

# NÛDEM

No 31 1999



Kovara Huneri, Edebi û Çandi



# NÛDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî

Xwedî û berpirsiyarê giştî  
Chief Editor

## Firat Cewerî

Hejmar: 31 sal 8  
Payiz 1999

Şerdên abonetiye (salek)  
Swêd: 240 Sek  
Skandinaviya: 280 Sek  
Ewropa: 100 DM  
Amerîka, Australîa,  
Kanada: 50 \$  
Institution: 290 Sek

Postgiro: 636 36 25-2  
ISSN: 1103-1964

Wêneya bergê:  
Keçeke kurd ji Sovyeta kevin  
(Hem wêneya bergê hem jî  
piraniya fotografên vê  
hejmarê ji arşîva Wezîrê Eşo  
hatine girtin. Em gelekî  
spasdarê wî ne)

Çapa bergê:  
Jakobsbergs Tryckeri

Pergala bergê û rûpelan:  
Nûdem

Adres:  
NÛDEM, Box: 177  
177 23 Järfälla-Sweden


E-mail:  
nudem@telia.com

Tel û Fax: 8-580 131 62  
70-7774552  
8-583 564 68

# NAVEROK

- 4 Kurdên kevnosoyetê ❖ FIRAT CEWERÎ
- 6 Dîroka kurdên Sovyeta kevin ❖ WEZÎRÊ EŞO
- 32 Yêrêvan xeber dide guhdarêd eziz ❖ ROJEN BARNAS
- 39 Li ser sînorê welêt li Ermenistanê ❖ MEHMET AKTAŞ
- 49 Sazbendiya kurdên Ermenistanê ❖ NÛRA CEWARÎ
- 56 Melkesvano ❖ ARJEN ARÎ
- 57 Şiira kurdî li kevnosoyetê ❖ TOSINÊ REŞÎT
- 64 Ger tu neçûya ❖ CAN GULŞENOGLU
- 65 Serdana Laçînê, paytexta Kurdistana Sor ❖ SILÊMAN ALÎ
- 69 Lorandina evînekê û Eslîka Qadir ❖ MEDENÎ FERHO
- 79 Du nameyên QANATÊ KURDO ji F. CEWERÎ re ❖
- 83 Qesîda qedexê ❖ RÊNAS JIYAN
- 86 Dil bû mecnûnê evîne ❖ HÊVÎDAR ZANA
- 96 Hawara dilê min, Hezkirî ❖ ABIDÎN
- 97 Hatî ❖ ZEYNEL ABIDÎN
- 98 Afirandina hunerî û edebî ❖ N. ZAXURANÎ
- 105 Ducan ❖ EMÎN BOZAN
- 106 Rêwîtiya tenêtiyê ❖ BERKEN BEREH
- 107 Li ser Kevoka Spî ❖ A. AMEDÎ
- 111 Kevoka Spî ❖ FIRAT CEWERÎ
- 119 Xezeba Azadiyê ❖ LALEŞ QASO
- 133 Pîrê, Baxçe û Adar ❖ KAWA NEMIR
- 134 Pêwendiyên kurd û vîkîngan ❖ ROHAT ALAKOM

# KURDÊN KEVNESOVYETÊ



**FIRAT CEWERÎ**

"Te nivîsiye, ku xortên niha qedir û qîmetê edebiyatê nizanin. Ew rast e, lê wê bere-bere giringiya wê, hêjaya wê zanibin, gunê wan nîn e, ku wan bi zimanê dayika xwe yê şêrîn xwendina xwe nestandine, ne gihîştine. Lê ew ê rojekê serwest bibin, xwe bihesin, qedir û qîmetê şihêrbêj û helbestbêjên xwe, zanyar û alimên xwe zanibin, bi nivîsarên wan ve fexir û kubar bin, derheqa wan de bêjin û binivîsin."

*QANATÊ KURDO*

**K**urdên Sovyetê, kurdên Êrîvanê, ji me dûr, lê di dilê me de bûn. Min hê di salên xwe yên gelekî biçûk de navê kurdên Sovyetê bihîstibû, min dizanibû ku kurdin hene û min texmîn dikir çihê ku ew lê dijîn jî Kurdistan e. Ji min we bû, kurdên Sovyetê Kurdistan ava kirine, li ser axa xwe azad û serbest dijîn; bi zimanê xwe dipeyivin, di dibistanan de bi zimanê

xwe perwerde dibin, kilamên xwe bi zimanê xwe dibêjin. Belê, min kurdên Sovyetê ne bi riya xwendinê nas kirin, min ew bi riya kilamên wan nas kirin. Dema ku ez behs dikim, dibe ku min hê dest bi dibistanê nekiribû. Ji xwe dibistan bi tirkî bû, mamoste tirk bûn û em bi kultur û îdeolojiya tirkîtiyê perwerde û mezin dibûn. Lê ew xurtedengên dengbêjên kurdan ku bi riya radyoya Êrîvanê li seranserê Kurdistanê pêl didan, dikirin ku hêsir ji çavên gelek jin û mêrên kurdan werin. Ew lerza dengê wan, mîna tîrekê li dilê me zarokan jî diket. Ji xwe, di hênkahiya danên êvaran de, gava dema weşana radyoyê dihat, herkesî dev ji kar û îşên xwe berdidan û bi heyranî guhên xwe didan radyoya Êrîvanê. Lê gelek caran bi tîrs û bi dizî lê guhdarî dikirin. Digel ku kesekî biyanî li gund tunebû jî, dîsa gundî pir li xwe miqate bûn û ji tîrsa ku dewlet dikare bibihîze, wan guhdarîkirina radyoyê jî mîna sirekê vedîşartin. Dîsa baş tê bîra min, gava dema stranan dihat û radyoyê dest bi parazîtan dikir, gundî hêrs dibûn, hin kesan dest bi kufurbaziyên dikirin û gazin û rexneyên dinyayekê dibarandin. Hingî diya min, ji dil devê xwe dadigirt û digot: "Welleh dijmin nahêlin ew bistirên, destên xwe dixin qirika wan."

Bi rastî jî gava min ew gotinên diya xwe dibihîstin, wêneyekî dengbêjên radyoyê ku di nava destên eskeran de diperpitûn dihat ber çavên min.

Min kurdên Sovyetê ji stranên wan nas kirin. Stranên kurdên Sovyetê ez bi min dam naskirin.

Sal derbas bûn, me mal bar kir bajêr, ez bûm xort û ketim nava tevgera "teleban". Ez hingî bi awayekî din li kurdên Sovyetê fikirîm, tiştên ku di derbarê wan de ketin destên min, min xwendin û kêr be jî ji aliyê ziman, dîrok û ola wan ve ez bûm xwediyê hin agahdariyan. Hingî rêkxistin û partîne kurdan gotin ku ew jî perçeyekî Kurdistanê ye, Kurdistan kirin pênc perçe û eniya li dijî pênc dewletên mezin fireh kirin. Lê ji ber ku em dilxwazên Sovyetê bûn û li gora nêrîna me ya wê demê Sovyet sosyalîst bû, hemû problemên hundirîn çareser kiribû, berberiyên sinif û kategoriyan nema bûn; herkes têr û azad bûn, loma, li gora me, kurdên wê derê jî di nava sistema sosyalîzmê de gihîştibûn azadî û serbestiya xwe.


Ez di heştêyî de derketim derveyî welêt û piştî heştêyî jî sistema Sovyetê hilweşiya. Min li derve kurdên Sovyetê baştir nas kirin, pêwendiyên min bi wan re çêbûn, ez çûm mêvandariya wan, ew hatin mêvandariya min. Min dît ku kurdên kevnesovyetê li gora nifûsa xwe ya kêr, li gora îzolebûn û dûrbûna ji welêt; di warê huner, ziman û edebiyatê de xebatên heja kirine. Lê xebatên wan negihîştine Kurdistanê, xwendevanên welêt ji xebatên wan bêhay û bêpar mane.

Di warê danasîna huner û edebiyata kurdên kevnesovyetê de, divê ez kovara Roja Nû, weşanxaneya Dengê û televîzyona MEDÊ bi bîr binim. Di vê hejmarê de, me jî xwest ku em careke din kurdên kevnesovyetê bi dîrok, ol, huner, muzîk û edebiyata wan ve binin zimên. Armanca me ew bû ku em hejmareke têr û tije li ser kurdên kevnesovyetê çêbikin ku di derbarê wan de bibe berhemeke çavkaniyê. Lê mixabin, bi tenê ev ji me hat. Em dizanin ku di derbarê kurdên kevnesovyetê de ne bi tenê nivîskarên vê hejmarê xwedîgotin in, lê bi dehan nivîskar û hunermendên din jî hene. Mixabin me nikaribû xwe bigihanda hinekan ji wan û nivîsên hinekan ji wan jî negihîştin me. Heger di hejmarên pêş de bigihîjin me em ê wan jî hêdî hêdî biweşînin.

Lê di vê hejmarê de, Wezîrê Eşo dîroka kurdên kevnesovyetê, zimanê wan, ola wan, edebiyata wan, komarên ku lê dijiyan, sistema Sovyetê, sebebên avanebûna Kurdistanê, şaştiyên Lenîn û Stalîn, zilma li ser nivîskarên kurdan tîne zimên. Nivîsa Wezîrê Eşo di hejmarê de jî wê bidome. Rojen Barnas bi girîngî û tesîra radyoya Êrîvanê re, rexneyan li hunermendên ku strana kurdî xerab dikin digire û daxwaza hunermendiyêke rastî û profesyonelî dike. Mehmet Aktaş me bi xwe re dibe Ermenîstanê û li malên kurdan dike mêvan. Nûra Cewarî resimekî sazbandiya kurdên kevnesovyetê radixe ber çavan û girîngiya lêbixwedîderketina folklorê kurdî tîne zimên. Tosinê Reşîd jî behsa şîra kurdî ya kevnesovyetê û demên cihê cihê di şîra kurdî de dike. Herçî Silêman Alî ye me dibe Kurdîstana Sor û li paytextê wê, li Laçînê digerîne. Bi riya hevpeyvîna Medenî Ferho ya bi Eslîka Qadir re jî em di derbarê huner, hunermendî û siyaseta kevnesovyetê de dibin xwedî agahdarî.

Bi hêviya ku wê bi dilê we be... ✍

# Dîroka kurdên Sovyeta kevin




WEZÎRÊ EŞO

**M**in weke hercar bi hezkirin û şabûn xwestina berpirsiyarê “Nûdema” me ya kurdî birêz Firat Cewerî bi cî anî û ev gotara xwe ya di dorbera dîroka kurdên Sovyeta berê de nivîsî. Ez dibêjim: Bi hezkirin û şabûn, ji ber ku “Nûdem” bi xurtî zimanê me û kurdîtiya me diparêze, lê ev

kar jî di rojên me de ji karê rizgarkirina netewa me, ji bo bidestxistina serfirazî û serxwebûna wî kêmtir ne girîng e. Nivîsîna dîroka kurdên Sovyeta berê vê rewşa îroyîn û nexasim ya li ser şexsê min pir dijwar e. Ya pêşîn ew e, ku dîroka kurdên Sovyeta berê bi giştî û bi temamî hetanî îro ji aliyê tu kesî ve nehatiye nivîsandin. Her bi tenê kêmkê dîroka kurdên Ermenistanê, çand û edebiyata wan hatiye nivîsandin û weşandin: Bi destê Heciyê Cindî, Nadoyê Xudo (Maxmudov), Xalit Çetoyêv, Karlanê Çeçanî û Tahirê Emer ve hatiye nivîsandin. Lê, ji ber sedem û meremên politîkî, bi hemdê wan, an jî bi piranî bê hemdê wan ew dîrok weke dîroka hemû gelên Sovyeta berê hatiye aloz kirin. Tu kesî newêrabûye di dewleta totalîter û dîktator de rastiya dîrokê bîne holê. Pir tişt, pir bûyer wek yê girî, veşartî mane, wek sira dewletê û her bi tenê niha îmkana çêbûne ji bo bikaranîna wan dokûmentên dewletê. Dîrokzanan carna bi rastî bi mafdarî her bi tenê pesnê jiyana Sovyetê, politîka dewleta Sovyetê ya neteweyiyê dane, lê carna jî, ji ber zor û zilma

dewletê xwe kerr kirine. Dîroka kurdên Komarên Sovyeta berê yê din kêma hatiye nivîsandin, an jî qet nehatiya nivîsandin. Ev yeka ha, karê min yê nivîsandina dîroka kurdên Sovyeta berê pir dijwar dike, nexasim, gava em vê yekê jî bidin ber çavan, ku ez niha durrî Sovyeta berê me û lîteratûra weşandî li ber destê min nîne: Arşîva min li wir maye. Hemû îmkânên arşîvên nûvekirî ji bo min vê gavê tunene. Loma jî, dema nivîsandina vê gotarê ez weke dîrokzan hêviya xwe bi piranî didim ser bîra xwe û hinek belgeyên ku ez ji vir û wir bi dest dixim. Lê ev gotina min nayê wê wateyê, ku belgeyên di bin destên min de û yê li bîra min têrî nivîsîna gotarê nakin. Têrê



Nadoyê Xudo yek ji dîrokzanên kurdên kevnesovyetê bû.

dikin û ya herî girîng ew e, ku bi van zanebûnên xwe yê ji ezber û weke şahidê demekê yê dîroka me kurdên Sovyeta berê dikarin rastiya dîroka wan kurdan binim ber çavan û pir bûyeran cara pêşî û rast pêşkêş bikim.

Piştî hatine Ewrûpayê min biryar da ku dîroka kurdên Sovyeta berê binivîsim, ji ber ku min li vir dît, ku haya kurdan pir kêma ji wê dîrokê heye û xwestineke mezin heye, ku wê dîrokê bizanibin. Lê dîroka kurdên Sovyeta berê beşek ji dîroka kurd û Kurdistanê ye. Loma jî min biryar da, wek gelê me dibêje: "heger mirin tê de tunebe", piştî anîna arşîva xwe û belgeyên weşandî pirtûkeke pir bi belge di dorbera dîroka kurdên Sovyeta berê de binivîsim. Ev pirtûkê dê pir bi kêrhatî û pêwîst be, ji bona kurdên Sovyeta berê, ji ber ku ewê dîroka bav û kalên xwe ya rast tê de bixwînin. Piştî vê pêşgotina kurt em dikarin derbasî şiroverkirina dîroka kurdên Sovyeta berê bibin ya bi kurtî. Zemanê berê kurdên li ser sînorê Rûsyayê û ji beşekî yê li ser sînorê Îranê re, bi giştî yê li Gola Wanê ber bi bakur ve, ji wan re digotin kurdên Serhedê. Niha jî carina vê termê/bêjeyê di derbarê me kurdên Sovyeta berê de bi kar tînin. Lê ev term di vî zemanî û hin zemanên berî wê de jî êdî ne rast e. Niha sînor di navbera kurdên Sovyeta berê û kurdên li Kurdistanê de hatiye danîn. Halo rastir e ku em ji kurdên Sovyeta berê re weke kurdên Ewrûpayê bibêjin kurdên derveyî welêt an jî rastir e, ku em bibêjin kurdên diyasporayê (vê terma navnetewî em jî bi kar binin). Berî destpêkirina dîroka kurdên Sovyeta berê divê

em tişteki zelal bikin, ku ji bo têgihiştina wê dîrokê pir girîng e. Loma jî, ez vê gotara xwe bi vê sernivîsê pêşkêşî xwendevanên xwe dikim.

### **Diyaspora kurdên Sovyeta berê di çi zemanî de û bi çi awayî hatiye pê**

Helbet, gava ev diaspora kurdan hate pê, hê Sovyeta berê tune bû, di şûna wê de împaratoriya rûsî hebû. Ev împaratorî jî, bi carekê re nehtiye pê, hin perçên wê di sedsala 19an de hatine dagir kirin: Weke welatên Qafqasyayê. Du beşên diaspora kurdan hebûne û bingehê herduwan jî berî dagirkirina Qafqasyayê û Asya Navîn ji aliyê rûsan ve hatine danîn. Diaspora kurdan ya herî kevnar ya Azerbeycanê ye. Şamîl Eskerof (ronakbîrê kurd yê ji Azerbeycanê) dinivîsîne, ku kurd hê beriya mîladê di sedsala 7an de li Azerbeycanê hebûne. Di sedsalên navîn de, ya rastir jî ji sala 951ê hetanî sala 1174 an xanadanî ye. Malbata kurdan ya Şaddadiyan li Azerbeycanê hukum kiriye. Pişt re, di sala 1587an de Şahê Îranê Şah Abbas çend eşîrên kurdan sergomî Azerbeycanê kirine. Navê kurdan navekî payebilind û bi rûmet bûye li Azerbeycanê. Şaîrekî rojhilatê yê mezin yê ji Azerbeycanê Fizûlî bi eslê xwe kurd bûye, lê şaîrekî azerî yê mezin Nîzamî jî xwarziyê kurdan bûye. Diaspora duduyan ji aliyê zemên ve ya Xorasanê ye. Niha Xorasan bûye du perçe: Ya mezin di nava sînorê Îranê de ye, lê ya din ya Turkmenistanê ye. Di sedsalên 16 û 17an de Şahên Îranê Şah Smaîl û Şah Abbas çend eşîrên kurdan ji Kurdistanê sergomî navça bakur- Rohhilatê Îranê yê Xuzistanê dikin, ku ew weke eşîrên xurt, merd û cengedar sînorên welêt ji êrîşên Asya Navîn yên koçerên dagirker biparêzin. Pişt re, beşek kurdên Xorasanê ketin nava sînorê Turkmenistanê, lê beşa mezin li Îranê ma. Ez vê dawiyê rastî belgeyeke pir balkêş hatim. Xwediyê gotareke kovarê, ku haya wî baş ji dîroka kurdên Xoresana Îranê heye, şahidiyê dike, ku vê gavê li wir weke du milyon kurd dimînin, çi ziman çi urf û adet, edeb û rizma neteweyî ji bîr nekirine. Her tenê di nava wan de, wek rûniştvanên Îranê xwendina bi zimanê zikmakî-kurdî- nîne. Ew serhev, bi kompakt dijîn û loma jî zimanê kurdî û kurdîtî winda nekirine.

### **Em niha bî ser diaspora kurdan li du welatên Qafqasyayê: Li Gurcistan û Ermenistanê.**

Kurd di sedsalên navîn de li Gurcistanê hebûne, nexasim li navçên wî welatî yên li ser sînorê Tirkîyayê. Di Sedsala 11an û 12an de peywendiyên xurt di navbera mîrîtî û dînastiyên kurdan û dewleta Gurcistanê de yên dostaniyê hebûne. Melika Gurcistanê, Tamarayê gelekî îtîbar bi kurdan, bi amîntî û merdbûna wan aniye, ku du



kurd kirine serleşkerên xwe: Îbo û Zahir, ku ermenî û gurcî ji wan re dibêjin; Îvanê û Zakarê. Nav û malbata wan di dîrokê de wisa diyar in. Lê em niha berê xwe bidne kurdên Ermenistanê. Ji dîrokê diyar e, ku ev çend hezar sal in, ku kurd li hewîrdora Çiyayê Agirî dijîn, lê Ermenistana îroyîn jî kîp her wî çiyayî dane. Hin eşîrên kurdan li Deşta Agirî û bakurê Êrîvanê hebûne. Ji destpêka sedsala 19an, gava Rûsyayê Ermenistana niha ji Îranê sitand, dagir kir, kurdên Êzîdî jî li Ermenistanê bi cih û war bûn. Du gundên kurdên êzîdî li girpala çiyayê Elegazê hebûne: Sîçanlî û Baygiz. Lê li bakurê wî çiyayî, li navça Axbaranê ji destpêka sedsala 19an olkeke kurdên êzîdî çê bûye. 12 gundên wê olkê hebûne û heta îro jî, ji bilî yekî hebûna xwe didomînin: Pamp, Çongermez, Camûşvana Mezin, Camûşvana Biçûk, Qundaxgaz, Senger, Poşt û Gozeldez. Ev navên van gundan yê berê ne, lê niha piraniya navê wan hatine guhertin.

Di salên 1877- 1878an de, di navbera Rûsyayê û Împaratoriya Osmanî de dîsa mîna caran cengeke giran tê li dar xistin (her tenê di sadsala 19an de çend cengên di navbera Rûs û Împaratoriya Osmanî de têne lidarxistin). Di vê cengê de li pêşeniya Qafqasyayê Rûs bi ser dikevin û Qaza Qarsê jî destê Împaratoriya Osmaniyan digrin. Li Qaza Qarsê bi piranî kurd diman û di nava wan de wisa jî kurdên êzîdî bi 16 gundên xwe yê cuda hebûn: Gundên navça Dîgorê.

Êl û eşîrên kurdên Qeza Surmeliyê (bi navenda Îdirê) jî bûbûn rûniştvanên Împaratoriya Rûsyayê. Hukumeta Çarê/Qaysê Rûsyayê weke serok berpirsyarê hemû kurdên misilman yê Qafqasyayê Malbata Gulî Cewaz Axa diyar kiribû. Lê yê kurdên Êzîdî Malbata Hesên Axa (pişt re jî, Üsiv Begê Hesên Axa bû serok)bû.

Ev bi giştî, lê her navçeyekê jî serokê wan kurd bû. Serokên navçan, nexasim yê kurdên êzîdî serê çend salan carekê ji aliyê rûniştvanan ve dihatin hilbijartin (Wî zamanî jî hilbijartinan re digotin avêtina kicê, kicavêtin). Ji van serokan re digotin “gilara” (ji peyva rûsî ya serî), lê kurdan ev peyv bi curê kurdî digotin: “gilarî”. Ev gilarî xekeke zincîrê ya di navbera hukumeta Qaysê rûs û olka kurdên êzîdî de bû. Hukumetê hemû pîrşgirêkên xwe bi destê gilarî çareser dikirin. Bi giştî rewş û jiyana kurdên Împaratoriya Rûsyayê ji jiyana kurdên Împaratoriya Osmanî xweştir û baştir bû. Hukumdariya Dewleta Rûsyayê wek ya Osmaniyan ne ya zor û zilmê bû. Piraniya serokêşîrên kurdên Serhedê jî yê di nav sînorê Dewleta Osmanî de, ku nêzikî sînorê Rûsyayê bûn, xwe li rûsan digirtin, meyla wan dikirin.

Bi saya polîtîka qenc ya dewleta Rûsyayê hemû gelên Qafqasyayê û Qezayên Qarsê û Surmeliyê bi hev re, bi aştî, bi cîrantîka qenc, bi xêrxwazî bi hevdu re dijîn. Di navbera kurdên misilman û kurdên êzîdî de ne ku tenê şer û dek çênedibûn, lê bi ser de jî ew li şîn û şahiyên hev bûn, bi hev re kirîvtî dikirin, ji ber ku

bingehê vê yekîtiya wan û biratiya wan xurt bû û bi tenê cudatiya olê nikarîbû bi-bûya sersebebê jihevduêrketina wan. Li Qeza Surmeliyê malbata Ûsivê Xwedo yê kurdê êzîdî serdewatiyê malbata Gulî Cewaz Axayê misilman bû. Li navça Dîgorê, wek meta min Meyane bi ax û kovan bi bîr tanî, gava li gundê kurdên misilman - Sorxuleyî - dibû şahî, dengê defê li rûniştvanê kurdên êzîdî - Şêrînkuyê - bela dibû, keç, bûk û zilamên wî gundî xwe dixemilandin û diçûn Sorxuleyê, li wir hetanî berbenga sibehê di destê xuşk û birên xwe yên kurdên misilman de govendeke giran û xweş digirtin. Ez çima vê hemûyî dirîsim? Helbet, bi nêr û merem, çimkî zemanekî şûnda, gava destên dagirkeran ketin navbera herdu beşên gelê me, heger xerab bû, ku xuşk û birên berî salakê, berî heftekê, berî rojekê li hev bûne dijmin, talanê hev birin û trajêdiya herî mezin: Hev kuştin. Ev yek jî, rûyê cenga cîhanê ya yekemîn û di polîtîka dewletên dagirker de, nexasim di ya dewleta osmanî de çêbû. Dijminayetî kirin navbera kurd û ermeniyan, yên ku hetanî hingê bi cîraniyeke qenc bi hev ra jiyar derbas dikirin.

### **Cenga Cîhanê ya yekemîn û çarenûsa kurdên Sovyeta berê**

Cenga cîhanê ya yekemîn (1914-1918) hew mabû roleke çarenûsî yeke qenc bilîze di nava dîroka gelê kurd ya dîr û dirêj de, lê bûyerên dîrokî piştî zemanekî kin bi piranî bi sebebê Şoreşa Oktobirê li Rûsyayê wisa çê bûn, ku stêrka azabûnê ya geş, ku ji bona gelê kurd weke stêrka li ezmanan derketibû, vemirî, winda bû. Û her tenê zor û zilma wî şerî kete kîsê gelê kurd bi koçberbûn û qira bi sedhezaran kurdan. Belê, weke çend sedsalên berê şerê navbera dewletên biyanî ev şer jî bû sebebê trajêdiya gelê kurd yeke nû. Li vir, vê carê jî bêhemdî me gotinên kurdê herî mezin yên Ehmedê Xanî tên bîra me. Gava ew şerên di navbera Tirkiyayê û Îranê de bîr tîne, di derbarê çarenûsa kurdan de, di dema wan şeran de weha dinivîse :

*...Ev rom û ecem, wek du deryayê dijî hev in  
Her cara ku bilivin û ji warê xwe derkevin  
Kurd bi xwînê dilewitin  
Wek berzexekê wan ji hev diqetînin*

Mîrov ji vê gotinê baştir nabîne û wê piştî çend sedsalan jî rastbûna xwe winda nekiriye. Gotinên ronakbîrên mezin wisa ne.

Împaratoriya Rûsyayê ji zû ve merem dikirin ku sînorê welatê xwe bighînin Avên Germ: Xelîca Farîsan, Okyanûsa Hindistanê. Bêguman şerê cîhanê yê yekemîn fersenda bicihanîna van xeyalan yên realîst pêk anî. Li pêşeniya Qafqasyayê

dijminên beramber yên sal û zemanan - Dewleta Osmanî û Rûsya - ketin pêşîra hev. Vê carê hemû bûyerên vî şerî li pêşeniya Qafqasyayê ser axa ku kurd li ser dijîn û ser axa Kurdistanê çêbûn. Lê mixabîn di vî şerî de ne bi tenê tirk û rûs ketin pêşîra hev, lê her wisa jî rûs û kurd bi hev ketin, lê mîna tê zanîn ev yeka ha bêhemdî kurdan û dijî kelka (menfeata) gelê kurd hate pê. Kurd rûniştvanên dewleta Tirkîya Osmanî bûn û li milê wê beşdarî şer bûn, ev yaka ha di şerên berê yên rûs û tirkîyan de jî qawimî bû. Belê, ne ku bi tenê li pêşeniya Qafqasyayê, lê wisa jî ya li Balkanan, li welatên ereban, êl û eşîrên kurdan xwîna bi sedhezaran, lawên xwe di ber Tirkîyayê de rijandin û vê carê jî rijandin. Siltanê Osmanîyan Hemîdê duymîn, hê ji sala 1892an ve alayên çekdarên kurd bi fermanîyayî serokeşîran saz kiribûn. Kurd bi piranî bi wan alayiyên xwe beşdarî şer bûn. Tirkîyan alayên kurdan yên bi navê Hemîdîyan didane pêşîya leşkerên xwe, ji bo ku derba herî pêşî û xedar li çekdarên kurdan keve. Bi tenê, di şerê Sarikamîşê de 70 hezar çekdarên dewleta Osmanîyan hatine kuştin, ku ji wan jimareke mezin lawên kurdan bûn. Leşkerê rûsan zora leşkerê tirkîyan bir û di nava zemanekî kin de axêke, aqereki pir fereh dagir kir. Rûs li rojavayê êrîşê birin û gihîştin Erzurum û Erzincanê, li başûrê rojavayê Bedlîsê, li başûrê Rewandîz, li başûrê rojhilatê Kermanshah. Deste û belûkên çekdarên ermenîyan wek mirovên bi cih û war li pêşîya leşkerên rûs êrîşê dibirin ser gund û bajarên kurdan û li pir cihan weke tolhildan rûniştvanên kurd jî dikuştin. Belê, ermenîyan ji bo jenosîda gelê ermenî ya ku ji aliyê Împaratoriya Osmanî ve pêk hatibû, kurd gunehkar dikirin. Lê rastiya dîrokê ew e, ku alayên Hemîdî bêhemdî xwe beşdarî qirkirina ermenîyan bûn, ji ber ku çerx di destê Hukumeta Osmanî de bû. Ma hedê kurdan bû ku li dijî fermanên Talat Paşa, Enver Paşa û Cemal Paşa derketana? Lê ev yek serokeşîrên kurdan yê fêhmkor û dûrnedîtî efû nake. Bi gunehên wan jî, leka kuştina ermenîyan ku cîranê bav û kalan bûn, ketiye ser gelê kurd. Lê em vê yekê jî ji bir nekin, ku Dewleta Osmanî ola misilmantiyê jî di vî mistewê de bi hostatî, bi şehrezatî bi kar anî. Ajanên tirkîyan di nava êl û eşîrên kurdan de digeriyan û propaganda li dijî ermenîyan bi cih tanîn, digotin: “kurd û tirk bira ne, herdu jî xwediyê olekê ne, lê ermenî kafir in û dixwazin li ser axa kurdan bi destên rûsan û dewletên rojavayê dewleta xwe damezrînin û kurdan jî bixin koleyên xwe”. Di wê demê de partî û rêxistinên kurdan yên xurt tune bûn ku li dijî wê polîtîka dewletê rawestiyana. Em çima pir dûr diçin? Pîştî wî şerî jî, dema serhildanên kurdan yên di salên bîst û sihê de dewleta Tirkîyayê her hewl da ku eşîreteke kurdan bibine ser ya din û bi wî awayî di navbera kurdan de şerê birakujîyê li dar bixe. Lê, li rex vî xerabiyê bûyerên çê jî dihatin holê: Kurdên Dêrsimê 50 hezar ermenî li ba xwe veşartin û ji qirkirina rizgar kirin. Pir malbatên kurdan mirin didan pêş çavên

xwe û li navçên din jî, keç û lawên ermeniyên di malên xwe de ji kuştinê diparastin. Kurdên êzîdî yê Çiyayê Şengalê û Geliyê Laleşê bi hezaran dîlên ermeniyên li ba xwe sitirandin û Hemê Şero diyarî tirkên kir, ku tu law, tu keçêke ermenî teslîmî wan nake.

Bûyerên trajîk yê birakujiyê di vî şerî de di navbera kurdên êzîdî û kurdên misilman de hatin pêk anîn. Sala 1918an çekdarên ermenî doza gundekî kurdên misilman, gundê Sorxuliyê, ku min li jor bi bîr anî, girtin, hemû rûniştvanên wê kirin gomê û agir bi wan xistin, hemû şewitandin. Pîr mixabin ku hin kurdên êzîdî bi serokatiya Elî Axayê Emer Axa beşdarî vê zilma giran bûn, mîna piştgirên ermeniyên. Lê kurdên Sorxuliyê jî, weke tê gotin, ne am û tam bûn, ne haya wan ji kirinên Alayên Hemîdiya û ne jî ji qirkirina ermeniyên hebûn. Hema wê salê jî, gava leşkerên Kara Bekir Paşa eşîr anîn ser Ermenistanê çekdarên kurdên misilman jî bi serokatiya Teyo Begê bi tirkên re hatin. Ew li navça Axbaranê li gundê Camûşvana Mezin, pişt re Elegez Elî Axa û neferê wî weke tolhildanê kuştin û bi ser de jî 150 mêrên kurdên êzîdî li ber pira gund ser jê kirin û laşên wan avêtin çem. Leşkerê tirkên li navça Axbaranê bi sedan mêrên kurdên êzîdî weke dîl girtin û birin aliyê Erzurûmê. Ji wan her bi tenê du kes bi revê xilas bûn, veqeriyên, yê din jî bêxêber û bêguman wîndî bûn. Belê, her ev e rastiya dîrokê ya gelekî tal, lê em divê wê bêjin. Mixabin, ronakbîrekî me pesnê dostaniya di navbera malbata Elî Axa û ermeniyên de dinivîse û ji bilî pesandinê tu giliyek di derbarê trajediya Sorxuliyê de nanivîse. Belê, em gotina dostaniya gelê kurd û ermenî weke gelên xwediyê eynî dîrokê û çarenûsa wan wek hev in. Lê divê ku mirov him ermenî û him jî kurdên ku tev li wan birakujiyên bûne, gunehê wan diyar bike. Eger em vê yekê nenivîsin, em ê dîrokê serûbinî hev bikin û gelên me jî tu dersan ji bûyerên dîrokî dernaxin.

Em niha ber bi vê pîrsê ve herin, ka şerê Cîhanê yê yekemîn çî guhertin kirin na-va çarenûsa kurdan û Kurdistanê û nexasim kurdên Rûsyayê, ku pişt re bûn rûniştvanên Sovyeta berê ya ku li ser axa Împaratoriya Rûsyayê hate damezrandin. Lê, ji bo ku em bi temamî û zelal bersiva vê pîrsê bidin, divê Em Şoreşa Oktobirê û rola wê bi bîr binin ya ku wê bi gîştî ji bo çarenûsa kurdan û bi taybetî ya kurdên Sovyeta berê leyist, têbigihin.

Piştî Şoreşa Oktobirê, gava hukumeta Qayserê Rûs hate ruxandin û hukumet ket destê komunîstan (Bolşewîkan) serokê hukumeta Komarên Sovyetê V. Î Lenîn eşkere kir ku Rûsya xwe ji nava şer vedikişîne. Ji ber ku ew şer dewletên Împeryalî bi Împaratoriya Rûsyayê weke şerekî dagirkeriyê li dar xistin. Dewletên rojava yê kapitalîst hatina komunîstan hê ji serî de bi dijminatî pesend kirin. Ji ber wê dewletê dijberiya xwe li pêşberî kapitalîzmê û dewletên kapitalîst yê mezin eşkere di-

yar dikir. Em li ser bûyerên din nasekinin, her bi tenê li ser wan bûyeran radiwestin yên ku çarenûsa gelê kurd bi giştî û nexasim ya kurdên ku li Sovyata berê diman. Me got, ku Rûsyayê di şer de piraniya axa Kurdistanê dagir kiribû. Eger Şoreşa Oktobirê nehabita li dar xistin, wê dîsa rewşa kurd û Kurdistanê di nava sînorê Împaratoriya Rûs baştir bûye. Rast e, li Împaratoriya Rûsyayê jî hîna zordarî û nemafdarî li pêşberî kêmanetewan hebû, lê tu deman em nikarin beramberî wê zor û zilma giran ya ku tirkan li pêşberî kêmanetewan bi cîh tanîn, bikin. Li Rûsyayê pir hindik be jî mafên mirovan bi qanûnî dihat parastin. Eger Kurdistan di nava sînorê Rûsyayê de bima, asoyeke qenc ya mîna gel domandina xwe ji bo gelê kurd di hate peyde kirin. Diyar e ku piştî Şoreşa Oktobirê hemû welatên derveyî Rûsya eslî, ku diketin nava sînorê Rûsyayê weke welatên netewa maf pir bi dest xistin: Di wan welatan de komarên Sovyetî hatin damezrandin. Û ew hemû ketin nava dewleteke nû ya bi navê Yekîtiya Komarên Sovyetî yên sosyalîst . Di van komaran de jî, ji bilî zimanê rûsî, zimanên netewan jî weke zimanê fermî hate pesend kirin. Her komarekê parlamentoya xwe hilibijart, hukumeta xwe saz kir, ala xwe li ser avaniya parlamento çikand. Welatên Qafqasyayê, Asya Navîn, Ûkranya bûn komarên yekîtiyê. Pîretewa/kêmneta bûn xwediyê komar û navçên otonom. Eger Şoreşa Oktobirê pêk nehatiba û Kurdistan di nava sînorê Împaratoriya Rûsyayê de bimaye, ew ê jî mîna Ermenistanê, Gurcistanê, Azerbeycanê, Turkmenîstanê û weke yên din bibûye komara yekîtiyê û îro jî, piştî hilweşandina Yekîtiya Sovyetê dê bibûye dewleteke serbixwe. Lê, Lenîn û Şoreşa Oktobirê bûn sersebebê hiçkirina vê asoya qenc. Artêş, leşkerên Rûsya Qayserî piştî Şoreşa Oktobirê û derketina Rûsyayê ji nava şer bê serî ma û hêdî bi hêdî ji nava Kurdistanê vekişyan, derketin. Lê şoreşa Oktobirê û Lenîn bi tenê di vê mistewê de nebûn sersebebê serfirazî û serxwebûna Kurdistanê. Diyar e ku li gora Peymana Sewrê ya sala 1920an, dê du dewlet hatibana damezrandin û ji Tirkiyeyê bihatana veqatandin: Ermenistan û Kurdistan. Lê li vir jî, şansê kurdan tune bû û ne ku bi tenê ji ber polîtîka dewletên rojava, lê dîsa bi piranî ji rûyê wê piştgiriya ku Lenîn nîşanî Atatürk û Tirkiyê da, kurdan tiştêk bi dest nexist. Di derbarê komploynên dewletên rojava de ji bo pûçkirina Peymana Sewrê pir tişt hatine nivîsandin, lê di derbarê ve yekê de, ku Rûsya Sovyetî û Lenîn jî rolekî pir xerab leyistin ji bo çarenûsa gelê kurd mîna ku tê xwestin hê nehatiye nivîsandin û sebebên vê yekê jî meremên polîtîkî ne. Berî hilweşandina Yekîtiya Sovyetê tu kesî risk nedida ber çavên xwe ji bo vê yekê bi awayekî eşkere binivîsîne. Niha jî dîrokzanên me di derbarê vê pîrsê de hê jî ker in, ji ber ku eşkerekirina polîtîka Lenîn e, herçiqas ev polîtîka ji bo kurdan xerab be jî, lê, dibe, ku li dijî kelka (menfeata) Rûsya îroyîn nebe jî û heger ne îro be jî, dikare

dijî kelka sibe û dusbe be, ji bo vê yekê jî, bêdengî peyde dibe. Amanca min ew e, ku di derbarê vê pirsê de binivîsim û ji nû ve polîtîka Hukumeta Sovyetê ya di derbarê kurdan de binivînim û ne ku bi tenê di derbarê dewra Lenîn û ya Atatürk de, lê wisa jî di derbarê dewra Stalîn de û pişt re jî hetanî hilweşandina Yekîtiya Sovyetê. Bi kurtî, niha her bi tenê ez dixwazim bêjim, ku ev polîtîka di derbarê kurd û Kurdistanê de ya dijminayetiye bûye. Bi kurtî ez dixwazim vê yekê jî bibêjim: Piştgirîya Lenîn ya bi vî awayî ku Atatürk rabe û bikaribe pir tiştan pêk bîne ji bo pûçkirina Peymana Sewrê, gelekî xerab bû ji pêşeroja me kurdan re.


## **Sergomkirina demografîkî ya di nav kurdên Rûsyayê de**

Lê, niha em bala xwe bidinê ka di dema Cenga Cîhanê ya yekemîn û piştî wê, lê wisa jî piştî Şoreşa Oktobirê çî guhertin ketin nava jiyana kurdên Împaratoriya Rûsyayê, çarenûsa wan çawa hate guhertin. Ya pêşî divê bê gotin ku guhertinên demografîkî yê berbiçav hatin holê. Dawiya cengê êleke kurdên êzîdî yeke giran bi serokatiya Cengiz Axayê Heylo ji bakûrê rojhilatê Gola Wanê koç û bar kir û hate axa Ermenistana îroyîn. Wê êlê êdî nikaribû zor û zilma dewleta Tirkiyeyê ya li ser kurdên êzîdî biqurpandine. Cengîz Axa bi çekdarên xwe, xwe gihand çekdarên ermenî û gava artêşa Tirkiyeyê bihara sala 1918an êrîş anîn ser Ermenistanê wî ligel siwarên xwe bi mîrxasî li dijî wan dagirkeran şer kirin, axa Ermenistanê ji dagirkirinê û gelê ermenî ji qirkirina dawî rizgar kirin.

Di eynî demê de, êleke kurdên êzîdî yeke giran ji navça Îdirê koç kir û ew jî hat li Deşta Araratê bi cih û war bû. Ew jî êla Ûsiv begê bû.

Bihara sala 1918an êleke êzîdiyên navça Qersê jî mecbûr bû bi koçberkirinê xwe ji êrîş û qirkirina artêşên Tirkiyeyê biparêze. Merivên wê êlê xwe li gundên kurdên êzîdî yê navça Telînê û Axbaranê girtin. Kurdên êzîdî ji navça Tûtekê û Tendûrekê jî koç kirin, hatin Ermenistanê. Piştî zemanekî kin beşek ji wan kurdên êzîdî çûn paytexta Gurcistanê: Tivlîsê, ku xwe ji mirina hal û tirsê, ji birçîbûnê biparêzin. Eger kurdên êzîdî ji bo rizgarkirina giyana xwe, ji bo domkirina jiyana xwe xwe li gurcan, ermenî û rûsan girtin, lê kurdên misilman ku hetanî hingî li navçên Ermenistanê yê cuda diman xwe li Tirkiyeyê girtin, ya rastir xwe li Kurdistanê girtin. Ew jî, ji zor û zilma ermenî û rûsan ditirsiyan. Kurdên misilman çûn, lê şûna wan kurdên êzîdî girtin: Li gundên navçên Deşta Araratê û yê dorbera wê deş-tê, li gundên navça Telînê bi cih û war bûn.

Lê guhertina herî mezin ya di nava jiyana kurdan de li navçeyên Surmeliyê û Qersê hatin pêk hatin. Weke me li jor diyar kir, di sedsala 19an de Rûsyayê navçeyên Qersê dagir kirin, ji Tirkiyeyê sitandin û xistine nava axa Împaratoriya Rûsya-



Jinên kurdên êzidî ji Tivlîsê.

yê. Li wan navçan bi sedhezaran kurdên misilman diman. Di dawiya cenga cîhanê ya yekemîn de artêşa tirk ew navçe bi hêsanî dagir kirin, ji ber ku piştî Şoreşa Oktobirê leşkerên rûs ji wan navçan vekîşiyabûn. Çekdarên ermenî nikarîbûn li ber xwe bidin û ji ber êrîşa tirkan ya zorî sext paş de vekîşyan. Dawiya bihara 1918an Komara Ermenistanê wek dewleteke serbixwe hate damezrandin. Lê wê jî, nikarîbû wan navçan ji bin zordestiya tirkan derxe û rizgar bike. Di dawiyê de ew navça bi peymanî Moskowayê ya sala 1921ê Lenîn ew şûn de dan Tirkîyê. Ew peymanî dostaniyê, cîrantiya çê û hevkarîyê ya pêşî bû di navbera Tirkîye û Rûsyayê de. Ji bo hukumeta Rûsyayê ya Sovyetê dostaniya bi Tirkîyeyê re saz bike, dostanî ji axa wan herdu navçeyan çêtir û giringtir bû. Tirsî Rûsya Sovyetê, ji dewletên rojava yê mezîn bû û ji bo parastina sînorên xwe yê başûr di eynî salê de peyman bi Afganistan û Îranê re pêk anîn. Amanca hukumeta Lenîn ya herî mezîn û girîng parastina Komarên Sovyetê bû. Wê hukumetê her tişt li gora kelka (menfeata) "sosyalîzmê" dikir û kurd jî bûn qurbana wê kelkê (menfeatê.) Belê, Tirkîye dewlet bû, xwediyê sîstemeke stratejîkî ya sext bû. Loma jî dewleta Sovyetê hewcedarî dostaniya wê bû û di demeke dirêj de ji bo xatirê parastina wê dostaniyê bi çavên dijminayeti li kurdan û têkoşîna wan ya azadiyê dinêrî û bi ser de jî tev li perçiqandina serhildanên kurdan dibû. Lê, Tirkîye hetanî wî zemanî her bi tenê dostê Sovyetê ma

heta ku hewcedarê wê bû. Tirkiye tu carî îtîbara xwe bi Rûsyayê nedianî û dawiyê bû endamê NATOyê, wisa dijminê Rûsya yê eşkere. Heyf e ku em kurd vê dawiyê bi vê yekê hisiyay, lê ew jî, ne hemû kurd. Heyf e ku her bi tenê vê dawiyê em dikarin di derbarê vê yekê de eşkere bibêjin û binivîsînin. Ma hetanî çend sala berê, Şoreşa Oktobîrê û dewleta Sovyeta berê kurdan mîna dost hesab dikirin.

Guhertinên demokrafîkî di serpêhatina cenga cîhanê ya yekemîn de piştî Şoreşa Oktobîrê hetanî sala 1937an di nav kurdên Azerbeycan û Turkmenistanê de nehatin pê. Lê li Qafqasyayê piştî wî şerî û di dema şoreşê de cara yekemîn olkeke kurdên êzîdî yeke ku ji xortan pêk dihat, li paytexta Gurcistanê - Tivlîsê - hate girtin. Di derbarê guhertinên demografîkî de di nav kurdên Sovyeta berê de ya di sala 1926an, 1937an, 1949an em ê pişt re li ser rawestin.

Lê niha em dest bi şirovekirina dîroka kurdan mîna rûniştvan û hevvelatîyên Sovyeta berê bikin.

### **Polîtîka Lenînîstiyê ya neteweyî û kurdên Sovyeta berê**

Piştî Şoreşa Oktobîrê çend welatên Qafqasyayê û hinekên din ji Împaratoriya Rûsyayê veqetiyay û dewletên xwe yê serbixwe yê netewî damezrandin. Lê ji destpêka salên 1920an ew welat bi beşdarbûna artêşa Rûsya Sovyetê careke din gihîştin Rûsyayê û vê carê weke Komarên Sovyetî yê yekîtiyê. Dawiya sala 1920an ew hemû komar bi fermî gihîştin hev û bi alîkariya vê yekê Yekîtiya Komarên Sovyetî yê Sosyalîst hate pê: Ser axa Împaratoriya Rûsyayê ya berê. Ev yek li gora programa Lenînîstiyê ya netewî hate pêk anîn. Ev program dê di nava dîrokê de bimîne mîna programeke çareseriyê ya pirsgirêka netewî ya qenc î rast. Berê, li ser axa Împaratoriya Rûs yek dewlet hebû ew jî Împaratoriya Rûs bi xwe bû. Hemû welatên din yê ku diketin nava sînorê wê Împaratoriya Rûs de her bi tenê weke qeza û navçên dewletê dihatin hesabandin. Împaratoriya Rûsyayê li ser bingehê teretoriyal/adminîsteratîf hatibû dabeş kirin, lê ne li ser bihgehê neteweyîtiyê. Navê welat û netewan jî li ser wan welatan hatibû rakirin yê ku dikevin nava teşkîla Rûyayê. Mînak, Ermenistan bi navê xwe nediket nava sînorê Rûsyayê, lê bi navê Qeza Êrîvanê. Gurcistan û Azerbeycan jî weke qeza dihatin nas kirin. Li Gurcistanê, mînak, qezayên Tivlîsê, Kutasiyê hebûn, li Azerbeycanê jî qezayê Bakûyê û Elîzawêtpolê. Lenîn digot, divê ku her netewayek û welatek bi navê xwe bê naskirin û komara xwe ya yekîtiyê angî li gora hejmara rûniştvanên xwe komara xwe ya otonom damezrîne. Divê, ku her komareke yekîtiyê parlement û hukûmet, al, gêrb û sirûda wê ya netewî hebe. Ji bilî zimanê rûsî, ku mîna yê navnetewî dihat hesabandin, di her komarekê de zimanê dewletê yê duyemîn yê wî netewî be, ku li wir weke pira-



nî bi cîh û war e. Sed heyf e, ku li tu dereke Sovyeta berê hejmara kurdan têra saz-kirina komareke yekîtiyê ango yeke otonom nedikir. Her bi tenê li Azerbeycanê hejmareke kurdan yeke mezin hebû, ku li ser hev kompleks çend cîranê hev diman. Lê, li gora programa Lenînîstiyê ya netewî gelên hejmara herî kêr jî, hindikayiyên herî piçûk jî her gelek hejmara wî çiqas piçûk be jî, dikare bi zimanê xwe yê netewî bê perwerde kirin. Guhdariya herî mezin di hate pêk anîn ji bo wan netewa yên ku bi dereca pêşveçûnê ya çandî şûnda mabûn. Programê pir pêş de dikişan, ku ji kîsê dewletê, bi mesrefa dewletê hemû îmkanên pêşveçûnê ji bo wan gelan pêşkêş bêne kirin. Û weke emê pişt re destnîşan bikin, ew program ji bo kurdan jî hate bicihanîn: Qeza û navçên kurdan hatin saz kirin (Qeza Kurdistanana Sor li Azerbeycanê û navçên Elegezê li Ermenistanê), xwendin - fêrkirina bi kurdî hate bi rêk xistin, edebiyat, çand û hunera kurdî hatin pêşvebirin.

Salên 1920an hejmara kurdan li Ermenistanê nêzîkî hezaran bû, li Gurcistanê bi texmîni bi qasî 10 hezar, lê li Azerbeycanê jî, ji 40 hezarî bêtir bû. Hejmara kurdên Turkmenistanê di wê demê de û pişt re jî ji me ve ne diyar e, lê tecrûba min ji min re dibêjê ji hejmara kurdên Azerbeycanê zêdetir bû.

### **Rewşa kurdên Sovyeta berê ya civakî - aborî û mafê berî hatina Sovyetê**

Êl û eşîrên kurdên, ku piştî cenga cîhanê ya yekemîn di nav sînorên Soveyta berê de bi cih û war dibûn, dehsalên vê sedsalê yên pêşî, hema bibêje heyana salên 1940î jî bi piranî bi jiyaneke pederşahî jiyana xwe didomandin. Helbet yên ku li gundan diman. Mîrata li gor kevneşopiyên, jiyana bi reng êlî û komî hê dom dikir. Olk û êlên kurdan, ku yekîtiyên terîtorîal bûn, lê pey re jî yên xwîn - ginêtiyê bi navê qebîle eşîrên mezin diyar bûn. Mînak, êla Cengiz Axa ya qebîle, eşîra Zuguriya bû. Pir berek, taxîm, diketin nava wê êlê. Ev berek, taxîm an jî tayfê yekîtiyên xwîn - ginêtiyê bûn, peyayên wan yekîtiyan ji bav û kalan digihiştin hev, ya rasttir, ji malbatekê hatibûn holê, weke berekên Reşa, Çuxreşa, Barava, Mendikan û yên din.

Êlên kurdên êzîdî yên Qersê (Dîgorê) jî diyar bû bi navê eşîr, qebîle xwe ya Sîpka. Heft berek, teyfe diketin nava wê êl û eşîrê: Wîtiya, Semsika, Mixeyla, Stûrka, Kîlêra, Îsediza û Çîlî. Birek ji berekên eşîran Sîpka jî li navça Axberanê bû. Li van herdû navçan eşîreke din jî bi berek, taxîmên xwe re dima ya bi navê Rojka. Ev qebîlên Sîpka û Rojka di nava kurdên misilman de jî hebûn û hene. Mînak, heranî bi nivê sedsala 19an qebîla kurdên êzîdî û misilman qebîlek bû, ku jê re dihat gotin: Eşîra Sîpka. Êla wan jî yek bû, dîsa jê re digotin: Êla Sîpka. Serokeşîr jî yek bû: Sarî Silêman Axa. Pişt re kurdên vê eşîrê yên misilman û êzîdî ji hev cihê bûn, ji hev

dûr ketin, lê bê şer û dew, bi aşî. Hemû eşîra Rojka ji sedsalên navîn de diyar e. Şeref Xanê Bedlîsî yê ku mîna bavê dîroka kurd û Kurdistanê tê nas kirin, Rojkî bûye. Mînaka eşîrên Rojka û Sîpka isbat dike, ku kurdên misilman û yên êzîdî, weke ku gelê me dibêje: Guliyê darekê ne, ewladê bav û kalekî ne û yên kurdên êzîdî û kurdên misilman cihê dikin û wan weke gelekî cuda dihesibênin, ew bextê xwe dişewitînin, ya rasttir bêbextiyê û xayîntiyê bi netewa xwe re dikin.

Êleke giran jî ya Hesîniya bû, ku bi serokatiya Ûsiv Begê ji navça Surmeliyê koç kir, hate Ermenistana îroyîn.

Kurdên êzîdî, ku salên 1920an, 1930an û pişt re jî Ermenistanê çûne Tivlîsê, wan jî zemanekî dirêj, wan jî dawîya xwe li gora berek û eşîran nas dikirin.

Eşîra kurdên misilman ya Bîzûrka, ku sala 1926an ji ber zilma dewleta Tirkîyê bar kirin, hatin Ermenistanê, ew jî ji berek, taximên ji hev cuda pêk dihatin.

Haya min kêr ji kurdên Azerbeycan û Turkmenistanê heye, gava ez literatûra di derbarê wan de bi dest bixim, ezê di derbarê wan de bi hûrgilî binivîsim, lê bi tecrûba min ew kevneşopî di nav wan de jî zemanekî dirêj domandiyê.

Beşbûna kurdan û xwe naskirina wan ya li gora eşîr û bereke ziyane daye pêkanîna yekîtiya gelê kurd û fersend daye dagirkerên biyanî, ku berxwedana kurdan ya qebîle-qebîle, berek-berek bişkîne û pirê caran eşîreke kurdan bi destê eşîra din bêzar bike û bi vî awayî teslîmî hukumdariya xwe bike. Şerên birakujîyê bi piranî di rûyê vê yekê de hatine pê. Lê, divê ku em tiştekî ji bîr nekin: Carna hin eşîr û bereka alîkarî dane kar û barê pêkanîna cebhê li dijî dagirkeran. Pir serokên eşîran bûne serokê serhildanên kurdan. Ji Bedir-Xan begê, Şêx Ubeydullah hetanî pir kesên din. Heger ev serokeşîr nebûna, dê kê ev têkoşîna çekdariyê bimeşanda, gava zemanê berê hê partî û rêxistinên kurdan tune bûn.

Di salên hukumkirina Hukumeta Sovyetê yên pêşî jî otorîteya serokeşîrên weke Cengîz Axa û Ûsiv Begê bilind bû. Gotina axa û began ji bona kurdên wê demê qanûn bûn. Carina di gundên me kurdan de li Ermenistanê di navbera taxim û berekan de şer û dozên dijwar diqewimîn, bi piranî ev şer li ser tiştekî netîşt yê besît, mînak, ji aliyê mirovekî berekê ve revandina keçeke ji bereke din, şer derdiketin. Serî bûn, ku bi şivdaran dihatin şikandin, mil û tiliyên destan bûn, ku bi gema dihatin firandin. Lê şikir ku di van deh salên dawî de gelê me ser hişê xwe hatiye û ji bo ser û dozên di navbera du zarokan de êdî şerên xwînê jî di navbera teyfan de nayên pê. Beşek ji kurdên Sovyeta berê hate salên 60 î û 70yî jî jiyanekê bi nîv koçerî derbas dikirin. Ango: Ne tam koçer û ne tam bi cih û war bûn. Nexasim kurdên deşta Araratê him gundên wan hebûn, ku payîzan û zivistanan lê diman û him jî derdiketin zozanan, palên çiyayê Elegezê, Axmaxanê û Egrîcê bûn. Van kurdan bi

taybetî pir pez xwedî dikirin, mal hebû, ku ji 500 pezî bêhtir pezê wan hebû. Payîza derengî û zivistana problema debora pêz tune bû, ji ber ku li deştê berf kêrî dibarî û ya ku dibarî jî zû diheliye. Kurdan pezê xwe li girê dora deştê û nava rewşenê gundê xwe de diçêrandin. Lê ew li biharê dest bi hîgirê dibû: Çûyîne zozanên bilind. Koça xwe li ga, hesp û keran dikirin: Livîn, sîtil, beroş û derdanên din û helbet konê reş jî ji bîr nedikirin. Li çiyayê zomên kurdan konê xwe vedigirtin, lê wan salên dawî di şûna konan de, ku çekirina wan dijwar bû, çadir bi kar tanîn. Hasila xwe li kaniyên ava sar hildidan û payîzê, gava li çiyê dibû sir û serma, dest bi dagirê dibû, kurd dihatin gundê xwe.

Lê kurdên ji navçên çiyayî yên cotkar, rûniştî bûn, weke kurdên navçên Axbaran û Telfînê. Weke ku ew dibêjin sal duwanzdeh meh li gundê xwe diman. Pez û dewar kêrî xwedî dikirin, ji ber ku zivistanê li wir dirêj dikişand û problema kêmasiya debara heywanan derdiket holê.

Bihar û hevînan, kurdan li mal heywanên xwe diçêrandin, hasil radikirin, zevî, bax û bostanên xwe diquraftin. Payîzan zemîrê xwe didan ser hev, aş û kerwanê xwe dikirin, lê mihên payîza derengî û zivistanê şevbêrkên xwe li oda dibihurandin: Çîrokêjiya berê, mesela û metelok, keyt-serpêhatî digotin, kelam, destan, li bilûrê dixistin.

Şîn û şahiyên xwe kurdan li gora kevneşopiyên bav û kalan li dar dixistin. Keç bi qelen didan mêr, lê şikir di van salên dawî de ji nava kurdên Ermenistan û Tivlîsê qelen bi carekê ve hate rakirin.

Civaka kurdan bi piranî ji mirîdan dihat holê, lê her mirîdek şêx û pîrê wî hebû. Nexasim şuştin, kefenkirin û veşartina miriyan bi destê şêx û pîrên kurdên êzîdî di hate bi cih anîn. Wan li ser miriyan qewl û beyt digotin, ku bi hezaran sal berê hatine berhem kirin. Piraniya kurdan hejar bûn. Lê rewşa kurdên deşta Araratê ji yê kurdên navçên çiyayî çêtir bû. Weke me got, li deştê pir pez û dewar xwedî dikirin, lê li gundên çiyê ew îmkân tune bû. Li navçên çiyayî ce û kertol diçêrandin, bêcer dikirin û ancax nanê devê zarokan didan ser hev. Di her gundekî de her bi tenê du-sê malên dewlemend hebûn, yên din bi zehmetî debora xwe dikirin.

Hetanî destpêka salên 1920an, ya rasttir hatina hukumetê, qaidêyên Sovyetê li welatên ku kurd lê diman, yên ku pişt re bûn komarên Sovyetî misoger ji sedî 99 rûniştvanên kurd nexwendî bûn, ji ber ku li navçên wan dibistan tune bûn. Weke me got, di nava hemû kurdên Qafqasyayê û Qeza Qersê de her bi tenê sê dibistan hebûn, ew jî yên rûsî bûn û yên xwendina seretayî bûn. Xortên ji aliyê Wanê tam nexwendî bûn.

Weke kêmanetewa tu mafên kurdan tune bû, ji nava wan karmendên dewletê û

endamên parlamant û hukumetê nedihatî hilbijartin. Ji bilî dewletê, hukumetê, pir hindik hukmê axa û began li ser kurdan hebû. Pir dozên di navbera kurdan de bi destê axa, beg, şêx û pîran dihatin çareser kirin: lihevruştandina ji bona birîndariyê, dizî û jinrevandinê û tiştên weha yên bi vî rengî. Lê, heger sûc giran bûya, nexasim gava mirov bihatina kuştin, hukumetê ew pirs safî dikir.

### **Destpêka şoreşa xwendinê (perwerdekirin) û çanda di nava kurdan de**

Weke me li jor jî got, li gora bernameya Lenîn ya neteweyî diviyabû ku bi alîkariya dewletê paşdemayîna gelên li welêt yên kêmanetewa bihata çareser kirin, bi wî şertî, ku ew bigihîştana mistewa neteweyên pêşketî. Kurd jî weke rûniştvanên Sovyeta berê diketin ber vê bernamê. Gava hukumeta Sovyetê ya herî pêşî hate damezrandin, hewl da ku nexwendinê di nava kurdan de rake û bi minasebeta vê yekê li hemû gundên kurdan dibistan hatin avakirin. Di destpêka salên 1920an de hetanî dawiya wan, dibistan li gundên navçên Kurdistanê hatin vekirin, lê li her komarekê dibistan bi zimanê wî netewî yê zikmakî, li Ermenistanê dibistan bi ermenî, li Azerbeycan, Gurcistan û Turkmenistanê dibistan bi zimanê azerî, gurcî û turkmenî hatin vekirin. Lê rewşa kurdên Ermenistanê ji ya kurdên wan hemû komaran cuda dibû, ku kurd lê diman. Li Ermenistanê ji bilî dibistanên ermenî û perwerdekirina bi zimanê ermenî, diviya ku mirov bawer bike, ku hema ji seriyê serî de, ji sala 1920an perwerdekirina bi zimanê kurdî jî dihate bicihkirin. Ev yeka ha jî, bi saya saziyên ermenî yên xêrxwazên dostên kurdan hate pê: Bi saya Lazo (Hakob Xaraziyani), yê ku kurdan bi rêzgirtin jê re digotin: Apo. Lazo ermeniyekî xwendekar bû, ku ji Îranê ji navça kurdan hatibû Ermenistanê, weke ronakbîr û serokekî partiyeke ermeniyani ya Hinçaka. Wî xwest ku zanîna xwe ya zimanê kurdî di oxira perwerdekirina zarokên kurdan de ya bi zimanê zikmakî xerc bike. Wî, ji bona vê yekê elfeba kurdî bi tîpên ermenî pêk anî û izna weşandina elfebayê ji hukumeta Ermenistanê xwest. Piştî standina wê iznê elfeba Lazo ya bi navê “Şems” li çapxana bajarê Ermenistanê ya Êcmiyazîne de sala 1921ê hate weşandin. Berî hemûyan sêwiyên sêwîxana bajarê Eşterekê yên kurd bi vê elfebayê bi zimanê zikmakî fêr bûn. Ji bilî Lazo, di vê sêwîxanê de Elîxan Şagirov û Nûrê Polatova kurd jî, ders didan. Piraniya gundên komarê yên kurdan jî elfeba Lazo bi kar tanîn.

Li vir, heger ku em wê alîkariya mezin bidin diyar kirin û sipasiyên xwe jêre pêşkêş kin, ji bo ku hukumeta Ermenîstânê û ronakbîrên ermenî dan ji bona vekirina dibistanên kurdan û perwerdekirina zarokên kurdan, di cihê xwe de ye. Wî çaxî, ji bilî Nûrê Polatovayê û Elîxan Şagirov ve kadroyên kurdan yên dersdar (mamosta) tune bûn. Gava li gundên kurdan dibistan vekirin, bala xw danê, ku hînkirina za-



Nivîskarên kurd Heciyê Cindî (li milê çepê) û Emînê Evdal du heb ji dersdarên dibistana kurdî yê nê pêşî bûn.

rokan kurdan bi zimanê ermenî gelekî zehmet e, ji ber ku piraniya wan bi zimanê ermenî qet nizanî bûn. Mamosteyên ermenî yê nê ku kurdî jî baş dizanîn, xwe dane ber vê barê giran, lê yê bi rûmet. Wan dest ji jiyana bajarên xweş kişandin û çûn gundên kurdan yê nê li çîyan, ku zarokên kurdan fêr û perwerde bikin. Piştî wan hêdî bi hêdî dersdarên kurd jî peyde bûn û pêşîya tevan Emînê Evdal û Heciyê Cindî bûn dersdar. Lê gava, sala 1931 ê xwendigehe kurdî ya Pişqavqasyayê ya pedagojiyê li Êrîvanê hate vekirin, hema bi carekê re hejmara kadroyên kurdan yê nê dersdar zêde bûn.

Piştî li Ermenistanê dibistanên kurdî li paytexta Gurcistanê hatin vekirin û ya herî pêşî dîsa bi destê Lazo hate vekirin. Ew, sala 1924 an ji Ermenistanê çû Tivlîsê û bi destê hukumeta Gurcistanê dibistaneke Şevberkiyê ya înternat ji bo zarokên kurd, nexasim yê nê sêwî û bêxwedî vekir. Lazo bi alîkariya Emînê Evdal, ji kuçên Tivlîsê pir zarokên kurdan civandin û anîn kirin şagirtên vê dibistanê. Di eynî demê de ronakbîrekî kurd yê bi navê Kamîl Bedirxan beg, ku piştî cenga cîhanê ya yekemîn nikarîbû vegere Tirkiyeyê (ji ber tîrsa îdamkirinê, ji ber ku ew serokê têkoşîna kurdan ya çekdarî bû li wî welatî), li Tivlîsê peneber ma. Kamîl Bedirxan



Cerdayê Gêncî ji destpêka salên sihi heta demeke dirêj berpirsiyartiya rojnama Riya Teze kiriye û herweha berpirsiyarê tiyatroya kurdî ya Elegezê bû.

bajêr yê kurd piyesên Mirazî ser sehnê nişan dan. Ji wan sisiyan komeke kurdî ya stran/folklorê bi rêk xistin. Lê, şoreşa xwendin û çandê pişt re dest pê bû, gava elfeba kurdî ya bi tîpên latînî hate pêk anîn. Xwediyê vê elfabê rûniştvanekî Komara Ermenistanê yê ji gundê Verîn Divînê yê ku bi eslê xwe mexîn (Aşûrî) bû: Îshak Morogûlor bû. Di pêvajoya pêkanîna elfebayê de ronakbîrê kurd yê bi nav û deng Erebe Şemo alîkariyeke mezin ji wî re kir. Pirtûka elfeba kurdî ya bi tîpên latînî ya bi navê “xwe bi xwe hînkirina zimanê kurmançî” li Êrîvanê hate weşandin. Belê, ev elfeba bû bingeha şoreşa çandî ya di nava kurdan de. Je ber ku ew ji hemû elfebayên din çêtir bi dengê zimanê kurdî û edebiyat û çanda me - çi kurdên li welêt û çi jî yên li derveyî - dikeve. Ser bingeha vê elfebayê sala 1930î, meha adarê dest bi weşandina rojnama kurdî ya bi navê Riya Teze hate kirin, ku hetanî niha jî tê we-

Beg dersdarê dibistaneke tirkî bû, lê wisa jî di dibistaneke bajêr ya partiya komunîst de ders didan. Wî bi alîkariya hukumeta Gurcistanê dibistaneke kurdî ji bo wan karêrên Tivlîsê yên kurd î nexwende vekir.

Di eynî demê de karekî baş yê çandê di nava kurdên Tivlîsê de hate pêk anîn. Hogirê Bedirxan, Ehmedê Mirazî, Esedê Cengo, isiyên yên ku bi eslê xwe ermenî bûn, ji bo kurdan kilûb vekirin û li wir şanoya kurdî pêk anîn, ya ku ji bo rûniştvanên

şandin û dibe ku ji aliyê zemên de rojnama herî temendirêj e, di nav rojnemeyên kurdî de. Di vê mistewê de ronakbîrên ermenî yên dostên me kurdan yên ku ji dil û can alîkarî dan: Nivîskarên ermenî Hîraçiya Koçar û Harûtûn Mikirtçiyân bûne berpirsyarên wê yên pêşî, lê piştî demeke kin lawekî gelê kurd, ronakbîrê bi nav û deng Cerdoyê Gêncî bi zemanekî herî dirêj bû berpirsyarê wê.



Casimê Celil rewşenbîreki kurdî pîrhêl bû.

Sala 1931ê li Êrîvânê xwendîngeha amadekirina dersdaranên ziman û edebiyata kurdî ji bo dibistanên kurdî yên hersê komarên pişt Qafqasyayê: Ermenistan, Gurcîstan û Azerbeycanê hate vekirin û berpirsyarê wê yê pêşî jî ronakbîrê kurdî yê bi nav û deng Casimê Celîl hate beyan kirin. Ronakbîrên ermenîyan xwe di ve mistewê de jî bi xêrxwazî û qencî nîşan dan: Vardan Pêtoyan, Rûbên Dîrampiyân û yên din. Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Wezîrê Hadîrî, Tîtal Mûzadov û Biroyê Mamo jî (Evên dawî jî bûn berpirsyarên xwendîngehan) ders didan.

Piştî bikaranîna elfeba latînî, dîw re jî dest bi weşandina pirtûkên bi kurdî hate kirin. Casimê Celîl bû berpirsyarê weşandina pirtûkên kurdî yên polîtîkî û edebî. Bingeha edebiyata kurdî li Ermenistanê hate danîn. Pirtûk û berhevokên şaîr û nivîskarên kurdan yên pêşî (Ereb Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Cerdoyê Gêncî û Etarê Şero) hatin weşandin. Hema bibêje ev kes



Nivîskarê kurd Wezîrê Nadîrî.

bûne damezrînerên edebiyata kurdî ya Sovyeta berê. Salên 1930î pir pirtûkên kurdî yên hêja hatin weşandin û di nava wan de berhevokeke “folklorî kurmançî” ya bi pir belegeyên sala 1936an, ya ku berhemên wê bi destê Heciyê Cindî û Emînê Evdal hatibûn civandin. Ferhengga kurdî - ermenî jî hate weşandin.

Karekî herî girîng û giran yê weşandina pirtûkên dersan bû. Bi qasî ku tê zanîn, hemû pirtûkên zanebûnê yên humanîteriyê û tebîyîyê bi kurdî hatin weşandin. Ji ber ku, ji destpêka salê 1930î hemû dibistanên gundên kurdan kirin dibistanên kurdî. Pirtûkên dersan yên zimên û edebiyatê Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl amade dikirin. Lê, pirtûkên zanebûnê bizişkî, fîzîk, matematîk,

kîmya, botanîk û yên din Rûbên Dîzampîyan û yên din jî ji zimanê rûsî û ermenî werdigerandin ser zimanê kurdî. Pişt re kurdzanê bi nav û deng Qanatê Kurdo jî dest bi amadekirina pirtûkên dersan yên rêzimanê zimanê kurdî kir. Di salên 1960î de Profesor Ordîxanê Celîl, lê wisa şaîr û nivîskarên kurd yê bi navê Mîroyê Esed û Qaçaxê Mirad jî dest bi amadekirina pirtûkên dersan kirin.

Bidestxistina herî mezin ya vê şoreşa çandî ew bû ku xwendin û nivîsandina bi kurdî derveyî dibistanan jî di nava hemû rûniştvanên kurdan de bû weke kevneşopiyekê (edet). Kurdên ku salên 1930î xwendingeha pedagojîyê û di dibistanên kurdî de hatibûn perwerde kirin û di van demên dawî de pîr û kal bûbûn, dîsa bi hezkirin pirtûkên kurdî dixwendin. Lê peydebûna xwendevanan bidestxistineke mezin e. Tê bîra min, salên 1930 û 1940î pir kurd bavê min, xuşk û birên min yên mezin jî, ji hev re name bi kurdî dinivîsandin. Lê niha heyf e ku kevneşopiya xwendina pirtûkên kurdî û nivîsandina namên bi kurdî weke berê nemaye, lê li pir cihan jî ji holê rabûye.

Bidestxistineke salên 1930î jî vekirina şanoya kurdî ya dewletê bû li gundekî kurdan yê mezin yê Elegezê (berê navê wî Camûşraana mezin bû). Çend kes bûn berpirsyarê vê şanoyê. Lê Cerdoyê Gêncî zeman û karê xwe yê herî dirêj di kar û barê wê de dikir. Hunermendên vê şanoyê bi piranî kurd bûn. Li ser dîka/sehna wê pi-



yesên dramaten kurd û ermenî nîşan didan û di nava wan de piyesên ku li gora afirandinên folklorê kurdî berhemkirî yên mîna "Mem û Zîn", "Ker û kulikê", "Silêmanê Silivî" dihatin pêşkêş kirin. Ev şano mirov dikare jê re bibêje: Şanoya gerok. Ew diçû hemû gundên Ermenistanê yên kurdan, lê wisa jî li nava kurdên Gurcistanê jî digeriya. Vê şanoyê li seranserê komarê nav û deng dabû.

Hunermendiya kurdî di salên 1920 û 1930an de pêş ve çûbû. Hê di nivê salên 1920an de rejîsorê ermenî yê bi nav û deng Hamo Bêk Nazariyan filmekî sînemê yê bi navê "Zerê" di derbarê jiyana kurdan de pêk anî. Ew filmê sînemê bêdeng bû, lê di salê 1970 de ew bi deng kirin. Filmekî sînemê yekî din jî yê bi navê "Kurd-Êzîdî" di wan salan de di derbarê jiyana kurdên Ermenistanê de hate kişandin. Ew film dokumenter bû. Di filmê "Zerê" de jî pir perçên dokumenter yên ji jiyana kurdan yên wî çaxî li gundan û nexasim ya li zozanan hene. Nirxa van filmên sînemê ya mezin ya etnografi ye. Em di wan de zelal dibînin bê ka bav û kalên me 70-80 sal berê çawa dijiyan.

Ji bilî civandina berhemên folklorê kurdî yên nivîskî di salên 1930î de stran û awazên (meqam) kurdî bi nota hatin civandin. Ji ber ku di wê demê de muzîkzanên kurdan tune bû. Ev kar muzîkzan û kompozîtoren ermenî pêk anîn, yên weke Samson Gaspariyan, Spîdon Mêlîkiyan, Karo Zakariyan, Aram Koçeriyan û Kirîstafor Kuşnariyan. Wan bi sedan stranên kurdî ji gund û zomên kurdan civandin. Pir stranên kurdan bi notan hatin weşandin.

Di salên 1930î de, li Ermenistanê çend komên kurdan yên stran - dîlanê hatin saz kirin. Ew tev li mêhrîcanên komarê bûn û layiqî nîrxekî bilind bûn.

Di salên 1920 û 1930î de gelek konferansên kurdan li Ermenistanê hatin pêk anîn û piraniya wan di derbarê pêşvebirina edebiyat û çanda kurdî, gihandina kadroyên kurdan yên ronakbîr û nexasim afirandina zimanê kurdî yê standart yê lîtereturê de bûn. Em her bi tenê kongra kurdzaniyê ya Yekîtiya Sovyetê ya berê bi bîr bînin ku havîna sala 1934an li paytexta Ermenistanê, Êrîvanê hate lidarxistin.

Di derbarê pîrşgîrêkên kurdzaniyê de yên ji hev cuda û nexasim hûnandina zimanê literatûrê û zimanzaniya kurdî de Heciyê Cindî, Erebe şemo, Emînê Evdal, Qanatê Kurdo, Sêrak, Xaçatiriyan û Pêtroyan bi gavên balkêş pêş de hatin.

Di nivê salên 1930î de, di nava Yekîtiya Nivîskarên Ermenistanê de seksiyona nivîskarên kurdan hate damezrandin. Heciyê Cindî di nav delegasyona nivîskarên ermenî de li Moskowayê beşdarî kongra nivîskarên Yekîtiya Sovyetê ya yekemîn bû. Ev nîşan û bidestxistineke pir mezin û qenc bû. Bi vî awayî, bi saya xêrxwazî û alîkariya hukumeta Ermenistanê û nexasim bi alîkariya ronakbîrên ermenî şoreşa çandî di nava kurdên wê komarê de hate pêk anîn û di nav temamiya Yekîtiya

Sovyetê de Ermenistan bû navenda edebiyat û çanda kurdî ya herî mezin. Lê pêşî-ya pêşî jî navendeke kurdzanînê li wî welatî.

Li paytexta Gurcistanê dersdana zimanê kurdî dom dikir, lê di nava kurdên ve komarê de yên li ser sînorê Tirkiyeyê bi qasî ku tê zanîn tu karekî çandî û xwendina bi kurdî nedihat pêkanîn. Her bi tenê carekê Ehmedê Mirazî wek em di bîranî-nên wî de dixwînin, diçe nav kurdên navça Axalsîxê ji bo pêkanîna kar û barê ronakbîrî û çandiyê. Ji nav van kurdan tu ronakbîrekî naskirî derneket.

Di salên 1930î de kar û barekî xwendina gelêrî û çandî li Kurdîstana Sor ya Azerbeycanê hate pêk anîn. Li wir, weke ku tê zanîn, di sala 1923an de navçeke kurdan bi curê otonomiya çandî hate saz kirin. Dor û berê bajarê Şuşiyê kirin navenda wê û li wir rojname ji bo kurdan hatine derxistin, lê ne bi zimanê kurdî hatine weşandin. Ew rojname ya bi navê “Kurdîstana Sovyetî” hetanî salên 1960î jî weşandina xwe dom kir, lê Kurdîstana Sor ji zû ve, ji sala 1931ê ve hatibû tune kirin. Ew bi destê hukumeta Azerbeycanê ya nîjadperest û bi navdêdana Tirkiyeyê hate hilweşandin. Navê Kurdistanê bi Tirkiyê xweş nedihat, ji ber ku wê li ba xwe ew nav qedexê kiribû û dûrî sînorê Tirkiyeyê jî nedihîşt, ku bi wî navî tiştêk bê saz kirin: Ji çavêdana kurdên xwe ditirsiya. Tirs û xofa hukumeta Tirkiyeyê di derbarê kurd û serbestiya wan de gelekî hasas bû, ku konsolosê wê yê li Êrîvanê ji serî heta bîna Rîya Teze dixwend, sansor lê dikir, ku di derbarê pirsgerêka kurdî û bi giştî kurd û Kurdistanê de tu tişt neyê nivîsandin. Ji bo xatirê “dostaniya” hukumeta Sovyetê izna beşdarbûna Tirkiyeyê ya di nava kar û barê wê de dihate dan. Hukumeta Tirkiyeyê dida bawer kirin, ku ew jî weke hukumeta Sovyetê li dijî dewletên rojava yên împeryalîst e û dosta Sovyetê ya herî dilsoz e û tu dema nahêle, ku bi destên kurdên Tirkiyeyê împeryalîstên Îngilîstanê zîyanê bigihînin Yekîtiya Sovyetê. Tirkiye û Sovyetê bi bédengî yekîtiyê saz kiribû, ne ku bi tenê li dijî kurdên Kurdistanê, lê wisa jî li dijî kurdên Sovyetê. Ne badilhawa ye, ku dîrokzaniya Sovyetê hemû serhildanên kurdan yên sedsala 20an weke serhildanên paşverû yên ku bi destê împeryalîstan dihatin tevdan, dinirxand. Dewleta Sovyeta berê ji bo vê yekê jî bi firokên xwe û tîpên leşkerê xwe pişt re li wan kurdan xist yên ku serhildana Araratê pêk anîn. Ev dijîminatîya li himberî kurdan li pêşberî kurdên nava Sovyetê jî dihate ajotin. Emê bi çend rîstan şûnde di derbarê vê yekê de gilî bikin.

Me got, ku di salên 1930î de navça kurdan ya cuda hate pêk anîn. Bi lez û bez navenda wê guhestin bajarekî biçûk yê Laçînê. Li navça kurdan dest bi perwerdekirina zarokan kirin bi zimanê zikmakî. Li paytexta Azerbeycanê, li Bakuyê çend pirtûkên dersan yên zimanê kurdî hatin weşandin. Li Şuşiyê xwendîngeha perwerdekirina dersdarên kurd hatibû vekirin. Lê, ev hemû mecal û îmkanên nîvçe dihatin



Dersdar û şagirtên dibistana kurdî ya pedagojiyê, li Êrivanê, dawiya salên 1950. Di nava dersdaran de Heciyê Cindî, Eminê Evdal û Eliyê Evdilrehman jî hene.

pêk anîn, ji ber ku xwestina hukumeta Azerbeycanê jî ewqas nebû ji bo perwerdekirina zarokên kurdan bi zimanê wan yê zikmakî. Tu ronakbîrên kurd yên ku hindikî be jî bi nav û deng be, li vir negihan. Sebebê vê yekê ew bû, ku êdî di salên 1930î de piraniya kurdên Kurdistana Sor hatibûn asîmîlekirin. Ev asîmîlasyon weke tiştê ecêb û sêr tê ber çavan, ji ber ku piraniya rûniştvanên Kurdistana Sor kurd bûn û bi hev re dijiyan. Hejmara wan jî, ji ya kurdên Ermenistanê zêdetir bû, lê li vê komara dawî hetanî van salên dawî jî kurd asîmîle nebûn. Sebebê herî pêşî ew bû, ku li Azerbeycanê asîmîlekirina kurdan bi darê zorê dihate pêk anîn. Ya dudan jî, kurd weke azeriyan misilman bûn û di navbera wan û azeriyan de tevlihevbûn û zewac pir dihate holê, kurd û azerî dibûn xal û xwarzê, dibûn neferê malbatekê. Dewlet jî ya azeriya bû û kurdên li vir, ku ji kurdên Ermenistanê pir paşdemayîntir bûn, zû dihatin winda kirin. Lê kurdên Ermenistanê bi piranî yên êzîdî bûn û zewaca di navbera wan û ermeniyan de û wan û hemû gelên din de, di eynî demê de zewaca wan bi kurdên misilman re jî qedexe bû. Kurdên êzîdî her bi tenê ji hev dizewicin û gava yek ji wan jî bi mêrên biyanî re dizewicî ew sosretî, bêrûmetî, bi ser de jî bênamûsîka mezin dihate hesabandin. Yê ku bi jineke ermenî re

bizewiciya, jê re digotin: “Filankes bûye ermenî”. Çavê hukümet û gelê ermenî jî weke yê hukümet û gelê azerî ne li asîmîlekirina kurdan bû. Zewaca bi kurdan re ne bi dilê wan bû jî. Û ya dawî: Çarenûsa kurdan û ermeniyan, nexasim ya kurdên êzîdî ya dîrokî bawer bike, hema bibêje wek hev, yek bû. Herdu gel jî weke hev ji aliyê dagirkerên biyanî ve hatine perçiqandin. Û dijminê wan, xenîmê wan jî yek bû. Loma jî ermeniyan nexasim ronakbîrên wan yên pêşverû ermenî û kurd yek dihesibandin û her curê alîkarî didan ku kurd çand û edebiyata wan pêşve bibin.

Haya me kê m ji dîrok û rewşa kurdên li Turkmenistanê heye, ji ber ku di derbarê wan de kê m hatiye nivîsandin û çûn-hatin, serlêdan di navbere me û wan de tune bûye. Kurdên Xoresana Turmenistanê, başûrê paytexta wî welatî Aşxebadê dimînin. Piraniya wan asîmîle bûne, lê ne bi destê zorê. Hetanî van dawîyan jî gundên kurdan wisa li wê komarê jî hene, ku ziman, kevneşopî û rizma xwe ya neteweyî winda nekirine. Dibe ku em di rojên pêş de delîlan di derbarê dîrok û jiyana kurdên Xoresana Turkmenistanê de peyde bikin û ez di pirtûka xwe de li ser wan rawestim. Tiştê ku ji me ve diyar e, ew e, ku şoreşa çandê ya ku li temamê Sovyetê û di nava kurdên wê de hate pê, li vir hindik be jî hate xuya kirin. Di salên 1930î de pirtûkên ziman û edebiyata kurdî yên dersan li Aşxebadê jî hatin weşandin, lê di pişt re ev kar bi rêk û pêk nehate domandin.

Mixabin, ev xweşbextewariya kurdên Sovyeta berê ya şoreşa çandê di nava kurdan de pir dirêj dom nekir. Bela vê yekê jî, ev çarenûsa me kurdan li eniya kurdan ya zikmakî hatiye nivîsandin.

### **Kurdan dixin rêza gelên bêîtîbar. Di sala 1937an de zor û zilma hukumeta Stalîn ya li ser kurdan**

Sala 1937an hukumeta Stalîn li çend gelên Sovyeta berê hate xezebê û sed heyf e ku kurd jî di nav wan de bûn. Me di derbarê sebebên vê bêîtîbariya hukumeta Sovyetê de, nexasim ya ji bo kurdên derveyî welêt de bi kurtî anîbû zimên. Lê, heger hukumeta Sovyetê ji zû ve eşkere xwe wek dostê Tirkîyê nîşan dida jî, lê bi rastî îtîbara wê tu carî li vî welatî nedihat. Bêguman, Tirkîye jî di derbarê Sovyeta berê de her wisa bû, ango îtîbara wê jî pê nedihat. Ji bo sûda (menfeata) xwe herduwan jî, qaşo hevdû weke dost dihesibandin! Lê, di rastiye de ne tirkan dîrok ji bîr kiribû û ne jî rûsan: Şerê dîrokî yê di nav wan de û doza axê, sînoran, hê nehatibû çareserkin. Hukumeta Sovyeta berê kurdên welatê xwe nexasim yê misilman weke dostên tirkan yên potansiyal dihesibandin. Hukumeta Sovyeta berê li ser vê ramanê bû, ku ji bo yekbûna olê ya di nava kurdan û tirkan de, her kurdek dikare bibe ajanê tirkan. Lê ev guman bi tenê li ser kurdan nebû. Hukumetê wek gelên “bêîtîbar”

çeçen, tirkên misxetê, teterên Qirimê û hinekên din jî dihesibandin. Û ji bo vê yekê jî, hukumeta Sovyetê biryar da, ku van gelan ji sînorê Tirkiyeyê dûr bixe, sergomî navçên ji vî sînorê dûr bike û bêguman kir. Otomobîlên baran, yên servekirî yên Wezareta Hiduro (pişt re KGB) li ber deriyên kurdan radiwestiyan, ji wan re digotin, ku wê wan ciguhestî deverên din bikin û ji bo amadekirinê saetek an jî du saet didan wan. Şîn û rêşî diket nava jin û zarokan, ji ber ku wan zanîbû, ku wan dibin sergomê, sergomeke bêînsaf û bi zilm. Bi vî awayî, bi hezaran kurd ji Azerbeycanê, nexasim komara wê ya Nexçivanê, ji navçên Ermenistanê û Gurcistanê yên ku nêzîkî sînorên Tirkiyeyê bûn, dibirin sergomê. Rebenên kurdan pişt re weke heywanan dikirin vagonên tirênê yên baran û berê wan didan Komarên Asya Navîn û Qazekîstanê. Di rê de pir merov ji ber pîrçîbûn, tîbûn, ji sir û sermayê û nexweşiyê dimirin. Leşkeran bi rê de laşên wan tavêtin çolan. Li Komarên Qirgizistan û Qazekîstanê malên kurdan ji hev dûr dixistin û her gundekî, carna her di navçekê de du-sê mal bi cî dikirin. Mafê kurdan yê iznê ku ji navça xwe derkevin, tunebû. Ev trajêdiya kurdan tu deman nayê jibîrkirin û ev zor û zilma li ser wan bi tu awayî nayê lêbihurîn.

Piştî vê sergomê demografiya şîniyên kurd yên li Sovyeta berê ser û binî hev bû. Cara pêşî di serpêhatina dîrokê de kurd wisa bûn rûniştvanên Qirgizistan, Qazekîstan û hinek jî bûn yên Ûzbekîstanê.

Lê, xwezî bi vê yekê tenê zilma li ser kurdan bimana. Zilma din ya giran qedexekirina zimanê kurdi ya di kar û barê lîtereturî de bû. Hat gotin ku ev ziman tune. Loma jî birêvebirina rojname û pirtûkên kurdi hate rawestandî. Dersdana ziman û edebiyata kurdi jî hate qedexekirin. Derbeke mezin li çanda kurdi hate xistin.

Le, bi vê yekê jî zilma Stalîn xilas nebû. Di eynî salê, sala 1937an de çend ronakbîrên kurd hatin girtin, avêtin zîndanê û sergom kirin. Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ehmedê Miraz li Êrivanê avêtin zîndanê, lê Erebe Şemo li Petersburgê girtin û sergomî Sibîryayê kirin. Li van ronakbîran di zîndanê de pir îşkence hate kirin, ji bo ku ew li xwe mikur bînin, ku girêdanên wan bi rêxistina kurdan ya derveyî welêt, Xoybûn û berpirsyarê wê re hene. Ev pîrsgirêka pîrsgirêkeke dûr û dirêj e, hewcedarî bi gotareke cuda û lêkolîneke bi serê xwe heye. Lê, emê li vir bi kurtî di derbarê wan pîrsgirêkan de binivîstînin. Sebebê acizbûna hukumeta Sovyetê ji Xoybûna kurdan, ku pir dûrî sînorên Sovyeta berê di sala 1927an li Lubnanê hate damezrandin, bi xwe bû. Ya yekê ew bû, ku hukumeta Tirkiyeyê digot, ku Xoybûn bi destên dewletên rojavayî yên Împeryalîst hatiye damezrandin, ku serhildaneke kurdan li dijî Tirkiyeyê û Sovyeta berê li dar bixe. Ya duyemîn û ya rastî ew e, ku civînên vê rêxistina kurdan yên herî pêşî di mala yekî ermenî de yê ku bi malbata



Mêrxasê Yekîtiya Sovyetê Semend Siyabandov


Papariyan dihat nas kirin, dihatin pêk anîn. Papariyan berpirsyarê partiyeke ermeniyan ya netewî ya bi navê Daşnaka bû. Lê Sovyet jî ji Daşnaka pir aciz bû. Diyar e ku hetanî sala 1920an jî hukumeta Komara Ermenistanê ya serbixwe bi piranî endamên wê ji endamên partiya Daşnaka hatibûn organîzekirin. Gava artêşa Bolşevîkan ya sor ji Azerbeycanê 1920an kete Ermenistanê û ew jî kir komareke Sovyetê, Daşnak jî reviyay welatên Rojhilata Nêzîk, Ewrûpa û Emerîkayê.

Ew pişt re li welatên derveyî Sovyeta berê propaganda dijî Yekîtiya Sovyetê weke dewletek komunîst dikirin û mafê wan jî ji bo vê yekê hebû. Ji ber ku komunîstan ew ji welatên wan qewirandibûn.

Daşnakan ji sala 1897an vir de mafê gelê ermenî diparastin û serkêşî li têkoşîna ermeniyan ya çekdarî dikirin. Ji bo vê yekê jî, hukumeta Sovyetê ji Daşnakan aciz bû û bi çavê dijminayetiye li peywendiyên Daşnakan û Xoybûnê dinerî. Gunehê ronakbîrên kurd yê Ermenistanê jî li gora hukumeta Sovyetê ew bû, ku wan rojname Riya Teze û çend pirtûkên kurdî ji ronakbîrên kurdan re yê li Sûriyê re şandibûn, yê ku bingehê Xoybûnê danîbûn. Piştî salekê ev ronakbîr aza kirin, lê Erebe Şemo li sergomê ma hetanî mirina Stalîn.

Piştî sala 1937an di zemanekî kin de ev qedexa li ser ziman û çanda kurdî ma. Di cenga cîhanê ya duyemîn de, ku ji bo Yekîtiya Sovyetê cenga niştimanperweriyê, xweparastinê dihate destnîşankirin, kurdên Sovyeta berê jî pir perîşan bûn. Dewletê bi hezaran kurd ji Ermenistan, Gurcistan, Azerbeycan û Turkmenistanê şandin eniyên cenga neteweyî û ji wan pir kesan giyana xwe, jiyana xwe dan, ji bo parstina Welatê Sovyetê li dijî dagirkerên Hîtler. Pir kurdan di vî şerî de wek bav û kalên xwe mêrxasî, qahramantî kirin, hin bûn efser û pêsîr û singên gelek jî bi medalîyên dewletê ve hatin xemilandin. Semend Siyabandov navê mêrxasiya Yekîtiya Sovyetê ya herî bilind û bi rûmet qezenc kir û Madalya stêrka zêrîn bi singa wî lawê kurd ve hate dalaqandin.

Hema di vî şerî de bi bédengî, lê bi çapeke ne mezin dîsa dest bi pêşvebirina ede-



Romannivîs û entelektuelê kurd Erebaş Şemo di sala 1937an de, ji aliyê desthilatdariya Stalîn ve li Petersburgê hate girtin û sirgûnî Sibiryayê bû.

biyar û çanda kurdî hate kirin. Lê ev pêşveçûn li ser bingehekî nû hate pê, ya ku kêmkî qenc bû. Ya xerab ew bû, ku di şûna elfeba kurdî ya latînî de tîpên elfeba rûsî ya kîrîlîkî danîn û bi alîkariya vê yekê girêdanên edebiyat û çandê di navbera kurdên Sovyeta berê û yên ji derveyî wê bi çapeke mezin kêmkî bûn. Ji ber ku, ji derveyî Sovyetê kurdan lîteretura bi tîpên kîrîlîkî zehv bi zehmetî dixwendin, an jî qet nedixwendin.

Dîroka pêkanîna elfeba kurdî ya bi tîpên kîrîlîkî jî ev e: Di sala 1944an de bi destê hukumera Ermenistanê komîta elfeba kurdî bi amadebûna cîgirê wezîrê Ermenistanê yê ronkayê Aram Xaxaxêsiyan hate pêk anîn. Endamên wê komîtê, zana û nivîskarên kurd: Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî û Nadoyê Xudo bûn, yên ermenî jî: G. Xapansiyan, H. Açarîyan, A. Zavariyan bûn. Lê amadekarê elfebayê Heciyê Cindî bû. Ji wê şûn de her bi tenê çend pirtûkên kurdî heranî sala 1955an hatin weşandin, yên zanistî yê H. Cindî bûn. Di eynî demê de antolojîyeke berhemên nivîskarên kurdan hate weşandin. Ji ber ku qedexa ser ziman û çanda kurdî hê bi temamî û bi fermî nehatibû rakirin.

*Dûmahik di hejmeta bê de*

# ”Yêrêvan xeber dide guhdarêd ezîz”

**ROJEN BARNAS**

**W**elgira radyoyê gelek bi derengî, piştî salên 1961-62 yan kete mala me. Li Farqîna me di sala 1952 an de radyo ketin nav malê kubar û efendiye tirkî-axêf. Taqeta me hebû, lê mala me ne tirkîaxêf bû, ji ber wê em demek bê wê man.

Herçend hingê radyoyên bi anot û katot peyda dibûn jî yên li bajêr bi elektrîkê dixebitîn. Li Farqîna me elektrîk nîvrokî bi qasî saetek an saet û nivekê û êvarê jî bi banga şîvê (azana mexribê) re heta serê sibê dihate berdan. Yên ku radyoyên wan hebûn di navbera wan deman de dikarîn guhdarî bikin.

Mala Zekerîya onbaşî li hafa dikana bavê min bû. Ku hema elektrîk dihate berdan Edîbeya qîza wî dê radyoyê vekira, bi xêra wê dikandariyên nêzîk ewê bernamêyên ”yurttan sesler” guhdarî bikirana.

Hingê du îstasyonên Tirkiyê yên guhdarîkirinê hebûn: Ya Stembolê li ser pêla drêj bû ku bi rojê nedikişand û ya Anqerê li ser a navîn bû, ew çêtir dihate bihîstin.

Lê sêlikên (plak) kurmancî di 1952-53an de hatin Farqînê. Li qehwexaneyê çarşîya jêrîn ku Çawîşoyê marmij marqeciye wê bû gramofoneke mekanîk hebû, pê sêlik lêdixistin û dengê wê bi hoparlorê didan aliyê meydana biniya hewzê. Ji yên populer ên tirkî pê ve hingê sêlikên Kawis axa û Meryem Xan hebûn ku rojê çend car dihatin lêxistin.

Bi wergerandina leşkerî ya Iraqê ya Ebdulkerîm Qasim di 1958 an de ji nişkave radyoya Bexdayê ket piyasê û dest bi weşana kumancî kir. Belkî berê jî hebû lê Far-



qîna me hê wê gavê bi kurdiya wê hisiya. Radyoya dikana Muhyedînê berber çî bigire timî li ser wê îstasyonê bû û jê stranên mîna "Here Leylê", "Hatim, hatim bi serbestî hatim", "Her bijî kurd û ereb" dihatin belavkirin. Dengê radyoyê mîna kişandina nixafê ji berê xwe ve pêlek bilind û pêlek nizim dibû.

Piştî ku radyo ket mala me - ciyê wê jî di oda lêrazana min de bû - ji meraq û betaliyê min îstasyonan serûbinê hev dikirin da rastî tişteki xweştir bêm. Rastî li radyoya Qahîrê,

'Emanê (Urdin), Şamê yên beşa kurmançî hatim. Ji ya Bexdayê û van hersiyên dinê pêve radyoyên Kermanşa û Qesrîştîrîn jî hebûn ku beşa kurmançiya wan gelek qels bû yan li ser "şoreşa spî" ya 'Ele-hezret Şahînşahê Aryamêhr bû yan jî klamên Behadînê Dostikî û Mecîdê Herkî bûn ku herdû jî li aliyê me ne ew çend jêhezkiir bûn. Mele Evdirehmanê radyocî digot Şah ji şeytanî wan herduyan aniye daniye ser radyoyê da ku alem ji klamên kurmançî nefret bikin.

Û mala wê ava radyoya Yêrêvanê (Erîvan/Rewan) dengê xwe bilintir kir û bi ser me xist: **"Yêrêvan xeber dide guhdarêd `ezîz`".**

Min ji hemû stranên kurmançî çî yên gelêrî çî yên klasîk an dînî ji berê de hez dikir û hê jî hez dikim: Lê bi şertê yê / ya ku distrê dengxweş be, yekoyeko ji hev



Aznifa Reşid yek ji bêjerên radyoya Erîvanê bû.

veqetandî û zelal bêje, li meqam û bi hisîyateke gurr bistrê, neke vinevin û xulexul. Çi klam, çi dîlok, çi qewl û qesîde bin, ku di gotinê de ji hev neyên veqetandin, di dev de bêne gemirandin, mirmirandin û fetisandin tu tama jêfamkirinê namîne. Vêca ku meqam jî kulek û dûzaheng (monoton) be, lê guhdarîkirin dibe mîna "ezabê qebrê". Lê timî jî stranbêj, dengbêj, derwêş an melayên dengxweş û şarezaya peyda nabin. Yêrêvan vê peydanebûnê rakir, bi pispor û şarezayên serşe yên xwe rojê carek du car vê fersendê gihande jêhezkiriyan.

Bi saya radyoya Yêrêvanê di piştî 1964-65 an de gelek xortên aliyê me mîna "ferzul `eyn" a li ser sofiyekî hişk ê bisilman, di wextê de dest bi vekirin û guhdarîkirina bernameya stranên kurmançî ya Yêrêvanê dikirin: Ew qismek ji gencîne (xezîne) me ya ku buhistek di binê toza jibîrkirinê de mabû, mîna Kerro û Kulik, Flîtê Quto, `Emê Gozê, Lawikê Metînî, Mîho, Ahmedo Ronî, Hekîmo, Xelîlê Xazî, Kalo Siba Te Bi Xêr `Eyda Te Bimbarek û bi sedan yên wekî dinê bi awakî dîlkêş li me dizivirîn. Mîna birûska evînê li dilê me dihingaft û di tê bişkoja kurdperweriyê dida bişkaftin. Heta hezkirina ji stranên kurmançî ewçend kûr û pêşve çû ku me li hevdu wesiyet dikir, digot: "Binêrin ku ez bimirim, wesiyeta min li we hunê li ser gora min dêlva telqîn û yasîne "Lawikê Metînî" û "Bêrivanê" bistrên.

Bi saya teknîka transîstorê radyo bêtir edîlîn û Yêrêvan li şaristan û yabanê bêtir hate guhdarî kirin. Pê re jî ji folklorê devkî ya kurmançî hezkirin û li çandeya xwe ya kurdî xwedî derketin zêdetir, ferehtir û kûrtir bû. Strana Flîtê Quto yê me yî rêbirê karwanê Mamê `Ermankî ku bajariyê me yên heta hingê pênc pere tê nedidan, niha li ba wan ên kurdxîret ji stranên hêja yên Zeki Müren û Munir Nurettin Selçuk jî bi qedirtir dihatin girtin. Bi rastî jî gava ku Gerabetê Xaço distra ji meriwetirê ku wayê dêwekî çîrokî pala xwe daye çiyayê Meretoyê û bi ser Kevanê Qîrê, Deşta Bişîriyê de ber bi Elmedîna ve xwe xwar kiriye û distrê.

### **Yêrêvan xeber dide guhdarêd `ezîz...**

Bi rastî jî Yêrêvan xeber dida.

Yêrêvan bi ya min bi tenê ne istasyona radyoyê, lê pê re jî konservatuwara muzîka kurmançî bû.

Yêrêvan klamên me yên kurmançî bê guhartin, bê lê kêma û zêde kirin berhev dikir, bê ku bi qasî mîlîmekê gotin an meqamê wê biguhêrê; bi sazê (enstruman) an çendên munasib, lê, bi hostayî muzîka berpâlê ji wê kulamê re çê dikir û diweşand. Muzîka enstrumanî di dezgehê radyoya Yêrêvanê de ji meqamê devkî re wek palgeheke hevrîşim e ku di serî û di navberan de meqamê devkî û dengbêj wek bal-

gîhekê pala xwe didinê. Muzîka enstrumanî (ya sazê) ya Yêrêvanê, muzîka (meqamê) bingehîn a stranê bi qasî mûyekî jî riya şaş nake û jê averê nabe, pê re tam mîna çerm û laş lihevkiyê ye. Bi vê lihevîyê muzîka enstrumanî ya kurmancî derdikeve meydanê ku ev awa jî dibe belgeya nasandin û tescîla biserêxwebûna muzîka kurmancî. Bi vê belgeyê merivekî muzîknas -çi kumanc çi bîgane- dikare muzîka kurmancî ji ya azerî, ermenî, erebî, farisî, hindî, yewnanî, makedonî, ûrisî, tirkî û herwekî dinê veqetîne û bibêje a ev muzîk ne ji wan muzîkan tu yek e jî; ev muzîkek bi serê xwe ye û ya kurmancî ye.

Yêrêvan konservatuwara muzîka kurmancî ye: Hem bi maneya xwendegê û hem bi maneya parastin û hilanînê (konserve / muhafeze kirin) konservatuwara muzîka kurmancî ye. Hem muzîka kurmancî ya devkî berhev kiriye û parastiyê û hem jî ji bona kesên ku bixwazin muzîka xweber (authentique) a kurmancî hîn bibin, bûye perwerdegeha (medrese) muzîkê ji bona wan kesên ku bi rastî bixwazin muzîka kurmancî ya gelêrî û bingehîn binasin û hîn bibin.

Sêlikên (plak) Kawis Axa û Meryem Xan hê di salên 1952-53an de hebûn, kasetên wan ên ji ber wan sêlikan hê jî hene. Ku meriv guhê xwe dide stranên wan, çêtir dibîne ku muzîka enstrumanî ya bi stranên wan re bi ya Yêrêvanê re qet nayê muqayese kirin. Muzîka enstrumanî ya di sêlikên wan de wek pîneyên yaxurî (êyretî) dimîne, muzîka wan a enstrumanî tew qet li muzîka xwezayî ya stranên wan herdû hostayan nanihêre. Di muzîka enstrumanî ya di sêlikên Mahmûd Qizil û Eyşe Şan de jî rewş bi wî awayî ye, mîna zirna Inisê mirtib li ber yasîna hafiz Fethulah be an li ber govendê li neyê xin. Di vê de bêguman tu qisûra Kawis Axa, Meryem Xan, Mahmûd Qizil an Eyşe Şan tune. Ew ne sazband in, lê hunermendê deng û meqamên xwe ne û ji aliyê xwe ve di dema xwe de bêhempa bûn. Lê gava ku meriv wê muzîka enstrumanî ya di stranên wan de guhdarî dike meriv nikare bêje a ev muzîka ha ya kurmancî ye. Yanî ew nîşana cudatî an taybetî (alamet-î farîqe) bûyîna muzîka kurmanciyê dîtî û bihîstin di sêlikên wan de ne mumkin e.

Felsefe an jêfamiya muzîkê ya gelêrî gelek muhîm e. Di muzîka gelêrî ya kurmancî de bi hîs û pejnên xwe naveroka stranê û ya ahenga meqam bi temamî lihevkiyê ye: Ku naveroka stranê bi xem û derd be meqam jî li wê gorê xemgîn, derdnak û giran e. Ku naverok bi şadî û xweşî be, meqam jî li wê gorê sivik, bestvekiyê û kêfjen e. Bi muzîkên derûciranên din nizamî lê di tirkî de ev timî ne wisa ye. Mêrik dibêje "Dediler yarin hasta / Yetiştim son nefeste (Gotin yara te nexweş e / Di nefesa wê ya dawîn de gihîştîm serê)" li dêlva ku li berê rûnê li xwe xe û xweliyê bi serê xwe dake, lê bi meqamekî wisa distrê ku meriv jî û ew jî li berê "şi-

qir-şiqir-şiqirdam” bi ”çifte-telli” direqise. An naveroka stranê nêtar (neutre) an a şadiyê ye lê meqam wisa xemgîn e ku li berê giriyê meriv tê: ”Bahçada yeşil hiyar / Boyun boyuma uyar / Ben seni gizli sevdim / Bilmedim alem duyar” (Li baxça xiyarê teze / Bejna min û te li hevdu dikin / Min ji te bi dizî hezkir/ Min nezanî ku ewê herkes pê bihise). Bi meqamek wisa tê stran ku li berê hem giriyê meriv tê û hem ceqera meriv pê reş dibe.

Strana ”Ax Kurdistanim ka? / Bax û bostanim ka? / Dijmin tev girtin ax! / Ax Kurdistanim ka? / wek şîr gelek gelek xweş û manîdar e. Gava ku meriv wê bi şîrkî bixweyinê divê dil û hinavê guhdaran bişewitîne, bihelisîne, bihelîne. Lê li ber muzîka wê meriv tê `eşqê, govendekê ji dilûcan digire, herwekî ku meriv gihîştibe xweziya xwe: Ku ne ji naveroka gotinên stranê be ew (meqam) jî ji ser sed puwanî sed distîne. Lê ew naveroka şîrê ya xemgînî û malxopanî, û ev muzîka bi kêf û `eşq û hêçgiloriyê qet li hev nakin: Em hem dibêjin ”Ax Kurdistanim ka/ Dijmin tev girtin ha/ û li berê em ji kêfa ji `eşqa direqisin xwe hiltînin li erdê dixin, ji ya ”Dediler yarin hasta / Yetiştim son nefeste” yê bi sosretir jî. Ev neliheviya muzîk û naverokê di stranên gelêrî yên kurmançî de tune ye. Yêrêvan tucar vê stîla muzîka devkî di muzîka enstrumanî de neguhartiye û vê taybetiyê her wisa wek xwe paras-tiye.

Niha li strana ”Eman eman koçerê guhdarî dikim”. Cara pêşî min ew li Diyarbekirê di sala 1964? filan de guhdarî kir. Hingê Bekirê meyxanecî hebû ku meyxana wî li pişt Sur Palasê û li hafa Tüccarlar Kulübü/Dilan Sinemasê bû. Berê êvarên bihar û havînan ewê Bekir sêlik bida ser gramofonê û dengê wê bi hoparlora ser rê berda derva. Ê ev stran jî bi meyxwiran mey dida vexwarin. Çîma? Ev stran bi eslê xwe ya ber govendê ye, lê dengbêj wek filma girankişandî giran giran straye ku biye strana meyxanê, pê re muzîka wê ya enstrumanî jî ji muzîka bingehîn a stranê veqetiyaye û rengê muzîka stîla Celal Güzelses welgirtiye (mîna neliheviya naverok û muzîka Bahçada yeşil hiyar).

### **”Ez çî dibêjim û tembûra min çî lédixe...”**

Aslîka Qadir, dengbêja strana ”Welatê Me Kurdistan e” di programa Şaneşînê ya CTV de straneke gelêrî (folklorîk) a leyistika giraniyê (sêpê) distra, ku li berê hindik mabû ez rabim govendê; lê orkestra di fesla navbira bînedana dengbêj de li mûzîkek wisa xerîb xist ku tu têkiliya wê muzîkê bi meqamê strana Aslîkê re tunebû. Hem Aslîkê xwe şaş kir û hem besta min a rabûna giraniyê li wê derê bihêlin,

ya pê re niqirandinê nema. Çend roj di pey de dîsa di wê bernamê de û bi wê orkestrayê re ewê Şemdîn "Lawikê Metînî" bistra... Perdeyên wan ên deng çî bi hev re çî bi perdeya meqamê stranê re li hevdu nekir û ez çiqas ber "Lawikê Metînî" ketim.

Ez baş dizanim ku her endamekî wê orkestrayê pispor û şarezayê sazjeniya sazê di dest xwe ye, lê bi perwerdebûna zîhniyeta muzîk û orkestraya îranî / farisî gihîştine û pê rabûne. Lê uslûb û zîhniyeta muzîka kurmançî û ya îranî ji hevdu cihê ne.

Bê cudatî kirina navberê ez dixwazim ji hawramanî heta dumilî ji lorî hea soranî li hemî cur û şaxên muzîka kurdî guhdarî bikim. Ez dixwazim muzîka dumiliya (zazayî/kirmançî) dumilî guhdarî bikim û bêjim ev muzîka kurdî ye; ku ya Pîr Sultan Abdal an sazjeniya bektasiyê be, ezê wan bi tirkî ji orjînalê wan guhdarî bikim an jî qet nekim. Ez dixwazim muzîka kurmançî guhdarî bikim; ku ewê "bağlama" Îhsani û Mahzuni Şerif, Ruhi Su an Rahmi Saltuk weyaxut muzîka cumbuşa xeta Celal Güzelses be ezê li wan bi xwe guhdarî kim, çima li kopiya kopiyayên wan... Gava ku li stranên lorî û mukriyanî guhdarî dikim dixwazim ku hin reng, rûçik, nexş û gulên taybetî yên kurdî tê de bibînim, bibihîzim; ne ku xwe li şafirên Asya naverastê li çolên Moxolîstanê an li meydana reqasên Azeriyan tesewir bikim. An di yên soranî de ku rastî muzîka hindî-erebî-rojavayî tîm û ji bilî zmanê wî mûyekî ji nexşên kurdî tê nabînim, nikarim bêjim ku min li stranek kurdî guhdarî kir.

Di muzîka neteweyekî de yê girîng ne ew e ku stran bi wî zmanî an zaravayî tîye gotin, lê ew e ku meqamê wê stranê mîna destekî cil li ser canûcesedê rûhiyeta wî miletî bêqisûr rûdinê an na. Meriv dikare gotinên bi kurmançî ji meqamên bîgane tango, ye-ye, twist hetanî "yaylalar! yaylalar!"ê bi kurmançî bisêwirîne, lê ew nabin muzîka kurdî; ew dibin muzîka bîgane ya bi gotinên kurdî. Tu rabî temamê stranên Celal Güzelses, Fahri Kayahan, İzzet Altınmeşe, İbrahim Tatlıses û wekî dinê bînî bikî kurmançî, dikarî bikî lê ew nabin kurmançî. Ew dibin muzîka "tirkiya li Kurdistanê" bi gotinên kurmançî û heta ji te re lazim e "Gel gidağın paytahta" û "yaylalar yaylalar" wergerîne bike kurmançî, bistrê û li berê bi soranî "balince-balince" bireqise, dîsa jî ew nabe muzîka kurdî. Hetanî ku ustad rabe "Gel gidağın paytahta" wergerîne kurmançî bira di dewsê de biçê li çavkaniya vî meqamî bigere û ji nû ve derxe piyasê.

Li malê xwe xwedî derketin; ne texlitkirina texlîta texlîta malê xwe ye, lê bi lêgerîn û qefaltina malê xwe yê esasî ye ku ew jî di nav xelkê de hê heye û hê winda nebûye.

Şaşıyeke ku qet nayê efûkirin jî ev e ku hin sazband an dengbêjên me straneke gelek xweş radikin li gora xwe bi gotinên guhartî (mîlîtanî / şoreşgerî) distirên. Yêrêvan vê şaşıyê qet nekir.

Çi bi yên gelêrî, çi bi yên modernîzekirî (romanî), çi bi yên nû afirandî (Welatê Me Kurdistan e) Yêrêvanê ev daye me: Nîşana xweserî (orîjînalî) ya muzîka kurmancî: Muzîka kurmancî ya ku naveroka klam û ahenga meqam lihevkerî; ne ku naveroka gotinê xemgîn û meqam ê reqsê an berevajiyê wê meqam hezîn û gotinên wê yên şadiyê.

Yêrêvan bêl qelebalix û anarşiya sazên cihê; bi awakî sade, paqij, hunermendane û bi zanîn li ser berhemên meqamên devkî muzîka enstrumanî ya kurmancî sêwirand û wê wek nasnameya (huwiyet) muzîka kurmancî ya jixweber tescîl kir û raberî me û tarîxa muzîkê kir.

Bi hêvotkar, bi berhevker, bi piçûk û mezin bi dengbêj, sazband û muzikologên xwe pêkve radyoya Yêrêvanê ji muzîka enstrumanî ya kurmancî re xizmeteke bêqiyas kiriye û bi vê xizmetê di muzîka kurmancî de "Ekola (école) Yêrêvanê" afirandiyê.

Ku meriv ji Kermaşahê bi rê keve û here heta di Kapîkule (deriyê sînorê Tîrkiye-Bulgar) de derkeve ji aliyê cografyayê û ne jî ji aliyê fîzyonomiyê ve cudatiyeke mezin a di navbera me û farisan, me û erebên hawir me, me û tirkan de tune. Ku em (ereb, faris, kurd, tirk) nepeyivin kes nizane bê em ji çi miletî ne. Lê zmanê me û neynika rûhiyeta me ku muzîka me ya gelêrî wek du nasname bi mor û mezbete me ji yên dinê vediqetînin.


Helbet emê stranên nû bi gotinên hemdemî, bi sazên cuda û besteyên li gora ce-reyanên rojê biafirînin, lê îskelet divê kurdîbingeh be; gul, nexş û tama kurdî jê bifûre. Muzîka sazjeniyê ya dîlokane (stranên govendê) bi çi sazî bêne lîxistin dilê wî ye lê divê di aliyê sivikî û giraniyê, hunerê xwe nîşandanê de rîtmî pê avêtin û çok şikandinê de ji rîtmî leyistikê ya xwezayî averê nebe. Hingê leyistika bedew a gelêrî yan dibe mîna filmê girankişandî bi cangiranî tê leyistin an jî mîna filma sînemayê ya li ser Mustefa Kemal...

Ji Yêrêvanê hînê çêtir naskirina muzîka kurmancî bûm.

Hivdeh salên min derbas bûn ku ji welat, herwisa jî ji guhdarîkirina radyoya Yêrêvanê dûr im. Êdî dengê Aznîfa Reşîd, Sêvaza Evdo û Keremê Seyad nayê min, lê bi kira xwe hê jî Yêrêvan di mêjîyê min de olan dide û bi awakî dîtir xeber dide.

-Hişşşş! Niha Yêrêvan xeber dide. □

# Zivistana 98an li ser sînorê welêt li Ermenistanê



MEHMET AKTAŞ

Zivistana bû... Dinya sar bû... Dinya mij û dûman bû... Li serê Agirî ewrê reş rûniştibû... Çiyayê mezin di navbera kirasê xwe yê spî da winda bûbû... Li Deşta Oktebiryane, li ser sînorê welat, di jîpeke kevnare de me berê xwe dabû gundên kurdan... Gundê Eşîra Sîpka, Xelka, Brûkan yên li ser axa Ermenistanê, yên ku 30 sal berê li welatê Xerîbiyê hatibûn avakirin... Ew ji zilm û zora Roma Reş sirgûnê welatê xerîbiyê bûbûn. Dema Siltanê Osmanî, Siltanê sor Ehbülhemîdê II.yan, sala 1915an jî ermeniyên re fermana qetlîamê derxistibû, ew ferman jî bo kurdên êzîdî jî hatibû pêkanîn.

Çend sal berê me jî bo bernameyek televîzyonê, bi rojan guhên xwe dabû çîroka qetlîamê. Li Gurcistanê, li Tîblîsê taxa kurdan, Mihemedê Dewetlî yê 110 salî, qirkirina Êzîdiyan bi çavên xwe dîtibû. Kalemêrê rind çavên xwe girtibûn, mîna ku behsa îro bike, wî jî me re zilma Roma Reş li hemberî kameraya televîzyonê wiha anîbû zimên.

‘Jon Tirk û Hamîdî diketin gundan û agir berdidan malan, bi însan û heywanan ve dişewitandin. Jinan zarokên xwe hildabûn, reviyabûn çïyan, mêran jî di bin serokatiya Cangir Axa de şer dikirin. Heft qîz û bûkên Angosî yê n ku nexwastin bi-kevin destên dijmin xwe ji ser kendalan avêtin, kuştin. Mêrê eşîra me sê roj û sê şevan şer kiran, ji çemê Eres derbasî wî aliyê avê bûn.’

Niha armanca me; çêkirina bernameyek televizyonê ya nû li ser ‘rewşa kurdên Qefkasya’ bû...

Dema şeş sal berê, di sala 1992an de cara yekemîn ez hatibûm Qafkasya, di civa-ka kurdan de koçberiyê nû destpêkiribû. Piştî wê serlêdana min a yekemîn, da-wiya çûyî û hatina min ya Qafkasya ne hat. Di her serlêdana min a nû de, min didît ku hejmara kurdan li Gurcistan, Ermenistan û Azerbaycanê her diçe kêmtir dibe...

Sirgunê sedsalê, ji xerîbiyê car din derdiketin xerîbiyê... Reva kurdan ya ji Erme-nistanê, germ mina dawî di zivistana sala 1998an de jî hê berdewam dikir. Wextê destê sibehê em ji Rewanê (Êrîvan) derketin, şofirê me Êsif destpêkir li ser rewşa koçberiyê xeber da... Te yê bigota qey malnexerabê Êsif, bi salan bû bi hesreta xe-berdanê mabû. Niha jî bi pirsên min ve firsendeke zêrîn ketibû destî wî. Êsif, bê sekinandin, agahdariyên nû didan min û gilî û gazinên xwe ji min re digot.

‘Birê min, Sovyet bû milkê dîrokê, herkes bû xwedî dewlet, herkes bû xwedî erd, koçerî careke din para cimaeta me ket... Di gundên kurmancan de mêr nemane, birê min. Gişk reviyane, çûne Urîsetê... Herkesî xwe avêtiye perê welatekî... Eşîrên me, ji hevdû belav dibin birê min. Ew hêj berdewam bike, zarokên me yê n di nav Urîsan de bihêlin, birê min. Welat ji destê me çû, dîn û ziman jî yê ji dest me here birê min...’

Di riyên berf û herî de jîpa me hêdî hêdî diçû. Min ji aliyekî ve guhên xwe didan rêhevalê xwe Êsif, ji aliyê din ve jî ez li ser dîroka nenivîsî ya wan salên dawî, ya kurdên Qefkasyayê difikirîm.

## **Ji dîroka nenivîsandî ya kurdên Ermenistanê**

Piştî hilweşandina Sovyetê, li welatê xerîbiyê, koçberiya duyemîn tehdîda ‘asîmî-lasyonê’ derxistibû hemberî kurdan... Ji ber ku di pêvajoya Sovyetê de, piraniya kurdên li Ermenistanê li gundan an jî li bajaran bi hev ra dijiyan. Ji Aliyê din ve, sîstema Sovyetê jî, derfetê çandî û aborî dabûn wan. Di wê rewşê de, kurdên Ermenistanê nasnameya xwe xwedî kiran û di gelek hêlên jiyane de pêş ve çûn. Lê, di



destpêka salên 90î de rewş hate guherandin. Gelek saziyên kurdan yê di dema Sovyetê de deriyê xwe girtin. Yê mayîn di warê aborî de ketin nav tengasiyên mezin. Ji aliyê din ve jî, revê dest pê kir. Siya Moskovayê çawa ji ser komarên Qefkasyayê rabû, civaka kurd jî di heman wextî de li hemberî gelek êrîşên nijadperest ma... Cara yekemîn di salên dawî yê Yekîtiya Sovyetê de kurdên misilman li hemberî êrîşên ermeniyên man. Di sala 1988an de, nakokiya Qerebaxê, ji rûpelên dîrokê careke din derket û di navbera ermenî û azeriyên de bû pîrsgirêkeke rojane. Pişt re jî di nav herdu miletan de, Qerebax bû sedema şerekî dijwar. Piştî vê bûyerê, nêzîka 200 hezar azeriyên ku li Ermenistanê dijîyan, dest pê kirin reviyên Azerbaycanê. Di wan rojan de, di serî da partiya Taşnak, pişt re jî grûbên din yê nijadperest yê ermenî zor dan ser kurdên misilman.

Wek azeriyên, kurdên li nehîya Abovyanê, bajarê Lenînekanê û Laçînê cih û war bûbûn, gund û malên xwe berdan, ji Ermenistanê reviyên. Di navbera salên 1988 û 1991ê de nêzîka 15 hezar kurdên misilman ji Ermenistanê derketin. Piraniya wan jî çûn Azerbaycan, Kazakistan û Rûsyayê. Hejmarek kêma jî xwe avête Ewropayê.

Di wan salan de siyaseta Ermenistanê ya fermî, kurdên êzîdî diparast... Lê belê bi çavekî dijminayî li kurdên misilman mêze dikirin.

Rayedarên ermeniyên digotin; 'Em ne dijminên kurdan in. Lê belê, kurdên misilman piştgiriya azeriyên dikin.'

Mixabin rastî ne ew bû. Serokdewletê wê demê yê Ermenistanê Levon Ter Petrosyan, sala 1991ê di meha Gulanê de, di xeberdaneke xwe ya di televîzyonê de, wiha digot; 'Min ji bo Ermenistanê qet tiştê nekiribe jî, min welatê me ji biyaniyan paqij kir!'

Bêguman ew îtrafkirina rastiyekê bû. Kesî nedixwast vê rastiyê bi nav bike, lê belê herkesî zanîbû ku Petrosyan dixwaze bêje; 'Min azerî û kurdên misilman ji axa Ermenistanê bi zorê derxistine.'

Piştî paqijkirina kurdên misilman li Ermenistanê, di sala 1991ê de, ermeniyên dest pê kirin zor dan ser kurdên êzîdî. Di destpêkê de siyaseta fermî ya Ermenistanê, cidayetî kir navbera kurdên êzîdî. Bi propagandayek mezin ve gotin; 'Êzîdî ne kurd in.' Di demeke kin de, bi navê 'Dengê Êzîdîyan' bi radyo û rojnamekê dest bi weşanê kirin. Dewletê ev sazî fînanse kirin. Radyoya Dengê Êzîdî weşanê xwe tim li ser 'cidabûna Êzîdîyan ji Miletê Kurd' dikir.

Ew weşan hê jî berdewam dikin.

Destpêka sala 1990î endamê partiya Taşnak yê xwe bi 'Fedaiyan' bi nav dikirin, êrîş dibirin ser gundên kurdan ji bo 'şerê Qerebaxê' şervanê xort belav dikirin. Bi

vê riyê, bi sedan xortên kurd li Qerebaxê li hemberî azeriyan şer kirin û hatin kuştin. Ji aliyên din ve, di destpêka Îlankirina Cumhuriyeta Ermenistanê de di navbera hêzên leşker û polîsan yê dewletê de hinek grûbên serbixwe peyda bûn. Wan grûban wek mafia hereket dikirin û dest didan ser hebûna gelek malbatên kurd. Herwiha di wan rojan de rewşenbîrên kurd jî bûn hedefa êrîşên fîzîkî. Yek ji wan jî, profesor û helbestvanê navdar yê kurd Seîdê Îbo bû. Îbo ji aliyê kesên nenas ve, di nav bajarê Êrîvanê di encama êrîşeke çekdarî de hate kuştin. Piştî vê bûyerê, nivîskar Çerkezê Reş ji Ermenistanê reviya çû Moskova û di bûyera Îbo de dewleta ermenî û hinek rewşenbîrên kurd sûcdar kir. Kuştina Seîdê Îbo tirs xiste hundirê rewşenbîrên kurd yê Ermenistanê. Ew li hemberî êrîşên ermeniyan yê li ser civaka kurd, demeke dirêj bêdeng man. Ji aliyekî ew êrîş, ji aliyê din ve jî rewşa aborî ya gelek xerab, bû sedemê koçberiya kurdên êzîdî...

Angorî texmînan, piştî hilweşandina Yekîtiya Sovyetê nêzîka 50 hezar kurd ji Ermenistanê koçber bûbûn... Ji aliyê din ve ji ber sedemên békariyê, gelek kurd ji bo çend mehan an jî demeke dirêj berê xwe dan federasyona Rûsya, Ûkraniya û Rûsya Spî... Li Federasyona Rûsya li bajarê Grasnadarê, hejmara kurdên li Qefkasya koçberkirî gihîştê nêzîka deh hezarî...

### **Biharê were birê min**

Êsif mizgînî da min û got, em nêzîkî gundê Xaçîkê Bro bûne. Yanî gundê Aragsê... Piştî vê agahdariya Êsif, min û wî bi hev re cixarek nû vexist. Me hê kişandina cixara xwe xilas nekiribû, em li ber mala Xaçîk bûn. Weke her malake gundan xêrhatina me di serî da Seyan, pişt re jî zarokan kir.

Xwediyê malê bi dengê wan ve, derketin pêşberî me. Malbata Xaçîk bi şabûneke mezin ve, em pêşwazî kirin. Ev cara sîsiyan bû, ku ez dibûm mêvanên wan. Cara dawî havîna sala 1995an li Zozanên Sircanê, ez bi malbata Xaçîk re bûm. Me jiyana wan ya koçeriyê ji bo belgesela Televîzyonê ya bi navê `Kurdên Qafkasya` tasvîr kiribû. Wan pişt re dîmenên xwe di Med-TV de temaşe kiribûn û ji wê yekê re gelek kêfa wan hatibû. Vê malbata kurd di jiyana xwe de irf û edetên bav û kalên xwe yê sedsalê dimeşandin. Wan wek zemanê berê, li Kurdistanê, li wir jî pez û heywan xwedî dikirin. Zivistanan li gundan diman, havîna jî derdiketin zozanan.. Di pêvajoya sîstema sosyalîzmê de jî wan dev ji vê jiyana xwe ya koçeriyê bernedabû. Bi dehan salan malbata Xaçîk li ser navê Kolxoz a gund, heywan xwedî kiribûn. Piştî hilweşandina Sovyetê, rewşa aborî gelek xerab bûbû. Bi taybetî jî li baja-



Mehmet Aktaş û Kameraman Burhan Demir li gundê Aragosê, li derveyî mala Xaçikê Bro.

ran, hindik kes di şevkê de dewlemend bûbûn, lê belê piraniya civakê di halekî gelekî xerab de bû. Hunermend, nivîskar û rewşenbîrên kurd ketibûn tengasiyek mezin. Meaşê profesorekî zanîngehê di navbera deh û bîst Dollaran de bû. Hinekan ji wan dest pê kiribûn, ticareta destan dikirin. Lê belê, di jiyana kurdên koçber de, di warê aborî de tengasiyên mezin derneketibûn. Angorî agahdariyên Xaçik, gelek insan ji bajaran reviyabûn, wan jî xwastibû dest bi koçeriyê bikin. Lê belê, ew di jiyana xwe ya nû de bi ser nektibûn. Xaçik digot; Kesê ku zimanê çiyar nizanibe, bi pez û dewaran re nikaribe xeber bide, navê sed çêreyên erdê nizanibe, di şillî û şerpa da çavên xwe ji dinyayê re venekiribe, nikare bibe koçer, birê min`.

Wextê em derbasî hundirê Xaniyê Xaçikê du odayî bûn, di navbera çend deqîqeyan de, biçûk û mezin, nêzikaya bîst kesan civiyan... Piştî hal û xatir, Xaçik dest pê kir ji jiyana gundan şikayet kir. Zarok û neviyên xwe yê biçûk nîşan dida û digot; `De tu halê wan seviyên me dibînî. Îsal jî zivistaneke gelek nebixêr li ser me de girtiye. Zarokên me, heywanên me di gundan de nikarin debar bikin. Lê biharê were birê min. Dema bihar tê de tu zanî, siya Qeredaxê çawa dikeve li ser deşta Surmêlî

(Ixdîr) wisa jî dikeve li ser deşta Oktebiryânê. Xwedê ji me re jî rehmê dike.`

Min baş fêm dikir ku, ji biçûkan heta bi mezinan temamiya malbata Xaçîk wek her malbatak koçer, zivistanan tim xewna rojên koçeriyê didîtin. Xaçîk ji aliyekî ve bi me re xeber dida, ji aliyê din ve jî ji çend deqîqeyan carekê bi ser jinên malê de hêrs dibû û digot; `Qîzê ka we çi kir?

Dema kameramanê me yî Torî Burhan çû pişt malê û zîvirî, wek her carê bi devekî ji min re got; `Kuro wan kavir şerjêkirine, post jî kirine. Niha jî dikin kebab, wilo ji bo çi ecele dikin?

Li ser gotina Burhan, ez li Xaçîk vegeyriyam û min got; `We careke din xwe kire mesrefeke giran, Birê Xaçîk.`

Wî bi devekî bersiva min da; `Tu jî kurê malê yî, birê min ji xerîbiyê hatiyî. De, wexta tu çûyî Germaniyê beranê beş hê berxik bû, tê bîra te?

Du sal berê, dema em li zozanan bûn, berbanga sibê Xaçîk car din pezek ji me re şerjêkiribû. Beriya nîvro me bi hev re dabû bin şûşek Vodka jî.

Li Sircanê hewa hênik bû. Bagera welat ji sînora derbas dibû, li ser axa Ermenistanê li rûyên me dixist. Piştî me li çiyayê Elegezê, berê me li çiyayê Gîrîdaxê (Agîrî) bû. Sohbeta me li ser welat bû. Qey teyê bigota her peyvek Xaçîk, bi ava hesretê ve hatibû şuştin;

`Welat ji me çiqas dûr, ewqas jî nêzik e birê min... Carna çivîk ji deşta Ixdîrê radibin, tèn li ser wan konên me datînin. Dengê nas û pismaman ji wî aliyê Eres tê guhên me, lê destê me nagêhije hevdû. Li wir hesret hema di çavên mirov de mezin dibe. Sovyet ji hevdû belav bû, di navbera dewletan de perdeya hesin heliya, lê ava Eres hê jî di navbera cimaeta me de diherike. Em hê jî heseretkêş in, em hê jî dero dero ne, birê min.`

Xaçîk piştî van gotinên xwe, bi kasa xwe ya Vodka'yê ve rabûbû ser piyan, dûr û dirêj pesnê gerîla dida. Pêşîya kasa xwe ya araqê bikişîne serê xwe dua yaxwe wiha xilas kiribû; Xwedê bi wan şêrên me yên li serê çiyaran re be. Hêviya me serî da rebê mezin e, pişt re jî ew keç û xortên me ne. `Niha ez ji Xaçîk hîn dibûm ku ji gundên kurdan yê Ermenistanê dîsa gelek keç û xort tevî hêzên gerîlayê kurd dibûn.

Cara yekemîn di sala 1990î de xortekî bi navê Cewoyê Evdal çûbû şerê Kurdistanê û li wir şehîd ketibû. Tesîra xebatên Partiya Karkerên Kurdistan PKKê û weşanên Med-TV tesîrek mezin li ser nivêşê nû dikir... Sohbeta me û Xaçîk li ser `taştê` bi saetan kişand. Pişt re jî em derketin nav gund, me bi gundiyên kurd û ermenî re sohbeta xwe berdewam kir. Sibêtirê gera me ya di nav gundê kurdan dest pê kir...

## Me dê û bavê xwe li erdekî çal nekirin

Sibêtirê me berê xwe da nehiya Tehlinê, Gundê Şamîranê... Ev gundê giran yê 400 xaneyî, navendeke mezin ya kurdên Êzîdî bû. Van salên dawî jî Şamîranê jî koçberiyê dest pê kiribû. Lê belê dîsa jî hejmara nifûsê gund nêzîkî hezar û 500 bû... Salek berê, Mabeda `Melekê Tawus` li meydana gund hatibû çêkirin. Di şîna û şahiyên de gundiyan di serî de dihatin ew mabet ziyaret dikir. Ocaxa şeşê navdar yê Êzîdî, `şeş Ebûbekir` jî li wî gundî bû... Piştî mirina şeşê kurê wî yê ciwan Êso dewsa wî rûniştibû...

Dema em çûn ziyareta Ocaxa şeş Ebûbekir, Êso jî me re li ber `stêr`ê ocaxê dua şandin û derxist. Piştî terqînê gundiyan hazir çûn destê Êso maç kirin û hinek jî wan pera baxişandin Ocaxê.... Piştî re jî sohbetekê giran li ser dîna Êzîdîtiyê dest pê kir... Êso digot; `Birê min, eger ku cimaeta me heya îro xwe xwedî kiribe, sebeb ev dîna e. Mezelê me jî ermeniya cida bûn, şîna û şahiyê me jî wan cida man. Ji ber vê yekê, em di nav wan de neheliyan.`

Ew gotinên Êso sohbetek min û Dr. Lamara Paşyev ya çend sal berê li Tîblîsê anî bîra min.

`Wî dîna nehîşt em di nav Gurcan de bihelin. Ji ber ku izna Êzîdîyan tune bû ku bi mîletên din re bizewicin. Mêrê me di xortaniya xwe de diçûn bi keçên gurcî û rûsî re digeriyan. Lê wextê zewacê dihat, ew mecbûr diman ku bi keçekê kurd re bizewicin. Vê yekê zimanê me jî xwedî kir.

Piştî sohbetê me, em bi Êso re çûn ser mezela gund... Ji gundê Eşmezinê nêzîkî Êrîvanê Meta Gogê çûbû rehetê. Ji ber ku li tu gundî mezela Êzîdîyan tunebû, Meta Gogê li Şamîranê teslîmî axê dikirin... Wextê em gihîştin Goristanê, şîneke mezin dest pê kiribû... Tenê ne jinan, mêrên jî Malbata Gogê jî herdu çavan digiriyan... Hinek jî wan jin û mêran jî dengê kelogirî `kilam` diavêtin ser Gogê û behsa emrê wê yê çûyî dikirin... Piştî şîna û duayên şeşan, sê kurê Gogê tabûta diya xwe berjêrî çela kolandî kirin.

Hesê xortan bi hev re sê caran gotin;

`Dayê... Dayê... Dayê.`

Cilên Gogê jî bi wê re hatin binaxkirin. Piştî definkirinê, kesên hatibûn ser mezela, bi dorê destê şeşan maç kirin... Li ser mezela, wê zivîstana sar, xwedî û xûdanê Gogê jî bo xêra wê jî 150 kesî re xwarin amade kiribûn... Li ser taştê xwarinê, mezinê gund dest pê kir tasa xwe ya Vodkayê bilind kir û got; Kî jî kûderê hatibe li ser çavên min û heft bavê min re hatiye. Ez vê tasê jî bo cînetiya Gogê vedixum.`

Pişt re ji şûşên araqê li ser hevdû vebûn û xwarinê dest pê kir. Gelek mêvan rabûn ser piyan, tasa xwe ya areqê bilind kirin û pesnê Gogê û jiyana wê dan.

Di navbera Gundê nehiya Tehlin, Elegez û Oktebiryar de me hefteyek xwe derbas kir... Di gera me ya di nav gundan de, te yê bigota qey herkesî hevdû şîret kiriye... Em li kêderê bûn, mehan herkesî ji koçberiya nû ya rojane û pirsgirêkên aborî şikayet dikir.

‘Me du bavên xwe erdekî çal nekir. Niha jî miletê me careke din ji hevdû belav dibe.’ Ev gotin li her gundî ji me re dihat dúbare kirin...

Beriya ez werim Êrîvanê, çend roj berê li Tîblîsê li meydana Ecema Apê Ordî (Ordîxanê Kaşafî) di çayxaneke Azeriyar de, ji min re xewna xwe wiha dianî ziman. ‘Birê min, mezê kalikê min welatê Serhedê, Korbulaşê ye. Bavê min, me li wir çal kir. Min temamiya kur û neviyên xwe re wesiyet kiriye eger ku ez herim rehmetê bi qaçaxî ve min bibin welat, di bin siya Gîrîdaxê de defin bikin.

## **Radyoya Êrîvanê**

Şeva ez bûm mêvanê Keremê Seyad, dîsa dût û dirêj, li ser Radyoya Êrîvanê, para kurdî sohbet kir. Piştî hilweşandina Sovyetê weke temamiya sazî û rêxistinên kurdên Ermenistanê, hemberî radyoyê jî pirsgirêkê aborî yê mezin derketibûn. Piraniya xebatkarên radyoyê ji Ermenistanê koçber bûbûn. Rêvebiriya Ermenistanê bi saetan weşana para kurdî kurt kiribû.

Kar û xebatê radyo tenê li ser milê Keremê Seyad kurê wî Tîtal û qîza wî Leylê mabû. Cemîla Celîl û Sîma Semed car carna alîkarî didan karê radyoyê. Wexta carra yekemîn sala 1992an de min radyo ziyaret kir, Kerem digot; ‘Di destê min de perê rîya min tune ku ez ji mal herim cihê karê xwe. Lê ez zanim ew radyo ji bo miletê me xizmeteke mezin dike, ez û zarokê xwe ji radyoyê berdin, ew dengê civa-ka me ye bê vemirandin. Piştî şeş salan hê jî rewş ne hatibû guherandin.

Radyoyê hê jî bi teknîka 40 sal berê weşana xwe dikir. Xebatên li derve yê di nav civakê de hatibûn sekinandin. Tenê li studyoyê bername dihatin amade kirin. Bi piranî materyalên muzîkê yê arşîvê dihatin bikaranîn...

Keremê Seyad bang li hemû rêxistin û saziyên kurdan dikir ku alîkariya aborî û teknîkî bidin Radyoyê... Herwiha Kerem hevî dikir ku rêxistinên kurdan xwedî li Fonda Radyoyê ya bi zimanê kurdî derkevin. Bi teknîka nû ve arşîva radyoyê careke din were nivîsandin (qeydkirin).

Di arşîva radyoyê de hezar û 500 kilamên dengbêjan, herwiha bi sedan piyes, çî-



Ji milê çepê Keremê Angosî, direktorê Radyoya Tîblîsê yê beşa kurdî; Dengbêj Ūso; Mehmet Aktaş û Leyla Çildergûşî, xebatkara Radyoya Kurdî û mamosteya zimanê kurdî.

rok, opera û nimûneyên mûzîka nûjen ya kurdî heye. Rewşa rojnameya Riya Teze jî ne cida bû. Rojnameya kurdên Sovyetê ya nav û deng êdî tenê bi çar rûpelan ve bi formatek gelek hêsan ve derdiket. Edîtorê rojnamê Emerîkê Serdar û hevalên wî li gundan digeriyan, ji gundiyan kurd alîkarî top dikirin û heftê carekê, wextê pere ne didîtin jî du hefta carekê, rojname derdixistin.

### **Ji dîroka nenivîsandî ya kurdên Ermenîstanê**

Di pêvajoya Sovyetê de, di nav sîstema Sosyalîzmê de siyasîmedara bêtir, civaka kurd rewşenbîr û nivîskaran temsîl kir. Bê gûman, rewşenbîrê xwedî pîrs yê endamê Partiya Komunist bûn. An jî bi KGB re girêdayî bûn. Nivîskarên ku tîkiliyên wan bi partiye re ne baş bûn, pirtûkên xwe nikaribûn çap bikirina û alîkarî ji dewletê werbigirtina. Piştî hilweşandina Sovyetê, civaka kurd rewşenbîr weke `Rûspiyan` nav dikirin û hêvî dikirin ku ew di rewşa nû de riyekê nîşanî wan bidin. Lê belê mirov dikare bibêje, sedemên aborî, nakokiyên navxweyî û neşayîyên wan yê ji sîstema sosyalîzma reel girtî, derfet neda ku rewşenbîr bibin hêzek. Wek ji wan di-

hat hêvî kirin, ew jî bo civakê rola xwe ya `Rûspîtiyê` dilîzin. Lê belê, dîsa jî dawîya sîstêma sosyalîzmê rewşenbîrên kurd yê Sovyetê, li ser navê civaka kurd ya welatê xerîbîyê ketina nav gelek hewldanan... Lê mixabin, ew bi ser neketin. Di sala 1989an de li Moskovayê rêxistina Yekbûn hat avakirin. Wê rêxistinê jî bo mafê otonomiyê, gelek meş û civîn çêkir. Dema serokê rêxistinê Mehemedê Silo (Babayef) bi dewleta Azerbaycanê re ket nav têkiliyan, di nav rêxistinê de nakokî derketin û Yekbûn jihev belav bû. Pişt re jî rewşenbîrên kurd `Hêja Azadiya Kurdistan` avakir. Îcar jî dewleta Ermenistanê bi rewşenbîrên wê rêxistinê re ket nav têkiliyan û xwast wan bi kar bîne. Di pêvajoya şerê Qerebaxê de, bi teşwîqa ermeniyan, rewşenbîrên kurd îlankirina `Kurdîstana Sor` kirin rojeva xwe. Havîna sala 1992an de Kurdîstana Sor di dîrokê de cara duyemîn bi navê `Cumhuriyeta Laçînê ya kurdan` ve hat îlankirin.

Wekîl Mistefa yê kurdê Ozbekistanê weke Serokwezîr hat hilbijartin. Destpêka meha Hezîranê, nêzîka 400 rewşenbîr û welatparêzên kurd ji Êrîvanê bi otobusan ve, mîna herin dawetekê, wisa çûn dewletek îlan kirin. Lê belê li ser axa Kurdîstana Sor kurd nemabûn. Di şerê Qerebaxê de kurdên mintiqê di nav agirê ermenî û azeriyan de mabûn.

Li Kelbecar, Kubatlu, Laçîn û Zengilanê nêzîka 4 hezar kurd, ji aliyê ermenî û azeriyan ve hatibû kuştin. Li Kurdîstana Sor, 30 hezar kurdên misilman jî bi azeriyan re reviyabûn, çûbûn Azerbaycanê... Yanî di vî şerî de kurdên êzîdî ji aliyê ermeniyan, kurdên misilman ji aliyê Azerbaycanê ve bê dilê xwe şer dikirin û dihatin kuştin. Şerê giran jî li mintîqa kurdan dihat meşandin. Dewleta ermeniyan hesab dikir ku eger Kurdîstana Sor di bin siya wan de bê îlankirin, wê jî her aliyê Sovyeta Kevn, kurdan bikişînin wir. Bi vî awayî di navbera wan û Azeriyan de mintîqek tampon yê çê bibe. Lê belê wisa nebû. Piştî îlankirina Cumhuriyeta Laçîn ya kurdan, kurd neçûn herêma şer û li wir bi cîh û war nebûn. Piştî çend heftiyan kesên çûbûn Laçînê jî pişt re vegeriyan.

Rewşenbîrên kurd yê weke Emerîkê Serdar, Karlanê Çaçanî, Prof. Şerefê Eşîr, Cemalê Êsîf hewl dan ku ji bo Laçînê bajarvanan û parastvanên çekdar bibînin, lê belê di vî yekê de bi ser neketin. Ji ber ku piraniya civaka kurd îlankirina duyemîn ya Kurdîstana Sor weke lîstîkek ermeniyan ya li hemberî azerî û kurdan didît.

Piştî vî tecrûbê, di navbera rewşenbîrên kurd de, cidayetî û nakokî zêdetir bûn. Tesîra wan ya li ser civakê jî kêmtir bû. □



# Sazbendiya kurdên Ermenistanê



NÛRA CEWARÎ

Heta 10 sal berê jî me dikarîbû bigota ku folklorê kurdên Ermenistanê ya sazbandiyê baş hatiye xwedîkirinê. Gundên kurdên Ermenistanê dûrî rê û bajarên mezin in, di berpala çiyayê de ne, çî ku meniya başmayîna folklorê ya pêşîn e. Xên jî faktora cografyayê, alî xwedîkirina folklorê wisa jî dîne êzdî, êzdfatî kiriye, ku herdem xwenaskirin û xwexwedîkirin pêş de aniye, nehiştiye ku kurd tevî dîn û adetên gelê cînar bibin.

Niha jî folklorê kurdên Ermenistanê jiyana xwe didomîne, lê rengê wê hinekî temiriye.

Çend sal berê wisa jî karê hewaskar dihatine kirinê di dereca berhevkirin, lêgerîn, çapkirin û qedandina sazbandiya kurdî de, kadrê baş pêş de hatibûn ku karê çandeyî û kulturî pêş ve dibirin.

Di nava kurdên Ermenistanê de stranên herî belavbûyî ew stranên gundîtiyê ne bi sîstema janrayê dewlemend ve. Di wana de yên herî hezkirî stranên govendê ne, bi tekstên nexş û nîgar, bi rîtmên hewaskar ve. Şayî, eyd, dawet bi stranên govendê ve hatine û tene xemilandin. Ew wisa jî bûne mecalên nîşandayîna hostatiya keç û

xortan, ku ber hev strana diguhêzin, bi teherê pirs û bersivê bi hev ra xeber didin, dikevîne lecê.

Vê paşiyê întonasya wan stranan, di bin bandûra stran û reqasên bajariyê, "rabî-zî" (derheqa sazbandiya rabîzî-de paşê wê bê gotinê) piçekî dêformasya bûne, hatine guhastinê. Ew stran li ba dengbêjên emirmezin baş mane.

Himberî mêran, jinên kurd hê konservatîv in, kêr karê derve dikin û diçine rêwîtiyê, piranî di mal de ne, bi zarok û karên malê ve mijûl in. Jinên jêhatî wexta nimûneke folklorî dibihên, ew nimûne li malên xwe de hey diwekilînin, stranên xerîbiyê davêjine ser xwe, stran û metelokan davêjin ser zarokan, stranê laqirdiya - ser nas û cînara. Û heta îro jî stranên jina - stranên zarok mijûlkirinê, razandinê-lûrî, stranên satîrîk, evîntiyê, xerîbiyê di nav kurdên Ermenistanê de baş mane. Bi taybetî, di nav stranên jinan de gelek elementên kevin hatine xwedîkirinê.

Gelek stran û miqamên gelêrî wînda bûne, hatine guhastinê, lê hinekên wan ku rabûn rûniştandinê de bûye serekera girêdayîne hê tene xwedîkirinê. Ew stran û miqamên dawetan in, stranên şîne ne. Ji stran û miqamên dawetan stranên verêkirina bûkê ku hevalên bûkê distirên, miqamên mêvanqebûlkirinê, verêkirin û peyakerina bûkê, miqamên govenda baş mane. Ji stranên şîne stranên jina - dîrok, nivê-jok, stranên mêran yê dîalogî ku di folklorê me de nimûnên nebînayî ne, baş mane. Stranên mêran bi taybetî giriyê mêranîni, li kîjana de camêrtî, eşîrtî bi element û întonasyayê pir arxayîk mane. Dramatîzm di wana de gelek xurt e û bi rastî mirov nikare wan stranan bi hêsayî bibihê.

Nimûnên ku mecalên qedandinê yê baş ve girêdayî ne bere-bere kêr dibin. Odên berê yê mezin, guhdarên hewce û hêja kêr bûne, nemane û stranên dîrokî, destan jî çawa pareke mijûliya hevcivîna kêr dibin, tene jibîrkin. Di wexta me de ev stran bi peyhatina para stranê ya sivik ve bi rîtmê reqase dupa bûne stranên ser mesrefa.

Wexta eyda û şîna stranên ruhaniyê - qewl û beytên êzîdîyan hê tene qedandinê. Qedir û ciyê wana di nava deb û sazbandiya kurdên Ermenistanê de timê hebûne. Evan nimûnên sazbandiyê dewr û salan re kêr hatine guhastinê û weke heykelê dewrê buhurî tene parastinê.

Bi gotina dê û bavê me li nav kurdên Ermenistanê wexta şaya hacetê sazbandiyê ya çalameşk (ji çermê pêz çêkirî) kêr anîne, miqamên govendê ser qedandine. Di rojên me de dewsa bilûra qedîm ya şivanan magnîtofona bi kasêtê cûre-cûre bi xwe re digerin. Poyemê sazbandiya me ya klasîk e bê xeber û awazên me ya ku ruhê sazband, kultur û merîfeta wî diyar dikin, hê tene xwedîkirinê. Ew awazên klasîk,

hostê kîjana Şamilê Beko, Egîtê Cimo, Xelîlê Evdilene, qey bêjî neynika emir û dîroka mebin, şirovekirina pirsên çetin bin. Zurne tevî defê mezin çawa sîmbola emirjiyîna kurdan, bi miqamên eşq û teqil ve hê kurdên Ermenistanê ruhdar û optîmîst dike. Tembûr tevî stranên lîrîkiyê hêdî-hêdî di nav deba kurdên Ermenistanê de cîwar dibe.

Pey stranên Evdalê Zeynê, Ahmedê Mîrazî, Aşiq Nazik, Ahmê Çolora çiqla sazbandiya aşiqiyê li Ermenistanê qey bêjî temirî. Dewsa wana stranên hêna Sovyetiyê, stranên bajariyê pêş de hatin.

Di nav kurdên Ermenistanê de, çawa li cem hemû gelên Sovyetê, piştî sazûna Dewleta Sovyetê cûrekî stranê yê gelerî pêş de hat, kîjan bi rîtmê meşê, întonasya û awazên nû yê veçêkirî ve pesnê kolxoza, komsomola, partiya komunîstiyê dida. Van stranan me di gotarên xwe de "Stranên hêna Sovyetiyê" bi nav kirine. Pêşdhatina van stranan bi guhastina tekstên stranên folklorî û bi lihevanîna wan tekstan tevî awazan dest pê bû. Gelek caran ew lihevanîn senteza baş çenedikirin. Ji bo belavkirina îdeolojiya Sovyetê, van stranên nû wek berhevokên dersan ji bo şagirtên dibistanan çap dibûn. Ji bo şagirtên kurdan jî sê berhevokên stranan bi tevûna sazbandê ermeniyana û arîkariya kurdan çap bûn. "12 klam seva mektebê kurman-



Bingehdarekî fonda stran û muzika kurdî ya radyoya Êrîvanê; bilûrwan û zurneyîyê bi nav û deng Egîtê Cimo.

ca” sala 1932an, ”Klamê meketeba” sala 1936an û ”Weten, 10 klama bi zmanê kur-mancî ” sala 1942an çap bûne. Lê çawa pêwîstiya wan tekstan winda bûn ew stran jî hatine jibîrkin. Du, sê stranên hêna Sovyetiyê, ku dengbêjên gelêrî yê hoste - Aaşiq Nazik, Bêmalê Keko sêwirandine, hetanî salên 1980î jî emrê xwe didoman-din.

Li Ermenistanê, di salên 1960-70î de stranên bajariyê hêdî-hêdî pêş de dihatin û belav dibûn. Meniya çêbûn û belavbûna stranên bajariyê - ew pêşdahatina xwenas-kin û wetenhiziyê bû di nava rûniştvanên bajarê Yêrêvanê, di nava xwendkaran de. Stran bi tekstên şayîrên pêşverû, stranên ku Aramê Tîgran ji nav kurdên Sûrya-yê anîbûn bi hêsayî di nava roşenbîr û xwendekaran de belev dibûn. Hey cara stran-ên lirîkiyê jî tevî wan stranan dimeşyan.

Tevî stranên bajariyê di nav kurdên Ermenistanê de wisa jî stranên kurdên bajarê Tîblîsê -paytexta Gurcîstanê- bi sêlik û kasêtên magnîtofonê belav dibûn. Ew stran, bi prîmîtîviya xwe ve di nava kurdên Ermenistanê de dihatine binavkirin, çawa stranên ”rabîz”. ”Rabîz” ji xeberên rûsî -rabotnîkî îskûsîrve- (karkerên çandeyî) çê bûye. Organîzasyonên bi wî navî di salên Sovyetê yê pêşin de di nav gelên dor û ber de pêş de dihatin. Peyra, wexta ansambîl û orkêstrê profesyonel pêş de hatin, sazbandên baş ji wan tevgeran derdiketin, diçûn karê profesyonelî bikin. Derecê wan tevgeran pêşin bi vî teherî hêdî-hêdî nizm dibû û hunermendiya wan jî ma bi navê ”rabîz”. Û heta niha jî, ji bo nîşandayîna dereca stran û miqaman ya sade û prîmîtîv xebera ”rabîz” tê bikaranîn. Gelek caran sazbandiya ”rabîz” nêzîkî sazbandiya geleriye dibe û di wana de dêformasya çê dibe.

Tevî sazbandiya bajariyê, ”rabîz” di nava kurdên Ermenistanê de wisa jî sazbandiya gelerî ya duyemînê belav dibû. Sazbandiya gelerî ji gel derbasî komê stran, reqasêye êtnografî dibû, li wir hil dibû, reng û cûrê qedandinê yê nû (ji bo nîşandayî-nê) distend û car din vedigeriya ber bi gel. Sazbandzan sazbandiya wî cûreyî çawa sazbandiya geleriya duyemînê nav dikin. Çend ansablê kurdên Ermenistanê yê êtnografîyê nav û deng hebûn. Wan bi cilên miletîyê bi def û zurne pêş de diha-tin û gelek caran xelatên mezin digirtin. Yek ji wana koma gundê Elegezê yê navça Aparanê (niha Saxkahovît). Li Yêrêvanê klûba Nor Arêş de koma stran û reqasên kurdî yê bi nav û deng sazbandê merîfet Egîtê Cimo hazir kiribû. Wisa jî Sûsîka Simo, Mîşayê Dilovanî di vî derecê de karekî baş dikirin.

Sala 1986 -88an li Yêrêvanê, li rex Înstîtûta Pedagojîyê bi serkariya Nûra Cewarî û Tosinê Reşît ji xwendevanên xwandinxana Yêrêvanê koma stran û reqasê kurdî ya etnografîyê çêbû û kar dikir. T. Reşît berpîrsiyarê para reqasa bû, N. Cewarî - ya

sazbendiyê bû. Ew kom bi serfirazî li Înstîtûta Pedagojîyê, li mala nivîskarên Ermenistanê, li bajarê Tîblîsê pêş de dihat û bi xelatên mezin ve tevî leca komê ermeniyên êtnografîyê dibû. Xwendekarên kurd stran û reqasa bi hewaskarîke mezin, hêsa û zû hîn dibûn û bi hezkirin nîşanê temaşavanan didan.

Li Ermenistanê di meydana sazbandiya kurdî de wisa jî karê profesyonelî - berevkerin, nivîsar, lêkolîn, çapkirina nimûnê wê sazbandiyê dihate kirinê. Berî qeydê Sovyetê û pey ra jî pêşekzanê ermeniyên bi xemxuriya mezin karê sazbandiya kurdiye profesyonel hildabûn ser milê xwe, paşwextiyê kadrê wê sazbandiyê kurd hazir kirin, yê ku ewî karê bimbarek pêş de dibirin.

Pêşekzanê ermeniyên gelek nimûnên sazbandiya kurdî nivîsîne, çapkirine û pê ra jî veçêkirine (derheqa wan kara de hûrgilî di zincîra gotarên me de "Pêwendiyên kurda û ermeniyayên sazbandiyê" ku kovara Roja Nû de çap dibin, wê bêne nivîsarê ). Ew karên îndîvidûalî li çend ocax-îdarê Ermenistanê dihatine kirinê, li ku niha karê kirî têne xwedîkirinê. Wisa jî di çend muzeyan de melûmetî û dokûmênt li ser çanda kurdî têne xwedîkirinê..

1. Yek ji wan ocaxa kabînetê ser navê kompozîtor Romanos Mêlikyane zaniyariyê bû li rex Komîtêya karên çandeyî, li ku bi serkariya sazbandzan Aram Koçaryan ji sala 1939 heta 1943an bi arîkariya Heciyê Cindî gelek nimûnên sazbandiya kurdî hatine nivîsarê, berevkerinê. H. Cindî dengbêjên baş didît, dibire wê kabînetê, tektên stranên kurdî tercumeyî ermenî ji bo karên zaniyariyê dikir, A. Koçaryan jî stran û miqamên kurdî bi teknîka herî primîtîv ve dinivîsîn. Paşwextiyê ew kabînet bû sektoreke çandeyî li rex Akadêmiya Ermenistanê ya Zaniyariyê û di salên 50î de bû Înstîtûta Hunermendiya serbixwe di nav sîstema Akadêmiya Zaniyariyê de. Koleksiyona dengnivîsarên A. Koçaryane mîxanîkiyê niha li dengxana Instîtûtê de têne xwedîkirinê. Li wê Instîtûtê wisa jî dengnivîsarên sazbandzan Krîstafor Kûşnaryane kurdî têne xwedîkirinê, kîjan li Ermenistanê s. 1927an û 1929an du êkspêdîsiya de ku Konservatorya Lênîngradê (niha Sankt Pêtêrbûrg) teşkil kiribû, hatibûne berevkerinê. Ewî ew dengnivîsar tevî hevalên xwe ji Konservatoryayê berev kirine. Orjînalê dengnivîsarê Kr. Kûşnaryane mîxanîkiyê li Sankt Pêtêrbûrgê Instîtûta Edebiyata Rûsî de ya Akadêmiya Rûsiyayê ya Zaniyariyê, ku tê navkirinê wisa jî Mala Pûşkîn, têne xwedîkirinê.

Sala 1967an Nûra Cewarî li Înstîtûta Akadêmiya Ermenistanê ya Hunermendiyê de çawa aspirantê qebûl kirinê. Sala 1969an Instîtûtê êkspêdîsiya pêşkêşî roosaliya bûyîna klasîkê sazbandiya ermeniyên yê bi nav û deng Komîtas teşkil dîke li gundên navçaya Aparanêye (niha Saxkahovît) ermeniya û kurda de. N. Cewarî tevî wê

êkspêdîsîyê dibe. Pey ra salek, du sal carekê bi tenê, yanê jî tevî neferê mala xwe - Tosinê Reşît û zaroka nimûnê folklorazazbendiyê li gundê kurda yê Ermenistanê wisa jî li Qazaxistanê, Gurcîstanê berev dike. Ew dengnivîsar hemî li wê Instîtûtê de têne xwedîkirinê. Kopya wan dengnivîsaran li dengxana N. Cewarî û T. Reşît de têne xwedîkirinê.

2. Ocaxa duduyan ew dengxana Radyoya Ermenistanê para kurdî ye, li ku bi sedan stran û miqamên bijare yên baş bi saya karkerên para kurdî - rêdaktorê sereke yê pêşin Xelîl Mûradov, rêdaktorê sazbandiyê yê pêşin Casimê Celîl û karkerên mayîn hatine berevkirinê. Di wê fondê de gelek stran û miqamên kurdî yên klasîk hene.

3. Ocaxa sisiyan Konsêrvatoriya Yêrêvanê yê dewlêtiyê ser navê Komîtas li ku çar kadrê kurdên sazbandzan hatine hazîrkirinê; N. Cewarî, Cemîla Celîl, Zozan Ozmanî û Naza Sûrên. Li ser sazbandiya kurdan çar xebatên dîplomayê bi zmanê ermenî û rûsî hatine nivîsarê. Ji wan her çaran bi tenê Zozan Ozmanî dîploma sor stendiye. Niha her çar jî karê xwe yê sazbandiyê didomînin. N. Cewarî, C. Celîl û vê dawiyê Z. Ozmanî gelek nimûnên sazbandiya kurdî bi notenivîsar berevokên başqê ve û li kovar, rojnemên kurdî de çap kirine. N. Cewarî wisa jî bi karê zaniyariyê ve mijûl e. (Derheqa dengnivîsaranê kurdiye mêxanîkyê û bi note binhêre gotarê me "Folklorîstîka sazbandiya kurdî û problêmên wê" li berevoka gotarên zaniyariyê 13 da ya Instîtûta Akadêmiya Ermenistanê ya Rojhilataniyê, 1985, bi zimanê rûsî).

Li dengxane û kitêbxana kabînetê sazbandiya geleri ya Konsêrvatoriya Yêrêvanê de wisa jî çend nimûnên dengnivîsarê sazbandiya kurdî ya mêxanîkiyê û monografya N. Cewarî, berevok, gotarên ser sazbandiya kurdî yên ku li Ermenistanê çap bûne têne xwedîkirinê.

4. Ocaxa çaran ew Muzêya Çande û Edebiyata Ermenistanê ye li ku notenivîsaranê Komîtasê stranên kurdiye nîvcî, miqamekî kurdî û veçêkirina wî ye "Lûr-de lûrê" wisa jî veçêkirinê kompozîtor Aram Mêrangûliyanê kurdî têne xwedîkirinê. Di nav gotarên nivîskarên ermeniyana de wisa jî melûmetî di derheqa sazbandiya kurdî de têne dîtinê.

5. Ocaxine pir dewlemend û hewaskar ew dengxanê sazbandiya kurdî yê mêxanîkiyê şexsî ne. Haya me ji du dengxanê wisa heyê; ya N. Cewarî û Tosinê Reşît û ya Cemîla Celîl. Nimûnên dengxana N. Cewarî û T. Reşît weke 30 salî de hatine berevkirinê ji kurdên komarên Sovyeta berê. Di wê koleksiyonê de wisa jî gelek nimûnên kurdên bakurê Kurdistanê û başûr hene.

6. Li Ermenistanê muzeya destnivîsarên ermeniyî yê kevin û dewlemend heye bi navê Matênadaran. Li wir Heciyê Cindî destnivîsara dîroknivîsa Şah Abbasê faris (sedsaliya 17an) Iskêndêr Mûnşî li ser dîroka Dim-dimî-ê û teksteke strana kurdî bi tîpên ermenî dîtiye. Dibe ku li wir dîsa ser pirsên kurdolojiyê, pêra jî sazbandiya kurdî melûmetî bêne dîtinê.

Bi gilîkî, li Ermenistanê sazbandiya kurdî heta deh sal berê jî bi gavên mezin ve pêş de diçû. Erdheja Ermenistanê ya sala 1988an, şerê di orta ermeniyî û azeriyan de ji bo Qerebaxê, bloka de Ermenistanê ji aliyê azeriyan û gurcan de, hevberdana komerên mûzê li Ermenistanê problemên miletiyê û ekonomiyê çêkirin. Gelên Ermenistanê yê biçûk û mezin tevî ermeniyî bi xwe dereketine Rûsyayê, dewletên mayîn. Kurdê Ermenistanê bi piranî derketine Rûsyayê.

Sala par em bûne mêvanê merivê xwe li Ermenistanê û Rûsyayê. Li gundên Ermenistanê yê kurdan de merî kêmane, her kal û pîr in. Li gundê Fêrîk de navça Êçmîsînê dawet hebû. Em çûne mala dawetvaniyan. Bûk ji gundekî nêzîk anîn peya kirin. Bin dengê zurnê tek reqîsîn, govend girtin û dîsa jî merî kêmane. Kurdên bajarê Yêrêvanê kêmane hej hev hene, giliyê hev nakin, kêmane hev dibînin.

Li Rûsyayê bajarê Mînvodiyê em çûn gelek malan, me li kasêtên vîdeoyê nihêrîn. Halê wan yê ekonomiyê baş e, pê ra jî ser adetê kal û bavê xwe ne. Li bal wan sazbandiya kurdî weke deh sal berê baş tê xwedîkirinê.

Niha halê Ermenistanê yê ekonomî hêdî-hêdî ber bi başiyê diçe û pirsên miletiyê jî ne tûj in. Me guman heye ku li Ermenistanê ew adetên berê yê baş wê bêne bîranînê, kurdeyatî, folklorê kurdî û karên profesyonelî wê emirjîyîna xwe bidomînin. □

## Melkesvano

### ARJEN ARÎ

Sibeha te bi xêr, melkesvano!  
qewet be ji te re.  
ji kerema xwe re ka rêş ke  
bi xwîna birayekî sor dike  
kolana devderîyê min...

tev li toz û tirabêlkê bikî  
ev xwîn, ya çendem e tu rêş dikî?  
melkesvano, tu bi xwedê kî  
dest ne xwîn, mal ne bi şîn  
bîra min bîn bajarekî.


"Kurd xayîno" digorîne.  
dêyek weha dilorîne,  
bajar lê bêdeng dimîne.  
melkesvano, tê çi bêjî?

xwînê li melkesa te jî va veda  
hê jî ma tu ê bêdeng bimînî?  
rêş ke, rêş ke melkes bi xwîno  
tev li xwînê neke şopa gedan.

*12-Tebax 95*



# Şiîra kurdî li kevnesovyetê



TOSINÊ REŞÎD

Çawa edebiyata kurdî bi giştî, wisa jî şîira kurdî li kevnesovyetê ji destpêka salên sêyemîn, hê rast ji çapkirina rojname "Riya Teze" dest pê dibe, ku ji 30ê meha Adarê sala 1930ê li Yêrêvanê dihate weşandin. Wan salan xwendin di dibistanên gundên kurdan de bi zimanê kurdî bû, hezkirina ber bi xwendinê geş bû, rojname baş dihate

belavkirin û xwendin. Nivîskarên me yê nifşa yekemîn hema di rûpelên wê rojname de berhemên xwe çap dikirin, bi serî wê ji xwe re xwendevan peyda dikirin. Bê guman berî hingê jî hinek tişt hatibûn nivîsar û çapkirin. Çend nimûnên edebiyata kurdî di pirtûka "Şems" da hebûn, ku dostekî gelê kurdî dilsoz Hakob Xazaryan (Lazo) çawa pirtûka hînbûnê ji bo dibistanê nivîsî bû û sala 1921ê li Êçmîazînê (Ermenistanê), bi tîpên ermenî hatibû çapkirinê.

Li gora gotina Qanatê Kurdo, di dibistana kurdî (bi xwe şagirtê wê dibistanê bûye), ya bajarê Tbilîsiyê de, ku mamostê wê Hakob Xazaryan (Lazo) bû, nîveka salên bîstemîn, ji aliyê mamosta û şagirtan de şano dihatin nivîsar û şagirtan ew şano ser sehnê dilîstin. Heta van salên dawiyê jî xelkê ew şano bi kêfxweşî bi bîr dianîn.

Sala 1929an Erebe Şemo û Îsahak Maragûlov ser binaxa tîpên latînî elfeba kurdî

saz kirin û pirtûka xwe, ya "Xwebixwe hînbûna zimanê kurmancî" çap kirin. Di wê pirtûkê de jî nimûnên edebiyatê hebûn. Lê ew nimûnên berî ronahî dîtina rojname "Riya Teze" çap bûbûn mirov dikare bêje tenê nîrxê wan ê dîrokî heye, wan tu şop di edebiyata kurdên kevnesovyetê de ne hîştin.

Ew edebiyat hema-hema li cîkî vala, bi xemxuriya hukumata Ermenistanê dest pê bû.

Gerek bê gotinê hetanî sala 1937an li Yekîtiya Sovyetê bi xemxurî berbirî çanda gelên kêmane, di nav wan de jî ya kurdan dibûn, cîhekî baş didan wan. Bo nimûne sala 1936an li Ermenistanê hê gelek pirtûkên kurdî çap bûne ne ku di nav pênc salên salên 70emîn, yan 80emîn.

Lê ev yek li komarên mayîn, yên ku kurd di wan de dijîyan wisa nîn bû. Li Azerbeycanê dawîya salên 20emîn û destpêka salên 30emîn çend tişt çap bûn, paşê her tişt vêsiya û çawa li komara Tirkiyê dest bi siyaseta asîmîlasyonê, helandina kurdan bû. Kurdên Turkmenistanê jî ketine roja kurdên Azerbeycanê. Rast e li Gurcistanê siyaseta helandina kurdan ne dihate meşandin, lê heta nîveka salên 70emîn jî tu firsend ji bo geşbûna çanda kurdî li wir nehatin sazkirinê, eger piştî wê hinek tişt hatin kirin jî (radiyo heftê carekê panzdeh deqe, şanoya gelerî, ku dirêj dom nekir) wan tu berên berbiçav nedan. Çend kesên li wir bi kurdî dinivîsîn jî berhemên xwe li Ermenistanê çap dikirin.

Wisa gava gilî tê ser edebiyata kurdên Yekîtiya Sovetê, divê em li ser edebiyata kurdên Ermenistanê rawestin.

Çawa me êdî li jor got edebiyata kurdî ji cîhekî vala dest pê bû. Salên 30-emîn di nav kurdan da mirovên xwendî lap kêm bûn, ewên hebûn jî gelek ji wan di sêwîxanan da mezin bûbûn û kurdiya wan yan qet tune bû, yan jî seqet bû.

Yek ji ronakhîrên me yê wan salan ê bi nav û deng, Heciyê Cindî, ku bi sedan pirtûk û gotar bi kurdî çap kirine, di sêwîxanê da kurdiya xwe bîr kirî bûye û piştî li gundekî kurdan dibe mamosta ji nû va zimanê kurdî fêr dibe.

Ciye bê gotin, wekî Mîkayêlê Reşîd jî gava dest bi nivîsandina şîran kir bi kurdî nizanibû û pirtûka wî ya yekemîn bi zimanê ermenî hatibû nivîsandin. Lê paşê ew jî ji nû va fêrî zimanê kurdî bû û bi dehan pirtûkên şîran yê hêja çap kirin.

Gava ev nimûne dikevin bîra min ez nikarim wan kurdan efû bikim, wekî îro jî bi zimanê tirkî, erebî, farisî û yê gelên mayîn dinivîsîn û xizmeta ziman û edebiyata wan gelan dikin. Bi bawariya min ev kesana ji rejîmên dagirker ra dibin piştî û asîmîlekirina kurdan hêsantir dikin.

Ji nivîskarên wê nivîşê ji hinekan ra wisa jî li hev nehat kêr û kurtiyê zimên bal



Simoyê Şemo



Mikayêlê Reşî

xwe bidin hildanê. Wan salan tu pêwendiyên nivîskarên me bi edebiyata kurdî ya dervayî Yekîtiya Sovyetê ra tune bûn. Heta destpêka Pêrêstroykayê ji bo gelek ronakbîrên kurd jî, kurdên Yekîtiya Sovyetê û kurdên welatên mayîn hema-hema wek du gelên cihê dihatin dîtin.

Çiqas jî hinek nivîskarên me navên Ehmedê Xanî, Meleyê Cizîrî, Feqiyê Teyran û hinekên mayîn bihîstibûn, lê berhemên wan di destê kesî da tune bûn û kesî ew ne xwendibûn. Nivîskarên wê nivîşê bi edebiyata ermenî dihatin perwerdekirin, piraniya wan bi zimanê ermenî difikirîn. Edebiyata kurdî li Ermenistanê di destpêkê da tam di bin bandora ziman û edebiyata ermeniyana da bû. Gava mirov hinek şîrê wan salan dixwîne, mirova tirê ew ji zimanê ermenî hatine wergerandin.

Şayîrên kurdên Yekîtiya Sovyetê heta dawîya salên 50-emîn kêmtirîn hêja pey xwe hîştine. Çawa piraniya edebiyata Sovyetê ya wan salan berhemên wan jî bi giştî pesnê sîstema sosyalîzmê, partiya Komunîst, serokên wê û jiyana "xweş û bextewar" bûn. Ji aliyê mayîn va ew li dijî axan, began, şêxan, dewlemend û adetên kevn bû. Ew edebiyet bi giştî ji pirsên netewî, derd û kulên rojane û hesînên zêndî dûr bû.

Wan salan Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Wezîrê Nadîrî, Ahmedê Mîrazî, Qaçaxê Mirad û çendekên mayîn berhemên xwe, yê şayîrtiyê çap kirine.

Ji salên 30-emîn destpêkirî, heta nîveka salên 60-emîn hinek şayîrên me, yê bi



Eskerê Boyık



Şikoyê Hesen

taybetî ji nivşa mezin awa gotî bi "veçêkirina" folklorê va mijûl dibûn. Wan destan, stran û çîrokên folklorî hildidan û naveroka wan bi hinek guhastin va (wekî problêmên çînayetiye bikin nav) ji nû va bi gotinên xwe dinivîsîn. Eger em poêma Fêrikê Ûsiv "Ûsivê Nebiya" û çend tiştên mayîne ne mezin nav hildin, di vî karê "veçêkirinê" da nivîskarên me bi ser neketin. Ew 'veçêkirinên' wan hatin jibîrkin, lê folklor dîsan wek xwe paqij û zelal ma.

Şîra kurdî li kevnesovyetê salên 30emîn û 40emîn û 50emîn bi kêm û kurtî, bi sistiya xwe va tevayî valahiya ku jiyana kurdên wê herêmê ya edebî da hebû, pir, hindikî tijî kir, kevneşopî, tradîsiyonek ava kir, bû bingeh ji bo şayîrên dûarojê.

Piştî mirina Stalîn çawa di jiyana gelê Sovyetê gişkî da, wisa jî di jiyana kurdên wî welatî da guhastinên mezin bûn. Ji bo geşkirina çanda kurdî hinek gavên hêja hatin avêtin. Ji nû va radîoya kurdî vebû, rojnama "Riya Teze" dîsa dest bi weşana xwe kir, di dibistanên gundên kurdan da dest bi xwendina zimanê kurdî bû. Van guhastina bandora baş ser şîra kurdî jî hîşt. Motîvên nû, reng û awazên nû hatin nav şîra kurdî. Cêrge navên nû derketin meydanê. Hinek ji wan navan ev bûn: Ûsivê Beko, Mîkayêlê Reşîd, Simoyê Şemo, Sihîdê Îbo, Fêrikê Ûsiv, Şikoyê Hesen, Karlênê Çaçanî. Salên 60-emîn Şerefê Eşir, Rizaliyê Reşîd, Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Şemsî, Eskerê Boyık û Tosinê Reşîd jî gihîştene desta şayîrên jorgotî.

Dawiya salên 70-emîn Ezîzê Gerdencerî, Çerkezê Reş, Korda Mad jî ketine nav

refê wan şayîran. Van sala Eliyê Evdirehman ku berî hingê pexşan dinivîsî dest bi nivîsara şîra kir. Selên 80emîn du keçên kurd jî Hinara Tajdîn û Sivêtlana Silêman di almanaxên nivîskarên kurd de şîrên xwe çap kirin, lê wisa jî ji wan ra li hev nehat pirtûkên xwe çap bikin.

Di salên cihê da Mîroyê Esed, Semend Siyabendov û Xelîl Mûradov jî berhemên xwe, yên şayîrtiyê çap kirin, lê wan nivîsandina şîra ji xwe ra nekirin karê herdemî.

Sala 1958an, gava Ebdul Kerîm Qasim Îraq îlan kir çawa komara ereban û kurdan, hinek mafên kurdan yên netewî nas kirin, gazî Mele Mîstefa Barzanî kir, wek bi pêşmergên xwe va vegere welêt, pîrsa kurdan bi teherê kete rojevê. Pêwîstiya naskirina kurdan û problêma wan zêde bû. Eger berî hingê li Lenîngradê û Yêrêvanê çend kes bi pîrsên kurdnasiyê va mijûl dibûn, vê carê li beşa Lenîngradê ye Înstîtûta rojhilatnasiyê kabînetê kurdnasiyê vebû, ku Qanatê Kurdo heta mirina xwe seroketî lê dikir. Li Înstîtûta Ermenistanê ya Rojhilatnasiyê jî bi seroketiya Heciyê Cindî beşa kurdnasiyê vebû. Kom û kesan wisa jî li Moskovayê, Taşkendê, Bakûyê û Tbilîsiyê dest bi lêgerîna pîrsên kurdnasiyê yên cuda-cuda kirin. Ji Başûrî Kurdistanê komek xort hatin, ku li navendên Yekîtiya Sovyetê yê rojhilatnasiyê zanebûnên xwe kûr bikin. Van bûyeran gişka bandûra xwe ser edebiyata kurdên kevnesovyetê hîşt. Lê di jiyana û edebiyata kurdên Sovyetê da sala 1963an dewraneke nû vebû. Havîna wê salê rêjîma Îraqê li dijî gelê kurd dest bi êrişên giran kir. Yekîtiya Sovyetê, ku hingê Nîkîta Xrûşçov serokê wê bû, bi şeweyekî vekirî piştgirtina şoreşa başûrî Kurdistanê kir. Mêdiya Sovyetê cîhekî mezin da pîrsa kurdan. Perda hesinî, ku navbera me û Kurdistanê da hebû, hinekî hat bilind kirin. Navê Barzanî ser zarê her kesî bû, di derheqa wî da stran dihatin sêwirandin, wêneyê wî di malê kurdan da diyar bûn. Bi serî Komela Xwendekarên kurd şîrên Cegerxwîn di nav xelkê da belav bûn.

Wan salan kurdnasên Sovyetê "Mem û Zîna" a Ehmedê Xanî, "Xeyset û edetên kurda" ya Melle Mehmûd Bayazêdî, "Şerefnama" Şeref Xan Bitlîsî û çend berhemên kilasîkên me, yên mayîn bi zimanê rûsî raberî xwendevanan kirin. Van bûyeran pêla hişyarbûna netewî xurt kir, di jiyana kurdan da kurdayetiyê şûna xwe, ya hêja girt. Bê guman edebiyata kurdên Sovyetê jî nikaribû ji van bûyeran dûr bimîne. Têma şorişa Kurdistanê, hisreta welatê bav û kalan di nav edebiyata me da, bi taybetî di şîra kurdî da, ciyê xwe yê hêja girtin.

Van guhastinên têma û naverokê, hunermendî û teherên nivîsarê yê nû dixwestin. Şayîrên me xwestin ji bandûra edebiyatên ermenî û rûsan bi temamî rizgar bibin. Qaçaxê Mirad, Şkoyê Hesên û Fêrikê Ûsiv ber bi şîra klasîk çûn, Mîkayêlê


Reşîd form û teherên şîra Ewrûpî anîn nav edebiyata kurdî. Hinek şayîran xwestin koka xwe di folklorê me ya dewlemend da bibînin û ser binaxa stranên mêtantîyê û evîntîyê şîra aza binivîsin. Lê ji talebextan ra her tiştên nû di hêla şîra kurdî da li kevnesovyetê bi dijwarîke mezin ji xwe ra rê vedikir. Pîr caran ji bo pêşiyê ji tiştên nû bigirin, şerê siyasî davîne şayîran. Ez li vira nimûnekê bînim. Sala 1966an, gava berevoka min a yekemîn ji bo çapê amade bû û divêt beşa nivîskarên kurdan rê bi-dayê ji bo çapê, şayîrekî me got, wekî ez dinivîsim tav, lê nanivîsim tava Sovêtiyê. Ji ber "kêmasî û têberdanên" vî teherî pirtûka min neh salan li weşanxanê "raza".

Li ser rîya şîra kurdî timê jî asêgeh hebûn. Şayîr û rexnegîrekî rûsan yê bi nav û deng Lêv Ozêrov nivîsiye: "Alî mirovên xwe yên talant bikin, yên bê talant wê bi xwe ji xwe re rê bibînin". Ji bo şîra kurdî hema ev yek pêk hat. Bi salan pirtûkên baş nedihatin çapkirinê, li weşanxanê "radizan", lê yên ne hêja hê hubra wan ziha ne dibû, diçûne çapxanê. Hinek kesan zanibûn jî wekî nivîsarên wan kes naxwîne, lê "dinivîsîn", çap dikirin, ji bo pera bistînin. Bê guman ew mafê nivîskar bû ji bo nivîsarê xwe alîkariyê bistîne, lê hinekan çapkirina pirtûkên ne hêja ji xwe ra kiribû rîya pereqazanckirinê.

Heta pirtûkên şayîrên me yên hezkirî, çawan Fêrikê Ûsiv, Şikoyê Hesên, ku hostatiya wan gişka dipejirand, dişan jî bi salan neçapkirî diman.

Şîra kurdî bê xweyî bû. Şayîrekî wek Şikoyê Hesên, ku bi rastî jî dayîna Xwedê pê ra hebû, neçar dima şîrê xwe bifroşe. Ew firotin ne bi têgihîştina şaristanî dibû. Lê şîrê wî pîr arzan jê dikirîn û paşê bi navê xwe (yan çiyê wan ew şîr nivîsîne) ew şîr çap dikirin. Gelo hema yek ji manên xwe kuştina Şikoyê Hesên ev neheqîya dinê nîn bû?

Şayîrekî mîna Fêrikê Ûsiv neçar ma mal û karê xwe (li beşa kurdî, ya radiyoya Yêrêvanê kar dikir) bihêle û here gundê xwe yê li serê çiya mamostatiyê bike. Li her çiya pesnê berhemên wî didan, lê te bidita bi zor, cefakî çawan berhemên wî dihatin çapkirinê û çiqas ji wan heta niha jî hê ne çapkirîne. Lê yên wek Mî-



Fêrikê Ûsiv.

royê Esed, wekî ne şayîr bû jî, lê endemê komîta navendî, yê Partiya Komunîst ya Ermenistanê, endemê parlamenta Ermenistanê bû, lema jî çi dinivîst dest xwe da çap dikirin. Xema tu kesî nîn bû, wekî wan pirtûkên wî tu kes naxwîne.

Ji nîveka salên 60emîn rast e pêşî li edebiyata kurdî bi tam nehat girtin, lê çiqas çû firsenda çapkirinê kêr bû, ew jî gava salên 60-emîn û 70-emîn jimara nivîskaran û berhemên baş zêde bûn.


Heta van salên dawiyê jî Ermenistan yek ji ocaxên çanda kurdî bû, di wê ocaxê da edebiyata kurdî jî wek îmkanên hebûyî pêş va diçû. Lê îro pir tişt hatine guhas-tin. Nivîskarên me kî bi xwe xwe kuşt, kî kuştin, kî bi rehma Xwedê mir, kî bû pe-neber û îro ew ocax, bi taybetî ji bo edebiyatê êdî ne maye. Bê guman çend kes hê jî li Ermenistanê mane, di nav çend salan da dibe pirtûkekê, dudan jî çap bikin, lê ev êdî ew nîne. Tişteki xemgîniyê jî ew e ku di nav van panzdeh, bîst salên dawiyê da şairên nû yên ku bi berhemên hêja bêne meydane me nedîtîn.

Piştî têkçûna Yekîtiya Sovyetê di nav kurdên kevnesovyetê da teherok bêhêvîtiyê ciyê xwe girt, paşeroj bi dûman û aloz bû. Vê rewşa nediyar bandûra xwe ser şîra kurdî jî hîşt.

Ji talebextan ra heta îro jî di dereca nixandina şîra kurdên kevnesovyetê da, rastiye, objektîviyê cîhê xwe negirtiye, heta niha jî xwendevanên me yên dervayî Yekî-tiya Sovyetê berê bi tam poyêziya kurdên kevnesovyetê ra ne nasin. Çend berhe-mên çapbûyî dêmê wê poyêziyayê rast naynin ber çavan. Eger em hinek kêr û kurtiyên zimên ji nav hildin (peyvên erebî û tirkî pirin) di wê poyêziyayê da gelek navên hêja hene.

Bê guman îro ew firsend tune (lê xwezil hebûya) berevokên şayîrên me, yên baş gişka çap bikin, lê divê qet na antolojiyêke şîra kurdên kevnesovyetê bê çapkirinê. Ew antolojiya jî ji aliyê mirovên zane da bê amadekirin, ku dêmê şîra kurdên kevnesovyetê rast bîne ber çavan û nimûnên rastî hêja hilgire nav xwe. □

## Ger tu neçûya



Me ê stran bigotina dîsa  
Yên ku bangê rojên xweş dikirin  
Em ê li ser fîlozofiya  
”Xweş”ikbûnê bipeyivyana  
Û dîroka îşan bixwenda bi hev re  
Ger tu neçûya...

Ger tu neçûya  
Em ê li ser ferqa  
reş û tariyê  
spî û ronahiyê  
mijûl bibûna.

Ger tu neçûya  
Me ê pirsên nepirsî bipirsiya  
weke nimûne  
”Kê biriye navêka mirovayetiye?”  
Başiyê an xerabiyê?  
An herdu bi hev re?  
An jî  
”Xwedayê baş û xerabiyê yek e?”  
An herkes Xwedayê xwe ye?

Ger tu neçûya  
Em ê li ser qetlîfama stranan  
Gulebarandina helbestan  
Li ser pêxemberên derewîn  
Polîtîkaya gemaî  
Şaîrên naylon  
Û li ser qatîlên rojên xweş  
mijûl bibûna  
Ger tu neçûya...

**CAN GULŞENOGLU**



# Serdana Laçînê, Paytexta Kurdistanana Sor

SILÊMAN ALÎ

Şerê ermen û azeran (kurdên Sovyeta berê ji wan re dibêjin: file û ecem) li ser Karabaxê bû. Karabax jî erdekî çiyayî di nav sînorê dewleta Azerbeycanê de ye. Pîraniya xelkên Karabaxê ermen in lê sînorê wê nagihê Ermenistanê. Di navbera wan de korîdoreke teng heye, kesên ne file lê dimînin. Ew korîdor beşek ji wî erdî ye, ku ji sala 1923an heya 1930 Kurdistanana Sor bûye. Paytexta wê otonomiyê, Laçîn eyn di wê korîdora teng de dikeve. Ji bilî êrdima Laçînê axa çar êrdimên mayî jî: Kelbecar, Zengîlan; Cebrayîl û Qubetlî, di nav çarçeva Kurdistanana Sor de bûn.

Gulana 1992an ermenan bajarê Laçînê ji destê azeran girtin. Ev yek bû behane, ku dîsa bi xurtî behsa kurdan bibe. Hat gotin, ku Xwedê giravî kurdan ew erd ji destê azeran girtine û rê ji karwanên Ermenistanê re vekirine da alîkariyê bighînin Karabaxa heya wê çaxê xelekîrî bû û hat gotin, ku kurd dixwazin otonomiya xwe ya hilatî Kurdistanana Sor dîsa vejînin. Ev nûçe hemî ji devê çapemeniya ermenî derdiketin. Ji bo rastiya pirsê were eşkerekirin û koka wê derkeve, rojnama rûsî ya heftane ya navdar - Nûçeyên Moskoyê, xwediyê van xêzana şand ciyê cî.

Hîna di balafirê de min hewil da ji rêwîyan tişteki fêhm bikim, lê tu înfomasiyoneke taybetî ya bi qîmet ne hat gotin. Li paytexta Ermenistanê, Êrîvanê (kurdên me jê re dibêjin Rewan), piştî xeberdana bi kurdên cî re min fêhm kir, ku înfomasiyona wan jî tenê ji jêderên ragehandina ermenan e. Parwîr Hayrîkyan, siyasetmend û parlamentarê li Ermenistanê nas, ku ez bi otomobîla xwe gîhandim Laçînê, ji min re eşkere kir: - diyar e tu tifaq di navbera kurdên Laçînê û hukûmeta me de nîne, çimkî gava karwanên me yê alîkariyê di wî bajarî re derbas bûn çûn Stîpanakêrtê (paytexta Karabaxê) kesek ji kurdan nehat pêrgî wan. Hukûmetê jî, tevî ku behsa tevkariya bi kurdên wê derê re dike, hîna heya nuha navê mirovekî nedaye, ku xeberdan yan lihevkerin bi wî re hatibe îmzekirin

Saet 2-ê paş nivê şevê em ji Êrîvanê bi rê ketin. Navrojê ereba Hayrîkyan em gî-

handin ser sînorê resmî yê herdu dewletên şervan. Hîna berî mirov binghê sînor bêhna şer diket guh û bêvil û çavan. Rê ji Gorîsê (bajarê ermena yê li ser sînor) heya Laçînê di nav çiyayên re diçû û ne xweş bû. Nêzîkî saet 13.00 ez gîham armanca xwe. Jê pê ve Hayrîkyan ez danîm û rêya xwe bi aliyê Stêpanakêrtê de berdewam kir. Berî ku bi rê bikeve, wî bi ermenî bi eskeran re xeber da û paşê ji min re wergerand rûsî: - Min tenê tembiya te li wan kir.

Laçîn li ser pala çiyakî bû. Cihekî tevde keskayî bû, lê xikî xalî bû. Ji eskerê ermenî pê ve, kes li ber çavên min ne diket. Gava min nas kir, ku zabitê bersivdar ne hazir e, min xwest fersendê bi kar bînim, li nava bajêr bigerim û çend fotoyan bigrim. Eskerekî naşî bi rateqala min ket û ji min qut nebû, diyar bû tembiya wî dostî bû. Li ser cade û di nav malên bajêr de şopa şewatê û topan xwe ji ber çavan ne di da alî. Gewdên terş û dewarên kuştî li ser cadan ramedandîbûn. Tê fêmkirin ku xelkê berî hîştina ciyê xwe, dewarê, ku wan nikarîbûn tevî xwe rakirana, kuştine da tu kes xêrê jê nebîne.

Li cadeke bajêr ez çav li hinek mirovên sîvil ketim, kamyon li ber malekê sekîandine û tişt-miştan davêjênê, mîna ku bar dîkin. Gumana min a ewil ew bû ku ez li xelkên Laçînê rast hatim. Eskerê ermenî ji min re diyar kir: - Xelkên Karabaxê ne, ev serê çar salan e rebena di xelekê de ne, tiştêkî wan nemaye, lema tîni ji xwe û zarokên xwe re xwarin-marînê dibin. Min li wan - rebenan nerî, ku ne tenê xwarinê dibin, lê bi hûr û girs ve talan dîkin, ji cil û beran, heya text û kursî û dolaban û heya melkes û feraxan. Yawerê min dîsa got: - Ji wan pê ve em nahêlin tu kes nêzîkî van derana bibe. Divê her tişt wek xwe bimîne, ji bo vê yekê em li vir in.

Laçîn bê şer ketibû. Gava şeveqa roja 18ê gulanê pêşîya tabûrên ermenan gîhabû bajêr, yêra xelkê cî êdî ne xwanê bû. Piştî stendina bajarê Şûşe, ermenan topên xwe ji jor de li laçînîyan girêdane û çend rojan xezeba Xwedê bi ser wan barandine heya bajar xalî bûye. Min hewl da çîroka stendina bajêr ji devê zabitê bersivdar bigrim gava hat, lê wî tu hevpeyvîn neda min û ji min xwest ez zûka-zûka wê êrdimê bihêlim û vegerim ciyê ez jê hatime, çimkî - li vê derê jiyana te di xeterê de ye weha ji min re got.

Xelkên Laçînê kî ne? Rast e gelo kurd bûne? Rojnamevan û helbestvanê kurd Tosînê Reşîd lî Rewanê ji min re got: 3 hezar mirov wek kurd li Kurdistana Sor qeydkirî bûn, hezarekî mayî ji xelkên Laçînê xwe wek kurd dizanîn, tevî ku di nîfûsan de ecem bûn. Kurdên wê derê jî hemî wek eceman musulmanê şîyîne, malek wan nemaye, ku jin ne dabe eceman yan ji wan ne biribe.

Rojnamevan Têmurê Xelîl bêtir êşkere xeber da: Kurdên sunnî hîna dema Stalîn, ji sînorên nêzîkî Tîrkîyê hatin rakirin û li Asya Navîn û Kazaxistanê hatin bicî-



Wekil Mistefa di hezîrana 1992an de bû serokwezîrê Komara Kurdî ya Laçînê.

bûye û ermenan xwestin vê yekê ji xwe re bi kar bînin. Ew ji xwe re li bingeheke huqûqî digerîyan ji bo zeftkirina wî erdê ne di nav sînorê dewleta wan de ye û ne miletê wan lê heye. Hîna berî girtina korîdora Laçînê ji destê azeran, wan haziriya xwe ji vê yekê re kiribûn. 13ê gulanê Mîrza Hakopyan, şîretvanê serokê komara Armênyayê, civînek bi Komela Rewşenbîrên Kurd re kiribû û tê de gotibû: - Ev rê (Gorîs Laçîn-Stêpanakêrt) ji me re gelekî girîng e û em ê nêzîk destên xwe deynin ser, çimkî bê vê rêyê Karabax ji destê me diçe û nikare li ber xwe bide. Şîretvanê serok ji civatê xwestibû li wî erdî xwedî derkeve. Li gor pîlana hukmeta Rewanê gerek bû rewşenbîrên kurdan tesîra xwe li ser kurdên Laçînê, Asya Navîn û Kazaxistanê bikirana, da ew jî bihatana aliyê ermenan û şerê azeran bikirana. Siyasetmendê ermen soza alîkariyê da, heger kurdên derdorên mayî bixwazin vegezin ser erdê Kurdistanê Sor û dewleta xwe ya serbixwe ava bikin.

Ermenan cigirê serokê komela Yekbûniyê a kurdên tevaya Sovyêta berê, Wekîlê Misefayêv jî anî bûn Êrîvanê. Mistefayêv siyaseta xwe ji min re weha anî zimên: Em dixwazin dewleteke serbixwe li ser axa Kurdistanê Sor damezrînin. Nuha pêşmerge ji her neh komarên Sovyeta berê, ku kurd lê dijîn, dicivin û berê xwe didin Laçînê da êrdimên din jî rizgar bikin. Li gora xeberdanê, çavê wî lê bû piştî xelasbûna danûstendinê bi berpirsyarên dewleta ermenî re, berê xwe bide Stêpanakêrtê û bi berpirsyarên - dewleta Nagornî Karabax re peymanê dostanî û hevalîkariyê

kirin. Têmuûr da nasîn, ku 50 salî tu danûstandinên kurdên Laçînê bi kurdên komarên sovyetî yên mayîn re nebûn û dengê wan ne dihat bihîstin. Gava Gorbaçov dest bi reformên xwe kiriye, mêrekî bi navê Şamilê Esker, li nav kurdên Azerbeycanê geriyaye, 6 hezar nifûs civandine û şandine Moskoyê ji bo serrastkirina çewtiya qeyda wan. Hukûmata Bakoyê bêbextiya bertilxwarinê kiriye hustuyê Şamilê Esker, ew avêtine zindanê û bi wê dawîya tevgera kurdan li wir anî.

Lê fakte, ku rojekê ji rojan otomomîya kurdan li ser wî erdî he-

deyne.

Mistefayêv armanca xwe reyal didît û baweriya wî bi ermenan xurt bû. Li ser Yekbûnê û serokê wê Mihemedê Babayêv, wî weha digot: - piştî jihevketina Sovyete tevgera me li ser hev nemaye. Komele û rêxistinên me cihê-cihê li ciyê xwe dixebitin. Babayêv naxwaze destê xwe bide filehan û li dijî eceman şer bike, çimkî ew bi xwe li Bakoyê dimîne, jin û bûkên wî jî hemî ecem in.

Gava ez vegeyriyam Moskoyê Babayêv jî li wir bû. Wî bi telefonê ji min re begem kir: Ez ê nehêlim xwîn di navbera me û eceman de birije. Hêza me ji şer re nîne, ne bi eceman re, ne jî bi fillan re.

Piştî belabûna gotara min di Nûçeyên Moskoyê de bi çend rojan, çapemeniyê xebera damezrandina dewleta Kurdistanê gerand. Ez bi têlê bi Mistafayêv re, ku li hotêleke Rewanê rûniştibû peyivîm. Wî ez bi avakirina dewleta kurdî pîroz kirim. Jêderin mayî ji min re çîrok û hawê avakirina dewletê rave kirin. Hukûmeta Rewanê du otobûs kirin bin xizmeta vê armancê. Wan herdu otobûsan qedera 60 mêrên kurd, def û zurne bi wan re birin Laçînê. Delegasiyonê du-sê saetên xwe bi kêf û muzîk li wir qedandin, ala rengîn hildan û serokê komarê hilibjartin (Mistefayêv bû) û ji bîr nekirin wezîran jî bi nav bikin. Paşê ew dîsa li otobûsên xwe siwar hatin, bi kêf û eşq, berên xwe dan Rewanê malên xwe û serok jî çû hotêla xwe.

Hilweşîna sîstema sosyalîzmê hestên netewî, ku berê li wan deran ne berçav bûn, şiyar kirin û derxistin ser cadan. Li hemî komarên Sovyeta berê xirecir û konfliktên navnetewî hatin holê. Piraniya miletan dest avêtin çekan û dawa mafên zêdetir kirin. Di vê rewşê de yê li ber nigan çûn kurd bûn. Hîna dawîya salên 80 ermenan dest bi sirgûnkirina kurdên musulman ji cem xwe kirin. Bi kuştina çend kesan û şewitandina hinek malan li vir û li wir, çare ji kurdên musulman re nema ji revê û penaberiyê pê ve. Ew bêxwedî li komarên Sovyeta berê belawela bûn.

Paşê ermenan dest bi xala dudan ji pîlana xwe kirin. Wan çend zilamên xwe di nav êzîdiyan de çêkirin, mîna Şêx Hesên Hesenyân û Ezîzê Emer, rojnamek bi navê Dengê Êzîdîyan û radîo ji wan re vekirin û tê de fikra ku êzîdî ne kurd in belaw kirin. Wê tevgerê kurd ji xwe re dijmin û file dost û meriv didîtin. Kurdên Sovyeta berê miletê bê xwedî bûn, di nav wê rewşa xerab de bûn û berjewendiyên tu hêzê xurtir di wan de nebûn.

Bera ev xebera Têmûrê Xelîl dawîya vê nivîsara min bîne: Heyran, tew lê nepirse! Halê me usa ye wekî em li Rewanê fillan ji xwe re bav û bira dibînin, li Bakûyê jî eceman. □

# Lorandina evînekê û ESLÎKA QADIR



Medenî Ferho ji bo NÛDEMÊ bi Eslîka Qadir re peyivî.

## MEDENÎ FERHO

**B**anga evînekê ku her danê êvarî hemberî rojava weke aleke lorînê ber bi ba dibû. Ji Êrîvanê di nava xeftanê brûskên qolincî de weke hesretekê difûriya. Ji pişt çiyayê Elegezê li her çar parçên Kurdistanê, ku di nava xemgîniyeke dagirkerî de dinalîn bela dibû. Gelo kê, kîjan kurdên ku qolincên lorînê di nava hûnandina laşê wî de dilerizî ne bihîstîye. Gelo kê!. Dengê xwe ne kiriye ne gotiye, dengê radyo bilind bike, bila awaz û qîrêna Welatê me Kurdistan e bi ser gund teva bikeve? Gelo kê bi Gerebêtê Xaço, bi Aramê Tigran, bi Eysel Şan û bi Eslîka Qadir re goti-

nên diljenê ne lorandine, di dawiya stranan de bi dengê melûlî ne tewirandiyê? Eslîka Qadir!.. Xwedan dengê baxî îremî. Di nava evîneke şebçiraxê şebê Kurdistanê. Kezî zera dayika mezin, gerdanxala rûdên gurr û geş, ku bi awazeke melûl, bi lorandineke hesretî, gotinên şebşêrîna azadiyê ji kûraya dilê xwe, di nava helûliya hunerî û delaliya nedîrî şanî de ber bi gewreya renge zuhre de, di nava risteke evînî de diqîriya. Û hîna di telewîzyona kurdî MED-TV Û MEDYA de, bi gotinên meygerî me serxoş û mest dike. Eslîka Qadir, evîna dilên bi kûfra dijmin birîndar in. Gelo kes heye, xwedîya *Welatê me Kurdistan e* nas nake.

Eslîka Qadir, bi her gotinê, bi her awaz û lorandina lelé şekerîstanî ya xwe, ya rastî mirov dike nava evîna Meleyê Cizîrî ku dibêje: dil ji min bir, dil ji min bir. Lewra min xwest, dûrahiya di navbera hunermend û komên xelkê de ku weke sîwaş û fitneyandi navbera me de çêbûye rakim. Di têkiliyê de, mîna Meleyê Cizîrî dibêje Ji têkel (.) nûr tê. Ev nûraniya ku dilgermiya hevbeş ya gelê kurd e, yekem car di radyoya Êrîvanê, bi dengê Eslîka Qadir li her çar parçeyên Kurdistanê, mîna fermangahiya şahî şahanî text bela bû. Min xwest Eslîka Qadir, êşa diljeniya min, ku evîna wê, evîna hûlûlî û lorîna wê basimbara hesretî ye, weke sersotekî li ser keçîka dilê min e, lêbelê di nava derfet û mercên koçberiyê de, nikare deng û awaza xwe, di avakirin û hûnandina hestên neteweya kurdî de bi kar bîne, bi we bidim nas kirin. Ne Eslîka Qadir bi tenê, bi sedan kesên xwedî cewher, di nava bêmecaliyê de hene, nikarin di pêvajoya vê dema nazik de binbariya xwe bînin cih. Dilê van mirovên xwedan cewher, weke kûra pur atêşdilerize. Min xwest ku têkilî bête danîn, têkiliya hunermend û gel ku nûr êdibarîne pêk were.

**Medenî:** *Xanim Eslîk, demeke dirêj e ku min dixwest bi te re, li ser dengbêjiya te ku bi awazeke gûr û geş mirov dipêçe, ber bi germiyeke xweş dibê, biaxivim. Pîrseke klasîkî be jî, em dixwazin fêr bibin, te kengî dest bi stran û muzîkê kir? Ji zarokatî, weke perwerdehiyê, yan ji xortaniyê ku weke hestekî evînî derkete meydanê û tenê dengbêjî ye, herwiha bi heval û hogîran re te dest pê kir, yan bi regekî din?.*

**Eslîk:** Weke her zaroka kurd, muzîka kurdî, dengbêjiya dewlemend ya kurdî ez pêçam. Min stran ji bavê xwe dibihîstin. Bavê min li mal rûdinişt û distarand, em jî li ser çogên xwe rûdinandin û dest bi tewirandina têr hesretî dikir. Ez dikarim bêjim ku gotin û awaza stranên kurdî, hingî ketin nava hûnandina laşê min, weke evînekê, weke parçek ji ya jiyânê bi min re pişkiwî. Ez hingî fêrî stranan bûm. Bêguman ji bo zarokan fêrbûna stranan ku dikaribin di nava heval û hogîrên xwe de bêjin, tişteki gelekî mezin û pesindarî ye. Îcar, dibîstan bû pêgiha ku ez di vî warî de xwe bidim pêş. Ez dikarim bêjim ku bi awayekî amatorî û di dibîstanê de stranbêjiya min dest pê kir.

**Medenî:** *Bavê te, weke mirovekî dengbêj dihate nas kirin, yan, li mal ji xwe re digot?*

**Eslik:** Bavê min ne dengbêj bû. Nivîskarekî mezin yê ermeniyî heye, navê wî Xeçetorebuvyan bû, wî nivîsiye û gotiye: "Her kurdekî ku ji dayika xwe re dibe, dengbêj dibe. Hestekî wan yê xwezayî dengbêjî ye". Bavê min jî tenê li mal digot, dengbêj nebû. Bi rastî dengê wî jî gelekî xweş bû. Mirov dipêça. Pîranî stranên mêranyê digotin. Me jî guhdarî dikir.

**Medenî:** *Bavê te, di civatan de jî stran digotin, yan, dema derdikete çiyê û tenê di-ma, serpêhatî û welatê dîr mayî dihate bîra wî stran digotin?*

**Eslik:** Mala me mîna Kerwansarayê bû. Wargehê rêbûwariyê bû. Di şevên zivistanê yê dirêj de, gundiyan me teva li mala me digihane hev, hingî bavê min ew hunerê xwe derdixiste meydanê û stran digotin. Ne tenê li mala me, gundiyan her şev civata xwe li malekê girêdidan, lê dema lingê gundiyan fêrî malekê bû, riya xwe li wê malê dîtin, her dem li wir bûn. Mala me, yek ji wan malên ku gundî bi bi-wartî ve dihatin, rûdiniştin, çay, qehwe vedixwarin bû. Îcar ne tenê bavê min stran digotin, gelek gundiyan din jî stran digotin. Car caran li hev vedigerandin. Em zarok jî di quncikan de kom dibûn, yan jî li ber kaba bavê xwe, dibin dawa dayika xwe rûdiniştin, bêyî ku em deng derbixin meguhdarî dikir. Kesî ji me zarokan dil ne dikir û newêrabû bikevin nava guftûgoya civatê. Tenê me guhdarî dikir. Ev jî weke dersekê bû ji me re. Mezinan çî digot, di nava mêjiyê me de rûdinişt. Ji biçûkayî, yanî ji zarokatiya me kultura kurdî, çî devkî, çî di jiyane de, ji hêlekê ve stran, ji hêla din ve civat û rengê têkiliyê fêr dibûn. Herwiha stranan bandoreke mezin li min kir û wilo bere bere heskirina min mezin bû, giha radeya dengbêjiyê.

**Medenî:** *Bavê te, qet ji te re got dengê te xweş e, stranan bêje, ka li ser kaba min rûne stranekê bêje, cewherê dilê te gurr û geş kir, tu ber bi vê çendê ajotî?*

**Eslik:** Bavê min bi rastî mirovekî kurdî bû, erê gundî bû, lê mirovekî pêşverû bû. Mirovekî progresif bû, ne ku tenê dixwest ez stranan bêjim, car caran ez li ser kaba xwe rûdinandim, ez fêrî stranên mêranyê dikirim. Niha di reperetuwara min de straneke bavê min jî heye. Ez dibêjim. Ez dixwazim bêjim ku bavê min, em ji bo jiyane amade dikirin. Ne mirovekî teng û xwedî nêrîneke teng bû.

**Medenî:** *Ji bilî bavê te, kesekî din alîkariya te kir, mirovekî ku te ber bi dengbêjiyê, muzîkê biajoyê derket? Di jiyana te ya gund de, ya dibistanê ku tu ji gund durketî û pê de, yan bavê te tenê bû, tu jî li ser wê bingehê rêve çuyî?*

**Eslik:** Belê, ji bilî bavê min, di nava malbata me de xwişka min ya duyem Rexbet, ku ez gelekî jê hez dikim, wê jî nav di min dida û ez ber bi dengbêjiyê diajotim. Ez fêrî stranan jî dikirim. Ew xort bû, di navbera me de gelek sal hebûn, dengê wê gelekî xweş bû. Wê jî kilam digotin. Lê mîna min degel nebû, bê tirs nebû.



Ez jê degltir bûm. Ew hinekî din perçiqî bû. Min di dibîstanê de jî kilam digotin, wê tenê di mal de kilam digotin. Lewra ez di hêla dengbêjiyê de derketim nava civakê, ew ma di mal de.

**Medenî:** *Bi rastî te tiştê anî bîra min. Jina kurd, di nava civakê de çiqasî xwedî roleke mezin be jî, rola xwe bi êrênî bileyize jî, dema hate stran û karê hunerî ku derbekive pêş, weke tolekê ye, li paş dimînin, mêran dîdine pêş. Lê, ez dinêrim ku te mîna xwişkê xwe ne kiriye, te xwe daye pêş, ev hest jî ku tê, çawa dest pê kir?*

**Eslîk:** Ez ne di wê baweriyê de me. Ez wilo dizanim ku jina kurd, hemberî jinên civakên derdorên xwe yên nîfşên wan cuda,

weke jina tirk, jina fersiyan, jina ereban, jina kurd serbest bûye. Di dawet û şahiyên de jina kurd li paş nemaye. Rast e, mirov dikare bêje kê, lê dengê jina kurd her dem hatiye bihîstin. Weke tê bîra min jin di dawetan de, di govendan de dengê bilind kiriye. Nimûna ku di dîlanên de yek dibêje, yek li vedigerîne, jinê rola xwe le-yistiye. Mêran digot, jinan li wan vedigerand, jinan digot, mêran li wan vedigerand. Ez di wê baweriyê de me ku jina kurd ber bi paş ne çûye, her ber bi pêş çûye. Belkî jinên kurd yê bakur wiha bin, nizanîm. Kurdên Sovyeta kevin ne wisa ne. Yanî ez dikarim bêjim ku di êtiketa gelê me de jî heye ku jinên kurd rûwê xwe sergirtî ne kirine, kêlek bi kêlek, pişt bi pişt bi mêrê xwe re meşiya ne. Ne ku tenê di karê rojane de, çûne şer, li hespan jî suwar bûne û di karûbarê jiyânê (her cureyî de) binbariya xwe anîne cih. Jinên kurd, li ser jinên civakên derî xwe dikeniyên. Ji sedema ku mêrên wan nîrxê wan nizanin, têne perçiqandine û ew nikarin rola xwe di civakê de bileyizin. Di êtiketa gelê me de, rola jinê, nîrxê jinê mezin e. Ez dikarim nimûna xesûwa xwe bidim. Jineke mikewn ku malxwêta malê bû, bi nav û deng bû. Karê malê teva di destên wê de bû. Pez, zevî, çandinî, paleyî, tevger, rabûn û rûniştin teva di destên wê de bû. Kurê wê, yanî mêrê min destê dayika xwe paç dikir û li gorî şîret û rêzaniya wê kar dikir. Jineke ku mal di nava mikewniyeke



mezin de tev digerland û derdoran jî wilo dizanî, ew qebl kiribûn. Jin di nava civaka kurd de roleke mezin dileyize. Bi rastî civaka me jî birêzî û nirxekî baş dide jinê. Dibe ku di demên dawî de rengê jiyane hatibe guhertin. Di etîketa gelê me de ev çend heye.

**Medenî:** *Dema ku tu zewicî, eger ji mêrê te, ji xezurê te, yan jî ji xesûwa te ku malxwêrê malê ew bû, tu astengî derketin hemberî te?*

**Eslîk:** Bibexişînin. Weke konkresiyê.

**Medenî:** *Belê.*

**Eslîk:** Naa!. Nikarim bêjim ku asteng derxistin pêşiya min. Lê, ez bêjim ku her kesî cihê xwe dizanibû. Her kes weke kiryar û weke himmeta xwe, weke dengê xwe. Lê na, kes hemberî min derneket. Ku hunermend be jî, di nava civaka me de her kesî cihê xwe dizanî.

**Medenî:** *Dema te dest bi dengbêjiyê kir, li mal, mîna bavê xwe, mîna xwişka xwe, te jî li mal got, yan bi amatorî li pêgîha şanoyan, di şevên dibistanê de te dest pê kir û derketî hemberî civakê?*

**Eslîk:** Naa, naaa!.. Ez dikarim bêjim ku min li mal qet ne strand. Lê di dibistanê de, zu hate bihîstin ku dengên min xweş e. Min jî xwe neda paş û naz ne kir. Deh duwazdeh salî bûm hingî. Dema Sowyetê bû û civînên me yên komsomolê, piyonêrê û hwd. ku bi rewşeke tredisyonel çêdibûn, ez derdiketim ser sahnê û min stran digotin.

**Medenî:** *Basê, dema tu ciwan bûyî te hemberî komên xelkê stran digot in, piştî ku tu zewicî.*

**Eslîk:** Aaaa!. Piştî ez zewicîm. Ev pirseke zor e ji bo min. Piştî ez zewicîm, rastî mêrê min ne hişt ez stranan bêjim. Berî niha min got, rola jinê, ji bo mêr girîng e, lê hin tişt hene ku mêr hej jê nakin, yan jî dil nakin ku di nava civakê de jina wan wî tiştî bike. Mêrê min herçiqasî mirovekî pêşverû bû jî, xwendina wî ya bilind jî hebû, lê hez ne di-



kir ku ez derkevîm sahnê û bistirê. Weke her mêrê kurd kûmreşî dikirin. Herwiha piştî min zanîngeh xelas kir, ez zewicîm, paşê zaro ketin destên min, demekê rawestiyam. Lê berî ku ez bizewicim têkiliya min bi radyoya Êrîvan re hebû. Reper-tuwareke baş ya min di Radyoya Êrîvan de heye, heya niha jî tê bi kar anîn. Piştî zewacê min dev ji vî karê hunerî berda. Yanî di rewşeke ofîsiyal de min dev jê berda. Di dawet û civatan de mêrê min destûra min dida ku ez stranan bêjim. Û min jî digot.

**Medenî:** *Berî ku em bêne ser mijara Radyoya Êrîvan, ez dixwazim bi pîrsim, te kîjan zanîngeh xelas kir, muzîk bû, yan babetekî din bû?*

**Eslîk:** Na, ne muzîk bû. Min zanîngeha dewletê ya Êrîvanê xelas kir. Para şarqê, rojhilat. Ez pisporê zimana ermenî û farisî me. Piştî ku min zanîngeh xelas kir, 25 salan min mamostayî kir. Piştî re li mînistêriya rewşenbîriyê, ku têkiliyê bi dibistanan re weke metodîstî ye, min kar kir. Metodîsta zimanê ermeniyî û edebiyata ermeniyî, me rê û derfet nîşan didane mamostayên ermeniyî ku zarokan fêr bikin, Yanî plansaziya perwerdehiya dibistanan bû karê min.

**Medenî:** *Ji bilî zimanê zikmakî, tu çend zimanan dizane?*

**Eslîk:** Ermenî, rûsî, farisî, darî, almanî.

**Medenî:** *Zimanê Darî, eger ne şaş bim şêweyê farisî ye.*

**Eslîk:** Darî, zimanê Afganîstanê ye. Ji ber ku di sala 1982an de, dema Sowyet hebû, weke pisporê zimanê farisî, ofîsiyal (fermî) ez şandim Afganîstanê. Li wir min 2 salan karê wergera zimanên farisî û darî kir. Darî, zimanekî ku nêzikî zimanê farisî ye. Ez dikarim bêjim ku zaravêkî zimanê farisî ye. Lê zimanekî cuda tê hesibandin. Ez dikarim bêjim ku mirovê bi farisî dizane, wê zimanê darî dizanibe.

**Medenî:** *Herçiqas mijara me ne ziman be jî, dixwazim ku li ser ziman çend pîrsan bikim. Farisî Îranî ye, kurdî jî zimanekî Îranî ye. Her du ziman jî Hindî Ewropî ne, herwiha weke te got zimanê darî û hwd. Gelo têkiliya zimanê kurdî û farisî çi ye?*

**Eslîk:** Em nikarin bêjin ku kurdî Îranî ye. Her çend zimanên ku te hejmartin dikevî nava yek grubî, grubê Hind û Ewropî. Lê em nikarin bêjin ku kurdî Îranî ye.

**Medenî:** *Mebesta min ji Îranê, ne dewleta Îranê ya îro, weke herê, weke nîf.*

**Eslîk:** Ez zimanê kurdan cuda dihesibînim. Zimanekî gelekî dewlemend ku dikare qarîşa zimanê herî pêşketî yê cîhanê bikişîne. Ne tenê bi zaravêkî, bi soranî, goranî, kurmançî, dimilkî, ev teva dewlemendiya zimanê kurdî ne. Gotinên hevbeş bi zimanê farisî re hene, lê du zimanên cuda ne. Eger bête bîra te, gelek huner-mend û wêjevanên me, di hêla pisporiya xwe de xwestine ku ayan bikin, cîhanê haidar bikin, zimanê kurdî dikare qarîşa zimanên herê me teva bikişîne.

**Medenî:** *Te kengî di Radyoya Êrîvan de dets bi stranan kir?*

**Eslîk:** Dema ez ketim zanîngehê, sala 1962 an ku min dibistana lîse xelas kir, wê salê min dest bi xwendina bilind kir. Di navbera avahiya zanîngehê û radyo de 50 metre hebû. Di kêleka hev de bûn. Piştî ders diqediya, ez diçûme radyo, ji bo ku guhdariya dengûbasan bikim, hingî dengûbasên Başûrê Mezin, ku Mele Mistefa Barzanî têkoşîna azadiyê dikir, ji bo min gelekî enteresan bû, min dixwest ku di derbarê kurdan de, di derbarê Kurdistanê de dizanibim çi dibe, çi nabe. Hingî mirovên mîna Egîdê Cimo, ku hunermendekî kurdan gelekî payebilind û hêja ye, herwiha mamostayê min yê muzîkê, ku ez fêrî gelek tiştan kirime li wir kar dikir. Wî dengê min bihîstibû. Gote min, dengekî te pir xweş heye. Van gotinan ez degel kirim. Lê dema di zanîngehê de, ku temenê min 14-15 sal bûn, ez diçûme avahiya piyomera, cihê ku mirov fêrî stranên dikirin. Koro hebû, min di koro de cihê xwe girt, lê di wê avahiyê de, di nava grubê koro de ez fêrî gelek tiştan bûm. Di hêla bikaranîna awaz û gotin û dangan de, fêrî gelek tiştan bûm. Piştî ku di zanîngehê de min xwend, têkiliya min bi radyo re çêbû, Egîdê Cimo dengê min bihîst û got, divê em ji te re stranên amade bikin ku tu bêje. Strana min ya pêşî ku di radyo de got, strana WELATÊ ME KURDISTAN E. Wê demê têkoşîna Mistefa Barzanî gur û geş bû. Me gişt xwe di nava wê têkoşînê de didît û hêviyên mezin bi me re çêdibûn ku wê Kurdistan rizgar bibe, emê biçin li ser xaka Kurdistanê bijîn. Ya bi rastî cihan pê dihesiya ku kurd hene, nifşekî ku mafê wan hatiye bin pê kirin, li Rojhilata Navîn dijîn. Wê demê Barzanî û gelê kurd ku dibin tacîdariya wî de şer dikir, tiştên mezin dikirin. Ez di wê baweriyê de me ku karmendên di Radyoya Êrîvanê de kar dikirin, dixwestin ku bîr û baweriyên kurdîyê, hestê neteweyîbûnê ne mire, her gur û geş bibe. Neteweperweriyê di dilê mirovên kurd de bilind bikin. Dengê radyoya Êrîvanê, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê, Li Rojava, yanî Kurdistanê Iranê dihate bihîstin. Bi wê pêwanê strana Welatê Me Kurdistan e derkete meydanê û min got.

**Medenî:** *Bi rastî me jî li bakur guhdariya Radyoya Êrîvanê dikir. Radyoya Êrîvanê weke pencereyeke ku kurdan xwe têre didît û dengê xwe dihesibandin. Karekî hêja, bi nîrx payebilind bû. Hingî, kê ji kurdan di radyoya Êrîvanê de kar dikir? Ji bilî Egîdê Cimo, rewşenbîr û entellektuelên kurd kî hebûn?*

**Eslîk:** Egîdê Cimo hunermend bû li wir. Serokê radyo, dema ez diçûme wir, Xelîlê Çeçen bû. Lê, li pêşiya Xelîlê Çeçen, Casimê Celîl bû. Xizmeta Xelîlê Çeçen di Radyoya Êrîvanê de gelekî mezin e. Dema serokatiya Xelîlê Çeçen, para muzîka Radyoya Êrîvanê gelekî dewlemend bû. Piştî Xelîlê Çeçen, ez dikarim bêjim ku tiştê nehate kirinê, her tişt hate rawestandî. Bila hevalên din ku keda wan di vî karî de heye, min bibexîşnin, gereke em rastiya bêjin û binêrin, keda Xelîl gelekî mezin bû û çi di Radyoya Êrîvanê de hate çêkirin, di wê demê de çi hate kirin wî

ciwamêrî kir.

**Medenî:** *Kî bûn, kê di di wir de kar dikir?*

**Eslîk:** Casimê Celil hingê jî tê de kar dikir. Memed hebû, bibexişîne navê bavê wî nayê bîra min. Mirovê ku li ser strana Welatê Me Kurdistane gelekî kar kir ew bû. Li ser muzîka wê stranê jî Egîdê Cimo gelekî kar kir. Û me di koro de ev stran got. Encama wê jî niha derdikeve meydanê. Bi vê satranê ez hatim nas kirin. Stranê dengekî mezin derxist û ez navdar bûm. Min jê bi hestekî dilsozî û evîneke mezin got. Egîdê Cimo mehekê seranser, şev û roj li ser meqamê stranê ku bi melûlî derxiste meydanê rawestiya, her ji bo ku gelê kurd bindest e, ku Kurdistan digirî, diêşe, diperçiqe, dianî bîra xwe û dixwest hestê neteweyî berz û hêz bike. Wî çaxî Tîtalê Apo, rêbazê muzîkê, reng da muzîkê, ewî jî gelekî arîkariya me kir. Piştî Tîtalê Apo, Celîla Casim, ez guman dikim niha jî li wir kar dike, arîkariya me kir. Bêguman wê jina hêja karekî gelekî mezin kiriye. Stranên kurdî teva ber hev kirin, bi nota kirin. Lê di radyo de, karekî ber bi çav ne kir. Me ji wan re digot, werin, stranên me, nixê gelê me winda dibin, werin em wan berhev bikin, ne dihatin. Lê di dema dawî de wê stranên derveyî herêma me ber hev kirin û bi nota kirin. Stranên mîna yê Şivan, yê Gulîstan û hwd. not dikirin, Bêguman ev kar jî hêja ye, mezin e. Kes nikare rola Şivan Perwer ku bandoreke mezin li ser ciwanan kir înkâr bike. Guhên me bi stranên wan tejtî kirin. Lê, derî vê çendê, stranên klasîk ku li ber têkçûnê bûn hebûn. Mîna stranên kurdên li Ermenîstanê hebûn, ew ne dihatin gotin, lewra entereza wan kêr dibû, ev jî dibû sedema têkçûna çanda devkî ya kurdî. Yanî dema xwe bi wan stranên winda dikirin, ew mirov ne mirovên ku dema xwe bi karê li meydanê mijul bikin bûn, lêkolîvanên hêja bûn. Ji hêla din ve dengbêjên nû, stranbêjên nû dernedixistin meydanê.

**Medenî:** *Weke ez dizanim, malbata te ji bakurê Kurdistanê, di salên 1914an, yan jî 15an an de koçber bûye. Tu jî niha li Almanya penaberî. Koçberî her bûye para kurdan, ji bo te ku niha tu li koçberiyê dijî, koçberî çi ye?*

**Eslîk:** Ji bo min, koçberî tişteki rezîlî ye. Ji bo min koçberî tişteki ku bi navê kêmasiyê tê bi nav kirin e. Li gorî min ew mirovê ku xwe nas bike, bi nixê xwe dizanibe, tucaran nayê nabe penaber.

**Medenî:** *Eger mecbûr bibin.*

**Eslîk:** Aaaa, ku mecbûr bin, ew tişteki din e. Rastî jî ji mecbûrî em hatine vir. Eger mecbûrî nebûma, ne dihatim. Kurdên Ermenîstanê di rewşeke gelekî perîşanî û wêranî de bûn. Rewşenbîrên me hatin kuştin, zarokên me dibirin eniya Karabaxê û didane pêş. Xortên me ku neyên kuştin, ji bo ku ez kurê xwe winda nekim, ji ber ku pêwîste kurê min ji bo Kurdistanê şer bike, ez hatim Almanya. Tişteki ne xweş e penaberî.



**Medenî:** *Li gorî gotinên te, li pêşiya me kurdan du rê mane. Yek şer e, ya din jî koçberî. Koçberî ji welat dûr bûn e, ne xelasî ye, şer jî mirin e. Tu çi dibêje?*

**Eslik:** Şer, karekî dijwar û mezin e. Lêbelê hêla ku ez li ser radiwestim rewşenbîr in, pêwîst e ku binivîsin, gelekî binivîsin. Kesên ku dikarin û cewherê hunerî di wan de heye, herwiha polîtîkmedarên me, serokê partiyên me, rayedarên din yê partiyên me, pêwîst e ku teva binivîsin. Şer tiştêkî din e. Şer zor e, êş e, wêranî ye. Bêguman kesî welatê xwe bê şer rizgar ne kiriye. Pêwîst e ku şerê kurdan li jor be, gelekî li jor be, qewîn be, bi hêz be, bi deng be. Sedema ku ez dibêjim nivîsandin ev e. Xwedî derketina li şer tune be, kêmasiyên mezin in. Mînaka serîhildanên kurdan yên berê, ji sedema ku nehatine nivîsandin, zanîna derbarê wan de kême û kêmasiya rewşenbîrên kurdan e. Nivîsandin bi şerê çekdarî re, wê bibe hejandina cîhanê. Wê bibe hejandina mêjîyê mirovaniyê. Wekî din, ez dikarim vê bêjim ku eger destdirêjiyên dewletên mezin li pîrsgirêka kurdan nebe, zor e! Ez dibêjim gerek dewletên mezin li ser vê pîrsgirêkê rawestin.

**Medenî:** *Weke ku tê fam kirin, tu li ser tiştêkî amadekariyê dikî, weke kaset, yan jî tiştêkî din, heye li meydane?*

**Eslik:** Niha du kasetên min amade ne. Pîrsgirêk ew e ku derfetên min nînin, kaset derxistin ne hêsa ye, girêdayî diraveyan e. Fînansa min jî nîne, lê saziyeke me ku

li ser raweste hebe, bêguman karekî bi rûmet e.

**Medenî:** *Ji bo weşana wan kasêtan te bi kesî re têkilî ne danîne?*

**Eslîk:** Min bi Akademiya kurdî re têkilî daniye. Lê karûbarê wan ji serê wan zêde ye. Kaset amade ne, tenê wê zêde bikin. Min kaset a xwe amade kir û şande Enstituya Parisê. Kasêteke gelekî baş e, di wê kasête de ney û zirne ku Egîdê Cimo dibêje, yanî muzîka Egîdê û stranbêjiya min heye.

**Medenî:** *Pirseke din ya klasîk. Muzîka kurdî di çi rewşê de ye, îro?*


**Eslîk:** Muzîka kurdî gelekî dewlemend e, weke derya bê binî ye. Ez nikarim bêjim muzîka kurdî di çi rewşê de ye. Ez nikarim bêjim muzîka kurdî di rewşeke baş de ye. Me gelek tişt ne kirine. Niha tê hişê min ku dema ez li Ermenîstanê bûm, weke lêkolînekê bikim, bav û kalên me çi stran kirine, çi gotin rêz kirine, wan teva ber hev bikim. A niha pêwîste ku ev xebat bête kirin. Niha gelek cureyên muzîka kurdî derdikevine meydanê. Bêguman tiştêkî dilxweşî ye. Lê stranên berê li ser bûyer û pêhatiyên civaka kurd in. Ku mirov dêhnê xwe dide stranên kurdî, her stranek bûyer û pêhatiyêke cûda ye. Eger muzîsyanyên me yê hemdemî dikaribin li ser van stranên mêraniyê rawestin, bi rastî dikarin berhemên bê hember yê opera û hwd. derbixin meydanê. Her stranek dîrok e, her stran bûyerek e. Çi evîn, çi pêhatiyên civakî di van stranên de hene. Ez gelek stranên ku dibêjin hemdemî ne na pejiirînim. Li gorî min, muzîka ku bête çekirin, çi rengê muzîkê be, pêwîste ku hestên kurdî têde hebin. Mirovên kurd xwe têde bibîne û bêje ev kurdî ye. Mînakên muzîka cîhanê jî wilo ne, ku mirov li muzîkê guhdarî dike, dizane ya kîjan gelî ye. Muzîk xwe bi nav dike. Di muzîkê de pêwîste motîfên civakê hebin. Lewra dema muzîka rûsî tê gotin mirov fam dike ku rûsî ye, japonî, almanî, fransî û hwd. Ev jî dide xuya kirin ku motîfên hestê civakî muzîkê bi nîrx dike. Muzîsyanyên me jî, pêwîste ku elementên gelê xwe, motîfên hest û civaka xwe têxin nava berhemên xwe. Lewra, ez dibêjim ku muzîka Ciwan Haco, ji hêlekê ve modern e, ji hêla din ve hest û motîfên kurdî di wan de dirijihê. Û bi awayekî profesyonelî çêdike, dewleta wî jî nîne, orkestra wî jî nîne, lê ew bi awayekî profesyonelî gruba xwe sazkar dike û bi qalîte berhemên xwe derdixe meydanê.

**Medenî:** *Te berî niha got ku di her strana kurdî de evîn heye. Ji bo te evîn çi ye?*


**Eslîk:** Evîn. Tiştêkî ku ez nikarim bersiva wê bidim e. Evîn hestê herî bi nîrx ku mirovan dipêçe ye. Tê de hezjêkirina mirovan, axê heye. Ka tiştêkî ji vê xweştir? Di evînê de tiştê xerab, wêraniyê nînin. Ji ber ku pirseke global e, mirov nikare bi gotinekê, diduwan bîne ziman. Pêwîste ku mirov dûr û dirêj li ser rawestê. Tenê ez dikarim bêjim, ez hesûdiyê (kûmreşiyê) ji wan merivan dikim ku bi rastî evîndar in, evîndariyê jîndar dikin. Ji ber ku ew tewan, ew lep û livandin di hestê her mirovî de nîne. □

## Du nameyên Qanatê Kurdo ji Firat Cewerî re

Bêguman, Qanatê Kurdo yek ji zana û entelektuelên kurdan yê bijarte bû.



Ji sala 1983an û heta wefata wî me carinan ji hev re name dişandin. Bi hinceta vê hejmara raybetî ya di derbarê kurdên kevnesoyetê de, min di arşîva xwe de du nameyên Q. Kurdo dîtî. Ev herdu name di salên 1983 û 84an de hatine şandin.



Heval û hevkarê delal, Fîrat Cewerî  
Min pertokên te şandî bûn, standin. Şêr û helbestên te bi m  
min xweş hatin, te bo biçûkên kurdan rind nîvîsiyê, bi  
xwandina herdu pertokên te "Dê şîrîne" û "Mezin dibim"  
nişan dîke, ku şêrbêj û helbestbêjêkî başî, rind dî-  
kari binivîsi.

Ez bi dil û can ji tera dî wê riya tîda, di îşê te  
hezkirîda, <sup>dixwezim te</sup> hergav û nêrdem serfenaz û serbest û pêşrêv bi  
bo xatirê ronak kirîna biçûkên kurd, bu terbyet kirîna  
wan, ku paşewîyê şûraşger û pêşrêvê netevyê kurd bin.

Li vîra, li cem min pertokên kurdi, yê li Ermenistanê  
çap dikin, kêmîn, çiqas ji minra dişînin, ez ji ji heval  
anra dişînim dervea. Eger paşê ji minra şandin, ezê ji  
tera bi rê kim.

Li Stokholmê pertoka min "tarîxa edebiyeta kurdi" çap bûye,  
tu li Svêdê dikari wê ji xwera dast xi.  
Eger dixwezi, ezê ji tera ferhenga Kurdi - rûsi ya sorani  
bikirim, bi rê kim, dibe ew niha Li Maskvaşe hebe, ezê  
herim, bikirim.

Bi kerema xwe ji minra çend gîliya binivise, tu xelqê  
kiderêyi, te li kiderê xwendîye, li Svêdê çî şî dikî,  
xên ji nîvîsandina şêr û helbesta mîla te li ser çî  
heye.

Ez derheqê xweda ji tera nîvîsîm, çimkî bi texmîna min  
tu oaq dîzani serhatîya min, çimkî di kovar û rojnamên  
kurdîda li ser îş û karê min gelek nîvîsîne. Niha sed  
car heyf, ez îda kal bûme, 74 salî derbas bûme. Lê divêt  
bêjim, ku jiyîna min, îş û karê min beqîhewa ne çun, çî  
min kirîye, çimkî ji mîletê minra damînê. Di vê pîrsêda  
ez bentewarîm.

Te bi xatirê te, çanê Kurdo.

267 X-1983



Heval u hevkarê delal,

Ferat Cewari can!

Nama te hat u kete destê min, min xwend u bi min xweş hat. Te nivisiye, ku xortên me niha qedir u qimetê edebetê nizanin. Ew raste, lê wê bere-bere giringiya wê, hêjaya wê zanibin, gunê wan nine, ku ew bi zimanê dayka xwe şirin xwendina xwe ne standine, ne ghiştine. Lê ewê rojekê serwest bibin, xwe bihesin, qedir û qimetê serbêj û helbestbêjên xwe, zanyar u` alimdar`ên xwe zanebin, bi nivisarên wanva fexir û kubar bin, derheqa wanda bêjin u binivisin.


Di jiyina xweda, di iş u kar`ên xweda min pênci sal terxan kirine bo xatirê hişyarbûn u xwe naskirina neteveyê meyi belengaz, bindest, z`êrandi û dabêşkiri, neteveyê me bi pirani haj vi iş û karê mine, lê fersenda wan tune li ser min bi aşkera, bi dil u can nêt u ramana xwe li ser min, li ser pertok û nivisarên min binivisin, yan ji li ciki çap bikin. Dibe, niha ji meriv hene, dixwezin û dibêjin ,ku li welatê Sovête mêrên zana u hêja ji nav xelkê derketine, bo neteveyê kurd xebitine, lê ji wan merivan kê ci kiriye, ci kar u işê wi bi nirxe , kes nizane. Tu dixwezi li ser sê şerên serê ciyan, şêrê kurdan ramanekê binivisi , lê dinivisi : Yek ji wan li Bevedeye, yek li Suriyêye, yek li Sovêteye. Destê te nagihije du kesan ji wan. Tu yê çî li ser wan binivisi. Her bi tenê, bi fikira min, tu dikari jinengariya wan, bi kurteberi li ser iş u karên wan bir, ra u ramana wan binivisi, pertok û nivisarên wan li ser jiyin, hal u kûltûra kurdan binivisi, lê divêt tu bizanbi, ku bona vê yekê nivisarên wan analiz biki, ji hev derxi u` bi jiyin u hal`e kurdên Suriye, Sov`ete, Tirkiye bini ser çavan u berhevîya kirinên wan nişan biki. Ewa işki ne bi hêsaye, dibe tu haj xwe heyi, dikari serpêhati, jinengariya wan binivisi,

biki wek raman, çirokeke mezin. Gotina te raste, bi zimanê kurdi bi pirani şêr u helbest nivisîne, lê çirok gelek u gelek kêr nivisîne, yan ji bi rasti goti bi teze, ji nûva dest pê dikin wana dinivisin. Bêbeb vê ye-ke te merem kiriye dest bi nivisandina wan biki. Ez bi dil u can ji tera di vi işida dixwezim serketin u pêşveçûn, ji tera oxir be, tu serferaz bi di karida.

Te nivisiye, ku ez pêşgotinê bona nivisara te binivisim. Binivisi pertok I20-I30 belgin. Pêvîste tu li ser belgeki (lapereki) naveroka nivisara xwe ji minra binivisi, ku ez karibim ra u ramana xwê binivisim bona pêşgotinê. Binivisarên te yên di kovarên kurdida çap bûne, bi min xweş tîn, zimanê te tê fehmkirine û rinde, Binivise, heta ji te tê, dikari, binivise, xulantiyê ji miletê xwe ra bike.

De bi xatirê te, daxweza dilê min ewe, ku tu u heval u hevkarên te herdem sax u silamet bin, bi serferaz bixebiten.

Qananat'ê Kurdo



Nama te pirozi ya sersale gihiste min, sipas, tu berxudar bi di jiyin u kare xweda serbest u kerkevtin bi.

I3-XII- sala 1984

## Qesîda qedexe

berxikên berdûş,  
zû ji dergûşên xwe dûr ketin  
di çardehsaliyên xwe de  
ji çekên çardeh derb çak hez kirin  
di bîst û çarsaliyên xwe de  
– hê tayekî spî neketibû porê wan–  
mal şûr,  
talde cercûr,  
milk şikeft  
û gor şikart hilibjartin  
birayên min wisa xweşik mirin,  
wisa tahmstran mirin  
hûn bibînin  
hûn dê ji kêfan bimirin...

heman ferxik,  
di azmûna şerê qiloçan de xwe selmandin  
bûbûn beran  
mîmarên baranan  
gorên wan hatin vedan li navenda ewran  
simbêlê min îdam dibû,  
devê min tije vîyolîn  
lawijên bi qasî şêraniya mewijên babîlan min dinehwirand  
firmêskan esman dimeyand  
fêris û firêz  
bi min re diîskiyan  
qebîleyên qulingan,  
li ser serê min seansên firê dikirin  
qîdûm nedima ku serê xwe hildim  
berberoyên reqas stûşikestî dibûn

distewiyan  
mijangên te yên qereçî  
guliyên te yên qarmeçî

qelbê te yê qesra qaçaxçiyani kanî?...

kanî...  
m i ç i q î n

çavên te, mexzenên şeraba sor  
nêrîn bi nêrîn vedixwim  
serxweş im  
qera min, qemera min, qedera min  
tu nizanî  
bi kabên kongên zarokên min bi qumarê dileyizin  
wechê xwe bi gîsinên cot biqelêsim bê feyde ye  
ezbenî zebanî  
tu jî nizanî,  
gunehê min  
heta gorê hezkirin  
katedral û camî bûne cangorî  
rûpişkîrî ye pira selatê bi ya mala badê  
şeytan şehîd ketiye  
poem pelixî ye  
di bin simên hespên pêxwas de  
pêtal diperitin di tariyê de  
rajena min erdhêj hildavê  
teqez terikandinek li pey e  
giliyên xwe li gulleyan dikim  
diya diyalogan delalê  
wext e  
keserên xwe yên te kesidandiye bibêje  
penguen li peravan baskvekirî  
duayên avê li ser min dixwînin  
ji micewherên mihacir gora beranan ava dikin

yara, li ser pûrta sînga min diçêriya  
sûsika nazenîn,  
êdî deyne kokteyla xwe ya kulîlkan  
wext e  
ji berxikên berdûş re  
qesîdeyêke qedexe,  
ji piyanoyên miqedes lêdikeve  
hemû ba bimbekirî ne  
balinde kespik in bi eniya bilûran ve  
û her ku navê hestê keser be,  
şûrê me, jê re serberjêr e  
lewre, bêrî di navbera min û te de bedew e...

**RÊNAS JIYAN**



## Dil bû mecnûnê kezebê

HÊVÎDARZANA

Dibarînin careke din bombeyên xwe. Belkî ev be roja qiyametê. Berî çend salan min ji dayîka xwe bihîstibû ku qiyamet di rojên wiha de çêdibe. Wê demê min gotibû: "Eger roja qiyametê were, ezê xwe di binê lihêfê de veşêrim..."

Lihêfa min tune ye. Ev çend salin min xewa di binê lihêfê de ji bîr kiriye. Dema berf dibare, bahoz radibe û ez bê agir dimînim, lihêfa min tê bîra min. Lê ez niha ji germa difetisim. Min di vê şikeftê de xwe ji ber roja qiyametê veşartîye, li derve agir bi ser bexçeyê gulên min de dibare. Xwezî guhên min ev deng nebihîstibana, piştî ku ez ji şikeftê derketibama bila sipîka çavên min birijîya û min belengaziya bexçeyê xwe nedîtiba..!

Tebîet ji sibehê ve pê hesiya bû ku ewê îro qiyamet rabe. Wê gelek rojên qiyametê dîtibûn, heya niha jî termê gelek dar û berên wê li erdê ne.

Serê sibehê ez bi jora çiyê ketim û li gel strana "Dor Kanyokê bi Nefel e..." min dest bi komkirina daran kir. Weke her rojê xuşînî bi pelan neket, qebe qeba kewan nehat guhê min, ba nediliviya û daran serê xwe berdabûn ber xwe. Min di dilê xwe de got: "Hebe tune be, ez îro berî her kesî hişyar bûme..."

Min çaydanê xwe yê reş hilda û ez çûme ser kaniyê. Ew kaniya ku her roj bi ken û hêle hêl diherikî, îro weke hêstirên çavan bi melûlî dihate xwarê. Min bi zorê çaydanê xwe tijî kir û ez vegeriyam. Tebîet di şînê de bû, lê min tu mane nedayê. Kesekî ji me bivir li new-

qa tu daran nedabû, me gul û sosin û nêrgiz jî nequrmiçandibûn, çi derdê wê hebû ku îro bi derketina rojê û ezmanê weke Gola Wanê şîn û paqij, ne şa bû?! Min fêhm nekir.

Dema min agir vêxist, ji bo çêkirina çaya sibehê, sioriyê ku her roj dihate ser dara li kêleka min û dikire wîze wîz, ne diyar bû. Ew her roj di wê kêliyê de dihate civanê min, xwe ji ser şaxekî diavêre ser yê din, bi hezar rengê balkişandinê bala min dikişande ser xwe, dihişt ku çaya min bifûre û dûman ji agirê min derkeve. Wî dizanibû dûmana êgir çiqasî tehlûkeyeke mezin e, ji bo me her duyan. Lê ew vê sibehê ne hatibû civanê min. Vê sibehê dengê sewalên zozanên jorîn jî nedihatî bihîstin. Min çavê xwe gerand, lê min pêjna şivanan jî nekir. Weke ku her kesî hev agahdar kiribin û cih û warê xwe berdabin.

Balafirên keşfê ji sibehê ve cot bi cot li derdora herêmê dizivirîn. Lê ev êdî perçeyek ji jiyana me ya rojane bû, ne tişteki awarte bû. Ji xwe hîna bîst rojên me li vê kampê çênebûne. "Ne mumkîne ku cihê me hatibe keşifkirin...", me di navbera xwe de digot.

Piştî taştê, ji nîzamiya kampê notek hat. Min vekir, bi lez xwend û ez di ber xwe de beşîm. Dilê min ku ji ber bêdengiya tebîetê xemgîn bûbû, bi wê xeberê geş bû. Ma wê çawa geş nebe?! Ji paytexta welêt, ji Amedê jineke Kurd serê xwe rakiriyê û daye pey şopa lawê

xwe û di başurê Kurdistanê re derketiye, belê dayîkek bûye mêvana me. Pêwîst e ez biçim wê bînim kampa hevayî jî. Ji aliyekî ve ez naxwazim bawer bikim û ji xwe re dibêjim: "Ne ji Hewlêr û Silêmaniyê ku gelekî nêzîkî me ne, lê ta ji Amedê jineke Kurd, heya van deran çawa hetîye..!" Li aliyê din jî ji bo ku mêvana me min paqij û şidiyayî bibîne, min porê xwe bi kulmek av şil kir û baş şeh kir. Min bîst metro şûtika xwe vekir û careke din baş şidand. Min rextê xwe jî li ser şûtikê girêda, çeka xwe ya rûsî avêre ser milê xwe û berê xwe da nîzamiyê.

Di navbera kampa me û nîzamiyê de nîv saetek hebû. Ji kêfa re min ew nîv saet kir panzde deqîqe û ez gihîştim nîzamiyê. Min bixêrhatina yadê kir, destê wê ramûsand, wê jî enî û her du çavên min ramûsandin û got: "Qîza min, xwezî min dayîka te bidîta û jê re bigota ku min keça te dîtiye û ew ramûsandiye. Belkî hinekî dilê wê rihet bûba..." Min got: "Hema tu dayîka min û ez jî qîza te, bawer bike weke ku min dayîka xwe dîtibe, ez gelekî kêfxweş im..." Destê xwe da ser milê min, keserek kişand û got: "Erê qîza min. Hûn tev wiha dibêjin, lê heya ku dayîk kezêba xwe bi çavên xwe nebîne dilê wê hênîk nabe. Binêre, min taaa ji Amedê daye rê û bi pey kezêba şewitî ketime, di van deran re derketime. Ji min re gotin lawê te, toxtorê te li kampa başur e, lê xuya-

ye ku bejinziravê min ne li vir e. Ez çi bikim rebena xwedê! Ezê çend rojan li cem we bibim mêvan, belkî ez xeberekê jê bistînim. Min xeberek jê nestand jî ezê vegerim malê. Berxê min toxtorî dixwend, zanebûna wî weke ya alimekî bû, derya bû maşallah! Porê xwe li aliyekî şeh dikir, riha xwe her sibeh kur dikir, bedlekî reş li xwe dikir, qerewata xwe ya sor û bi gulên spî girêdida û diçû zanîngêhê. Keçên Amedê tev dil ketibûn toxtorê min, lê dilê wî jî ketibû welat, heya ku di van çiyên re derket. Ev sê sal in min tu xeber jê negirtiye, ez bi qurbane we bim, min destvala venegegrînin, ez di dora serê we re bigerim, de ka ji min re bibêjin toxtorê min sax e lê mirî ye...”

Dilê me hebû em suhbeta xwe dirêj bikin, lê vê carê jî noteke biçûk ji qerargêhê hat. Min bi heyecan pusula vekir û xwend. Fermandarê kampê yê giştî Luqman wiha nivîsandibû: ”Mêvana me nebe kampa hevalên jin, wê bîne qerargêhê û li cem wê bimîne, heya ku vedigere. Eger hûn di demeke kin de xwe bigihînin qerargêhê wê baş be. Hişyar bin! Balafirên keşfê îro gelekî diçin û tên...”

Min çenteyê yadê rakir, bi destekî wê girt û me berê xwe da qerargêhê. Pêwîst bû em ber bi jor ve biçûna, lê yadê ji bo meşeke wiha ne amade bû. Her deh gavan carekê em disekinîn, dayîka pîr bêhna xwe vedikir, pişt re me dîsa meşa

xwe berdewam dikir.

Yadê di navbera pêncî û pênc û şêst salî de bû. Navê wê Besê bû. Piştî wê xûz bûbû, serçavên wê tev qermiçî bûn. Her xetêke eniya wê şahidê dîrokekê bû. Dilê wê jî zeîf bûbû û mîna berê alîkariya wê nedikir. Lê xuya bû ku derdê kezêbê dabû ser her tiştî û yadê bi çol û çiyên xistibû.

Balafirên li ser serê me bala wê jî kişandin, got: ”Ev pilotên bêbav me nebînin qîza min! Ma ev balafirên kîjan dewletê ne?” Min got: ”Balafirên tirkên in yadê. Her roj wiha di ser serê me re difirin, herêmê keşif dikin, li cih û warê me digerin. Dema ku dibînin jî, hemû bombeyên xwe davêjin. Piraniya caran jî nikarin tu zerarê bigihînin me. Cihê me bi ewlekarî ye. Çiya û şikeftên me dikarin me baş biparêzin. Lê ez li ber van dar û beran dikevin, daristanan dişewitînin. Eger ku ne ji vê şînkayiyê be, wê ba, av û jiyên li van deran nemîne...” Yadê bi bêhneke çikiyayî li min guhdarî kir û got: ”De bila hûn sax bin û em derdê we nebînin, wê dar û devî careke din şîr bibin qîza min. Ma vî welatî hindik şer dîtine! Ma ev dar û devî careke tenê hatine şewitandin! Wê şîr bibin, bila yadê bi qurbana we be, wê şîr bibin...” Dema ku dayîka Besê diaxift, çavên min çûn ser termên darên li erdê. Ev herêm di dema şerê Îraq û Îranê de hatibû bombekirin, lê hîna li şûna wan darên mirî, yê nû şîr nebû-



bûn. Wê zû bi zû şîn nebin jî. Êdî barûd ketibû rehê wan. Ax ne mîna berê bi bereket bû.

Şikefta qerargêhê di quntara çiyayekî bilind de bû. Hûn ya rast bixwazin ew bi xwe şikefteke biçûk bû, lê hevalan ew bi dînamîtan mezin kiribûn. Dînamît têde teqandibûn, tehtên wê ji hev perçe kiribûn û avêtibûne derve. Bi vî awahî şikefteke ku deh kes bikaribin têde bimînin çêkiribûn. Hejmara hevalên ku li wê derê diman pênc bûn. Niha wê her pênc heval ji xwe re şikefteke din bibînin û wê şikefta qerargêhê ji min û yadê re bihêlin. Hevalan devê şikeftê bi çîwalên tijî axê teng kiribûn, ji bo ku perçeyên bombeyan zerarê negihînin tu kesî. Li kampa hevalên jin jî bi vî awahî me ji xwe re şikeft çêkiribûn.

Fermandarê giştî Luqman, li devê şikeftê li benda me bû. Dema me nêzikî lê kir, hate pêşiya me û bixêrhatina yadê kir, destê wê ramûsand. Me silav li hev da, destê hev guvaşt û em derbasî hundirê şikeftê bûn. Şikefta yadê hatibû amadekirin. Çend çîwalên êrd bi hev ve dirûtibûn û li erdê raxistibûn, metereyeke avê û qedeheke naylonî danîbûne ser. Ji cem hevalên birîndar betaniyek jî ji yadê re peyda kiribûn. Beramberî germa li derve, hundirê şikeftê gelekî hênîk bû.

Em rûniştin. Min qedehek av da destê yadê. Ava xwe vexwar, bêhna wê hate ber û dest bi çîroka xwe kir. Ji Luqman

xwest ku ew xeberekê ji lawê wê bîne. Gelek kesên nêzikî partiyê jê re gotibûn ku lawê wê li kampa başûr e. Wê jî bi vî temenê xwe, her zorî dabû ber çavê xwe û hatibû. Her tiştê ku berê ji min re gotibû, careke din ji Luqman re jî dubare kir. Fermandar Luqman wiha jê re got: "Ez toxtor Filît baş nas dikim, ew di nava gerîla de jî toxtoriyê dike. Lê mixabin ne li vê kampê ye. Dîsa jî xwe aciz neke, bêtelên me hene û em dikarin ji her derê bipirsîn, ka ew niha li kîjan herêmê ye, û di çi rewşê de ye. Wê heval li ser rewşa wî me agahdar bikin. Eger ku em bizanibin ew li kuderê ye, emê jê bixwazin ku were ser bêtelê û bi te re biaxife. Heya ku em xeberekê ji wî distînin jî, wê tu mêvana me bî..."

Xemgîniya li ser çavên dayika Besê ya sê salan xwe ji hêviyê re hîşt û wenda bû. Xetên li ser eniya wê nerm bûn, hinekî di ber xwe de beşîşî. Bû weke dayikeke ku piştî êşa welidandinê zaroka xwe di hembêza xwe de bibîne û tevayî êşê ji bîr bike. Yadê deh salan ciwan bû.

Luqman, ez û yadê bi tenê hîştin û çû ser bêtelê.

Dema firavînê bû. Min dizanibû ku yadê gelekî westiyaye û piştî hêviya ku kete dilê wê dixwaze bi lez gezek nan bixwe û serê xwe deyne, hinekî vehese. Min got: "Yadê, ezê biçim firavînê bînim, wê tu bi tenê bimînî, eger balafirran dest bi bombardûmanê kirin, ji şikeftê dernekeve, ev der bi ewlekarî ye. Ji

bîr neke bila devê te vekirî be, eger ku tu devê xwe venekî wê guhên te ji dengê bombeyan biteqin..." Yadê bi balkêşî li min guhdarî kir û got: "Ez ji cihê xwe nalivim qîza min, ma ezê çî bikim rebe-na Xwedê... Ez jî weke we tevan, ma canê min ji yê we şêrîntir e! Bila ez bi qurbane rihê we bim... Bela xwedê li wankeve îşallah..."

Ezê xwarinê ji metbaxa hevalên xort bînim. Her roj çar heval ji bo çêkirina xwarinê têne wezîfedarkirin. Di qazanên mezin de xwarin ji bo sêsed-çarsed hevalî tê amadekirin. Her grup beroşa xwe dibe, hejmara gruba xwe dibêje û li gorî wê hejmarê xwarinê distîne. Ez jî ketim dorê. Hevalên ku wê rojê aşvan bûn xwarina germ çenekiribûn. Nan û helaw belav dikirin. Dema ku dor gihîşt-te min ji min re gotin: "Hevala Hêvî-dar, balafir îro gelekî diçin û tîn, me ji ber vê yekê agir daneda û xwarina germ çenekir. Em nan û helawê belav dikin. Lê belê me bihîst ku dayîka hevalekî ji Amedê hatiye, me hevalek şande gundê herî nêzîk, me ji wê re firengî, îsot û bacanên reş anîn. Me ji bo yadê tîrşîk û savar çêkiriye..."

Min weke her roj hesabê xwarineke bi tenê kiribû. Hevalan tîrşîk xistin satileke biçûk, savar xistin beroşa min û du nanên sêlê jî danîne ser savarê. Min bi kêfxweşî berê xwe da şikeftê. "Wê yadê bibîne em li serê van çiyaran savar û tîrşîkê jî çêdikin. Belkî ji bo yadê ev xwari-

neke rojane û feqîr be, lê li vê derê...!" min bi kêfxweşî di dilê xwe de got.

Ez gihîştin şikeftê. Yadê betaniya xwe ji xwe re kiribû balîf. Destekî xwe xistibû bin serê xwe û ketibû xeweke şêrîn. Min nexwest ez wê hişyar bikim, lê min dizanibû ew birçî ye. Ji sibehê ve tişteke nexwaribû. Min mersêfa ku hevalan ji bo yadê anîbûn şikeftê paqij şûşt û savar xiste hundirê wê. Firaxeke din tune bû ku ez tîrşîkê têximê, ji ber vê yekê tîrşîk di satila biçûk de ma. Min du kevçî jî baş şûştin û ji bo yadê danîn kêleka mersêfê. Min xwest ez bibêjim "yadê rabe xwarinê bixwe, berî ku sar bibe..." lê gotin di devê min de ma. Ez çî bibînim! Ez û yadê ji nişkê ve û bi carekê de her du bilind bûn û li erdê ketin. Min bi destê yadê girt û ew kişande da-wiya şikeftê. Weke ku xewnek dîtibe yadê veciniqî, heya wê kêliyê jî nizanibû çî bi me hat. Min got: "Tişteke nabe yadê, tirkan dest bi bombardûmanê kirin, cihê kampê keşif kirine, wê çil û pênc deqîqeyan yan jî saetekê bidomîne, lê di vê şikeftê de fûze jî bibarin wê tişteke bi me neyê..."

Di dema bombardûmanên kampan de artêşa tirk jetan bi kar tîne. Ew dizanin ku kampên me li hemberî êrîşên hewayî bi tedbîr in. Doçkayên me nahêlin ku ew hedefên xwe bibînin. Raket û BKC jî ji bo helîkopteran amade ne. Ji xwe cihê ku ev çekên giran lê peyda dibin, helîkopter nikarin tevî bomardû-

manê bibin. Ew nêzik dibin û bi piranî wezîfeya koordînekirin û kontrolkirinê bi cih tînin.

Vê carê jî tenê dengê jetan tê guhê min. B-7 (rokêt) û her çar doçkayên me jî ketin êrîşê û dengê xwe tevlî dengê bobmeyan kirin.

Dengê yadê bi zorê tê bihîstin. Destên wê di nava destên min de weke pelên çilo diricifin. Ez ditirsim ku dilê wê bisekine. Lê belê wê dest bi selewatan kiriye û dilê xwe ji nava vê qiyametê bi dûr xistiye. Hewara xwe digihîne tevayî şêx û mişayix û ewliyan. Ne şêx Evdilqadirê Gêlanî hîşt, ne jî Xocê Xizir. Xwe avête ber bextê şêx Silêmanê pak û Veysel Qiran... Siltan Şêxmûsê ku gelek jinên kurdûnde kiribûn xwedî zarok, mirov ji bayê fecrê xelas kiribûn, kesên kût meşandibûn, kor bi çav kiribûn, gelac û nebaş rûreş kiribûn... hemû hatine bîra yadê. Hewara xwe gihande dergeha wan şêxan û berxek kire sedeqe.

Şikefta me bi dengêkî ku em ji guh kirin hejîya. Hundir bû toz û dûman. Me her duyan dest bi kuxukeke xerab kir, yadê dikir bifetise, hema ez bi lez rabûm ser xwe û min xwe avête devê şikeftê, ew betaniya ku hevalan bi derî ve daleqandibûn, min bi zorê kişand û avêt. Berî ku bombeya din bigihêje erdê min metereyê avê gihande cem yadê û bi dengêkî hinekî bilind got: "Desmala xwe bide min yadê! Ezê desmalê şil bikim, deyne ser dev û pozê xwe, wê hi-

nekî bêhna te derkeve... Hindik ma wê biçin..."

Piştî ku min betanî ji ber derî avêt, bêhna me hinekî vebû. Qazana dawiyê li ber devê şikeftê ketibû. Gelekî nêzik bû. Weke ku zelzele çêbibe, şikeft xurt hejand. Guhên min û yadê hatibûn girtin, ji ber vê yekê em bi dengêkî bilind diaxifin, me bi zorê dengê hev dibihîst. Lê rewşa me gelekî baş bû. Eger vê kêliyê em li derve bana, yan jî li ser kaniyê bana, wê me mirin bi çavê serê xwe bidîtiba. "Ez bawer dikim karê xwe qedandin yadê" min got. Kuxukê nedihîşt ku yadê biaxife. Min bi destê wê girt û me serê xwe di deriyê şikeftê re derxist. Bêhna barûdê da ser rûyê me. Kaniya avê, ax, dar, gul û sosin... hema hema her tişt di wê kêliyê de bûbû barûd. Ewrekî reş girtibû ser kampê. Ji şûna qazanan dûman bilind dibû. Her tişt di nava bêdengiya mirinê de bû.

Ez li vê derê tişteki bibêjim, dema ku bombardûman dest pê dikin, her kes mecbûre bêtêl û radyoyên xwe bigire, min jî bêtêla di bêrika yêlegê xwe de girtibû. "Bawer dikin ez niha dikarim têkiliyê bi hevalan re deynim û li rewşa kampê bipirsim" min ji xwe re di dilê xwe de got. Berî ku ez li wan bigerim ew li min geriyan. Ji bêtêlê dengê Luqman bilind bû: "Artêşa Sor... Artêşa Sor..!", ji ber ku me kampa xwe ji ya hevalên xort serbixwe ava kiribû û me kumên bi stêrkên sor didan serê xwe,

hevalên xort navê "Artêşa Sor" li me kiribûn. Ev nav di bêtelan de jî weke koda me bikar dihanîn. "Kerem bike, Artêşa Sor guhdar dike" min bersiv da. "Heval, rewşa te û yadê çawa ye? Gelek bombe nêzikî şikefta we ketin, em ditirsiyan ku tiştêk hatibe serê we..." got. "Em baş in heval. Rast e, min jî texmîn kir ku şikefta qerargehê kirine hedef. Eger ne ji parastina doçkayên me bûna, wê şikeft bi ser serê min û yadê de bi-anîna xwarê. Dev û pozê me tijî barûd bû, yadê hîna jî dikuxe. Lê rewşa me ne xerab e, hevalên din çawa ne, haya we ji kampa hevalên jin heye?" min pirs kir. "Du birîndarên Artêşa Sor hene. Giraniya bombardûmanê li ser wê kampê bû. Ez bawer dikim cihê doçkaya wan nas kiribûn û dixwestin birûxînin. Hevalan gelekî li ber xwe dan û xwe ji ser doçkayê nedane aliyekî. Şerîda doçkayê derbe xwaribû, heya ku heval şerîdê diguherînin balafir fersendê dibînin û derbê li wan dixin. Du heval ji lingê xwe ve birîndar bûne. Ji hevalên xort jî yek birîndar e. Şehîdên me tune ne. Me gazî erebê kiriye, emê birîndarên xwe bişînin Hewlêrê... silav, hurmet û serkevtin" Luqman got.

Piştî êrîşên bi vî awahî tu gotin weke gotina "şehîdên me tune ne" bi min xweş nedihat. Dilê min, ji hemû tirs û xofa wendakirina hevalekî yan jî hevalekê dûr diket, ez rihet dibûm, êdî min dizanibû ku ezê bikaribim careke din

hemû hevalên xwe bibînim. Piştî deh deqîqeyên din wê ji bin her keviyekî hevalek derkeve, wê weke moriyan ji serê çiyân bêne xwarê. Emê dest bidin hev û govendeke botanî bigerînin. Wê dengê me li hev vegere, di vê newalê de. Wê hêviya di dilê me de derbasî rehên dar û zeviyên şewitî bibe, wê ji nû ve şînbibin.

Yadê jî pê hesiya ku şehîdên me tune ne, gelekî kêfxweş bû, bêhna wê derket. Serçavê xwe bi dawa kerasê xwe paqij kir û got: "Ma ev çi ferman bû lawo?! Ev çi qiyamet bû?! Min dawîya emrê xwe tiştên nedîtî jî dîtî. Bi Xwedê tev sûcê min bû, heqê min kuştine. Vê sibehê min bi çavên serê xwe ew bêbav dîtî. Lê te digot belkî ez li sûka Amedê dimeşim... Ji xwe ev çarîka spî ya li ser serê min... ma min çima ji serê xwe nekir! Ma ez nizanim, çarîka spî dîtî û cihê me keşif kirin... Xwelî li serê min be lawo... ez bûme sebeba vê qiyamete... lawooo! Min çi dît û çi nedît...!" Min li ber dilê wê da û got: "Ne sûcê te ye yadê. Ji dema ku em hatine vê kampê, dewlet şerê xwe di me dide, her roj tîr herêmê keşif dikin. Ew dizanin ku em li vê derê dimînin. Lê binêre kesek şehîd neket, tenê sê heval bi sivikî birîndar bûne..." Yadê hinekî rihet bû û got: "Şêx û mişayix hatin hewara me qîza min. Xwedê me ji bereketên wan meh-rûm neke..."

Hêdî hêdî deng bi kampê ket. Birîn-

dar bi erebeyekê şandine Hewlêrê. Hinek heval tevlî metereyên xwe yên avê diçûne ser kaniyê-eger ku kanî mabe-, hinekan dest bi govendê kiribûn, hinek jî ji şikeftên tarî derketibûn, qutiyên xwe yên tûtinê danîbûn ber xwe û cixare dipêçandin. Yadê xwest dakeve ser avê, min gazî du hevalên bi metere kir, ji bo ku wê bi xwe re bibin ser kaniyê û careke din vegehrînin. Ew birin, ez jî ketim şikeftê.

Savar û tîrşika me tijî toz û kevirên hûr bûbûn. Ev demeke dirêj bû ku min savar û tîrşik nexwaribû. Lê êdî nedihatete xwarin. Min satila tîrşikê û mersefa savarê berda ser hev û bir rijand. Min betaniya yadê li derve dawêşand û betaniya derf jî careke din bi cihê wê ve da leqand. Careke din min berê xwe da metbaxê.

Metbax her demê cihê komkirina malûmatan bû. Ne bi tenê metbaxa hevalên jin, ya hevalên xort jî wiha bû. Wê kîjan heval di hundirê çend rojan de biçe kîjan herêmê, partiyê kîjan biryarên nû girtine, di êrîşê de kîjan heval çiqasî tirsîya ye, kîjan heval çiqas bi cesaret derketiye...? Bersiva van pirsan hemû di metbaxan de dihate dîtin. Ji ber ku cihê taximan ji hev dûr bûn, her kesî her demê hev nedidît, bi tenê li metbaxê, di dora xwarinê de mirov dikaribû hev bibîne û agahdariyan bibihîse.

Ji ber ku ne dema xwarinê bû, gelek heval li metbaxê kom nebûbûn, lê weke

her demê grupek hebû. Berê xwe dane min, hem bi henekî, hem jî bi hesûdî gotin: "Ma te û yadê we têr tîrşik û savar xwar an na?" Hevalekî din jî got: "Welleh eger min ew tîrşik û savar bixwara, min dikaribû bi serê xwe êrîşê bibim ser qereqolekê..." Gotin ji devê hev girtin û tiştek nema ku li ser savar û tîrşika min û yadê ku me devê xwe jî pê nekiribû negotin. Piştî wê êrîşê pêwîstiya her kesî bi ken û henekan hebû, min got: "Dema ez hatim min xwarin bir, çavên we tevan ketin savar û tîrşikê, bi rê ve ez du caran lukumîm (terpilîm), tu nema ku ez bikevim, lê min savar û tîrşik bi selameti gihande şikeftê. Lê vê carê jî bombardûmanê dest pê kir, savar û tîrşika me jî bû hedefa yekemîn, min her du jî li kêleka şikeftê binerd kirin, serê we sax be...", em têr kenîyan. Piştî re min nan û helaw ji hevalên aşvan xwest û ez vegehrîyam şikeftê.

Min li derve agir dada û çaydanê avê da ser. Me ji sibehê ve çay venexwaribû.

Yadê di navbera du hevalan de hêdî hêdî ber bi jor ve hildikişîya. Min li saetê nêrî, hindik mabû bibe sisê. Me hîna firavîn nexwaribû. Yadê bêhnçikiya yî gihîşte cem min. Her du heval hinekî rûniştin, bi wê re suhbet dikirin, piştî re rabûn çûn. Min careke din mersefa xwarinê danî, lê vê carê nan û helaw bû. Diya Besê weke hevalên li metbaxê neda pey aqîbeta tîrşik û savarê. Me nan û helawa xwe xwar û çay jî bi ser de

vexwar. "Kaniya we ji berê mezintir bû-  
ye qîza min, wan bêbavan bombe kiri-  
ne, şînkayiya derdora wê şewitiye, lê ava  
wê zêdetir bû ye..." yadê got. Ez û ew  
careke din ketine suhbetê. Me bombar-  
dûman ji bîr kir. Vê carê wê ji min re  
qala keçaniya xwe kir. Berî ku ew çîro-  
ka xwe biqedîne, hevalekî xort xwe gi-  
hande cem me û bi heyecan ji min re  
got: "Hevalê Luqman dixwaze te bibî-  
ne, ew li cihê bêtêla mezin e..."

Min hevalê xort li cem yadê hîşt û ez  
çûme şikefta ku bêtêla me lê dima. Min  
silav da û ez derbasî hundir bûm: "We  
xwestiye hûn bi min re biaxifin" min  
got. Luqman bê moral bû. Piştî ku ez  
rûniştim, dest pê kir: "Ez ji bo hevalê  
Filît bi hemû herêman re axifim, ew li  
Heftanînê bû ye, lê berî çar mehan şe-  
hîd ketiye. Ez nizanim em bi çi awahî ji  
yadê re bibêjin..."

Ji kêliya ku min ev xeber bihîst û pişt  
re, êdî min hew dikaribû axaftina Luq-  
man bibihîsim. Ez çûme dinyayeke din.  
Ez nikaribûm bigiriyama jî. Min xwest  
ez wê kêliyê ne di nava şal û şapikan de  
bama, min dixwest keras û keftan li  
min bana, ji bo ku têra dilê xwe bigiri-  
yama. Dilê min bi çol û çiyar ket.  
Çavên min li cihêkî din giriyan, ji bo  
ku min di nava gerîla de şermezar ne-  
kin. Ez di cihê xwe de bûme weke hey-  
kelekî cemidî li Zagrosan.

Heya niha min gelek heval wenda ki-  
ribûn. Hevalên ku me bi hev re ji bero-

şekê xwaribû, ji metereyekê vexwaribû,  
şehîd ketibûn. Dilê min şewitibû, ez bi  
dizî di piştta teht û latan de giriyabûm,  
lê ez nebûbûm heykelekî ji Zagrosan.  
Na, ezê nikaribim vê xeberê bigihînim  
yadê. Piştî ku ez hişyar bûm, min got:  
"Hûn bi yadê re biaxifin heval, baştir e.  
Ez bawer nakim ku bikaribim ji wê re  
bibêjim..."

Luqman dizanibû ku min hêviya di  
çavên yadê de ditiye û naxwazim bi  
çend gotinên sar wê hêviyê tune bikim.  
Rast e, di şer de bûyerên wiha êdî perç-  
eyek ji jiyana rojane ne. Dilê me qebûl  
neke jî, mêjiyê me dikeve dewrê û rasti-  
ya şer tîne bîra me. Lê ne dil, ne jî mêji-  
yê dayîkekê zû bi zû van rastiyan tehl  
napejirîne. Wê yek ji me van rastiyan  
bîne bîra yadê. Lê ez naxwazim ew yek  
jî ez bim.

Luqman qebûl kir ku ew bi yadê re  
biaxife.

Em derketin û me berê xwe da şikefta  
qerargehê. Yadê li derveyî şikeftê rûniş-  
tibû û bi hevalê li kêleka xwe re suhbet  
dikir. Fermanarê giştî Luqman silav  
da û li kêleka wê rûnişt, ez jî li hemberî  
wan rûniştim. Hinekî li ser bombardû-  
manê axifin, axaftin anîne ser rastiya şer  
û pişt re gotin anîne ser şehadetê û rû-  
meta şehîdên Kurdistanê. Li dawiyê jî ji  
yadê re got ku ew niha dayîka şehîdekî  
ye. Behsa axaftina li ser bêtêlê jî kir, lê  
ez bawer nakim ku yadê bihîstibe.

Belê. Dilê yadê bû mecnûnê kezêbê û

bi çolan ket. Bedena wê bû weke mûmyayên Fîrawnên misrî. Çavên wê di hundirê çavên min de cemidîn. Nêrî-nên wê weke kêran li dilê min ketin, û ez di nava deryayên xeyalên wê de fetisîm. Pêlan ez ji hev re avêtim. Kengî Luqman rabû çû, kîjan demê ez li kêleka yadê rûniştim, min kengî destên wê xistin nava destên xwe û hêstirên min tevî hêstirên wê bûn, xebera min jê tune bû, ez bi tişteki nehesiyam.

Ez ketim bin milê wê û min ew bir hundirê şikeftê. Deng ji kevir derket, ji yadê derneket. Bû weke pîreke sed salî, belkî jî pîrtir bûbû. Rabû ser xwe, çenteyê ku bi xwe re anîbû vekir, li pêşiya xwe danî, du taxim cilên binî ku bi xwe re ji Amedê, ji toxtorê xwe re anîbûn, cotek goreyên rîsîn ku bi destên xwe çêkiribûn û bi neqşên hezkirin û hesreta di dilê xwe de ew xemilandibûn, hemû yek bi yek ji çente derxistin, li pêşiya xwe danîn û bi dengêki xemgîn dest pê kir û şîneke ku kevir li hember xwe bi girî dikirin, gerand: "Ez rebena bejna zirav, tiliyên dirêj û simbêlên nûhatî bim lawo... Ez bi qurbana birayê sê

xwişkên bim lawo... Ez rebena rext û fişekan bim lawo... Ez berdîwara ronedi bim lawo... Ezê sibehê rabim berê xwe bidim Diyarbekira şewitî, ezê dinya alemê bi xwe bihesnim, ezê bedil û qerewatên toxtorê xwe tax bi tax bigerinim lawo... De bila ez nemînim, piştî bejna zirav û çavên belek lawo... Egîdo, şêrê sê xwişkano, qilçixê çavê dijmin û neyarano lawo..!"

Yadê dilok digotin û ji seriyekî şikeftê diçû seriyekî din. Di hundirê şikeftê de hilnedihat. Derdikete derve, berê xwe dida jor, hinek tişt di ber xwe de digotin û ji bo ku hevalan bi xwe re neêşîne careke din li hundir vedigeriya, vê carê ez hembêz dikirim û bi ser min de digiriya, ez kelogirî dikirim, bêhemdê min hêsir ji çavên min dadiketin.

Wê şevê em her du jî raneketin.

Du saet ji şefaqê re mabûn. Ez li bendê nemam ku roj hilê, li ber ronahiya fanosê min êşa xwe û yadê ji deftera xwe re got. Yadê jî, geh lorîkên ku di dema zaroktiyê de ji toxtorê xwe re gotibûn dubare dikirin, geh jî stran davêtin ser evîna dayik û lawekî. □

## Hawara dilê min

Min kulmek hêsir ji te re anî  
Ne ji çavên xwe  
Lê min ji dilê xwe niqutand û anî  
Min ji hawara dengê te re anî  
Ji guliyên porê te re  
Min ji wî dilê te yê herî xizan re anî  
Rahêjê, vexwe û têhna xwe bişkîne.

## Hezkirî

Bihêlin ez çavên xwe deynim  
ser zinarekî sincirî  
da êdî hezkiriyê nebîne  
Li dawiyê bila xemên şêlo bimînin  
Bila dengêkî nenaskirî bimîne  
Bila êdî dûrikek li ser zimanan be  
ya ku herdem tê gotin.

**ABIDÎN**



## Hatî...

Hatî...

Bi kenekî germ û hêşîn vebûbû derî.  
Mîna strana dilerizî,  
Mîhraba dema ku berî tu werî.

Hatî...

Mîn digot ji bîr bikim.  
Hineka,  
Hêviyê derxistana ji ramanên min,  
Mîn digot ji bîr bikim,  
Meşa biharê li baxçeyên cam.  
Gula diçilmisî bîhn nekiribim jî,  
Dilê min bibariya li ser wê...

Hatî!

Mîna ketina stêrka şevê,  
Gamzeyên te,  
Hîveke tazî danî,  
Li esmanê dilê min...

Hatî!

Rêwiyekî bêdeng û bê hêvî bûm.  
Li stasyona giyanê min ê qefilî  
Di tirêneke vala de  
Li çavên te geriyam...

Hatî!

Çûyînên min zîpik dibarandin ser laşê min,  
Xwezî nehatibayî...

**ZEYNEL ABIDÎN**

# Afirandina hunerî û edebî

**N. ZAXURANÎ**

Mîna bîreweriyêke taybet/xas ya ku li ser serçaviyên jiyana civakî tê pê, huner hê ji serdema mirovantiyê ya pêşî hebûna xwe heta roja me her didomîne. Huner di serpêhatina dem û dewranên dîrokî de li ser prensîba ku jiyana civakî ya mirovantiyê tîpîk an jî muşexes dike, prensîba ku îmajan bi awayekî hunerane li dorbera bûyer û mijarên civakî radipêçe, ji xwe re bingeh digre. Bêguman, gava ku mirovê hunermend bi alîkariya vê yekê fenomenên jiyana civakî di serpêhatina kar û barê xwe yê hunerî de muşaxes dike, kar û barê hunerî bêtir bi wate (mane) dibê. Ji ber tîpîkkirina fenomenên civakî ji aliyê kesên hunermend ve hîmê şirovekirinên civakî û dîrokî tê pêk anîn. Ji vê yekê wîrdetir, mirovê hunermend

bi alîkariya tîpîkkirina fenomenên jiyana, rastiya jiyana civakî digel hemû xeml û xêza wê li gor idîalên xwe yê ramanî şirove dike. Ji xwe, ev şirovekirin jî, di nav rapêçana jiyana civakî de li ser bingehê nakokiyên ku di nav xeml û xêza jiyana civakî de peyde dibin, tê lidarxistin.

Mîna ku tê zanîn, bê çawa civatên netewên ji hev cida xwedî dîrok û dînamîkên ji hev cida ne, herweha nakokiyên wan yê ku li ser dînamîkên netewî, dîrokî û civakî peyde dibin jî, ji hev cida ne. Di vê pevgerîdanê de gava ku mirov li rewşa civata welatê me dinere, mirov dibîne ku civata welatê me ji ber nakokiyên ji hev cidayî aloz mîna kovara mêşên hingiv him û gum jê tê. Ji ber ku civata Kurdistanê ji ber aloziya na-

kokiyên tevlihev mîna beroşa savarê di-kele. Di vî warî de nakokiyên ku mirov dikare destnîşan bike, ev in: Li qelaçê Kurdistanê nakokiya herî serekî ya di navbera girseyên gundî û axayan, ango feodalan de ye. Ji ber ku axayên Kurdistanê hema bibêje hemû zevî û deştên Kerdistanê di destên wan de ne. Lê, li himberî vê yekê gundiyên Kurdistanê ji axê bê par in. Loma jî, gundiyên Kurdistanê bi piranî mîna mirêban bi nanûzikê li ba axayên Kurdistanê kar di-kin.

Li bajarê Kurdistanê jî, di navbera çîn û refên ji hev cida yên gel de nakokiyên cur bi cur hene. Mînak, mirov dikare nakokiyên di vî warî de weha destnîşan bike: Nakokiya di navbera karker û xwediyê kar de, nakokiya di navbera esnaf û kesên sermayedar de, nakokiya di navbera burjuwaziyê nukerî komprador û yê netewî de, nakokiya di navbera kesên bêsewad û ronakbîr de û gelekên din bîne bîra xwe.

Bêguman, ev nakokiyên weha yên ku li ser dînamîkên civata Kurdistanê peyde dibin, piraniya wan nakokiyên ku mirov dikare bi metodên demokratîkî aştiyane çareser bike. Gelek ji wan jî, di serpêhatina jiyana civakî ya Kurdistanê de bûne sersêbebê gelek aloziyên civakî ku civata Kurdistanê ji ber rûdana wan ser û bînî hev bûye.

Lê, digel van nakokiyên, nakokiyêke din heye ku bi carekê re hemû nakoki-

yên weha yên ku li jor behsa wan hate kirin, di bin mij û morana xwe de dihele. Bêguman, ev nakokiya jî, nakokiya di navbera mîna netewe gelê kurd û dewleta tirk ya kolonyalîst de ye. Ji ber ku zalbûna vê nakokiyê ya kolonyalîstî dînamîkên me yên netewî û civakî tên serkut kirin, rê li ber bal û geşbûna wan tê girtin. Bi peyveke din, hemû hebûnên me yên netewî, civakî û bi awayekî giştî hebûnên me yên kulturî têne perçiqandin. Heger ku mirov bîlançoya şerê qirêj ya van deh-panzdeh salên dawî ya ku ji aliyê dewleta tirk ve bi awayekî barbar tê birêvebirin, li ber çavan bigire, parîkî be jî, pirsgirêk tê zelalkirin. Lewra, di van deh-panzdeh salan de dewleta tirk bi hezaran gundên me wêran kirin, bi hezaran ronakbîrên me - çi millet wekilî, rojnamevan, nivîskar, siyasetmend û çi jî şivan û gavan - roj bi nivro li kuçên bajar û gundê Kurdistanê teror kirin. Ji ber vê terora bê sînor û ji ber barbariya dewleta tirk bi milyonan kurdistanî dev ji axa bav û kalên xwe berdan, ji bêçareyî li welatê biyanîyê mîna derberderan dijîn.

Digel vê rastiya zelal ya berbiçav jî, hema bibêje hemû siyasetmendên ku berdevkiya Komara Tirkiyê dikin, dixwazin ku bi hewldanên xwe qaşo vê rastiye ji holê rakin û pirsgirêkê ser û qûnî hev bikin. Lewra, siyasetmendên mîna Bulent Ecevit ku li gor terbiya Kemalîzmê karê xwe bi rê ve dibin, dixwazin ku

bibêjin: Pirsgirêka kurdan tuneye, lê li herema kurdan pirsgirêka feodalîzmê û paşdemayîne heye.

Belê, rast e ku welatê me li gora welatên pêşketî paşdemayî ye, li hinek navçên wê hêzên feodal hê li ser piya ne. Lê, mirov dikare bipirse: Ma gelo bi saya kê ev hêzên feodal hebûna xwe heta roja me didomînin?

Gava mirov di vê pevgerîdanê de li dîroka çeteyên kemalîst dinere, mirov dibîne ku ji destpêka damezrandina Komara Tirkîyê û vir de hêzên feodal bi saya siyaseta kemalîstan hebûna xwe didomînin. Lewra, hê di destpêka damezrandina Komara Tirkîyê de M. Kemal bi xwe li Kurdistanê geriya û ji bo "biratiya" kurd û tirkên xwe avêta bextê feodal û şêxên me kurdan, da ku bi alîkariya vê "biratiyê" welat ji hêzên biyanî bi hevdu re paqij bikirana. Ji xwe, gava ku haya mirovî ji hevbeşiya meclîsa Tirkîyê ya pêşî hebe, hingî jî ji mirovî tê xuya kirin ku piraniya endamên wê ji axa û derebegên ku qaşo bi însiyatîfa M. Kemal mîna nunerê navçe û herêman hatibûn tayîn kirin, tê pê. Îro jî, hêzên dagirker ji bo ku bikaribin hebûna xwe ya kolonyalîst li Kurdistanê bidomînin, axa û şêxên Kurdistanê yê nûker li dora xwe didin hev û wan "diparêzin". Lê mîna ku yê mîna Ecevit vê yekê nizanin, xwe ker dikin. Bêguman, ev kerbûna wan ne ji nezantiya wan, ji berevajî ji durûtiya wan ya ker-

şeytanî tê. Ji ber ku herkes dizane ku welatê me Kurdistan welatekî dewlemend î bi rûmet e. Bi petrola xwe, bi paxirên xwe, bi kîşt û kalê xwe, bi ava xwe, ango bi dewlemendiyên xwe yê ser erdê û bin erdê ne bi tenê li Rojhilata Navîn, mirov dikare bibêje ku li seranserê cîhanê bi nav û deng e. Digel vê yekê jî, kurd mîna netewe weke hejaran têne katagorîze kirin. Ma ev yeka ha bi serê xwe ne paradoks e? Li aliyê din jî, mirov dikare ji wan bipirse: Ma gelo ew heremên din yê Tirkîyê yê ku hema bibêje mîna navçên Kurdistanê paşmayî û belangaz in, çima ew jî mîna navçên Kurdistanê ji ber rebenî û belangaziya xwe serî ranakin? Çima ew jî mîna kurdan doza welatekî nakin? Ango, ew navçe çima doza kurdaiyê nakin?

Vêca, gava mirov di vê serdema ku tevgera rizgarîxwaz ya gelê Kurdistanê çî li nava welêt û çî ji li derveyî welêt digel hemû astengî û dijwariyên hêzên dagirker roj bi roj bêtir li ser dînamîkên xwe yê netewî û civakî geş û bal dibe û di eynî demê de li kar û barê hunermendên me yê hunerî dinere, mirov dibîne ku hema bibêje kar û barên wan yê hunerî li dorbera wan nakokiyên ku di rêzên jorîn de bi awayekî kurt behsa wan heta kirin, tê rapêçan. Bi peyveke din, pirsgirêkên ku serçaviyên xwe ji wan nakokiyên digrin, ji xwe re dikin mijar. Bêguman, mirov dikare di vî warî de ji nav rûpelên berhemên kul-

turf /hunerf - çi yên kevn û çi jî yên nûjen - yên ku ji aliyê hunermendên me ve hatine / têne derxistin, gelek mînakên bide. Lê, bi ya min mînaka herî berbiçav ya ku mirov dikare di vî warî de bide, hejmara nû - heger ku mirov dev ji polemîka bê ber ya "generalê bê nefer" û "nivîskarê swêdî" berde - ya "Nûdem"ê ye. Lewra, gava ku mirov rûpelên wê li hev diqulibîne û li wan dimeyêze, mirov dibîne ku piraniya nivîskarên wê nivîsandinên xwe li ser pirsgirêkên ku serçaviyên xwe ji nakokiyên ku li civata me ya kurdan aktuel in, nivîsandine. Lê bela ku ev nivîskarên me raf û çînên ji hev cida yên civata Kurdistanê ne, heryek ji wan li gora xwe nêzîkî van pirsgirêka dibe û hewl dide ku çareserkirinan ji bo çareserkirina wan pêşkêşî xwendevanên "Nûdem"ê bike. Bêguman, ev hewldanên wan yên ku ji bo çareserkirinê têne lidarxistin, di serpêhatina hûnandina berhemên wan yên hunerî de dibin mijar ji naveroka wan re.

Ji bilî vê yekê jî, hunermend û nivîskarên kurdan yên aktîf bi vî kar û barê xwe yê kulturî hewl didin ku bi alîkariya rexne û nirxandinên xwe çareserkirinan ji pirsgirêkên civata me re pêşkêş bikin, an jî bibine piştgir ji çareserkirinên hevalbend û hogirên xwe yên ku bi alîkariya berhemên xwe yên hunerî serê xwe li ser pirsgirêkên me yên netewî û civakî diêşnin.

Bi rastî jî, gava ku mirov wan nivîsandinên ku ji aliyê nivîskarên "Nûdem"ê ve hatine nivîsandin, bi rêk û pêk dixwîne, mirov tê digihê ku daxwaz û îdealên wan nivîskaran yên civakî jî ji hev cida ne. Heryek ji wan dixwaze ku bi alîkariya van nivîsandinên xwe daxwaz û îdealên xwe bi alîkariya prensîba ku diyardeyên (fenomenên) jiyane yên netewî û civakî di nav rapêçana kar û barê xwe yê hunerî de tîpîk/muşexes dike, pêk bîne.

Mîna ku tê zanîn, prensîba tîpîkkirinê an jî ya müşexeskirinê mîna gelek prensîbên hunerî him ji aliyê wate (mane) him jî bikaranîna wê ya di prosesa berhemkirina berhemên hunerî de hatiye guhertin û roj bi roj ber bi rêkûpêkkirinê ve çûye. Ango, ev prensîba ha ya ku di pêvajoya afirandina hunerî de ji aliyê resam, peykervan û nivîskarên ku bi karê hunerî ve mijûl in, bi awayekî ferdî tê bikaranîn. Vêca, mirov dikare bibêje ku mirovên hunermend bi alîkariya nerînan xwe yên îmajîkî fenomenên jiyana civakî bi awayekî afrîner müşexes dikin. Ji ber ku berhemên ku bi alîkariya vê yekê ji aliyê mirovê hunermend ve têne berhem kirin, mirov dikare wan mîna berhemên hunerî destnîşan bike.

Ji aliyê din ve jî, divê neyê jibîrkin ku bi tenê bi saya vê yekê mijar/objeya serekî ya huner bi hemû aliyê xwe rindtir tê xuya kirin. Ji ber ku nakokiyên ramanî ji aliyê hunermendan ve mîna fe-

nomenên civakî têne pesend kirin û bi alîkariya vê yekê bala wan bêtir li ser karekterên civakî tê kişandin. Lewra karekterên civakî di nav ferdiyeta xwe de taybetmendiyên jiyana mirovantiyê yên civakî, dîrokî, çînî digel cihê wan bi cih û war dike. Bi qasî ku tê zanîn, dê ji ber vê yekê be ku karekterên civakî digel peywendiyên xwe yên bi dorbera xwe re û raman û xeyalên xwe yên ferdî bûne mijara /objeya herî serekî ya hunerê.

Bêguman, gava ku mirov li nav rûpelên dîroka edebiyata klasîk ya yewnaniyan dinere, mirov dibîne ku karê edebî nakokiyên civakî yên aloz î tevlihev ji xwe re kirine mijar û li ser bingahê vê yekê afirandina hunerî ji destpêka xwe ber bi xweseriya xwe ya hunerî ve çûye.

Mîna tê zanîn, li Atînaya Yewnanîstana kevna li ser hîmê leyiztikên Dionysos yên kevna bi wate (mane) û naverokeke nû ku mijarên xwe ji serçaviyên civakî digirtin, nivşekî nû yê trajedyan hat peydekirin. Lewra, gava ku haya mirovî ji naveroka "Îllîas"ê hebe mirov hîn dibe ku Xwedeyan digel ku li ba herdu qabîlayên dijmin, ango li ba Akhan û Trojan bû jî û du serdarên qehreman yên mîna Akhilleus û Hektor li ser serê wan bûn jî, ji berhemên edebî yên bi vî rengî tê fêhmîkirin ku mirovên wê serdemê jî bi nerînên xwe yên polîtîkî û exlaqî li dijberî hev bûn. Bi qasî ku mirov ji rûpelên dîroka kevna ku wî çaxî hîn dibe, di wê serdema

kevna de di navbera parsan û yewnaniyan de cengeke dijwar tê li dar xistin. Bela vê yekê jî, di eynî demê de trajediyekê bi navê "parsan" ji aliyê Aiskhylos hate nivîsandin. Di serpêhatina vê berhema xwe de Aiskhylos rexne li despotîzma parsan digire. Ji ber wî digot ku " Ji bilî yekî hemû kes kole ne." Lê, li pêşberî vê yekê wî pesnê demokrasiya Yewnan dida û digot ku: " Hemû hevvelatiyên Yewnanîstanê azad in, kes ne koleyê tu kesî ye." Îro jî, gava mirov bi perspektîfeke globalî li cîhana roja me dinere, mirov dibîne ku hê ev yeka ha hebûna xwe bi form û awayên îroyîn didomîne. Ma ne ji ber vê yekê ye ku Rojavayiyên Ewrûpa pesnê xwe û sivilîzasiyona xwe didin? Lê ew jî mîna Yewnanîstana kevna ji bîr dikin ku sivilîzasiyona wan mîna demokarasiya Yewnanan bi handikapî lawaz e. Bê çawa di demokrasiya Yewnanîstana kevna de cih ji kesên kole re tune bû, bi tenê kesên ku hevvelatîbûn sîd (fêda) jê werdigirtin, îro jî, li Rojavayê Ewrûpa hevvelatî bi saya xwîne hevvelatiyên welatên navçe Asya, Afrîka û Emerîka Latînî jiyana xwe ya rind î xweş pêk tînin.

Naxwe, piraniya berhemên hunerî - çî yên kevna û çî jî yên nû - yên ku mal û mewdanê gelê ji hev cida ne, gava ku diyardeyên civakî ji naveroka wan re mîna mijar têne destnîşankirin, ya nivîskar bi alîkariya vê destnîşankirinê van diyardeyan bi awayekî erênî pesend

dike, yan jî nivîskar wan bi awayekî ne-yînî pesend dike. Bêguman, nivîskar vê yekê bi metodeke rast û rê nake, ji berevajî, bi alîkariya nerînên xwe yên heycanî rexne li wan dike, an jî bi alîkariya şirove û nirxandinên xwe wan pesend (qabûl) dike.

Baş e, mirov dikare bi çi awayî jiyana civakî digel diyardeyên wê bi awayekî afrîner ya hunerî tîpîk an jî muşexes bike? Mirov bi çi awayî dikare, nerîna xwe ya hunerî di serpêhatina vegotina berhemên hunerî de bi saya perspektîfa tîpîkkirinê raxîne ber çavan?

Bi bîr û baweriya min, bersiva wan pirsên jorîn mirov dikare bi alîkariya nirxandina berhemên hunerî bide: Karakterên mirovan yên civakî û dîrokî ku dibine objeya serekî ji bo naveroka berhemên hunerî di nav rapêçana jiyana civakî de gelekî aloz û tevlîhev in. Bêguman, dema ku nivîskar hewl dide ku wan di serpêhatina hûnandina berhema xwe de biafirîne, pêşiyapêşî bala xwe dide ser hinek aliyên wan û serê xwe li ser taybetmendiyan wan yên girîng î sereke têşîne. Ango, nivîskar bi taybet serê xwe li ser taybetmendiyan karaktera berhema xwe yên ku pê balkêş tî, bi gelek alî li ser wan hûr û kûr dibe. Lê, çi heye ku xisletên karakterên kesê ku endamê eynî rafa civakî ne, ji karakterên kesên din bêtir beloq û diyar in. Dê ji ber vê yekê be ku birek ji kesên ku mensûbê eynî rafa civakî ne, bêtir bi mirovê hu-

nermend têne xuya kirin û ji ber vê yekê jî ew ji aliyê mirovê hunermend ve mîna karakterên tîpîk têne destnîşan kirin. Bela vê yekê jî, karakterên weha yên bi vî rengî ji aliyê nivîskarî ve birêkûpêktir li ser rabûn û rûniştina wan, li ser ramandin û jiyana wan ya civakî di-raweste, wan di serpêhatina kar û barên xwe yên hunerî de diafirîne.

Bêguman, gava nivîskar hewl dide ku wan biafirîne, bi piranî ji tecrûbe û hewldanên xwe yên praktîkî hereket dike. Di serpêhatina vegotina berhemên hunerî de mirov van figûran mîna tîpên protîp dide naskirin. Mîna ku tê zanîn, her hunermend bi awayê xwe protîpên xwe diafirîne. Lê, metoda abstrakkirinê di dema afirnadina protîpên xwe de nikare bi kar bîne. Ji ber ku metoda abstrakkirinê ji bo karê zanistî, angoyê felsefî, eborî, dîrokî û hwd. yên ku li ser hîmê mefhûmên abstrak têne berhem kirin, digunçe. Heçî henermend e, ji tecrûbeyên xwe yên jiyani dest pê dike û bi alîkariya vê yekê karê xwe yê hunerî bi rê ve dibe. Ango, ji nav cergê jiyana civakî taybetmendiyan protîpên xwe yên ferdî destnîşan dike, wan di nav rapêçana karê xwe yê hunerî de his dike.

Ji ber vê yekê jî, nivîskar jî, mîna mirovê zanyar û karmendên ku bi kar û barê komelayetî, angoyê cemewerî mijûl dibin, bi alîkariya îmajên hunerî kar û barê xwe yê hunerî bi saya prensîba tîpîkkirinê diyardeyên jiyana civakî bi-

rêve dibe. Bi qasî ku tê zanîn, mirovên zanyar û karmendên ku bi karê ceme-werî mijûl in, diyardeyên jiyana civakî yên ku bi wan tîpîk tèn, tu guhertinê di taybetmendiyan wan yên ferdî de nakin, bê di jiyana civakî de ev diyarde çawan ne, wan wek rastiya wan radixin ber çawan, lê heçî mirovên hunermend in, ew bi vê yekê bi tenê qaîl nabin. Ji ber ku mirovê hunermend bi mistewa tîpîkkirinê ya ku mirov di nav rapêçana jiyana civakî li qayî tê, razî nabin, li pêşberî vê yekê ew di ferdiyeta protîpên xwe de guhertinan li dar dixin û bi alîkariya tasawûrên xwe karakterên fiktîf diafirînin.

Dikare bê pirs kirin: Ma gelo ji ber çî mirovê hunermend van protîpên fiktîf diafirînin? An jî, afirandina karakterên fiktîf bi kêrî karê wan yê hunerî tê?

Gava nivîskar li gora îdealên xwe yên civakî bala xwe dide ser hinek aliyên karakterên hunerî, wan aliyên karakterên fiktîf yên ku pê balkêş tèn, di serpêhatina kar û barê xwe yê hunerî de ji xwe re bingeh digire û karakterên xwe li gora vî bingehê xwe bi goşt û can dike. Bela vê yekê jî, ew kesayetiya fiktîf ku ji aliyê nivîskarî ve tê afirandin, bi saya van taybetmendiyan balkêş yên ku ji aliyê hunermendî ve bal li ser wan hatiye kişandin, mîna ferdiyeteke ku ji wan xisletan bi rêk û pêk bûye, ji xwendevanan tê xuya kirin.

Ji aliyê din ve jî, divê bê zanîn ku ke-

sayetiyên ku di nav rapêçana berhemên hunerî de têne afirandin, ji protîpên xwe yên ku di jiyana civakî de mirov li qayî wan tê, gelekî bi xwîn û cantir in. Ji ber ku protîpên fiktîf yên ku ji aliyê hunermendan ve têne afirandin, bi wesf û xisletên xwe ji wan diyarî berbiçavtir in. Mîna ku ji vê yekê tê fêhmkirin, nivîskar dema ku karakterên xwe yên fiktîf diafirîne, wan bi rasewûr û ramanên xwe kamiltir dike.

Bela vê yekê jî, nivîskar bi alîkariya vê hewldana xwe karakterên xwe yên fiktîf ku di serpêhatina hûnandina berhema xwe ya hunerî de diafirîne, parîkî ji karakterên “normal” wurdetir bi beden û can dike. Ango, mirovê nivîskar di nav rapêçana berhema xwe ya edebî de xisletên balkêş yên protîpên xwe yên “normal” di kesayetiya karakterên xwe yên fiktîf de birêkûpêktir bal dikişîne ser wan, wan bi gelek alî pêşkêşî xwendevanan xwe dike.

Ji bilî vê yekê jî, fonksiyoneke din ya karakterên fiktîf yên berhemên edebî ya ku jiyana wan bi teferûatan radixe ber çavan, heye. Lewra, mirovê nivîskar bi alîkariya van teferûatan xisletên serekî yên karakterên fiktîf yên berhemên edebî ji hebûna wan ya rastî ya ku di jiyana civakî de mewcûd e, radipêçe. Lê di eynî demê de heyecana xwe ya xwediyê delîlên civakî ku dibe wesîle nivîskar nerî-nên felsefî, polîtîkî û olî di derbarê qehremanê berhemê de bi gelek alî vedibê-



je. Bêguman, ev fonksiyona teferûatên îmajên hunerî ji bo berhemkirina berhemên hunerî mîna fonksiyona yekê girîng in.

Vêca, mîna ku bi hêsanî ji mirov ve tê xuyakirin, kesayetiyên ku di nav rapêçana berhemên edebî de ji aliyê hunermendan ve têne afirandin, bi tenê ji kesayetiyên jiyana civakî ya rojane netîpiktir in, herweha bi alîkariya tasawûra nivîskarî bêtir bi alîkariya hûnandineke ramanî/heyecanî têna strandin.

Divê bê destnîşan kirin ku digel tefe-rûatên kesayetiyên karakterên fiktîf, xisletên zimankî jî ji bo hûnandina berhemên edebî/hunerî xwediyê roleke girîng e. Hûnandina zimankî ya berhemeke edebî, ango vegotina hunerî dibe wesîle ji bo nivîskêr da ku bikaribe nêrînên xwe yê ramanî / heyecanî di derbarê karakterên xwe yê fiktîf de vebêje. Bê çawa mirovê hosta bi alîkariya xerca ku ji avê, çemento û qûmê pêk tê, dîwarên avaniyan datîne, herweha mirovê edebiyatzan jî bi alîkariya vegotina hunerî ku bi alîkariya zimên tê vegotin, kar û barê xwe yê edebî bi rê ve dibe. Ger mirov baş bi zimên nizanibe, mirov ê nikaribe berhemên edebî yê baş biafirîne. □

## ducan

min xwe spart zinarên asê  
bi keriyê kuliyan re bènifçe dimam  
li nava bermahiyên salan  
min fam nedikir jana jinên ducan  
zik li ber dev  
û xweşik  
di malzaroka xwe de vedişêrim şeh-  
weta wan  
jinên bêhnxweş reyhanî  
xwe li mirîtî datînin  
yên min nesax û merezdarî  
kenjibîrkirî  
sêdar bihevşabûneke eşkere ye  
li hawîrdora ken  
girî têkilkirî  
serdanpê qilêrî lertzok  
dost şêrên devmezeloq  
sêwlekekî binçengşewitî me  
malîno!  
min pê nedizanî ketim dexlê jinan  
ji lêvên wan dihatin maçîkirin  
ez çûm çavên wan

## EMÎN BOZAN

## RÊWIYÊ TENÊTIYÊ

bi çavên kelogirî  
bi ruyek kovanî jê difure  
rêwî me ber bi tenêtiyê.

di dilê min ê hejar de  
agirê gundên şewitandî  
di guhê min de  
nalîna zarokên Helebçe û  
barê sewalên bê hêlîn mayîn jî  
xwe berda ser nav milan.

ji vê êşa mirovkuj re  
ne bayê payiza hênîk kar dike  
ne stranên lehengiyê  
ne jî  
cixara ji tituna Mûşê hatî pêçan  
û mîna bizmarek li serê min bê kutan  
xaltîka Xecê tê ber çav  
û ji xwe dipirsim:  
tevî çar mindalan  
li bajarên mêtîngeran  
wê çawa debara xwe bike.

lo....kesên ne aştîxwazin  
xwedê mala we xera bike.

bi hevaltiya heyvek melûl  
bi lez û bez  
xatir dixwazin  
banî  
dar û ber  
û çemên welatê min.

wek çivîkek baskşikestî  
wek masiyekî bê av mayî  
digevizim  
diperpitim  
di deryaya tenêtiyê de  
li dengekî nas  
li destekî germ digerim  
da xwe pê bigirim.

**BERKEN BEREH**

# Li ser Kevoka Spî

## A. AMEDÎ

Berî niha bi demekê nivîsek ket destên min, xwendevanekî rexne li çîroka Firat Cewerî a bi navê *Kevoka Spî* girtibû. Bi derengî be jî xwendevên baş kiriye. Ji ber ku ev kitêba F. Cewerî di sala 1992an de derketiye û çîroka bi navê *Kevoka Spî* jî di sala 1989an de hatiye nivîsandin, yanî berî niha bi deh salan. Bi tenê ji bo zellakirinekê ez ê çend rêzan binivîsînim. Ez di destpêkê de dixwazim bibêjim bi qasî ku baweriya min bi demokrasî, civatek plural û azadiya ramanê tê, baweriya min ewçend jî bi tendens, tevger û "îzmên" edebiyatê yên cihê cihê jî tê. Ji bo zimanê kurdî û ji bo dewlemendkirina edebiyata kurdî ya nivîskî hewcedariya me, ji hemû fikir û ramanên huner û edebiyatê heye. Ne ku em bi tenê xwe di fikra sosyal-re-alîzmê de hepis bikin.

Edebiyat bi zimên tê pê, ziman navgîneke hevbeş ya mirovatiyê ye. Mirov bi zimên û bi alîkariya rêgihîştin, xewn, xeyal û fantaziyên xwe nêzikî edebiyatê dibe. Têgihîştin, xewn, xeyal û fantaziyên mirovan nêzikî hev in, ew jî hevbeş in. Êş, jan, xayintî, hezkirin, evîn, xapandin, xizanî, dewlemendî, xewn, fantazî, şer, serîhildan, qehremantî û çî bigire her tiştên insên an wek hev, an jî pir nêzikî hev in. Loma gava mirov berhemeke edebî ya nivîskarekî japonî, Emerîka Latînî, fransî, rûsî an jî efrîkî dixwîne, ger ji aliyê hûnandin û avakirina edebiyatê berhemeke biserketî be, mirov xwe tê de dibîne; cîranê xwe, hevalên xwe, gundiyên xwe, an jî xewn û fantaziyên xwe tê de dibîne. Hisên insên tixûban nas nakin, ez bawer dikim we carina di rojnameyan de xwendiyê ku filan xortî an jî filan keçê xwe ji bo hezkira/hezkirê

xwe kuştîye. Ev li her derê dinyayê dibe. Lê ev bûyerên insanetiyê ji bo edebiyatê alavên xav in, edebiyatvan van bûyer û alavan bi rengekî hunermendane û bi fantaziyan dihûnin, dixemilînin, rengekî nû didinê û dîsa li insên vedigerînin.

Bûyereke ku li gundekî Almanayê derbas bûbe, dikare li gundekî Kolombiyayê jî derbas bibe. Gava kitêba Marquez ya bi navê *Duşema Sor* derdikeve, xwendevaneke wî jê re nameyekê dişîne û dibêje; tu ji ku hatiya gundê me? Ev tiştên ku tu qal dikî, hemû li gundê me bihurî ne.

Gava aktîvistekî kurd serpêhatiyên xwe yê di girtîgeh û îşkencexaneyan de binivîsîne, behsa îşkenceya ku lê hatiye kirin bike, bivê nevê, wê hem serpêhatiya wî, hem jî celebê îşkenceya ku lê hatiye kirin, bişibe ya Emerîka Latînî, ya Efrîka, an jî ya welatekî din ku ji demokrasî û mafên mirovan bêpar e.

Herçî çîroka bi navê *Kevoka Spî* ye li ser motîfa bûyereke rastî hatiye hûnandin. Lê F. Cewerî kirasekî edebî yê psîkolojîkî lê kiriye. Ez di vir de pêwîstiya şirovekirina armanc û naveroka çîrokê nabînim, ji ber ku hûn ê bi xwe bixwînin û we li gora xwe çî tê de dît, çîrok ew e.

Di sala 1996an de Husên Dozen antolojiyê çîrokên kurdî bi almanî derxist. Ev antolojî ji deh çîrokan pêk hatiye û çîrokek jê jî *Kevoka Spî* ye. Piştî weşandina kitêbê bi çend mehan, wergêrê çîrokê Husên Dozen (bi xwe di dadgehan de wergêr e) li min geriya û got, wî di dadgehê de tercumanîyek kiriye ku bûyera wê eynî dişibe ya *Kevoka Spî*.

Lê çiqasî bêhna Turgenyev ji *Kevoka Spî* tê ez nizanîm, ji ber ku wergera berhe-ma Turgenyev ya bi navê "Klara Mîlîç" an jî "Piştî Mirinê" ne bi tirkî ne jî bi swêdî bi dest neket. Ez dizanîm ku F. Cewerî bi rûsî jî nizane.

Lê berî çapkirina vê hejmarê bi çend rojan min bi riya Kitêbxaneya Qiraliyetê kopyayêke vê çîrokê bi dest xist. Ev çîrok di sala 1883an de, bi swêdiya kevin, li Helsînkîyê hatiye çapkirin. Min ew pir bi zehmetî xwend, lê min tu bêhna wê di *Kevoka Spî* de nedît. Vê yekê gotinên camêrekî anîn bîra min. Camêr ji bo ku zimanê kurdî bişibîne zimanê swêdî, ji xwe re lîsteyek gotinan çêkiribû. Bi rastî jî hin gotinên kurdî û swêdî dişibin hev, lê di lîsteya wî de gotinên hebûn ku tu têkiliya wan bi hev re tunebûn. Bo nimûne wî "vit" a swêdî û "spî" ya kurdî dişibandin hev.

Ev jî ew nimûne ye. Lê ger heq ji wergera "Piştî Mirinê" ya Turgenyev were derketin, em ê wê wergerînin û bigihînin Nûdemê.

Heger bêhna çîroka Turgenyev çûba rexnegirên alman, ez bawer dikim wan ê behsa vê bêhnê bikirana. Ez li vir çend danasînên di derbarê antolojiyê de yê ku

di çapemeniya Almanya û Swîsreyê de derketine û behsa *Kevoka Spî* kirine, diweşînim û herweha ez hêvîdar im çîroka *Kevoka Spî* jî ji nû ve were weşandin.

Herçî çîroka bi navê "Doktor Sertaş" e, di çapa dudan de, bi şaştiyeke çapê "zikê weke meşkekê" bûye "weke meşkekê". Xwendevan dikarin ji kerema xwe re li çapa kitêbê ya yekê binerin.

Ev in çend nimûneyên ku di derbarê *Kevoka Spî* de hatine weşandin.

Rojnameya DIE WOCHENZEITUNG: "Kevoka Spî" ya Firat Cewerî behsa zilamekî dike ku divê ji bo rûmeta malbatê xwişka xwe ya ku ew pîr jê hez dike bikuje. Ji ber ku xwişka wî bi hezkirê xwe re bez daye. Ev kirina ha jî jiyana zilêm mehû dike.

Rojnameya DER KLEINE BUND: Her çîroknivîs nikare mîna Firat Cewerî hunera kurteçîrokê bi kar bîne.

Rojnameya VOLKSSTIME: Em di kurteçîroka Firat Cewerî de êş û jana kalemêrekî ya ruhî dijîn ku wî ji bo rûmeta malbatê xwişka xwe kuştiye.

FERHAD SHAKELY, Modern Kürt Öykü Sanatı: "Beyaz Güvercin adlı öykü yazdıklarının en iyisi, bu

## ROMANE & ERZÄHLUNGEN

### Pionierarbeit aus dem Exil

sth. Wer in einer Anthologie kurdischer Erzähler den Autonomiekampf des kurdischen Volkes verarbeitet wissen will, kann dieses Buch getrost im Regal stehen lassen. Husên Düzen, der Herausgeber, will mit den Geschichten Eindrücke vom Alltag, von den Gefühlen und Schicksalen der 20 Millionen Menschen liefern, für die es bis heute kein zusammenhängendes Staatsgebiet gibt. Düzen hat eine velseitige Wahl getroffen. Um Bruderzwist geht es, um Vater-Sohn-Konflikte, Korruption unter kleinen Leuten, Scheinheiligkeit und auch um Blutrache. Das verbreitete Bild der Kurden als Unterdrückte, Verfolgte und Flüchtlinge erweiternd, vermitteln die Erzähler von Redwanê Alî bis zu Flit Totani den Eindruck eines religiös geprägten Volkes, das zwar arm an Gütern, aber reich an Weisheit ist.

Weil der Band nur Kurzgeschichten beinhaltet, kann er auf gut 150 Seiten gleich mit 10 Autoren bekannt machen. Nicht alle von ihnen beherrschen die Kurzprosa so gut wie Firat Cewerî und nehmen bisweilen einen zu langen Anlauf bis zum erzählerischen Höhepunkt. Die meisten schildern alles brav der Reihe nach und verwenden eine geradezu unauffällige Sprache. Vielleicht liegt's daran, dass diese Schriftsteller Pionierarbeit leisten. Die Entwicklung der kurdischen Schriftsprache steckt noch in den Kinderschuhen. Bis heute überliefert dieses Volk seine Erzählungen meist mündlich. Kompliziertes hat da keinen Platz. Traurige Realität ist, dass die Schriftsteller ihre Arbeit im Exil tun müssen. Keiner der Autoren dieser Anthologie lebt noch in Kurdistan.

Husên Düzen: Zehn kurdische Erzähler. Ararat-Verlag, Winterthur, 157 Seiten, Fr. 24.80.

Kopyayek ji rojnameya bi almanî.

öyküde seçtiği ana kahramanları sanatsal bir biçimde betimliyor. Onların dış ve iç dünyalarını aşan şeyler anlatıyor, okuyucunun değişik iki zıt dünyayı yaşamasına izin veriyor. Yazarın en büyük başarısı, kardeşlerden birinin kız kardeşini öldürmeye karar verdiği dakikalar anını betimlemesi ve onu değişik kararları almaya iten zıt güçleri anlatmış olmasıdır.

...ana kahramanların yaşamında rüyaların ve psikolojinin öneminden başarılı bir biçimde yararlanmış.”

Kurdiya wê: "Kevoka Spî çîroka wî ya herî baş e, ew gernasên ku di vê çîrokê de hildibijêre bi awayekî hunermendane taswîr dike. Ew behs û şîroveya cîhana wan ya derveyî û hundirîn dike û destûr dide ku xwendevan du cîhanên dijberî hev bijîn. Biserketina nivîskêr ya herî mezin behskirina wan deqîqeyên ku divê lawik biryara kuştina xwişka xwe bide û herweha hêzên dijhev yên ku wî diajo ser girtina biryarên cihêreng.

... di jiyana gernasên navendî de, nivîskar bi awayekî biserketî ji xewn û psîkolojiyê destkeftî bûye.”

Bi hêviya xweşbînî û dostaniyê

# Kevoka Spî

## FIRAT CEWERÎ

Ew pênc roj berê ji girtîgehê hatibû berdan. Digel ku emrê wî hê sih û pênc bû jî tayekî reş di porê wî de nemabû. Gepên wî kort bûbûn û qermîçokên rûyê wî bûbûn mîna yên kalan. Ew rûyê wî yê gewr û jîndar niha zer bûbû. Bejna wî ya dirêj ya ku demekê ji keçikên mehelê re meraq bû ku bidîtana, tewiya bû. Ew êdî ne xortekî berî niha bi panzdeh salan, lê bûbû mîna kalekî.

Erê, ew pênc roj berê hatibû berdan... Û niha, li qatê sisiyan, li ber pencereya odeya xwe ya xebatê rûniştibû û li derve, li barana pêşî ya payizê temaşe dikir. Car caran ji nişka ve dikeniya, bi pistînî tiştin digot û dîsan bêdeng dima. Ev yeka han berhema salên wî yên girtîgehê bû. Berî pênc rojan, gava ew ji girtîgehê hatibû berdan, bavê wî û merivên wî yên nêzik bi vê yekê hesiyabûn, loma ew zû nişanî doktorekî nas dabûn, doktor ê nas tişteke jê fêhm nekiribû, tenê bi gotina “Ancax hûn wî rakin Ankara” ve hatibû ser. Lê ne wî dixwest here Ankarayê, ne jî rewşa malbatê jê re dest dida. Rojekê jî wan pîrek ji gundekî çiyê anîbûn, da ku pîrê hin dermanan jê re çêbike û tişteki li ser bixwîne, lê ew belkî zêdeyî deh deqîqan bi pîrê keniabû, paşê xwe avêtibû ser pîrê, destên xwe xistibûn qirika wê û ger ne ji endamên malê bûya wî ê li wir ew pîra han bixeniqanda. Pîra ku bi zorê xwe ji nava lepên wî filitandibû, di derî re derketibû û bi xurtbûna xortekî bazdabû.

Barana ku dihat carinan xurt dibû, carinan mirov digot qey wê dawî were, kêmbû, lê dîsan bi xurtî dibariya. Wî jî herdu enîşkên xwe danîbûn ser masê, serê xwe xistibû nava kefên destên xwe û bêyî ku çavên xwe bikutkutîne li barana pêşî

ya payizê dinihêrî. Carinan dixwest dilopek baran ji hewa de heta ku bigihîje erdê taqîb bike, lê hew dinihêrî ku dilopin din diketin ber wî û bala wî dîsan belav dibû. Ew cerekê jî li hebûna baranê fikirî. Wî ew perçeewrên reş yên li ezmên şibande deryayeke weke moxilê biqul. Di wê navê de dîsan ew pîrika wê rojê hate bîra wî. Ew dîsan mîna wê rojê bi pirqînê û bi dengekî bilind keniya. Paşê bi carekê ve kenê xwe birî. Çavên wî beloq bûbûn. Wî ew çavên xwe yên beloq bera ewr dabûn. Erê, rast bû, di nav ewrê reş de kevokeke spî xuya dikir. Ew kevoka spî her ku nêzîk dibû mezin dibû, her ku mezin dibû dişibiya xweha wî. Erê, ew xweha wî bû. Wî bi çavên xwe didît.

Vê carê enîşkên xwe ji ser masê hilanîn, bi herdu destan xwe hişk bi masê girt û ziq li xweha xwe nihêrî. Kirasekî tenik li xweha wî bû, guliyek ji dehfên hespan li eniya xwe girêdabû û li ber pencereya wî difiriya û dixwest di pencerê re têkeve hundir. Gava mêrik ev yeka han ferq kir, hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Bi vekirina pencerê re xweha wî firiya hundir. Digel ku li derve baran xurt dibariya jî dîsan keçik şil nebûbû. Çavên keçikê mîna du morîkên şîn dibiriqîn, lêvên wê yên dagirtî di rengên sorbûna hinarîkên riwê wê de bûn. Bejna wê dirêj, newqa wê zirav û hêtên wê dagirtî bûn. Ew bi wî awayî li quncikeke odê li ser lingan rawestiyabû, baskên xwe bera ber xwe dabûn, stûyê xwe xwar kiribû û bi rewşa birayê xwe digiriya.

Wê digot:

– Keko ev çi bi te hatiye? Birayê mino kanî xortaniya te? Te çima xweha xwe kuşt? Çawa destên te li min geriyan û te ez kuştim? Çawa destên te li xweha te, ya ku te ewqasî jê hez dikir, geriya?

Axx... Min çi bêriya te kiriye. Axx... Ez çi dixwazim te hemêz bikim. Ez çi dixwazim birayê xwe tayê bi tenê hemêz bikim. Ez çi dixwazim rohnîka çavên xwe hemêz bikim. Kekê mino, bavê mino, birayê mino... Lê ez nikarim. A niha destên min bi te bibin ez ê winda bibim. Ji ber ku ez mirî me, te ez kuştim... Axxx... Kekê mino, min çiqasî jî te hez dikir. Ma nayê bîra te gava em li ser daweta te dipeyivîn? Te ji min re digot, divê tu serê govendê bikişînî. Ma tê bîra te kekê mino? Tê bîra te bê ji daweta te re çiqasî hindik mabû? Piştî te ez kuştibûm bi salekê dergistiya te jî xwe avêtibû ber tirêne û xwe kuştibû. Tam hûn ê wê rojê bizewicyana û min ê wê rojê serê govenda birakê xwe, tayê bi tenê bikişanda. Tam wê rojê dergistiya te bûbû mêvana min. Wê ji min re behsa rewşa te kiribû û wê gotibû piştî ku te ez kuştibûm, tu hatibûyî girtin. Wê jî îdare nekiribû. Ji derdê evîna te xwe avêtibû ber tirêne û miribû. Zûdeye haya min ji wê tune. Ji wê şeva ku em bi hev re li



girtîgehê hatibûn xewna te û pê ve min ew nedîtîye. Ger ew bibihîze tu hatiya berdan, ew li ku be ew ê were. Me çend caran bi hev re xwest em werin ba te, lê gardiyanan em ditirsandin, em ji wan newêrbûn bihatana. Dergîstiya te her li te difiki-re. Wê roja ku hatibû mêvandariya min, ji min re gotibû, bi çi awayî dibe bila bibe, ez ê xwe bigihînim wî. Wê zewac li herdu dinyan li xwe haram kiriye. Ew li ser te dîn bûbû kekê mino, ew bi tenê ji bo ku te ez kuştibûm hebekî ji te qeherî bû. Lê roja ku mêvana min bû, min jê rica kiribû, ku kekê min efû bike. Wê jî soz dabû min ku ew ê te efû bike. Min jê re gotibû, çi dibe, birakê min tayê bi tenê ye, wî efû bike. Min gotibû, birakê min guneh e, pir diltenik e. Min gotibû, birakê min heta îro gêrikek neşandiye, lê ez kuştîme, xem nake, ew jî ne sûcê wî bû ku... Xelkê lê wilo kir. Ger xelkê li te wilo nekiriba te ê ji ku xwaka xwe bikušta? Wê ji ku destê te li min bigeriya? Min ji dergîstiya te re got, gava te bera min dabû, te çavên xwe girtibûn. Min got, destên wî li min nedigeriyan. Min got, wî pir ji însana hez dikir. Û min got, te ji min jî pir hez dikir. Ma ne wilo ye? Qey te ji min hez nedikir? Ma tu ji min hez nakî kekê mino?

Xilolîkên hêsirên çavên mêrik di ser riwê wî yê nekurkirî de gêr dibûn ser çena wî û paşê dinuqutîn erdê. Êdî ew mîna zarokekî bi îskîn digiriya. Wî dixwest serê xwe deyne ser milê xweha xwe û bi dengê bilind bigirî. Dixwest uzra xwe jê bixwaze. Dixwest jê re bibêje ku wî çiqasî bêriya wê kiriye. Dixwest poşmaniya xwe bîne ziman.

Xwe winda kiribû. Ber bi xweha xwe çû, ku wê hemêz bike, lê xweh li ber geriya û jê re got, ku destê wî pê bibe, ew ê winda bibe. Lê mêrik xwe negirt, xwe avêtê; bi avêtina wî re keçik winda bû. Mêrik deverû, li hundirê odê kete xwarê û bi ketinê re serê wî li qorziya masê ket û serê wî mîna ku perçe bûbe, xwîn jê hat. Ew bi şikandina serê xwe nehesiyabû.

Heya ku diya wî ket hundir, bi qêrîn bang cîranan kir, hingî ew hêdî hêdî, mîna ji xeweke kûr şiyar bibe, bi ser hişê xwe ve hat û têgihîşt ku li erdê ye.

Ew barana ku di pencerê re li hundir xistibû, kaxiz û pirtûkên li ser masê şil kiribûn û av herikîbû ser tej û xaliyên raxistî.

Bi alîkariya cîranan ew rakirin nexweşxanê, doktoran, ku yek ji wan hevalê wî yê zaroktiyê bû, serê wî pansûman kirin, bi xavikekê girê dan û ji bavê wî re gotin, da wî rakin Ankarayê, an jî ku îmkanê wan hebe, wî bibin Ewrûpayê. Bavê wî ji bêîmkaniya xwe gazin kir û ji bo bikaribe alîkariyekê ji cihekî bistîne, ji doktorê hevalê lawê xwe daxwaza hin şîretan kir. Doktor jî soza tiştê ku jê bê dayê û bi rewşa hevalê xwe yê zaroktiyê, ku ewçend zîrek û jêhatîbû, xemgîn bû.

Zîrektî û jêhatîbûna wî ji aliyê herkesî ve dihate zanîn.

Berî bi panzdeh salan, di îmtihana tîbbê de, ew di nav sed û pêncî hezarî de yê şêstemîn derketibû û ew hevalê wî yê ku niha li nexweşxaneyê bajarê wan doktorî dikir bi zorê bûbû yê hezarî. Wî hê di salên xwe yê lîseyê de piraniya klasîkên fransîz û rûsan xwendibû û di qayîşkişandina çîrokan ya rojnameya bajêr de bi çîroka xwe ya bi navê “Mêrikê Serxweş” bûbû yekemîn û paşê ew çîroka wî li Ewropayê ji aliyê hevalekî wî ve hatibû wergerandinê almanî û niha jî ew çîrok di antolojiyêke bi nave “Edebiyata Rojhilat” de li Almaniyayê ji aliyê weşanxaneyêke naskirî ve hatiye çapkirin. Herkesî bi vê zîrekbûna wî dizanibû. Heta, apê wî, yê ku reîsê belediya bajêr bû û gelekî jê hez dikir, soz dabûyê ku dê wî ji bo stajê bişîne Îngîltireyê. Lê gava kurtûpista ku wî di bin tesîra apê xwe de xweha xwe kuştiye, li bajêr belav bûbû, pir kesan bawer nekiribûn û ji bo ku dilê xwe têxin cih, ew bi hin karkerên belediyê re peyivîbûn. Karkerên belediyê jî nedixwestin diyar bikin ku serokê wan bûye sedema vê trajediyê, wan tenê bédengî dipejirandin. Li gora ku dihate gotin û di nava bajêr de belav bûbû, çîrokê wilo dest pêkiribû: Xweha wî, ya ku bi xweşîkbûna xwe di bajêr de deng dabû xwestiya pismamê xwe bû. Ev xwestin jî hê di pêçekê de ji aliyê herdu biran biryar hatibû dayin; lê herdu zarokên ku di aliyê karakterê de gelekî dûr hevdu bûn û ew pismamê ku ji aliyê keçîkê ve qet nedihate hezkirin û hebandin, ketibû derê riya wê. Keçîkê jî hewesa xwe berdabû ser xortekî cîranê mala xalê xwe û rojekê gava êdi têdigihên ku tu riyên din tune ye, bi hev re baz didin. Ji bo ew şopê ji ser xwe dagerînin û nekevin dest, her gav cihê xwe diguherin, tu carî zêdeyî şevekê li cihekî namînin, lê piştî bi sê mehan, li Îzmîrê, li barkêşekî nas rast tên û barkêşê ku bi tesadûfî bi reva wan hesiyabû û bi xelata ku apê keçîkê ji bo girtina wan soz dabû, bihîstibû, timayî zora wijdan biribû û ji malbata keçîkê re xeber şandibû, ji aliyê din jî bi dek û dolab û bi dostanî bi dû herdu dilketiyan ketibû û gava rojek ji rojên havînê ya herî germ ew bi apê keçîkê, bavê wê û du pismamên wê re ketibûn hundir, herdu dilketî şaş û ecêbmayî mabûn, lêwîk hema destê xwe avêtibû destê hezkiriya xwe û xwestibû bazdin, lê apê kêçîkê, yê reîsê belediyê bû û bi laş û gewde bû, hema xwe avêtibû qemçîka paş stûyê lêwîk, ew ber bi xwe ve kişandibû, paşê heta jê hatibû ew ber bi dîwêr ve dehf dabû, piştî wî li dîwarê çimento xistibû, lawîk bi belqîn verêşiyabû, lê hîn berî ku ew bigihêje bi piştî destê xwe devê xwe pakij bike, vê carê lawê reîs, yê ku di nav malê de gelekî delalî rabûbû, lê pir tirsonek û ji aliyê laş û gewde jî de qet nelîhev bû, heta jê hatibû kulmek li ser çavê lêwîk xistibû. Keçîkê îdare nekiribû, êrîşî wan kiribû, gava apê wê xwestibû lêxe, destê wî gez kiribû, di wê kêlikê de barîna

ku ji apê wê hatibû bêtir barina gayekî anîbû bîra mirov. Lê herdu dilketiyan herçiqas li ber xwe dabûn jî, dîsan nikaribûn xwe ji nav destên wan bifilitînin, heta ku tarî ketibû erdê ew bi dest û lingên wan ve girê dabûn, ew avêtibûn dawiya dolmîşê û hezar û dused kîlometre, digel ku tenê sê caran sekinîbûn, çûbûn. Di sekinandina cara çaran de, lêwik xwe bi awayekî vekiribû, weke guleya devê tivingê xwe di derî re avêtibû, xwe avêtibû dû pîqabek ku nuh ji benzînxanê hereket dikir û çûbû. Her çiqas hin ji van bi dû pîqabê de bazdabûn jî, pere nekiribû; pîqab zû derketibû ser rê û bi sureteke xurt ji wir bi dûr ketibû. Apê keçikê pîlaka pîqabê nivîsandibû û ji mêrikê kal yê li ber benzînxanê pîrsa wê pîqabê kiribû. Mêrikê kal heqê benzîna xwe jê stendibû, bi neyînî serê xwe hejandibû û pîrsa wî bê bersiv hiştibû. Vana li dolmîşa xwe siwar bûbûn, ji benzînxanê derketibûn û piştî sê saetan, saet donzêdeh û nivê şevê gihîştibûn bajêr. Di ketina bajêr de gava dewriye di rê de li wan rast hatibû û dîtibû ku reîsê belediyê ye, silav lêkiribûn û bêyî ku li dolmîşa wan saxtî bikin ew berdabûn. Wan jî rast ajotibûn ber deriyê mala bavê keçikê, pîsammê wê bi guliyên wê girtibû, ew ji dolmîşê derxistibû, di hewşê de bi dû xwe de kişkişandibû û biribû avêtibû hundir. Gava diya wê ji xew şiyar bûbû, keçika xwe ya mîna guleke bêstîrî di wê rewşê de dîtibû, xwe negirtibû, xwe avêtibû ser wê, lê bavê keçikê çend pehîn li wê xistibûn, jê re gelek xeberên ne li rê dabûn û bi bazdana keçikê ew jî sûcdar kiribû. Paşê zilaman keçik di nava xwe de hilgirtibûn, ew biribûn xaniyê banî, ji nû ve girê dabûn, derî li ser wê kilit kiribûn û sê roj û sê şevan ne avek ne jî pariyek nan dabûnê. Dotira rojê mala apê wê ji birayê wê yê li Stenbolê re telefon kiribûn, lawik bi balafirê hatibû, li wê rewşê şaş mabû, pêşî bawer nekiribû, dû re gava apanê wî xistibûn serê wî û xwestibûn ku ew namûsa xwe pakij bikin, di nava xelkê de dîsan weke berê bi serbilindî bijîn, jê re demançeke çekî ya ku destikê wê ji aliyê zîvkerekî asûrî ve hatibû neqîşandin, peyda kiribûn û xwestibûn ku ew bi destê xwe, wê dêlika xweha xwe bikuje. Pêşî lêwik qebûl nekiribû, herçiqas dixwest xweha xwe biparêze jî ji ber hin sedeman newêrîbî. Ew bûyera ku di nava bajêr de belav bûbû, ji bo malbata wan ya naskirî kêmaniyeke mezin bû. Û ji bo ku dîsan rûyê malbatê spî bibe, şeref û namûsa wan bi dest bikeve, kuştina keçikê pêwîst bû. Lêwik jî bi vê yeka han dizanîbû. Loma kuştina xweha xwe qebûl kiribû, demançe ji apê xwe stendibû, du caran ketibû hundirê oda xweha xwe, jê nîşan girtibû, lê dîsan jî destên wî lê negeriyabû, bernedabûyê, tenê li ser lingan rawestiyabû û ziq li xweha xwe nihêribû. Xweha wî jî stûyê xwe xwar kiribû, bi porê xwe yê jihevdeketî û bi rewşa pîreke çîrokî li birayê xwe nihêribû. Ne wê, ne jî birayê wê tiştek ji hev re negotibûn. Roja sisiyan gava birayê wê şev nivê şevê

bi şidet derî vekiribû, xweha xwe li ser lingan di qorzîka odê de dîtibû.

Gava xweha wî çav li wî ketibû, mîna ku zanibe ew ê vê carê were kuştin, bi birayê xwe re keniyabû. Ew hingê li ber çavên birayê xwe bûbû weke pîrhebokekê. Lawik ji wê rewşa wê bêhawe tirsiyabû, weke ku tu satilek av bi ser de birijîne di xwêdanê de mabû. Çavên wî weke du bizotên êgir sor bûbûn û beloq bûbûn û bi qêrînekê re bera xweha xwe dabû. Guleya pêşî ku berdabûyê mêjiye wê ji hev belav kiribû û ji ber ku bera eynî cihê dabû, lê keçik bi guleya pêşî re çokên wê fisyabûn û hêdî herikîbû erdê, her heft guleyên ku berdabûnê li eynî cihê ketibûn.

\* \* \*

Êvarî, gava wî xwe bi wî serê xwe yê girêdayî li ser nivînê xwe dirêj kiribû û ziq li zikê odê dinihêrî, ew li wê yekê difikirî. Li salên xwe yên girtîgehê difikirî. Gelek serpêhatiyên wî hebûn. Ew bi gelek kesan re rabûbû û rûniştibû. Gelek kesên nas kirî dîtibûn. Ji bo derbaskirina wextê xwe û ji bo ku xwe ji bîr bike gelek pirtûk xwendibûn. Paşê rewşa wî xerab bûbû, destê wî li xwendina pirtûkan sar bûbû, wî seredanên ku dihatin bi paş de vedigerandin, heta demek pir dirêj bi heval û dostê xwe yê girtîgehê re jî nepeyivîbû. Ew li vê yekê jî difikirî. Paşê ji nişka ve rabû û li ser xwe rûnişt. Piştî kurtedemekê jî çû odeya xwe ya xebatê. Berî panzdeh salan gava hîn berî ev bobelat bi serê wan de were, rewşa malbata wî ya aborî pir baş bû. Ji bilî xaniyê wan yê sêqatî, sê dikanên wan yên kincan jî li bajêr hebûn. Ew odeya xebatê tenê aydê wî bû. Ew çû, dîsan li ber masa xwe rûnişt, herdu enîşkên xwe danîn ser masê, serê xwe xiste nava kefên herdu destên xwe û ji pencerê li derve nihêrî. Ev yeka han ji roja ku ew hatibû berdan jê re bûbû mîna adetekê. Ji nişka ve çavên wî beloq bûn û li dûr nihêrî. Erê, ew ne şaş bû, ya ku ji dûr ve xuya dikir û xwe li wî girtibû û bi firîn dihat xweha wî bi xwe bû. Lawik hema ji cihê xwe pengizî û pencere vekir. Xweha wî di pencerê re kete hundir û dîsan çû quncika xwe ya berê.

– Min ji te re gotibû, kekê mino, got. Min ji te re gotibû, ku destên te bi min bibin ez ê winda bibim. Niha divê tu destên xwe bi min nekî. Ger tu destên xwe bi min bikî ez ê dîsan winda bibim.

Carekê mîna ku winda bû lê dîsan xuya bû. An jî mêrik wilo hîs kir. Vê carê ziq li hêla xweha xwe nihêrî; dît ku erê, rast e, ya ku xwe di quncika xênî de kiriye qomik û stûyê xwe xwar kiriye, xweha wî ye. Xweha ku berî niha bi çend deqîqan bi kirasekî spî û tenik bû û rûyê wê gewr û hinarîkên wê sorik bûn, niha li ber çavên mêrik bûbû mîna berî bi panzdeh salan; porê wê ji hevdeketî, kirasê wê qetiyayî,

zeyif û bêhêz. Loma mêrik ji nişka ve kire qîrîn û bi qîrinê re jî çend caran li ser hev got: “na! na! na!” Bi dengê qêrîna wî re dê û bav û xwişkên wî yên biçûk şiyar bûn, lê gava dîtin ku tiştek tuneye dîsan çûne cihên xwe. Lê diya wî pencera oda wî girt, ew li ser mînderê dirêjkirin da, demekê li ber serê wî rûnişt û serê wî yê ku di rengê berfê de bû, mist da. Wî jî eynî weke zarokekî biçûk serê xwe danî ser çonga diya xwe û herdu congên xwe kişandin zikê xwe. Diya wî gunehê xwe bi wê rewşa lawê xwe anî û ew lawê wê yê ku weke çiyayekî bû, lê niha ketibû wê rewşa xerab, dil û cergê wê disot. Ew demekê li zaroktî û xortaniya lawê xwe fikirî û ew keçikên mehelê ku ji bo lawê wê yê çeleng çiqasî xatir û qîmeta wê digirtin, bi bîr anî. Her ku diya wî serê wî mist dida, wî jî xwe hîn bêtir weke zarokekî hîs dikir û hêsirên çavên wî weke dilopan diherikîn erdê. Diya wî jî ji bo ku hêsirên wê neherikin ser riwê lawê wê, bi destmala serê xwe hêsirên xwe pakij dikir û nifirên dinyayekê li mala apanê wî dikir. Mala apanê wî ku demekê tade û neheqiyê mezînin li wê kiribûn û ew apê wê yê ku bûbû sedema kuştina keça wê û bûbû sedema ku kurê wê têkeve wê rewşê.

Wê, nifir li wî apî dikir. Wê di dilê xwe de nifirên xwe dikirin. Wê digot, te warê min kor kir, Xwedê warê te jî kor bike. Wê digot, te mala min xerab kir, Xwedê mala te jî xerab bike. Wê digot, Xwedê ava reş bi çavên te de bîne. Wê digooût û digot.

Mêrik piştî demeke kurt li ser çonga diya xwe di xew re çûbû, lê diya wî ji bo ku wî şiyar neke, heya saet sisê şevê bêyî ku xwe tev bilivîne, di bin serê kurê xwe de rûnişt. Lê heya ku êdî ji tevizandina lingê xwe debar nekiribû, mecbûr mabû kurê xwe ji bo ku ew here ser nivîne xwe razê, şiyar kiribû. Lawik jî ji nişka ve ji xewê pekiyabû û ew xwêdana ku ji tesira xewna wî ya tirsê mabû bi piştî destê xwe pakij kiribû. Diya wî bi destê wî girtibû, ew biribû oda wî ya razanê, ew li ser nivîne wî dirêj kiribû, rûyê wî maçî kiribû, lampa wî vemirandibû, hêdîka deriyê wî girtibû û derketibû. Yê mêrik jî xewa wî nehatibû, piştî derketina diya xwe bi nîvsaetekê rabûbû ser xwe û dîsan çûbû oda xwe ya xebatê. Çer ku ketibû hundirê oda xwe ya xebatê pencera xwe vekiribû, lê dîsan girtibû, paşê dîsan vekiribû. Vê carê ji nişka ve ji hundirê odê dengê hatibû. Mêrik veciniqîbû, li paş xwe zivirîbû, dîtibû ku dîsan xweha wî li quncika odê stûyê xwe xwar kiriye û dixwaze ji birayê xwe re tiştinan bibêje. Birayê wê jî hebekî berepaş çûbû, li quncika din ya odê li ser kursiyekê rûniştibû û wî jî bi stûxwarî li xweha xwe nihêrîbû. Carekê, mîna ku niqûtibe dilê wî ku ew ne xweha wî ye, bi tenê li ber çavên wî wilo dibe, lê weke xweha wî dizanîbû ew çi fikiriye, loma zûka ji wî re gotibû:

– Ez xweha te me, bavê mino! Ez Sorgulê me. Ez niha ji ba dergîstiya te têt.

Mêrik dîsan jî baş lê nihêribû, ew xweha xwe ya berî bi panzdeh sal û çar-pênc mehan anîbû bîra xwe, dîtîbû ku tu guhertin di xweha wî de çênebûne, ew spehîbûna xwe ya berî bi panzdeh sal û çend mehan hîna jî parastiye.

– A îro min dergîstiya te dît. Wê got, ger tu here, silavên min lê bike, jê re bibêje, ez li benda wî me, ez ji wî pê ve kesî nakim, bila ew jî kesî neke. Wê dixwest bi min re were, lê nehat, wê got, jê re bibêje, bila ew were. Wê got, ma ne heqê min e ku ew were min bibîne. Min jê re got, belê wele, heqê te ye, ez ê herim kekê xwe bînim û werim. Ew niha haziriya me dike, ew niha li benda me ye, çavên wê li riya me qerimî ne. De heydê kekê mino, heydê em herin.

Niha xweha wî çûbû ber pencerê, herdu destên xwe avêtîbûn pencerê û ji birayê xwe re, yê ku dîsan hêsîrên wî di ser riwê wî yê bi rih de diherikî re digot, “de haydê em herin”. Keçik di pencerê re derket û çû. Dengê wê ji dûr ve di guhên mêrik de dikire zingînî: “Tu jî bide dû min keko, ez li benda te me!...” Merik jî herdu destên xwe avêtin pencerê, hilkişiya ser û xwe bi dû xweha xwe de avêt.

\* \* \*

Sibehê zû gava mele ji mizgeftê vegeriya malê, ji dûr ve dît ku yek li kuçê dirêjkirî ye, kûçik û cewrikek li dora wî diçin û têt û lingên wî bêhn dîkin.

Her ku mele nêzîktir bû, têgihîşt ku ew lawê cîranê wan e. Gava wî xwe avêtîbû, pêşî li ser zik ketîbû, paşê qulupîbû ser piştê. Nîvê riwê wî yê çepê nemabû, mêjiyê wî rijiyabû erdê. Melê ew çend mêşên rengkesk yên ku dikirin vingînî, dane alî û bi destmalka xwe riwê wî nuxumand. □

*Swêd, 1989*

# Perçeyek ji romana "XEZEBA AZADIYÊ"

LALÊŞ QASO

Mîna ku ro bi derbên şûr û rîman ketiye zerikê. Di mextela wê de tu dibêjt Mqey xwîn bi ser dinyayê de dinisile, mextel tîş tîş û sor û mor bûye. Ezman mîna sîmê ye. Bi tenê çend sitêr xuya dikin. Ji heyvê re hîn pir divê ku derkeve. Sirûşt tevdigere; bi lez xwe ji qêlik derdixîne û bêhneke xweş difûrîne. Deng bi çirçir-kan ketiye. Ba nadêrî ne lê dîsa jî dinya hênik e. Xortên serek malbatên gund defa sêngê û keç jî qûntara memikên xwe difirkînin; xortan bi lewentoyê û keçan jî bi gulavê porê xwe şeh kirine. Keçên xatûnan ku newqa xwe ji xezalan dizî bûn, kezi-yên xwe wek fidlên maran dane ser hev û xwe di misk û emberê de hiştine. Serê memikên wan di bin fîstanê şîrîkî de wek du lib hersim bel bûne. Kember di bejin û bala bilind de bûne xelek. Tu dibêjt qey sênga wan dikanên zêringeran e, ji xwe re û me re diçirîsinin. Qirika gewr û boz wek berfa şevnivistî ku xunava baranê bigire ser, xwêh daye û dilopên xwêhdana borana eşqê hêdî bi hêdî di coka memikan re têne xwar. Mêrga di nav lûleyên wan ên mermerî de, bi şîrikê ku di xelesa koşka bihuştê re herikîbû qelşika herdu dikên liqûmî, şil û pil bûye. Memikên hinarî, bê-vîla çilagî û çavên wan ên xumarî, di bin birhuyên wek heyva yekşevî de mîna komikên sitêrikan xuya dikin. Mijankên ku ji tîrên nijdevanan jî diwartir in, li kilê siphani xistine û bêwestan di cihê xwe de diqeliqin. Lê şevê hîn jî xwe tazî ne kiriye, sitêrik nalîzin. Ji ser Tahta Birxulan dîsa kewekî berê xwe daye goristanê û mîna ku wazan li miriyan dike qebqeba wî ye. Dengên çûkên beytik nema tê. Teyrekî

mirîşkan mîna ku dixwaze li ser darên behîvan bilûse û ji xwe re cihêkî bi sitar nabîne, ha ha xwe datîne û difire. Garanê ji zû de xwe berdaye gund. Lê herdu keriyên pez hîn jî di çêreya xwe de ne. Piştî çêreya dawî li guherên rêya Bamidê dikevin mexel û şevder dimînin. Gundî bi dorê şevînê dikin. Bin berqefên bestê reşxerîqî ne û mîna tabiyên eskeran xof didin! Terempêla ku ji Nisêbînê rêwî dikişandin Sitilîlê a dawî jî derbas bû. Lê hîn jî Atxê derbas ne kiriye, dengê wê tê heta gund. Kenêr mîna ku ji dawetê mabe, bi lez kera xwe diajo. Ji nav bîstanên qelêç tê. Xurcika xwe dîsa ji petêxên destarkî dagirtî ye. Kûçikan xwe berdane navtarên gund û mîna ku şewrekê digerînin, dudu-dudu sisê-sisê dane ber hev û diçin û tên. Ji şewqa terempêlên ser rêya Îpekê xuya dike ku reşayî ketiye dinyê, di pişt şewqê de çavên mirov terempêlan xweş ji hev nafesilînin. Pisîka Simo û a Fesîh li binya mizgeftê cardin bi hev ketine. Dengê nire nira wan di ser gund re derdikeve. Birahîm vê êvarê jî bi qewsikê du teyrik li ber birka avê kuştine, lê hîn jî xwe ji bin herdu darên tuyan nedaye alî. Gulên berbero di nav bîstanên nêzikî xeta mayinan de mîna eskeran xuya dikin. Herkes derketine ser xaniyan, livînên xwe rast kirine. Çîtê ku jina Kerîm li textê xwe pêçaye, bi sipîbûna xwe li temamê çîten xwedî textan ferq dike. Mêvanê ku nizanîba, wê bigota qey mêtê wê axeyê gund e. Li ser hin xaniyan erzêl hene û dora erzêlan yekser çepelkirî ne. Zarok hêdî hêdî xwe ber didin ser benderên binya gund û xwe ji çirê re hazir dikin. Ji her aliyê gund de dengê pîrekan tê. Bergîla Heso dîsa ketiye nav bîstanê Circîs. Fesîh bergîl rapêşî xwe kiriye û wê ber bi mala Heso de tîne. Hesûk rahiştiye keleşkova xwe û ji ser qesirê nîşanê li dîrekê eletirîka ku ji Nisêbînê ber bi Mêrdînê de diçû, digire. Ne zilaman êdî ewqasî lê dinerîn û ne jî zarokan destên xwe didan ber guhên xwe. Her êvar wilo dikir û fişek ne diteqand. Xaniyê Bozan li tara jêr û ê Zibêr jî li tara jor e û jinên wan ji ser xaniyên xwe bi hev re dipeyvîn...

Ji xort û zilaman rê û rewanî li ser odeya Heso nemaye. Şoreş û hevalên xwe li vî alî û Serdar û hevalên xwe li wî alî di sênga civatê de rûniştine, xwe ji devjengê re amade kirine û di lûleya tivingê re li hev dinerin. Di vî gundê şênî de ji temamê rêxistinên kurdan telebe hene. Û ji bilî Reşo hemû jî beşdarî vê civatê bûne.

Heyecaneke mezin girtiye gundiyan û heryek bi ê kêleka xwe re dike piste pist. Bêsebir di cihê xwe de diqeliqin; mîna guran li devê teleban temaşe dikin bê ka wê ji hev re çî bibêjin û ew ê jî ji wan çî hîn bibin. Aydinê ku berpirsyarekî Partiya Sosyalîstên Memûrên Kurdistanê (PSMK) bû, piştî ku li Sînên nerî û di bin simbelan re beşîşî, bi haweyekî hişk got:

”Komunîzm îdeolojîyêke proleterî ye û xwediyê vê îdeolojîyê jî karker û rewşen-



bîrên wî ne. Çênabe ku partiyeke komunîst ji komik û momikên cihê cihê pêk bê. Lê mixabin partiya Reyis ji du-sê grûbkên ku kes nizane bê kê temsîl dikin, pêk hatiye” û dengê xwe birî.

Tev li Serdêr û hevalên wî, herkes di cihê xwe de cemidî û bala xwe da ser Şoreş. Zinêr xwe aciz kir û xwest ku wek wî bipeyive, lê Şoreş berî wî got:

”Rast e, Partiya Komunîstên Çînê jî ji çend grûbkên ku heryek ji wan lawê papaz, axa, komprador, feqîr û belengazan bû, pêk hatibû. Lê ji ber ku wan hêzeke nuh temsîl dikirin û ew hêz jî proleterya bi xwe bû, bi serketin û bûn mezinê Çînê.”

Aydin bi benikê qerewata xwe girt û kişand. Dû re jî qerewat li situyê xwe sist kir û ji karmendekî bêtir wek aqilmendekî peyivî:

”Li Çînê tu carî partiyeke komunîst çênebû heta ku komunîst bi ser bikevin. Çan Kay-Şek û Vang Cîng-Vey ji Mao û partiya wî pêşverûtir bûn. Mao jîr û zaneyên welatê xwe kuştine û bûye mezinê cahil û pêxwasan. Navê birakujiyê ne serketin, binketin e...”

Şoreş mîna ku henekê xwe pê bike, keniya:

”Mirovên axe û burjuwazî çawa dikarin pêşverû bibin! Çan Kay-Şek û Vang Cîng-Vey axe û burjuwaziyên Çînê temsîl dikirin û welatê xwe pêşkêşî emperyalîst-ran kiribûn...”

Sînanê ku berpirsyarekî Partiya Reel Komunîstên Kurdistanê (PRKK) bû, ferq kir ku ew rê lê nebire, wê ji bo partiya wî jî baş nebe.

”Belê ezbenî, di salên ku Cen Du-sîyu sekreterê Partiya Komunîstên Çînê bû, wî jî bawerî pê anîbû ku di pêşerojê de wê şoreşa wan şiklê cumhûriyeteke burjuwazî bistîne. Ū ji ber vê yekê jî ji meqamê xwe bû.”

Xwest bibêje ”Piştî ku Mao tê ser hikim, wî û hevalên wî hemiyar dikuje”, lê Restemê ku berpirsyarekî Partiya Maoîstên Kurdistanê (PMK) bû, ew sekinand. Destê xwe hejand û bi qahr got:

”Yanî çi! Cen Du-sîyu bi nexweşiya oportunîzma rast ketibû; karker û gundî piçûk didîtin û parlamentarîzm diparast. Dixwest ku li Çînê kapîtalîzm tam bigihê û li parlamentoyê li heqê karker û gundiyan bigere. Partiya we jî ji bo miletê kurd wilo difikire...”

Aydin keniya:

”Yanî Maoyê te ew jî kuşt, ne wilo?..”

Serdar:

”Buharîn jî wilo fikirîbû.”

Piştî ku Şoreş got "Lê ew jî hat kuştin", Bekirê hevalê Serdêr peyivî:

"Heq kiribû. Kamenev û Zînovyev jî heq kiribû."

Bekir sih salî bû. Bi qasî tayikekî dirêj û zirav bû. Bi porê wî ê reş, şahîk û dirêj mirov tê derdixist ku dixwaze xwe bişibîne Ernesto Cîgawera. Gava dipeyivî jî serê xwe wek serê wî ê ku li ser tîşortan bû, radikir, ji jor de dinerî, awir vedidan û dipeyivî. Lê simbelên wî hinekî qalind bû. Ji Diyarbekirê bû.

Berpirsyarê Partiya Herî Komunîstên Kurdistanê (PHKK) ê Enqerê Bişar, bi dû ku hilmek li çixareya xwe xist û bêyî ku dixana xwe hemî berde, bi simbelên xwe list û got:

"Can Guo-dao jî bi nexweşiya oportünîzma çep ketibû; wî jî gundî piçûk didîtin. Ketibû xeta Tiroçkîstê sosyal-faşîst. Li Ernawîtê komunîstê mezin Enwer Xoce jî..."

Heso beşişt:

"Bavên mino hêdî hêdî, we hîn Çîn safî ne kiriye û hûn berê xwe didin Ernawîtê, wilo nabe..."

Herkesî heq da Heso û bi gotina wî kenyan. Bişar jî li pêşiyên xwe çûbû. Xortekî zirav î dirêj bû. Hema hema temamê mêrên bûblaniyan dirêj û bi dar û ber bûn. Bi ser Gird Elî ve çûbûn. Gora Gird Eliyê ku li Zivinga Bitû hindik mabû winda bûba, tibabekî dirêj bû. Mirov xof dikir lê temaşe bikira. Qisûra Bişar a herî mezin ruyê wî hinekî dişibîya ê mîhê; dengê wî jî. Lê kuxuka wî tam lê ê wê çûbû.

Berces zû pê ve danî, xwe aciz kir û berê xwe da Bişêr:

"Tu çawa dikarî ji komunîstekî wek Troçkî re ku hertiştê xwe di rêya jîr û zanehî û mirovperweriyê de feda kiribû, sosyal-faşîst bibêjî! Tu di derheqê Tiroçkî de çi dizanî? Te çend kitêbên wî xwendine? Kî ye û ji ku ye? ev Troçkiyê ku Stalîne we ji tîrsa wî newêrbû raketa. Gramsî bixwînî ku hûn alimtiya Stalîne xwe fêm bikin!..."

Serdar ji cihê xwe çeng bû û bi herdu destên wî girt:

"Berces, ez ricayê ji te dikim bisekine! Bi minaqeşê yek ji me ne himberî te ye. Lê gerek tu jî me fêm bikî, mesele cidî ye. Eger tu jî wek me xwedî partî ba, wî çaxî te çi bigota heqê te bû. Te hinekî serê min jî tev li hev kiriye. Hey me hemiyan daye dû Stalîn, îcar bihêle bê ka em ê di kîjan newalê re derkevin."

Berces piştî ku got "hûn ê di newala Waweylê re derkevin", piştî xwe da balîfê û li Kenêrê ku kêfa xwe bi gotina wî anîbû û dikeniya nerî.

Bercesê nisêbînî li Bûlgaristanê piştî ku sosyolojiyê dixwîne tê Swêdê û li wir bi cih dibe. Mirovekî esmer, kin î zeîf û devnerm bû. Zimanê kurdî baş bi kar dianî.

Lê hin dengdêrên wî dengê siwêdî girtibûn. Xwe tiroçkîstekî kurdan didît, lê di eslê xwe de evulusyonîstekî swêdî bû. Bi mêhvanî car carê dihat welêt û têkiliyên xwe bi teleban re xweş dikir. Li gor teleban qisûra wî a herî mezin ku marksîzm bi kultura sosyaldemokratên skandînavî rave dikir û ji şerê çekdarî direviya. Û ji ber vê yekê jî kesî pê re hevaltî ne dikir. Berces mirovekî ji xwe razî bû, lê ji yekî ji xwe razî jî ne dihenitand. Bi vî hawayê xwe kubar û şêrîn dibû. Dixwest têkeve çavên civatê; lê hew tenê bi zimanê xwe. Ev yeka ha jî ew di qada întelektuelên herêmê de tahl dikir. Ax ku ne ji wî aliyê wî ê megolomanî ba!.. Gava êrîşî Stalîn dikir, bêyî ku bi xwe bihisê dibû heyranê Troçkî. Dîsa jî baş bû ku megolomanîzma li ser paşîv bû.

Rojekê Yuzbaşiyê Tabûra Nisêbînê bi mebesta ku qaçaqxçiyên dîsa li hidût xistine, tê Dala; gundiyan derdixîne ser benderan û li wan êşkencê dike. Bercesê ku li vî gundî mêhvan bû mîna ku Dala gundekî Swêdê ye û li himber yuzbaşiyekî swêdî rawestiyaye, bi zimanekî kubar li ser heq û hiqûqê insên bi ê yuzbaşî re dipeyive. Yuzbaşî jî hema di cih de dev û diranên wî dipelixîne, wî radike tabûrê û piştî bîst û neh rojan wî berdide. Li gor ku digotin, Berces ji destê êşkenceya ku xwaribû du mehekî li nexweşxaneyê Diyarbekirê radikeve.

Circîs jî bi hawaye ku bala civatê bi aliyê xwe de bikişîne:

”Ev hûn çima behsa Berzanî nakin, lo? Berzanî di bin guhê me de ye û hûn diçin heta bi Çînê”, got û sekinî.

Kesî guh nedayê. Telebe bi carekê ve li dijî Berzanî bûn û ew zîlamê emperyalîstan didît. Lê ji ber ku gundiyan jî qîmeteke mezin didan Berzanî, newêrtibûn têtetana vê mijarê. Sînan mîna ku Circîs tiştê ne gotibe, tena tena û cidî peyivî:

”Tarîxa, qaşo, komunîstên çîniyan (!) tarî ye. Wan tim û dayim demokrasiyeke eskerî bi kar aniye. Ew li ser cendekên welatperwer û demokratan bilind bûne. Hevalên xwe bi xayintî kuştine û dû re jî navê wan ‘ajanên emperyalîzmê’ îlan kirine. Di salên ku partiya Mao bi Guomîndang re li himber milîtarîzma japonî cephe danîbû, îdeologê partiya wî Vang Mîng jî bi çavekî mezin li vî cebhî dinere û ji bêbextiyê direve. Bêbextî dibêjim, çimkî piştî ku Mao îşê xwe bi cebhê diqedîne, ên ne wek xwe hemiyar ser jê dike. Mao vê lepta Vang di qalibê oportunîzmê de digire û wî jî ajaneke emperyalîstan îlan dike. Wek wî bi deh hezaran kes hene, lê pêwîst nake mirov navê hemiyar bibêje. Di vir de a girîng xêzik e, gerek mirov li ser vê bisekine.”

Sadiq ji dera ha zend û milên xwe hejandin û herdu destên xwe bi hev re bilind kirin:

"Kuro Sîno, ka bise ka bise! Ê hema bi telaq min nehişt ku tu li ser xêzê bisekine heta ku tu di derheqê wî zilamî de tiştêkî ji me re nebêjî. Erê ew Mao ye bê çi ye, çi bi serê wî zilamî kir, kuro? Lawo hema xwedê bike wî jî nekuje..."

Kerîmê ku navê serokên dinyayê dizanîbû li xwe qewimand:

"Sadiq hewce nake ew bibêjin, zilamê ku bikaribe jina xwe têxe hepsê, îcar bifiki-re û hew!"

Zibêr piştî ku got "Kuro qey jinikê jê re ne dihişt", dev li serê zimanê xwe kir û li Aydinê lawê xwe nerf. Aydin jî lê nerf, lêbelê dengê xwe ne kir.

Şoreş:

"Partiya komunîstê mezin Mao, careke din isbat kir ku serketin û neserketina partiyêke siyasî, birastî û nerastiya xêzikên hatine danîn ve girêdayî ye. Xêzika rast her tim bi xêzikên çewt re di nav têkiliyên zîtî xwe de dimeşe; bi wan re tekoşînê dide û li pêş dikeve. Gava ku dizê malê ji malê be mal xerab dibe; oportûnîzm nexweşiyêke hindurî ye û her ganêrê malê jî dikare bi vê nexweşiyê bikeve. Vang Mîng di salên dawiyê de ketibû bin tesîra felsefa Konfuçyus û Mençiyus û endamên partiyê ber bi îdealîzmê de dibirin. Heq kiribû."

Aydin bi helwesteke تمام:

"Li gor zihniyeta totalîter rast e, heq kiribû..."

Bişar bi haweyekî ji xwe razî:

"Li Ernavîtê Seyfullah Maleşova jî bi nexweşiya wî ketibû. Di kongra 1946an de bi zimanekî vekirî digot 'gerek ev sîstema me a demokratîk wek demokrasiya burjûwazî bixebite, daku reqabet têkeve nav insanên me û welatê me dewlemend bibê.' Ajanên emperyalîstan incex dikarin van gotinan bikin. Baş bû ku komunîstê mezin Enwer Xoce zû rê lê girt û ew ceze kir..."

Sînên destê xwe hejand:

"Baş e, ew ajanê emperyalîstan bû an na, me fêhm kir, ma bi dehan ên wek Koçî Çoçe jî ajanê emperyalîstan bûn ku Enwer Xoceyê te îşê hemiyar qedand, hi?"

Restem bi dû ku got "Ajan bû û ajaneke pir mezin jî bû! Koçî Çoçe û Pandî Krîsto troçkîst bûn", li Berces nerf û di cih de gotina xwe birf. Aydin hema bi peyva wî re:

"Îcar ji Bihemd Şêxo re tu ê çi bibêjî?"

Mele Salar veciniqî:

"Te got çî! Çawa dikarin Bihemed Şêxoyê ku pêşmerge bi sitiranên wî êrîştî ser kozikan dikirin, bikujin!" û xwe aciz kir.

Serdêr bi qerf:

"Seydayê delal, gerek tu zanibî ku ew Bihemed Şêxoyekî din e..."

Gotina wî li telê Kenêr çû:

"Ez dixwazim pirseke ji we bikim", got û li bendî bê ka ew ê çî bibêjin ne sekinî.

"Partiya Hoybonê li ku û di kîjan salê de avabû û serokê wê kî bû?"

Hemiyana di bin çavan re li hev nerîn. Kenêr dîsa pirsî:

"Tirba Ehmedê Xanî li ku ye?"

Şoreş:

"Apê me jî pirsna wisa ecêb dike ku kesek ji me nizanibe."

Serdar:

"Em Hoybonê û Ehmedê Xanî nas bikin wê bibe çî yanî (!) Ji me re çî kirinel.."

Heyv di nav devjenga wan re hilatibû; niha jî bejinekê bilind bûye û mîna xence-reke soranî xuya dike. Sitêrik naçirîsin. Şewqa heyvê di tahtên qesrikê de xwe daye ser kavlên Sirêçkê û di qesira Girdo de gihaye hev. Qesira wî mîna hêkê sipî diyar dike. Siha xaniyan, di kendalên bestê de wek pozê zinaran kişiyane. Zarok bi tûştê dilîzin û xwe di ber taldeyên dîwaran de vedişêrin. Kûçikan mîna ku hîn jî li hev ne kirine, di navtaran de piyasê dîkin. Ne dengê pîrekan û ne jî dengê giryê dergûşekê tê. Sirûşt îşev pir comert bûye; di nav bayê xwe ê hênîk de bêhneke xweş difûrîne.

Luqmên dîsa kasetaya şerê Bişarê Çeto û Hemê Gozê daniye ser teybê û moca wê li niqra dawî sekinandiye. Dengê teyba wî heta bi Sirêçkê diçe. Ji Sirêçkê jî dengê du-sê teyban tê. Di eslê xwe de sirêçkî bi sihûd û qubal bûn ku bapîrên wan Sirêçkê di navbera Zorava û Sarincê de ava kiribûn. Bi êvarkî re ên wek Selmo û Metoyê bêteyb, him li teybên sarinciyana û him jî li ên zoraviyana guhdarî dikirin. Di vî warî de sarincî bi qasî nisêbîniyana li pêş ketibûn. Hin kesan hoperlorên ku li sînemeyana bi kar dihatin, kiribûn. Berê hoperloran didan gundên çiyê û binya xetê û dengê wan heta bi dawî hildidan. Îşev dengê hoperloraya Şêxoyê sarincî bi zorê digihê Zorava. Wilo xuya ye, merqa hoperloraya wî bi qasî a ku li sînemeyaya Mûngana bi kar tê, saxlem nayê. Xwediyê sînemeyê bi qeweta vê hoperlorê hin mîrên dalayî, dêrî, şanişî, kelehî û qamişlî hînî sitiranên tirkî kirine. Baş e ku bûblanî jî wek omeriyana, hîn jî xebardana bi tirkî şerm dibînin; yana wê ên wek Şêxo û Faro bi hoperlorên xwe herkes hînî sitiranên tirkî kiribana.

Serdar û Sînan bi haweyekî hişk rahiştibûn hev. Piştî ku civat bi devjenga wan nerehetiya xwe tîne zimên, ew jî ji mecbûrî wek ku civat dixwaze kubar bi hev re dipeyivin. Şoreş got:

"Mesela şoreşê a herî bingehîn ku iqtîdarê bi dest bixîne. Û ev yeka ha jî inçex bi

rêya sîleh dibe. Marksîzm û lenînîzm vê diparêze. Ên ku vê rastiye qebûl dikin şoreşger û ên ku nakin jî ne şoreşger in.”

Aydin û Sînan bi hev re gotin:

”Marksîzm û lenînîzm ne dogmatîzm e. Li gor şertên welatan bi kar tê. Iqtîdar li welatekî dikare bêsilah û li yekî jî bi sîleh bê sitendin.”

Serdêr ji dil got:

”Hûn sovyetçî ne. Li gor îdeolojiya we gerek welatên sosyalîst û emperyalîst, karker û burjûwazî bikaribin wek biran bi hev re bijîn. Gerek em bi a Krûşçev û Birejnev bikin û Politîka-Detant bi kar bînin û bi sînorên Rohilatanavîn nelîzin. Gerek em bi tirkên re şer nekin heta ku tirk bibin insan... Her şoreş bi devê tivingê dibê...”

Sînan:

”Helbet em wek we ne şerxwaz in. Gelê me bi rêya aşitiyê dikare heqê xwe bi destxe...”

Bişar henekê xwe pê kir:

”Yaho hûn li Çola Sahrayê li berfê digerin, hayê we ji dinyayê tune ye. Ji vê dinyayê tu dikarî nimûneyekê bide min ku karker û gundiyan bêşer iqtîdar û filan û bêvan sitendiye, hi?”

”Karker û gundiyan dinyayê û bi taybetî jî ên Ewropa-Roava tucarî ne bûne marksîst heta ku bikaribin bêxwîn iqtîdarê zefî bikin...”

Aydin xwe di ber re rakir:

”Mesele Şîlî. Alende bêxwîn iqtîdar zefî kir, lê heq jê derneket...”

Ji bilî Sînen hemû pê kenîyan. Restem:

”Zaradov û Sûslovê we bila pê ve biçûna. Mêrik ‘Detant’ a wan bi kar anîbû. Başkan Mao bi derewan ne gotiye ku ‘iqtîdar di devê tivingê de ye’...”

Seyitxan ji dera ha:

”Rast e, ku ne bi darê zorê be mirov nikare here ba jina xwe jî!”

Civat kenîya. Mîrzo di bersiva wî de:

”Bi telaq ku jinikê ji te re bihişt a te wilo ne digot, lo.”

Remo xwe avêt pişt Mîrzo:

”Ma wê çawa jinik jê re bihêle bavê mino, mêrik har e. Jinik ji hev de xistiye. Ma hûn nabînin bê xanima wî çawa şahto mahtî dimeşe...”

Xelef, qaşo xwest ku rê li henekpêkirinan bigire. Lê bi gotina wî re civat tam ji ser xwe çû û ji ken derbasî hoqêboqê bû.

”Bavo ne hewara qu...ê jina we ye, ka bihêlin bila birayê me Rûreş ji me re bipe-

yive, weh!”

Di vê carê de gotina wî tam li hesabê Heso hatibû. Piştî ku li Sadiq guhdarî kir, dîsa kenîya û çavên xwe zivirandin ser Xelef:

”Kuro Xelef Xelef, lawo navê wî ne Rûreş e, Şoreş e yaho!..”

Berces di cihê xwe de diqeliqî. Di dawiyê de xwe ne girt:

Ev partiyên sovyetçî ne felsefa marksîzmê û ne jî tarîxa marksîstên ewrupî dizanin. Ma Roza Luksembûrg, Karl Lîbcnet û temamê spartakusiyîyan dest avêtibûn sî-lehan ku emperyalîstan ew di xwîne de fetisandin, hi! Na... Komunîstên macarî bi haweyekî barbarane hatine kuştin!.. Li temamê Ewropayê komunîst hatine kuştin... Îcar dema ku cumhûriyetçiyîyan li himber faşîzma Franko şer dikirin, Stalîn jî ajanên xwe şandibûn Spanyayê û troçkîst dikuştin.” Piştî ku bi keder got ”Bi rastî jî halê me kurdan wek hewa Swêdê ye”, civat ji wan re berda û keserek veda.

Kûçikan li ser bereteyê mîha ku li bestê bû pevdiçînîn û bi pevçûn û pevçûn ber bi benderên piştî gund ve dihatin. Zarokan jî dev ji lîstika xwe berdabû, li wan kom bûbûn û ew hîn bêtir li hev sor dikirin. Dengê zarokan bala Şoreş kişand. Pêşt çixareyek pêxist, dû re jî gotina Berces birî û bi civatê re peyivî:

”Erê, hûn dibînin bê zarok çawa bang kûçikên xwe dikin! Navê kûçikên wan Zinar û Çiya ye. Howeh li vê ecêbê, em miletekî ku ji destê zilma tirkan newêrin navê kurdî li xwe bikin, îcar em li kûçikên xwe dikin û partiya PSMK û PRKK jî wê bi metodên aşitiyê doza vî miletî ji van zaliman re bînin zimên!..”

Sînen bi xwe ne xweş anî:

”Tu demagojiyê dikî. Di programa me de şerê çekdarî jî heye. Lê me ew avêtiye plana dawî. Berî şer, pêştî divê em xelkê xwe jîr û zane bikin û temamê rêyên demokratîk bi kar bînin. We marksîzm-lenînîzm çewt fêm kiriye. Kurdistan ne Çîn e ku hûn bi zihniyeteke Maoî rabûne ser xwe. Partiya te û Serdar, Bişar û Restem bi şerekî hindurî daketiye û kurdan berdidin pêxêla hev...”

Piştî ku Aydın got ”Ê me, em tu carî nabin hevalê şer; ji ber ku şerê herî piçûk jî dikare welatekî herî mezin xerab bike. Şer mirov bi ser barbariyê de dibe...” Şoreş peyivî:

”Şoreşa kominîstên Çînê, ji sala 1921ê heta sala 1949an tam di çar merhelên tarîxê re derbas bûye. 28 sal girtiye. Merhela pêştî bi haweyê şerê hindurî dest pê dîke û agirê şoreşê pêdixîne, a duduyan şoreşê bi şerê reforma erdan disincirîne, a sisêyan şoreşê bi şerê li himber mîltarîzmê diqemirîne û a çaran jî şoreşê bi şerê ji bo bîdestxistina iqtîdarê dikelîne. Ev lênerîneke stratejîk e. Lê, wek ku Başkan Mao û Reyis jî dibêje, di pratîkê de şerê van herçar merhelan gerek her tim bi hev re bime-

şe. Wî wiha kiriye û bi ser ketiye. Em jî divê wiha bikin.”

Aydin:

”Tu û partiya te hûn ji bîr dikin ku welatê me bi her haweyê xwe ji Çînê cihê ye. Li Çînê Çankay Şek hebû. Çîn nîv dewletek bû û zimankî wan hebû. Li Kurdistanê tiştêkî wilo tune ye. Dewleta tirkan bi qasî ku dijminê min û te ye, ewqasî jî dijminê axe, beg, şêx û melên Kurdistanê ye. Doza me miletî ye, divê em deriyê şoreşê ji herkesî re vekirî bihêlin. Û heta ji qahpikan re jî!”

Serdar:

”Helbet şerê me miletî ye. Lê divê mirov vê jî tu carî ji bîr neke: Li Çînê mirovên burokrat, komprador, axe û papaz her tim li himber şoreşê sekinîne û digel emperyalîstên japonî heta bi dawiyê şer kirine...”

Şoreş bi haweyekî devlikenî:

”Rast e, teza ku di labratowara şoreşê re derbas bû, hîç pêwîst nake mirov careke din bîne labratûwarê. Axe, beg, şêx û burokratên kurdan tim û dayim xayin bûne. Berî dewleta tirkên faşîst, em divê bi van re şer bikin. Ji xelkê me re tiştêkî bi rûmet ne kirine.”

Restem sor û mor bû û bi hêz destê xwe li ba kir:

”Îcar di vir de em wek we nafikirin. Ji ber ku sosyal-emperyalîzma sovyetî bi lez li pêş dikeve û bûye emperyalîzmeke serekî, berî dewleta Tirkîyê gerek pêşî em bi vê emperyalîzmê, axe, beg û şêxên Kurdistanê re şer bikin.”

Bişar:

”Na, em wek we nafikirin. Ji ber ku emperyalîzma emerîkî û rûsî herdu jî pir bi hêz in û bi hev re dinyayê dişelîhînin, gerek em jî bi herduyan re şer li dar xînin...”

Circîs xwe ne girt:

”Kuro hûn tiştan wilo ecêb dibêjin ku aqilê mirov hîç nikare qebûl bike! Berzaniyê ku temamê kurdan dabû dû xwe û 20-30 salî bi dewleta Iraqê re şer kiribû têkçû, îcar em ê çawa bêtenq û top û teyare bikaribin bi Urûs û Emerîkayê re şer bikin! Ev we mejiyê xwe xwariye!..”

Civat jî li hêviya bersiveke wilo bû. Heso da ber Circîs:

”Li vê dinyayê ji mêrê ereb gendelîtir mêr tune ne, Berzanî nikarîbû bi wan re serî derxista, îcar em ê çawa bikaribin serî bi gunmezin û ganêrên wek...”

Restem mîna ku li çûran kaban xîne, nehişî peyivî:

”Hûn ‘eskî kafa’ne, apo! Ûşaxên emperyalîstan hûn çavtirsandî kirine; heqê we heye ku hûn van gotinên neşoreşgerî dikin...”

Eger Kenêr ne gotiba ”Apê Heso û Circîs jî fikira xwe dibêjin...”, Restem wê bi



dest û lingan bida nav û pîsiya emperyalîzmê di ruyê temamê civatê de bida.

Ji herkesî bêtir Şoreş kêfa xwe bi gotinên wî anîbû. Tiştê ku wî dixwast û nikarîbû bigota, Restem gotibû. Li gor wî, Restem dilê civatê ji telebên gund sar kiribû û civat ber bi wî de ajotibû. Dilê wî sivik lê dixist. Di bin simbêlan re dikeniya û bi hawayê ku wê çawa bikaribe Serdar li koncalê biqelibîne, bi çavekî dijminî lê dine-rî.

"Li gor marksîzmê her komunîst, gerek pêşî ji gundê xwe dest bi hertiştî bike", got û dengê xwe birî.

Bekir çarmêrkî rûnişt, serê xwe bilind kir û destê xwe ê rastê hejand:

"Wisa ye. Pêşiyên me jî tiştêkî bi rûmet ne kirine, ev jî wisa ye; lê we ji xelkê me re çi kiriye gelo?"

"Gerek hûn vê pîrsê ji xwe bikin. Baş e, ez ji we re dibêjim, we heta niha çend xayin û ajan kuştine, hi?"

Serdar di bersiva Şoreş de:

"Hema berî niha bi şeş-heft rojan, me li Nisêbînê Dimsoyê Erebecî kuşt. Ajan bû."

"Me jî eyarfiroşê omerî ku xelkê şika muxbirciyê jê dikir, li mehela Qijlê kuşt."

Bişar berê xwe da Şoreş:

"Tu derewan dikî, ê ku eyarfiroşê omerî kuştîye partiya me ye..."

Restem sor û mor bû û bi hêz destê xwe li ba kir:

"Îcar hûn çima behsa eylema partiya min nakin, ev çawa şoreşgerî ye yaho! Temamê nisêbîniyan pê dizanin ku me, dikana wî zêringerê kevneperest tazî kiriye..."

Sitêrikan xwe ji dor heyvê dane alî û ji dûr ve pê re dilfizin. Eletirîkên Nisêbînê û Qamîşlê bûne yek; Nisêbîne wek bajarekî mezin dikeve çavên mirov. Ji ser odeya Heso eletirîkên Amûdê windane; lê mahsera bajêr mîna agirê Newrozê di ezmên de xuya dike.

Serdar û Şoreş wek du kewên şingalî dabûn ber hev û civatê jî bédeng li wan guhdarî dikir. Yekî ji yekî danedixwar; car carê xwe ji hev aciz dikirin û bi ser hev hildibûn.

Şoreş piştî ku bi kenekî xemgîn got "We, li Xanika Cizîrê qaz û ordekên hevalbendên me kuştibûn. Ma mirov çîçik û mîçik û mirîşkkan dikuje!" û li Circîs nerî.

Serdar ruyê xwe tirş kir:

"Mirîşk dibe, çi dibe bila bibe, li gor marksîstê mezin heval Stalîn, tiştê ku zerarê bide malê gel, divê bê kuştin. Qaz û ordekan ava gola gund dilewitandin."

Berces bi qerf got, lê wan fêm ne kir.

"Îcar kê ji we şêxê Bizgûrê kuşt?"

Şoreş xwe nepixand û eniya xwe xurand:

"Me ew cahş kuşt!"

Bekir xwe jê bêtir nepixand:

"Me jî şêxê Enkafê kuşt!"

Ne wilo bû. Şêx, wan li nav rez dibîne û ber bi gund de direve. Bi rê de dilê wî sekinîbû.

Restem bi haweyê ku dawet revandiye û hindik maye dawet xelas bibe:

"Tam di neqeba ku ber bi Heskîfê de dadikeve, me li Şêxataullahên batmanî girêda, lê çi fêde zû bi me hisiyân û xwe ji texsiyê avêtin..."

Bişar tiliyên xwe di hev re derbas kirin û bi dengêkî pêt peyivî:

"Me jî çend meh berê li Enqerê, miftiyekî kevnepêrest kuşt."

Mele Salar piştî ku çavên xwe kutkutandin, bi ruyekî sar û qermiçî di ber xwe de got, "Hema Xwedê bike ew miftî tirk be", xwêziya xwe daqurtand û li ezmên nerî. Dengê wî çû wan, lê tiştêk jê re ne gotin.

Sînan bi qahr:

"A ku hûn dikin ne pêkanîna şoreşê, têkbirina şoreşê ye. We dest dirêjî erdê axe û şêxan jî kiriye û hûn li gundiyan belav dikin..."

Bekir rabû ser herdu kabokan û bi teqîl peyivî:

"Ma ku em ji niha de erdê axan li gundiyan belav nekin, em ê kengî vî karî safî bikin efendim! Şoreşa me demokratîk û milî ye. Aliyê wê ê demokratîk xwedîerdan û aliyê wê ê milî jî milîtarîzma tirkan hedef digire..."

Serdarê ku tiliya xwe xistibû devê xwe û nenûka xwe dikoja:

"Me xwest ku em li Batmanê erdê Mala Çelqê li gundiyan belav bikin. Lê esker anîn ser erd. Par bi qeweta eskeran çandinî kirin, me jî agir berdayê. Îsal jî beyar maye. Ne em dikarin û ne jî ew dikarin biajon."

Şoreş bi haweyê ku qerfê xwe pê bike tevgeriya, lê wî jî wek wî got:

"Me jî li Hîlwanê axeyekî sax ne hişt; heta bi zarokên wan jî me kuşt. Îcar piştî ku gundiyan li ser erdên wan girêda, bi hezaran esker kişiyên ser erdan û gundî hemû girtin. Ew erd ji ber ku îro bêxwedî mane, dewletê jî hemû kirine malê xezîne. Kes nikare biajo. Bi kurtî ez dikarim bibêjim ku me li Hîlwanê şoreşa xwe a demokratîk qedandiye. Di pêşerojê de gava me dewlet bi carekê ve ji wir derxist, em ê bi hêsanî wan erdan li gundiyan belav bikin."

Heso bi haweyê ku şîretekê li wan bike peyivî:

"Bi xwedîerdan, axe, şêx û esnafan re şer nekin; ev welat bi wan heye. Ew heva-

lên kê bin, ew ê bi ser bikevin. Îcar hema Xwedê aqil bide we û hew!”

Aydin ji gotinên Heso cesaret girt. Piştî ku dîsa qerewata xwe ediland û bi deng got ”Apo, ev macaracî ne! Felsefa wan a xerabkirinê ye. Eger di demekê de lê bê û wek wan bibe, wê ev zir welat bi carekê ve xirîxopan bibe û nan ji tu kesî ji me re nemîne”, zor bi qirika wî hat, zimanê wî ê piçûk nema çerx kir, civat pê keniya. Hema pê re ew jî rabû ser xwe û çû.

Dengê Aydin li karekterê wî ê burokrat, çûbû. Dengketî bû. Dema ku dengê xwe hildida û bi hêz dipeyivî, dengê wî dibû wek ê zarokan, mirov digot qey he- nekan dike. Bi serê xwe ê mezin û lêvên xwe ên qalind dişibiya mêrxasên kurdan. Ji dûr ve tam kubar xuya dikir. Ji nêzik de jî kubarî bû. Ax ne ji wî aliyê wî ê qûn- sîrî ba! Gava ku gotin li hesabê wî nehata, di cih de erza ên li himberî xwe dişike- nand û civat diterikand. Bi qelafet jî bû. Li gor zihniyeta partiya wî qerewat, sem- bola medeniyetê bû. Û her endamên partiyê jî mecbûr bû ku bi vê sembolê him bigeriyana û him jî di civatan de rûniştibana. Bi rastî jî gava ku di şûna sola derbê de qundere girêdida, qerewatê jî tam û tam li bejinê dixwar.

Şoreş gotina Aydin cidî ne girt. Berî ku hin tiştekî bibêjin, wî berê xwe da Ser- dêr:

”Hûn araqê vedixwin...”

”Tu derewan dikî! Me jî araq qedexe kiriye, lê hin heval carina bîrakê duduyan vedixwin...”

”Hûn çixarên Marlboro, Samsûn û Maltepe dikişînin...”

”Tu derewan dikî! Em jî wek we çixarên Bidîs, Birîncî û tûtînê dikişînin...”

”Gerîla pezê xelkê ser jê nake û naxwe; lê hûn bi gundiyan pez ser jê dikin...”

”Ev jî derew e! Li gor qerara partiya me jî, ji heftê carekê endam derdikevin çiyê, xwe berdidin ber çeman û mar, beq, kwêsi, kevjal û kêzikan dixwin.”

”Esker û polîsên tirkan her roj sê-çar kesên kurd dikujin û hûn jî di dawetan de direqisin...”

”Tu mirovekî derewîn î! Me wek we li gelê xwe dawet hîn qedexe ne kiriye, lê em di dawetên wan de nareqisin jî...”

Şoreş bi haweyekî ji xwe razî:

”Li ser pêşniyara Reyis, partiyê zewaca hevalan qedexe kiriye...”

Sînan xwe soro moro kir:

”Hûn klînîk in, pêşî herin xwe tedawî bikin”, got û bi wahc ji civatê rabû.

Serdar piştî ku jê re got ”Eger em klînîk bin, hûn jî zir klînîk in. Tirk gergedan e û hûn jî ji vî gergedanî doza heq û hiqûqê insên dikin” û berê xwe da Şoreş:

"We li ser navê me nameyek ji Sebrîyê nisêbînî re şandibû ku Sebrî, keça xwe bi êvarkî re ji we re bîne bin Pîra Eleman."

"Tu bêbextiyan dikî!"

"Na, ez bêbextiyê nakim, me hevalên we li bin pirê girtin..."

"Heta niha we nozdeh hevalên xwe kuştine, ma ev jî bêbextî ye!"

"Erê bêbextî ye! Me ne nozdeh, neh hevalên xwe ên ku dev ji partiyê berdabûn, kuştine..."

Bûbû derengî şevê. Lê gundiyan dîsa jî dev ji civatê bernedidan. Destê wan jê ne dibû. Dewlemendiya ji salên 70î û vir ve û tevgera teleban, sitûnên kîn û dexsa sed salan di zindana mejiyê wan de xistibû û bi vê devjenga îşev sitûn hêdî bi hêdî radi-bûn ser xwe. Kengî diçûn mala xwe! Herkesî bi meraq li wan guhdarî dikir. Car carê wan jî a di dilê xwe de dikirin qerf û digotin, lê mixabin teleban jî hîç rû nedidan wan. Kenêr rabû ser xwe ku here malê. Heso û Cîrcîs bi hev re jê re gotin:

"Ma aqilê te ji dîwarên qesirê birî?"

"Dîwar bi zilaman lêdibe", got û bi lez xwe di mêrdewanê re berda...

Ev romana L. Qaso "Xezeba Azadiyê", dewama romana wî ya bi navê "Sê Şev û Sê Roj" e.

## \*Pîrê, Baxçe û Adar

Pîrê li ber caxên pencereyê  
bayekî spî yî bêlekan, hêlekan  
pêgermoka digêrîne li ser sîseqerqashiya berfê  
sêv serma dîkin

hîna ne xeber e ji havîna Deşta Îdirê  
çivîk li ser darê serma dîkin

Adareke tembûrî ye baxçeyê me  
kurdewarî diguvin danîştvanên çîla  
yek yek nas bikin:  
ev, Hurmiya şêranî  
ev, Gêlaza xwînî  
ev, Bîşenga helbestî  
ev, Xoxa xunavî  
ev, Mişmişa banî  
ev, Sêva zivistanî

li ba me, li wan deran  
bîstê Adarê zivistan e  
bîst û yekê wê, li bêxçe bihar e


Dayê, gulîberrê, Xwezayê  
ez di bextê te de me  
bi bêriya te ketime, boşhal im  
ji janan jan diceribînim  
ji halê xwe re dibêjim  
diya min a dilhewîniyê  
min dîsa bihewîne, ez kurê te me

### **KAWA NEMIR**

\* Navê bagereke destpêka meha Adarê ye. Jê re Gîskê Pîrê jî dibêjin.

# Pêwendiyên kurdan û vîkîngan

## ROHAT ALAKOM



Dîroka pêwendiyên Swêdê û rohilatê gelek kevn e, ev dîroka heta salên dewra vîkîngan dirêj dibe. Di navbera salên 800 û 1050î de vîkîngan sê an jî çar<sup>1</sup> seferên talankirinê li rohilatê pêk anîne. Vîkîngên danmarkî û norwecî zêdetir ber bi welatên ewrûpayê sefer pêk anîne, yên swêdî ber bi rohilatê. Vîkîngên swêdî heta Rusyayê, Behra Reş, Konstantînoplê, Behra Hezarê û heta Bexdayê çûne. Derbarê van ger û seferên vîkîngan de bi gelek zimanan lîteratureke dewlemend îro li ber destê me heye û di vê babetê de lêkolînên fireh hatine amade kirin. Ji van xebatan çend hebên balkêş ji aliyê T. J. Arne<sup>2</sup>, R. Nordenstreng<sup>3</sup>, Holger Arbman<sup>4</sup>, Mats G. Larsson<sup>5</sup> û Catharina Ingelman-Sundberg<sup>6</sup> de hatine nivîsîn. Derbarê pêwendiyên Swêdê û rohilatê yên dewra vîkîngan de, bi taybetî arkeolog û dîroknasên swêdî T. J. Arne (1879-1968) Holger Arbman (1904-1968) û Mats G. Larsson (1946-) gelek lêkolîn amade kirine û demên cihê-cihê de weşandine. Derbarê van seferan de delîlên here mezin li Swêdê dîtina kevirên nivîskî (runsten) û pereyên zîv (dîrhem) yên rohilatê ne. Ev kevirên nivîskî û ev pereyên zîv derbarê pêkanîna seferên vîkîngan yên rohilatê de me gelekî ronî û agahdar dikin.

Qasî ku em pê dizanin heta niha di derbarê pêwendiyên kurdan û vîkingan de tu lêkolîn nehatine çêkirin. Tenê navê kurdan di çend cihên hin çavkaniyên ku li ser babetên mayin de hatine amade kirin, derbas dibe, wek xebatên li ser pereyên zîv yên rohilatê ku di dewra vîkingan de hatine Swêdê û wek çend cihên kronîka dî-roknasê ereb Ibn Miskawaih.<sup>7</sup> Beşeke xebata me ya ku bi zimanê swêdî wê di vê payiza sala 1999an de biweşe, li ser babeta pêwendiyên kurdan û vîkingan e.<sup>8</sup> Çawa emê li jêr bibînin kurd û vîking bi ihtîmaleke gelek mezin li Berda'ayê sala 943, Diyarbekirê sala 1000 û li Malazgîrdê sala 1071ê de bi kêmanî sê caran rastî hev hatine. Delîlên van rasthatinan yê here berbiçav, bêguman li Swêdê dîtina wan pereyên zîv yên kurdî û dîtina wan kevirên nivîskî yê dewra vîkingî ne. Ji van kevirên nivîskî çend heb li ser vîkingên ku çûne Bîzansê, li wir mirine, beşek jî, ji bo vîkingên ku li rohilatê, li Särklandê mirine hatine çêkirin. Ji aliyê din çavkaniyên dîroknasên ereb û çend çavkaniyên mayin jî van kontaktên dîrokî rast derdixin û dîtî-nên li ser van kontaktan xurt dikin. Li cihên ku vîkingan li rohilatê ziyaret kirine, em dikarin bêjin ku li her derê kê-m-zêde kurd hebûne. Di dewra vîkingan de li Kurdistanê û Azerbeycanê, mîrîtiyên kurdan yê wek merwanî û şeddadiyan çawa tê zanîn bi nav û deng bûn. Berî ku em derbasî babeta pêwendiyên kurdan û vîkingan bin, divê em li ser çend xalên mayin bisekinin, wek pêwendiyên vîkingan - rusan û bi giştî seferên vîkingan yê rohilatê.

### **"Deriyê Asyayê yê herî mezin"**

Hemû pêwendî, hatin-çûyinên vîkingan yê rohilatê, li ser Rûsyayê re pêk hatine. Împaratoriya Rûsyayê ji bo vîkingan wek "deriyê Asyayê yê herî mezin" dihate hesabîn. Gelek pêwendiyên vîkingan bi rusan re hebûn. Ji bo ku pêwendiyên kurdan û vîkingan baş bînin fam kirin, divê em perçekî li ser pêwendiyên swêdiyan û rusan bisekinin. Beşeke wan pereyên kurdî yê merwanîyan ku li Gotlandê hatine dîtîn, mimkûn e cara pêşîn hatine Novgorodê, paşê bi destê duwemîn gihiştine Gotlandê. Deverên rojava û bakura Rûsyayê ji aliyê swêdiyan de wek *Gårdarîke* dihate bi nav kirin.

Bakura Rûsyayê nêzîkî *Împaratoriya Sveayê* (Sveariket) bû. Gelek bakurî diçûne bajarê Staraya Ladoga. Paşê bi saya robarên Dneper û Volgayê xwe digîhandin hundirê Rûsyayê û heta welatên rohilatê diçûn. Du rêyên navdar hebûn: rêya Dneperê û rêya Volgayê. Vîking beledê herdu rêyan bûn jî. Li qiraxê robarê Dneperê bajarê Novgorod (Holmgård) hebû ku li bakura Rûsyayê dima, wek cihekî transîtê yê bazirganiya rohilatê û rojavayê dihate hesabîn. Gelek ticarên


Gotlandê diçûne Novgorodê, li wir karên xwe pêk dianîn. Paytextê Rusyayê di van salan de Kiev (Konugârd) bû, bajarekî kevn yê bazirganiyê bû. Bi Bîzansê re gelek pêwendiyên Kievê hebûn. Bi kurtî bajarên Novgorod û Kievê ku li dorberê robarê çemê Dneper bûn di pêwendiyên bi rohilatê re roleke gelek mezin lîstine. Li qiraxê vî robarê herfî dirêj li Ewrûpayê, Mîrîtiya Volga-Bûlgar hebû, paytextê wê Bûlgar bû, wek *"Bûlgarên reş"* dihatin hesabîn. Bûlgarên spî li Bûlgarîstana îro dijiyan. Mîrîtiya Kazeran mîrîtîke din bû ku di van salan de navdar bû. Peytextê wê Itil, li qiraxa Behra Hezarê bû, robarê Volga li vir dikete nav Behra Hezarê. Bi kurtî Mîrîtiya Bûlgarên Volga û Mîrîtiya Kazaran wek du navendên rasthatin û hevdudîtina rojavayê û rohilatê dikarin bên hesabîn. Di navbera vîkingan û ticarên welatên islam de gelek pêwendiyên bazirganiyê hebûn. Vîkingên swêdî angorî vîkingên norweçî û danmarkî zêdetir bi zanava (huviyet) bazirganiyê ve hatine nasîn. Him bazirganiya hacimfireh û him bazirganiya perekende û xurde, wek çerçîtiyê (gârdfarihandlare) di nav swêdiyên Rusyayê de pêşta çûbû.<sup>9</sup>

### **Di avakirina Rusyayê de beşdarbûna swêdiyan**

Angorî dîroknesan di avakirina Împaratoriya Rus de vîkingan û bi taybetî jî swêdiyan roleke gelek mezin lîstine.<sup>10</sup> Babeteke ku divê em bi kurtî li ser bisekinin, koka peyva rûs' û çend dîtînen li ser pêkanîna Împaratoriya Rus e. Divê em ji vir şunda di navbera peyvên rûs' û rus de cudatîkê daynin. Payva rûs' ji bo vîkingên ku li Rusyayê cîwar bûne û peyva rus ji bo mirovên Rusyayê hatiye bi kar anîn.

Derbarê babeta pêwendiyên vîking û rusan de gelek xebat û lêkolîn hene. Beşek lêkolîner dibêjin ku vîkingan (ahaliyê bakurê, svea, îskandinavi) û bi taybetî swêdiyên ku bi *rûs'* hatine nav kirin, bingehên Rusyayê danîne. Çawa emê li jêr jî bibînin di çend çavkaniyan de peyva *rûs'* li cihê vîkingan de hatiye bi kar anîn. Vîkingan xwe bi vê peyvê ve identifite kirine. Peyva here balkêş, peyva *Roussi* ye ku ji dewra vîkingan heta îro jî di zimanê finî de maye û ji Swêdê re tê gotin.<sup>11</sup> Çawa tê dîtîn, ev nava gelekî nêzîkî peyva rûs' e. Di dewra vîkingan de mirovên bakurî di çavkaniyên Bîzansî de jî wek *rhôs* hatine bi nav kirin.<sup>12</sup> Ji aliyê din angorî lêkolîneran di zimanê swêdî de çend nav hene ku ji eynî kokê tên, wek *Roden*, *Roslagen*.<sup>13</sup> Mirovên vê deverê wek *rodskarlar*, *rodsmen*, *rodspiggjar* hatine bi nav kirin. Peyva *rodd* (bêr kişandin) di zimanê swêdî de gotineke bingehîn e. Ev peyvan nêzîkî wan peyvên wek *rûs'*, *rhôs* û *Ruotsi* dibin ku di çavkaniyên dîrokî de cihê vîkingan û welatê wan hatine bi kar anîn. Bi kurtî mirov dikare vê eşîra skandinavi (rûs') ku avakirina li Rusyayê roleke mezin lîstiyê,





Xerîteyê kevin ku seferên vîngan nişan dide. Di vê xerîtê de bajarên wek Berda'a û Nîsêbinê ji xuya dibin. Li van deveran çawa tê zanîn mîrîtiyên kurd yê wê wek şeddadiyan û merwaniyan hatine ava kirin.

wek "rusên skandinavi" û "rusên bakurî" bi nav bike. Nêzîkbûna van navan di çavkaniyan de carcar astengî û serêşiyên termînolojiyê peyda dikin. Dema mirov di hin çavkaniyên dewra vîkingan de rastî vê peyvê (rûs') tê, nizane gelo vîking tê fikirîn an ji bo rûniştvanên Rusyayê ku heta îro jî jiyane, tê fikirîn. Ji ber vê yekê jî divê mirov peyva *rûs'* ku cihê vîkingan digre û peyva rus ku ji bo rûniştvanên Rusyayê tê bi kar anîn ji hev cuda bike û tevlihev neke. Di van salan de prosesa *swêdbûna rusan* û *rusbûna swêdiyan* kultureke tevlihevbûyî pêk anîye, di nav hev de heliyane. Mirov dikare bêje ku swêdiyên vê devere bûne rus.

Çend çavkaniyên rusî û erebî hene ku derbarê seferên vîkingan yê ber bi Rusyayê û rohilatê de zaniyariyên balkêş pêşkêşî me dikin. Yek ji van çavkaniyên girîng ku bi rusiya kevn hatiye nivîsîn, *Kronika Nestor* (Nestorskronikan) e. Di sala 1100î de ji aliyê keşîşekî bi navê Nestor de li Kievê hatiye nivîsîn. Bi saya vê çavkaniyê mirov fêr dibe ku di dewra vîkingan de li Rusyayê tevlihevîke mezin hebûye, eşîrên rus li dijî hev derketine û di dawiyê de, ji welatên îskandinavi alîkarî hatiye xwastin. Sê birayên bi navê, Rurik, Sineus û Truvor hatine Rusya-

yê û hukimdariya welêt xistine bin destê xwe û ji nû ve pergalek li Rusyayê saz kirine. Ji ber vê yekê jî ev çavkaniya dîrokî hin caran ji aliyê nivîskarên swêdî de wek "*destana mêrxasiya dewra vîkîngên swêdî*" hatiye hesibîn.<sup>14</sup> Ev qasî 250 sale e ku lêkolînvanên swêdî û rusî derbarê dewra vîkîngan, pêwendiyên swêdiyan - rusan û li ser koka peyva *rûs* 'gelek lêkolînan çêdikin û tevî gelek raberzînan dibin.<sup>15</sup>

Ev vîkîngên ku li Rusyayê diman û bi rûs dihatin bi nav kirin, paşê asîmîle bûne û di nav rûniştvanên van deveran de heliyane. Ji ber vê guhartina bi hem-dî xwe (evolution) ango; navê rûs' ne tenê di nav vîkîngan de, li hemû Rusyayê belav dibe, wek rus qalibê xwe yê dawîn digire.<sup>16</sup> Piştî van guhartinan mirovên skandînavî û bakurî êdî vê carê di zimanên cu de wek *varjag* (våring, varäger, varang, varangoi)) hatine bi nav kirin. Angorî zimanzanan pêşpirtika ku di van navan de heye, hevbeş e: (*varjag, våring, varäger, varang, varangoi*). Ev pêşpirtika hevbeş ango peyva *var-*, tê maneya vaad, vefa, sedeqet û paqijiyê.<sup>17</sup> Zimanzanê danmarkî Vilhelm Thomsen ku cara pêşîn xebateke etimolojîk li ser koka van peyvan amadekiriye, dibêje ku *varang* (di zimanê erebî de) û *varangoi* (di zimanê yunanî de) bi taybetî ji bo swêdiyan hatiye bi kar anîn.<sup>18</sup>

Gelek salan berê di çîrokên îslandî de bi zimanekî edebî ji Swêdê re *Svidjod* hatiye gotin. Pêwendiyên swêdî-rusî wisan pêşta çûne, êdî vê carê ji bo Rusyayê, carinan *Det stora Svidjod* (*Swêda mezin*) hatiye gotin.<sup>19</sup> Ev nimûna piçûk jî derbarê pêwendiyên nêzîk yên Swêdê û Rusyayê me agahdar dike. Gotina *Svid-* ji peyva navê kal-bavên swêdiyan *Svear* tê. Derbarê seferên vîkîngan yên rohilatê de bi taybetî di çîrokên îslandî de gelek tiştine balkêş hene. Çawa tê zanîn seferên vîkîngan wek seferên rojavayê û yên rohilatê hatine beş kirin. Rohilatnas û zimanzanê swêdî Stig Wikander di xebateke xwe de bala me dikêşîne ser xaleke termînolojîyê, ew dibêje ku bakuriyên (nordman) ku ber bi rojavayê, Ewropayê sefer kirine ji wan re *vîkîng* hatiye gotin, ev kesan bi piranî norwecî û danmarkî bûne. Bakuriyên ku ber bi rohilatê sefer kirine, ji wan re jî *våring* hatiye gotin, piraniya wan jî swêdî bûne.<sup>20</sup> Lê belê hemû ev seferan di literatura vîkîngan de wek "*seferên vîkîngan*" (vikingatåg) hatine bi nav kirin ku bi kombinasiyona talankirinê û bazirganiyê pêk dihatin.

## Ber bi Särklandê

Di dema vîkîngan de navê beşeke wan welatên Rohilata Nêzîk ku di bin kontrola xelîfeyên ereban de bûn, di zimanê bakuriya kevn de, bi giştî Särkland hatiye bi nav kirin. Gelo sînorên *Särklandê* ji kîderê re derbas dibûn û koka vê peyvê ji kide-

بسی می خند و می آید ساقی نیکو کشت و پوست وی مرغان بخوردند  
 و کبک ایجا جانند




بعضی که ارشاد نمی بودند از ام لا حج و عمره و بیایند و بیایند و بیایند  
 بود باب الیاهن بنسرتان قومی شجاع باشند و سوار سبیل دارند و کبک ایجا  
 اولاد یکی ز کبک است هم دارند و بعضی دارند که آن صحف را بچو و کبک برشت آن  
 بعضی میزاید برشته است و زیر آن کبک خواب خوانند و علی بن ابی طالب را آن  
 العرب خوانند و بزادی آن را آنند که نسزد و بر اجنه می اندازند اعظمی دارند

Vikîngek li dorberê Volgayê bi darekê ve hatiye girêdan. Mînyatûreke faris. (Stig Vikander, Araber, vikingar och vâringar, 1979).

başura Behra Hezarê dikeve, ji van deveran re Sârkland hatiye gotin.<sup>22</sup> Vikîngan cara pêşîn tenê bi rêya Volgayê xwe gihandine Behra Hezarê û deverên mayin yên rohilatê. Li van deveran him zêde hevrişim hebû û him jî rêya hevrişim li van deran re derbas dibû ku heta Çînê berdewam dikir. Paşê maneya vê peyvê hatiye firer kirin. Derbarê vê yekê de arkeolog û dîroknasê swêdî T. J. Arne di nivîseke xwe de çend dîtinan pêşkêş dike. Angorî dîtinekê piraniya axa ku Îslam lê hakim e, bi Sârkland hatiye nav kirin. Di çavkaniyên îslamî de Sârkland ji Fasê heta Îranê dirêj dibe.

Bi giştî em dikarin bêjin ku zêdetir dorberên Behra Hezarê yên rojava û başurê, navenda Sârklandê pêk dianîn. Sârklandê, axa dorberê çemên Dîcle û Firatê jî hildida nav sînoren xwe. Çend *kevîrên dîrokî* (runsten) ku li Swêdê hatine dîtîn, li ser van kevîran qala Sârklandê tê kirin. Ev kevîran bi taybetî ji bo kesên

rê tê? Ev gelek salên li ser vê peyvê raberzînên (mînaqaşe) cihê-cihê tîn çêkirin. Hinek dîroknas û lêkolîner dibêjin ku ev peyv ji peyvê sarecanê ku di dewra xaçperastanê de ji kesên musulman re dihate gotin, ango Sârklandê tê maneya "welatê misilmanan". Hinek dîroknas jî dibêjin ku koka vê peyvê ji latînî tê, ango: sericum ku tê maneya hevrişim (îpek), paşê di swêdî de bûye sârk- û peyvê Sârklandê jî hatiye maneya "welatê hevrişim".<sup>21</sup> Lêkolîner T. J. Arne di vê nivîsa xwe de dibêje ku Sârkland angorî zaniyariyên dîrokî û arkeologî, zêdetir li axa ku



Xertîyêke ku deverên Särklandê nişan dide.

ku di seferên vîkingan yê li rohilatê de mirine, hatine çikandin.<sup>23</sup> Yek ji van kevîran ku li Mariefredê ye gelek navdar e, wek kevîrê Gripsholmê tê nasîn, niha li ber rêya ku diçe Koşka Gripsholmê disekine:


*Wan bi mêranî li dûr sefer dikirin  
ew pey zêr ketibûn  
û li rohilatê  
xwarin didan eyloyan.  
Ew li başûrê  
li Särklandê mirin.<sup>24</sup>*

Angorî Mats G. Larsson îfada "xwarin didan eyloyan" di zimanê vîkingî de tê ma-

naya "dijmin kuştin".<sup>25</sup>

Çawa emê paşê jî bibînin bi taybetî li van dorberan, li rojava-ya Behra Hezarê gelek kurd dijiyan, Mîrîtiya Şeddadiyan li van deveran bû. Tişteki balkêş ew e ku, du pereyên zîv yê kurdî ku di van salan de hatine Swêdê, angorî zaniyariyên dîrokî tam li ser van axan, li bajarên Berda'ayê û Erdebîlê hatine çêkirin û belav kirin. Çawa çavkaniyên dîrokî nîşan didin, vîkîng heta Bexdayê çûne. Bexda, serbajarê Xelîfetê bû û wek navendeke kirîn-firotinê ya girîng di hata hesabî. Vê deverê beşeke Särklandê pêk dianî. Vîkîngan jî berê de rêya Bexdayê nas dikirin. Kontaktên xwe yê pêşîn bi ticarên ereb re li rojhilata başûra Behra Hezarê pêk anîne û tiştên xwe jî bo firotanê bi rîya

reşayê li ser piştê hêştiran (devwe) birine Bexdayê.<sup>26</sup> Li hemberî van tiştan jî xwe re zêr, qumaş, baharat û tiştên mayin peyda kirine. Dîroknasekî ereb, Ibn Khordadbeh di pirtûkeke xwe de dide diyar kirin ku vîkîngan û ticarên ereb li başûra Behra Hezarê bajarê Djordjan (Gurgan) hevdu didîtin, ev bajara cihêkî bazirganiyê bû. Vîkîng paşê jî vir bi rê diketin, diçûne Bexdayê. Rohilatnasekî Sovyet P. G. Bulgakov dide kîşkirin ku ev pirtûka ne di sala 846-847an de, di sala 885-886an de hatiye nivîsin. Lêkolînavanekî mayîn, Thomas S. Noonan, angorî dîtina tiştên arkeolojîk yê nûdîtî rabihuriya van pêwendiyên heta destpêka salên 800î dirêj dike.<sup>27</sup> Paşê çawa emê bibînin bi taybetî dema merwanîyan de pêwendiyên kurdan û Bexdayê zêde dibin. Demekê Merwanîyan hewl dane ku êrîşî Bexdayê bikin û têxin bin kontrola xwe jî.<sup>28</sup>



Kevireki nivîskî (runsten) li Gripsholmê. Ev kevîr jî bo vîkîngên ku li Särklandê (Rohilata misilman) mirine hatiye çêkirin.

### **Rasthatina kurdan û vîkîngan ya pêşîn**

Di dîrokê de çawa em dibînin ku kurd û vîkîng cara pêşîn di sala 943an de li bajarê

Berda'ayê hatine hemberî hev û li dijî hev şer kirine. Di sala 943an de vîkîng bi rêya robarê Volgayê - robarê herî dirêj li Ewrûpayê - diçine Behra Hezarê, ji wir bi rêya çemên Kurayê û Terterê xwe digihînin bajarê Berda'ayê. Çemê Volgayê ku tevî Behra Hezarê dibû, di van salan wek rêke avê ya bingehîn dihate hesibîn ku vîkîng digîhandine rohilarê. Di vê sefera vîkîngî de Berda'a hatiye dagir kirin, gelek rûniştvanên bajêr ji aliyê vîkîngan de hatine kuştin. Berda'a, navendeke kirîn-firotinê, bazirganiyê ya giring bûye, li vê deverê li qiraxê çemê Terterê dima. Çemê Terterê tevî robarê Kurayê dibû. Çawa tê zanîn erdê ku di navbera robarên Kura û Eres de cih digirt, jê re Aran dihate gotin. Berda'a li ser vî erdê bû. Di sedsalên kevn de ji çemê Terterê re "Ava Kurd-Elem" hatiye gotin.<sup>29</sup> Di navbera Behra Reş û Behra Hazarê, li van deverên Kafkasyayê gelek kurd jî diman. Kurdên ku ji ber zor û zilmê revîna, xwe xelas kirine, ev çiyayên bilind û asê bi sedsalan ji xwe re kirine war û star. Angorî dîrok nasê erebî, Mukaddasî, yek ji dergeyên Berda'ayê berê "Bab al-Akrad" (dergeyê kurdan) dihata bi nav kirin.<sup>30</sup> Heta niha jî li deverên wek Laçîn, Kelbecer, Zengîlan û Qubatlî gelek kurd dijîn.<sup>31</sup>

Cara pêşîn arkeologê swêdî T. J. Arne, di lêkolîneke xwe de ev sefera sala 943'an wek "*sefereke vîkîngî*" bi nav kiriye û li ser vê seferê lêkolîneke balkêş nivîsiye.<sup>32</sup> T. J. Arne di lêkolîna xwe de wisan jî cih daye çend dîtînen dîroknasê ereb Ibn Miskawaih. Ev nivîskarê ereb, di pirtûkeke xwe de bi kurtî be jî qala kurdên ku li dijî vîkîngan derketine, dike.<sup>33</sup> Ji ber vê yekê ev dîtînen T. J. Arne û Ibn Miskawaih derbarê pêwendiyên vîkîngan û kurdan yê pêşîn de wek du çavkaniyên giring dikarin bèn hesibîn.

Devera Aranê, di navbera robarên Kura û Erez de cih digirt. Çawa C. J. Tornberg dide diyar kirin, bajarê Berda'a navendeke hevrişîm bûye. Li dorberê wê, ocaxên madenan yê zêr û zîv hebûne, cihekî bi adan û bi xêr bûye. Ev bajarê dîrokî, Berda'a îro êdî nemaye, tenê li cihê wî çend xerabe mane. Berda'a ji aliyê ermeniyên de wek *Partav* dihate bi nav kirin.<sup>34</sup> Beşeke Aranê piştî dagirtina Mongolan, wek *Qerebax* hatiye bi nav kirin. Angorî zaniyariyên dîrokî li van devaran gelek kurd hebûn.<sup>35</sup> Mîrîtiyeke kurd bi navê Şaddadî li vê deverê hatiye bi dar xistin. Eşîra Rawadî li vir dima. Çawa tê zanîn kal û bavên Selhaddîn Eyubî ji vê eşîrê tî. Angorî rohilatnas Minorsky bapîrên Selhaddîn yek ji bajarên Aranê, Dvinê hatine dinê. Di navbera salên 952-1174an de Şaddadî yek ji mîrîtiyên kurd yê mezin dihate hesibîn.<sup>36</sup> Mîrîtiya Şeddadiyan ji dused salî zêdetir jiyaye. Bajarên Genca, Dvin û Berda'a li Aranê sê navendên naskiribûn.<sup>37</sup> Bajarê Genca ku li ser rêya Berda'ayê û Tiflîsê cih girtibû, paşê dibe paytextê Şeddadiyan. Mîrîtiya Şeddadiyan demekê heta bajarê Aniyê erdê xwe fireh kiri-



Herdu rûyên pereyekî ziv ku di sala 937an li Berda'ayê hatiye çêkirin û di dewra vîkingan de hatiye Gotlandê. Ev pere bi navê mirê kurd Daysam ibn Ibrahim al-Kurdî çêbûye. (Myntkabinettet, Stockholm).



Herdu rûyên pereyekî ziv ku di sala 952/953an li Erdebilê hatiye çêkirin û di dewra vîkingan de hatiye Gotlandê. Ev pere bi navê mirê kurd Daysam ibn Ibrahim al-Kurdî çêbûye. (Myntkabinettet, Stockholm).

ye. Dema vîking di sala 943an êrîşt Berda'ayê dikin, ew bajêr wêran, kavi û talan dikin û rûniştvanên bajêr dîl digrin. Dorgirtina bajêr bi mehan ajotiye. Dîrok nasê ereb Ibn Miskawaih dibêje ku dema vîking dikevîne bajêr, di bin kontrola berpirsiyarê bajêr de qasî 300 deylemîn, ewqas jî kesên bêkar û beşek kurd hebûne.<sup>38</sup> Berpirsiyarê bajêr, Marzuban ibn Muhammed, li dijî vîkingan mirovan berev dike û ordiyêke ji hezar kesan pêkhatî çêdike. Lê belê li hemberî vîkingan nikare zêde berxwe bide û bindikeve. Piştî demekê vîking ji ber epîdemîkê nexwaş dibin û hejmara wan roj bi roj kêm dibe. Dîrok nasê ereb Ibn Miskawaih di kronîka xwe de derbarê bajarê Berda'ayê û van dorberan de dibêje ku, piştî qelsbûna vîkingan, berpirsiyarê Berda'ayê, Marzuban ibn Muhammed mecbur maye ku ji Berda'ayê derkeve. Ew diçe aliyê Salmastê wekî li dijî serhildanê mayin şer bike. Lê belê çawa Ibn Miskawaih dinivîse, berpirsiyarê bajêr Marzuban, qasî 500 deylemî, 1500 siyarên kurd û 2000 kesên daxwazkar li bajêr dihêle.<sup>39</sup>

Gelo çi tê serê van 1500 kurdên ku tevî şerê parastina Berda'ayê bûne? Derbarê qedera wan de zaniyariyên sedî-sed rast di destê me de tunin. Lê belê Ibn Miskawaih dibêje ku di vî şerî de ji der kesên bi hesp, hemû hatine qir kirin. Ev yeka tê wê manayê ku kurdên bi siyar bûn, wisan tê xuyan di vî şerê Berda'ayê

de zirareke mezin nedîtine. Di dawiyê de, vîkîng xwe davêjine çemê Kura ku wê derê geştiyên wan hebûne, geştiyên xwe siyar dibin, ji bajarê Berda'ayê ber bi hundirê welêt direvin. Di vê vegeerê de vîkîngan bi xwe re gelek pereyên zîv û zêr û gelek tiştên mayin yên bi nîrx û giranbiha birine. Angorî hin çavkaniyan dema Berda'a di bin destê vîkîngan de salekê dimîne, kesên dixwastin xelas bin zo dîrhem didane vîkîngan û xelas dibûn. Vê yekê vîkîng dewlemend dikir. Çawa emê paşê jî li ser bisekinin, ew pereyên zîv yên kurdî ku li Berda'ayê û Erdebîlê hatine çêkirin, ihtîmaleke gelek mezin e di van salan de bi destê vîkîngan hatine Swêdê. Gelek lêkolîner di wê baweriyê de ne ku vîkîng bi rastî çûne deverên ku Îslam lê hakim bûye û paşê ber bi bakurê bi rê ketine û li ser Rusyayê re vegeerîne welatê xwe.<sup>40</sup> Ev sefera li dijî bajarê Berda'ayê, di navbera kurdan û vîkîngan de wek rashatîneke here pêşîn dikare bê hesabîn. Ji ber vê yekê jî pirtûka Ibn Miskawaih<sup>41</sup> û ev lêkolîna T. J. Arne wek du dokumentên giring dikarin bê hesabîn.<sup>42</sup>

Ne tenê ev çavkaniyên nivîskî, wisan jî hin dîtiniyên arkeolojîk vê rashatîna navbera kurdan û vîkîngan ku berî hezar salan pêk hatiye, rast derdixe. Di sala 1929'an li girava Gotlandê pereyekî kurdî yê zîv hatiye dîtîn ku di sala 936/937an de li Berda'ayê bi navê Daysam ibn Ibrahim el-Kurdî hatiye çêkirin. Ev pereya dema çandinê de ji aliyê cotkarekî swêdî bi navê Viktor Lagergeren de li devera Fröjel li Gotlandê, li cihêkî bi navê Gustafs hatiye dîtîn. Ev pereyê ku pêwendiyên kurdan û vîkîngan li Berda'ayê gelek baş sembolarîze dike, niha di *Muzeya Pereyan ya Qiralîyetê* de (Kungliga Myntkabinettet), li Stockholmê tê parastin.<sup>43</sup>

Di sala 1915an de li Gotlandê li devera Barlingbro, li cihêkî bi navê Enges pereyekî kurdî yê din tê dîtîn ku li Azerbeycanê, li bajarê Erdebîlê hatiye çêkirin. Berda'a û Erdebîl li eynî deverê bûn ku li aliyê rojavaya Behra Hezarê diman, di nav sînorên Azerbeycana Rohilat de bûn. Çawa em dibînin ku di van salan de li eynî deveran mîrekî kurd bi navê Daysam ibn Ibrahim al-Kurdi hukumdarî kiriyê, hin çavkaniyan de wek "*waliyê Azerbeycanê*" tê nasandin. Ev pereyê ku di sala 952/953an de, ango; deh sal piştî zeftkirina Berda'ayê (943) hatiye çêkirin, di katalogên pereyên swêdî de wek "*pereyê Kurd*" hatiye qeyd kirin. Kîjan salê, li kîderê hatiye çêkirin, li ser navê kê çêbûye? û li kîderê hatiye dîtîn? bersivên van pirsan hemû di vê katalogê de cih girtine, wek: "*kurdish, 341 (952/953), Erdebil, Daysam ibn Ibrahim*".<sup>44</sup> Mîmkun e ev pereya di dema seferên demên paşê de ji aliyê vîkîngan de hatiye bi dest xistin. Pîraniya lêkolîner û pisporên perenas hemfikir in ku ev pereyên ji aliyê vîkîngan de di salên din de hatine Swêdê.<sup>45</sup> Piştî sedsalî ev dorberên Behra Hezarê ji aliyê vîkîngan de çend caran dîsa di sa-



lên 1030-1033 û di sala 1041ê de tèn ziyaret kirin. Hinek vîkîngan jî di sala 987an li bal mîrê Derbendê kar kirine, bûne nasê van deveran. Sefera *Ingvar den vittfarne* ku di sala 1041ê da pêk hatiye bi nav û deng e. Di sala 1041an de dema vegera vê seferê gelek vîkîng di rê de ji ber nexwaşîke giran mirine. Derbarê van kesên mirî de li Swêdê çend kevirên dîrokî hatine dîtîn.<sup>46</sup>

Ew kesê ku ev pereya bi navê wî hatiye çêkirin, ki ye gelo? Daysam ibn Ibrahim al-Kurdî çawa mirov ji paşnava wî fam dike, ew bi koka xwe ya etnîkî, kurd e. Malbata Daysam ji bajarê Mûsilê ye. Dema dubendiyên hundirîn di navbera baskên Îslamî de li Mûsilê destpêkir, malbata Daysam di sala 896/897 ji Mûsilê bar dike, diçe Azerbeycanê. Bavê wî li wir bi keçeke mîrekî kurd re dize-wice û Daysam tê dinê. Daysam dema mezin dibe, gelek xurt dibe û çend caran hewl daye ku hemû Azerbeycanê têxe bin kontrola xwe, lê belê bi ser neketiye. Piraniya leşkerên wî bi koka xwe kurd bûne. Daysam di sala 957/958an de ji aliyê dijminên xwe de tê kuştin. Pereki ku bi navê Daysam hatiye çêkirin, li Rusyayê hatiye dîtîn. Ev pera bi navê Daysam di sala 936/937 li bajarê Berda'ayê hatiye çêkirin.<sup>47</sup> Ev yeka tê wê maneyê ku Daysam demekê him li Erdebîlê û him jî li Berda'ayê hukimdarî kiriye. Ji aliyê din ew perên ku bi navê Daysam hatine çêkirin, nîşan didin ku bandûreke wî ya mezin hebûye û wê demê navdar bûye. Bi vî tehrî ev zaniyariyên arkeolojîk, bi zaniyariyên nivîskarên Erebb hev temam dikin. Cih û wext ku di van çavkaniyên dîrokî de hene, hev rast derdixin û bi giştî hev xurt dikin.

Ji bo giringiya Berda'ayê bidin nîşan din, divê li vir em li ser çend pereyên gelek kevn jî bisekinin ku li Swêdê hatine dîtîn. Çawa em dibînin hin pereyên din ku berî sefera 943an li Berda'ayê hatine çêkirin, paşê hatine Swêdê. Angorî Tornberg, ev 25 pere gelekî berî sefera Berda'ayê ji aliyê emîrên Abbasiyan de li Berda'ayê hatine çêkirin.<sup>48</sup> Gelo ev perenan deme sefera Berda'ayê an jî berî seferê, di sefereke mayin de hatine bi dest xistin, mirov nizane. Di sala 1934an de li li devera Buttle, cihekî bi navê Stora Vellinge, çar pereyên ji Berda'ayê hatine dîtîn.<sup>49</sup> T. J. Arne di nivîseke xwe de dibêje ku di sedsala 19an de çend pereyên ji Berda'ayê li devera Sandby li Ölandê hatine dîtîn.<sup>50</sup> Hemû ev nimûneyan giringiya Berda'ayê nîşan didin. Li Gotlandê gelek pereyên zîv û zêr yê rohilatê hatine dîtîn. Beşeke mezin ya van pereyan ji dewra vîkîngan in. Ev yeka jî nîşan dide ku, pêwendiyên vîkîngan û welatên rohilatê gelek xurt bûne.

Di derbarê rola vîkîngan di avakirina Rusyayê de dîroknas bûne du beşan: kesên normanist (piranî skandînavî ne) û antî-normanist (piranî rus in).<sup>51</sup> Hin lêkolîneran ji ber ku raberzîn û literatura li ser pêwendiyên vîkîngan-rusan teqîp nekirine an jî teoriyên mayin parastine, ev zaniyariyên Ibn Miskawaih bi dîroka


vîkîngan re girênedane. Van lêkolîner û dîroknasên anti-normanist, ev zaniyari tenê bi dîroka Rusyayê ve girêdane û ew tiştên derbarê kurdan de jî wek nîşana pêwendiyên kurdan û rusan nîşan dane.<sup>52</sup> Lê belê T. J. Arne û kesên wek wî yê ewrûpayî ev agahdarî û zaniyariyên li ser kurdan yên Ibn Miskawaih, di çarçeveke vîkîngî de bi cih kirine.<sup>53</sup> Ji ber vê yekê jî him ev dîtînen Ibn Miskawaih û him jî dîtînen T. J. Arne derbarê pêwendiyên kurdan û vîkîngan de me gelekî ronî dikin. Derbarê seferên vîkîngan de bi taybetî çend çavkaniyên erebî de agahdariyên gelek kêrhatî û balkêş cih girtine.<sup>54</sup>

### **Pêkhatina pêwendiyên kurdên merwanî û vîkîngan**

Çawa tê xuyan kurd û vîkîng cara duwemîn li Kurdistana Bakur, li devera Diyarbekir û çend cihên mayîn rastî hev hatine an jî di navbera wan de çend kontaktên dîrokî pêk hatine. Vîkîngên ku qeyserê bîzansî diparastin û di nav ordiyên Bîzansê de kar dikirin, gelek caran tevî seferên ber bi Kurdistanê dibûn. Ev yeka tê wê maneyê ku, rê û îmkânên rashatin û hevdudîtînen kurdan û vîkîngan di dewra Bîzansê de hertim hebûne. Derbarê pêwendiyên kurdên merwanî û vîkîngan de delîlên here mezin, li ser erdê Gotlandê, berî sed salan dîtina pereyên zîv yên dewra merwaniyan in. Ji çîltî zêdetir pereyên zîv yên merwaniyan hatine dîtîn.

Di destpêka sedsala 10an de li Bîzansê yekitiyên taybetî hebûn, tenê ji bakûriyan (swêdî, norwecî û danmarkî) pêk dihatin. Him di şeran de beşdar dibûn û him jî parêzkariya qeyserê Bîzansê dikirin. Qeyser ji bîzansiyan zêdetir baweriya xwe bi van skandînaviyan dianî. Di nav wan de gelek swêdî hebûn. Dema qeyser diçû şer, ev hêzên taybetî bi xwe re dibir. Ew vîkîngên ku li Konstantînopelê kar dikirin, ji wan re *vüring* hatiye gotin. Ne tenê bi minasebeta kar, vîkîngan wisan jî du caran di salên 860 û 1043an êrişî Konstantînopelê jî kirine.<sup>55</sup>

Bi saya robarê Dneper jî vîkîng diçûne Behra Reş û ji wir bi geştiyan heta Konstantînopelê diçûn. Carinan ji vir rê diketin bi geştiyên xwe ber bi Gurcistanê diçûn, dema reşayê derdikete pêşiya wan geştiyên xwe kaş dikirin, bi rêya ava Kurayê dîsa xwe digihandin Behra Hezarê. Vîkîngan hertim robar û çem teqîb dikirin, mirov dikare bêje ku ew li ser avê dijiyan. Behr, gol, çem û qanal ji bo vîkîngan jiyan bû. Çawa emê li jêr jî bibînin, bi munasebetê van seferan çend caran pêwendî û kontaktên kurdan û vîkîngan pêk hatine. Berî ku em derbasî pêwendiyên kurdan û vîkîngan bibin, divê em hinekî Mîrîtiya Merwaniyan bidin nasandin û perçekî li ser pêwendiyên kurdên merwanî û Bîzansê bisekinin. Dewra merwaniyan di navbera salên 983 û 1085an de berdewam kiriye. Di van salan de çawa tê zanîn vîkîng gelek aktîf bûn. Erdê merwaniyan cara pêşîn di



Xerîteyeke tirkî ku deverên Mîrîtiya Merwanîyan nîşan dide.

sala 983ê an de ji aliye yekî bi navê Bad bin Dostik de tê rizgar kirin. Hukumdariya merwanîyan li du devaran pêk hatiye. Devera yekemîn, Devera Diyarbekirê bû, ji bajarên wek Amîd, Mayafarîqîn, Cizre, Sêrt, Hesênkeyf, Nisêbînê û ji çend bajarên mayîn pêk dihat. Devera duwemîn Devera Xelatê bû, heta bajarê Bitlîsê dirêj dibû.<sup>56</sup> Mirov dikare Bad bin Dostik, wek avakarê Mîrîtiya Merwanîyan bihesibîne. Dema Bad bin Dostik di sala 990/91an de dimire, hukumdariya vê mîrîtiyê dikeve destê kurên Merwan bin Kek. Ev kesê bi navê Merwan bin Kek, zavayê Bad bin Dostik bûye, bi xûşka wî re zewicîbû. Lê belê Merwan bin Kek bandûreke mezin nîşan nade, li cihê wî kurên wî aktîf dibin. Çawa em dibînin ku ev mîrîtiya kurdan, her çiqas avakarê wê be jî ne bi navê Bad bin Dostik, bi navê Merwan bin Kek hatiye nas kirin: *Mîrîtiya Merwanîyan*.<sup>57</sup>

Di dawîya sedsala 9an û di destpêka sedsala 10an de pêwendiyên kurdan û bîzansiyan her diçin zêde dibin. Mîrîtiyên Kurdistanê di navbera Bîzansê û Xelîfetê de dewletokên piçûk yê bêtêref (buferrstate) pêk dianîn. Kurd gelek caran di navbera du agirên de diman, xwe dispartine herdu aliyan, wek sînorparêz dibûne peyayên wan. Hin caran jî bo xwe biparêzin tevî şer dibûn. Bîzansê jî ber vê pozîsyona kurdan xwastiye kurdan nêzikî xwe bike, lê belê ev yeka hertim ewqas hêsa nîn bûye. Têkiliyên kurdan, bi ereb û tirkên misilman re hertim ne-



Sûretekî Împaratorê Bizansi Basileios II ku di sala 1000î de bi vâringan re (leşkerên skandinavi) çûye devera Diyarbekirê. Qeyserê bizansi ku zêdetirîn li ser text maye (976-1025).

bawerîk li bal bizansiyan peyda dikir. Van baweriyan gelek caran êrişên bêsedem re zemîn amade dikir. Ji ber vê yekê di navbera kurdan û bizansiyan de demdem dubendî, nakokî û şerên herêmî derdikeşin. Di zimanê kurdî de şopa

van êrîşan hê jî heye: *roma reş*. Ev îfada di destpêkê de ji bo leşkerên Bîzansê hatiye gotin. Heta niha jî kurd ji ruman re *rom* û *horim* dibêjin. Lê belê piştî tunebûna Bîzanê, vê carê îfadê reng guhartiye û ji bo Împaratoriya Osmanî û Tirkiyê hatiye bi kar anîn. Bêguman di vê guhartina zimanî de baweriya civatê ya derbarê zordestiyên tirkî roleke mezin lîstiye. Wisan tê xuyan ku civatê, derca van zordestiyan osmanî û tirkî qasî yê bîzansiyan ewqas neînsanî dîtiye û zêdebûna ezîyetan bi peyva "reş" ve îfade kiriye. Çawa tê zanîn berî avabûna Mîrîtiya Merwaniyan, Bîzansê bi dehan caran êrîşî navçeyên li devera Diyarbekirê kiriye û zilmêke mezin aniye serê însanan. Van zordestiyan şopa xwe bêguman di mêjû, bîr û hişê gelek nîfşan de hiştiye û hatiye van rojên îroyîn. Di van deveran de hertim şer û dew hebûn. Bîzansiyan ji berê de ji Mayafariqînê re *Martyropolis* (bajarê şehîdan) gotine, divê menayeke vê yekê ya dîrokî hebe.

Di dewra qeyserê Bîzansê, Basileios II (976-1025) pêwendiyên kurdan û bîzansiyan digêhêjin merhaleke nû. Piştî avakirina Mîrîtiya Merwaniyan, kurd êdê xwe fireh dikin, li başurê ber bi Sûriyê diçin. Di sala 993ê an di navbera kurdan û bîzansiyan de şerek derdikeve û di dawiyê de mîrê kurdan Abu Ali al-Hasan ibn Merwan zora wan dibe, bîzansî mecbur dimînin, direvin.<sup>58</sup>

Çawa tê zanîn li sînorên rohilatê yê Bîzansê hertim tevlihevî û êrîşên mezin pêk dihatin. Vê yekê zemînê seferên nû li dijî misilmanan amade dikir. Di sala 999an de qeyserê Bîzansê Basileios II dibêhê ku misiriyan dor li bajarê Helebê girtine. Basileios II derhal tivdarekê xwe dike û bi hêzên xwe diçe Suriyê. Dema vegeerê sala 1000ê diçe diçe aliyê Diyarbekirê. Mîrê kurd, Abu Mansur Said ibn Merwan diçe pêşiyê û wî diezimîne, xelatên giranbiha pêşkêş dikê. Qeyser re bi kurdan re dide-distîne, di navbera wan de peymaneke aştiyê ya dehsalîn tê girêdan.<sup>59</sup> Qeyserê bîzansî di sala 1001an de diçe dorberê Araratê, demêke dirêj ji paytext dûr dimîne, du salan şunda vedigere Konstantînoplê.<sup>60</sup> Di vê gera wî ya du salî de, bi wî re gelek *vâring* (parêzkarên skandinavi) jî hebûne. Îhtîmaleke gelek mezin e ku ev vîkingan û kurd di van salan de li van deveran bi rastî hev hatine. Ev rasthatina kurdan û vîkingan piştî rasthatina Berda'ayê, wek rasthatîneke duwemîn dikare bê hesabîn. Tişteki herî balkêş jî ew e ku, çawa emê paşê li ser bisekinin, ew pereyên zîv yê ku Gotlandê hatine dîtin, di dema van seferên Basileios IIan de li Mayafariqîn, Cizîrê û Nîsêbînê hatine çêkirin.

Lêkolîner dibêjin ku bingeha sazkirina van yekitiyên ji vâringan pêkhatî cara pêşîn di dema Basileios IIan de hatiye avêtin û ev qeyserê Bîzansî wek efrandarê van hêzan tê hesabîn.<sup>61</sup> Hejmarên vîkingên ku di van salan de di xizmeta Bîzansê de bûn bi hezaran tîn texmîn kirin. Di van salan de li dijî selçûkiyan û gurciyan gelek sefer hatine çêkirin, yek ji wan di sala 1021an de li dorberê Erzîromê çêdibe, gelek

mirov tèn kuştin û ev deveran tê talan kirin.

Piştî Basileios II, vê carê Michael IVan (1034-1041) dibe qeyserê Bîzansê. Michael IV timê dixwast sînoren xwe yên rohilatê heta Kafkasyê dirêj bike, heta Ermenîstanê here. Çawa em dibînin pêwendiyên kurdên Şaddadî ku li van deveran diman û bîzansiyan jî peyda bûne.<sup>62</sup> Di van salan de serokê vâringan Harald Hârdråde yekî norwecî bûye û di dema qeyser Michael IVan (1034-1041) de gelek sefer û şerên li dijî misilmanan de beşdar bûye. Angorî çîrokên îslandî Harald Hârdråde qasî 80 bajar zêft kirine.<sup>63</sup>

Ji aliyê din dema em dîroka merwaniyan mêze dikin, em dibînin ku pêwendiyên merwaniyan û Bizansê yên nêzîk û dostanetiyê jî hebûne. Ji der seredanan, di navbera wan de gelek hevdu dîtî çêbûne, peyman hatine girêdan û hewldayînên dîplomatîk yên wek şandina nameyan, elçiyên û xelatan pêk hatine.<sup>64</sup> Dema mîrê merwaniyan Nasruddevle tê ser text, qeyserê Bîzansê ji bo ku wî pîroz bike, temsîlkarê xwe şandiyê û hespên bejn dirêj, heştir û gelek xelatên ji hev xweşik diyarî wî kiriye.<sup>65</sup>

Gelek skandinaviyan di parêzgeriya qeyserê bîzansî û di ordiya bîzansî de kar dikirin. Dema ordiya bîzansî ber bi Kurdistanê sefer çêdikirin, ew jî pê re diçûn. Mirov texmîn dike ku dema van seferan de, ev leşkerên skandinavî rastî kurdan hatine. Mîmkun e li dijî hev şer kirine jî. Çawa emê paşê jî bibînin ev dîtî û baweriya di şerê Malazgîrdê de gelek xurttir dibe û zaniyariyên me yên dîrokî derbarê van pêwendiyên de zêdetir dibin. Bêguman delîlên van pêwendiyên yên herî berbiçav li ser erdê li Swêdê dîtina wan kevirên nivîskî û li Gotlandê dîtina gelek pereyên zîv yên merwaniyan in.

### **Dîtina pereyên zîv yên kurdên merwanî li Gotlandê**

Ne tenê pêwendiyên talan û kuştinê, wisan jî çawa tê xuyan rûniştvanên girava Gotlandê di dewra vîkingan de bi çalakiyên kirîn-firotinê ve mijûl bûne.<sup>66</sup> Belki ji ber vê yekê ewqas zêde pereyên rohilatê li Gotlandê hatine dîtî.<sup>67</sup> Gotland di dewra vîkingan de navendeke giring bû, li vê giravê gelek tiştên dîrokî hatine dîtî.<sup>68</sup> Li Gotlandê heta niha jî 40 000 zêdetir pereyên rohilatê ji defînan derketine.<sup>69</sup> Hemû lêkolîner di wê baweriya hevbeş de ne ku ev pereyan di dewra vîkingan de li ser Rusyayê re ji Rohilata Nêzîk hatine Gotlandê û bi sedsalan di baxên Gotlandê de veşartî mane.<sup>70</sup>

Ev pereyên zîv yên merwaniyan bi çend qanalên û rêyan ve hatine Gotlandê. Vîkingan wek rêyên hatin-çûyînê zêdetir robarên Dneper û Volgayê bi kar dianîn. Yek ji van robaran diçû Behra Reş, yê din diçû dikete Behra Hezarê. Îhtî-



Herdu rûyên pereyekî ziv ku di sala 997an de di dewra merwaniyan de li Mayafariqinê hatiye çêkirin û di dewra vîkingan de hatiye Gotlandê. Ev pere bi navê mirê kurd: Abu Ali al-Hasan çêbûye. (Myntkabinettet, Stockholm).



Herdu rûyên pereyekî ziv ku di sala 1000î de di dewra merwaniyan de li Cizirê hatiye çêkirin û di dewra vîkingan de hatiye Gotlandê. Ev pere bi navê mirê kurd: Abu Mansur Said ibn Merwan çêbûye. (Myntkabinettet, Stockholm).

maleke gelek mezin e ku ev pereyên merwaniyan bi rêya Dneperê aliyê *väringan* de hatine Gotlandê.

Gelo van skandînaviyan ev pere çawa bi dest xistine? Çawa me berê jî gotibû, ev skandînavî wek parêzkar û leşker di ordiyên Bîzansî de kar dikirin û di gelek seferên ber bi deverên kurdan de beşdar dibûn. Li wan deverên rohilatê ku bîzansî lê hakim bûn, bi taybetî li dora sînoran bîzansî yê rohilatê gelek kurd dijyan. Hertim têkiliyên bîzansiyan, bi kurdan re hebûn. Îhtîmaleke mezin e ku van kesan ev pere di dema van seferan de bi dest xistine. Paşê *väringan* ev pere birine Konstantinoplê û dema vegera welêt bi rêya robarê Dneper li ser Rusyayê re anîne Gotlandê. Skandinaviyên ku li bal qeyserê Bîzansê parêzkar bûn û di ordiyên bîzansî de wek leşkerê kirêkirî dixebitîn, ji wan re *väring* hatiye gotin.


Ji aliyê din Konstantînopel navendeke bazirganiyê bû. Ji her cihî, li bakurê bi rêya Behra Reş û li başûrê bi rêya Behra Sipî gelek ticar û mişterî ji deverên Asyayê dihatin Konstantînoplê.<sup>71</sup> Mimkun e bi saya van kesan ev pereyên kurdî hatine Konstantînoplê, paşê bi tehrekî ketine destê skandînaviyan. Wisan tê xuyan dema vegere van skandînaviyan bi xwe re ev perenan anîne Gotlandê. Di van salan de Gotland wek navendeke bazirganiyê ya navdar dihatê hesabîn. Di navbera bazirganiya rohilatê û rojavayê de roleke mezin dilîst.

Angorî tezeke mayîn jî, ev pereyên kurdî ji dorberê Behra Hezarê, bi rêya çemê Volgayê hatine Swêdê.<sup>72</sup> Gelo ev peranan çawa ji devara Diyarbekirê, ji bajarên Mayafariqînê, Nisêbîn û Cizîrê çûne dorberê Behra Hezarê? Derbarê vê yekê de gelo dîrok çi zaniyariyan pêşkêşî me dike? Ez bawer dikim ku ev yeka zêdetir di warê bazirganiyê de bi aktîfbûna Mîrîtiya Merwaniyan re girêdaye. Pêwendiyên merwaniyan bi dorberê xwe re gelek pêşta çûbûn. Çawa tê zanîn Paytextê Merwaniyan, Mayafariqîn (Fariqîn, Sîlvan) navendeke kirîn-firotinê bû. Sûkên fireh li Mayafariqînê hebûn, yek ji wan "sûka bezciyan" bû.<sup>73</sup> Bazirganiya qumaş û bendê pembû pêşta çûbû. Ji her aliyan ticar û kerwan dihatine Mayafariqînê.<sup>74</sup> Ne tenê ticar û bazirganên biyanî, yên kurd jî hertim rê û sûkên nû keşf dikirin. Merwaniyan bi taybetî li dorberê Amîd, Mayafariqîn, Nisêbîn û Cizîrê hukim dikirin. Li van deveran gelek rê û kerwan li hev diqelîbîn, şenahî û hatin-çûyîneke mezin hebû. C. J. Tornberg, di xebata xwe de bi zimanekî gelek xweşik qala çend navendên kurdên merwanî dike, wek Mayafariqîn û Nisêbîn. Di derbarê Nisêbînê de C. J. Tornberg dibêje ku Nisêbîn li devera Cizîrê navendeke here jîndar bûye, bi gulên xwe navdar bûye û gulava Nisêbînê gelek hatiye kirîn-firotanê.<sup>75</sup> Angorî C. J. Tornberg li devera Diyarbekirê cihê herî xweşik Mayafariqîn bûye, bi fêkiyên xwe ve navdar bûye.<sup>76</sup> Çawa Ulla S. Linder-Welin jî dide diyar kirin, ev pereyên rohilatê bi saya bazirganiyê û talankirinê hatine bi dest xistin. Ji aliyê din vîkîngan xeraç ji çend deveran distendin.<sup>77</sup> Di dema Şerê Berdayê de 943an de îhtîmaleke mezin e ku ev yeka hatibe serê kurdan jî. Kesê ku dema dorgirtina Berda'a yê 20 dînar dida vîkîngan, canê xwe xelas dikir.

Ji aliyê din pevguhastinên piralî di nav dever û mîrîtiyên kurdan de jî pêk dihat. Mîrê merwaniyan yê sêwemîn Nasruddevle, wek mîsal bi keçeke mîrê Aranê re zewicibû. Ev devera çawa me li jor jî gotibû li aliyê rojavaya Behra Hezarê diket û vîkîng gelekî beledê ve deverê bûn. Ev yeka tê wê maneyê ku di navbera van herdu dever an jî herdu mîrîtiyên kurd de (merwanî û şaddadî) pêwendiyên cihê-cihê hebûne. Vê yekê îmkana tevger û belavbûna hundirîn (intern circulation) ya pereyên merwanî zêdetir dikir û ji tevgera pereyan ya derva re, rê vedikir.

Bi saya kontaktên duwemîn û zincîrkerî ev peranan gelek caran dest diguhandin, diçûn, derdiketine welatên gelek dûr û biyanî. Wek mîsal çawa me jorê jî gotibû pêwendiyên merwaniyan bi Bexdayê re hebûn. Ticarên ereb dema diçûne Rusyayê, zêr û zîvên xwe bi xwe re dibirin. Mimkun e ku van ticarên ereb, ev pereyên zîv yên merwaniyan bi xwe re birine heta hundirê Rusyayê û li vir rastî vîkîngan hatine. Li van deran gelek navendên vîkîngan yên kirîn-firotanê





Kartpostalek ji girava Gotlandê.

de keda çend rohilatnas û perenasên swêdî gelek derbas bûye. Li ser van pereyên zîv yên kurdan zêdetir rohilatnasê swêdî C. J. Tornberg (1807-1877) xebitiye, analîz çêkirine û demdem ew dane nasandin. C. J. Tornberg cara pêşîn di sala 1847an de di lêkolîneke xwe de sê pereyên dewra merwaniyan dide nasandin.<sup>78</sup> Salekê şunda di xebateke xwe ya mayin de hejmara van peran wek 12 nîşan dide.<sup>79</sup> Profesora C. J. Tornberg ku bûye pisporê pereyên rohilatê yên ku li Swêdê hatine dîtîn, di xebateke xwe ya ku di sala 1857an çapbûyî de dide diyar kirin ku 13 pereyên kurdî ji dewra merwaniyan hatine Swêdê.<sup>80</sup> Angorî C. J. Tornberg ev perenan di navbara salên 389 (993/4) û 399 (1008/9)an de, dema herdu emîrên pêşîn yên merwaniyan hatine çêkirin. Ji van pereyan 3 heb li Nîsêbînê çêbûne. Lêkolînerên swêdî van pereyên merwaniyan di nav pereyên îslamî de wek pereyên teze dihesibînin.<sup>81</sup>

Lêkolînerên arkeolojîk li Swêdê her berdewam dikin. Di navbera salên 1845 û

hebûn. Ev tehrên kontaktan zêdetir li ser erdê Rusyayê pêsta çûbûn, bi taybetî Mîrîtiya Bûlgarên ku derbasi dî-nî Îslamê bibûn, li ser erdê Rusyayê li dorberê Volgayê wek xelexokeke transîtê ya bazirganiyê pêk anîbûn. Bûlgaran di navbera rohilatê û rojavayê de roleke gelek mezin dilîstin, ev herdu dever digîhandin hev. Nêzîkbûn û xurtbûna pêwendiyên Rusyayê, Gotlandê û Swêdê çawa tê xuyan êdî qedera van pereyên kurdî gelek baş eşkere dikir.

Di derbarê analîzkirin, xwendin û nasandina van pereyên kurdî

1928an de gelek pereyên dewra merwaniyan tenê li deverên Gotlandê yên cuda tèn dîtînê.<sup>82</sup> Sal û koka beşeke, van pereyan ji aliyê Profesor C. J. Tornberg û beşeke din ji aliyê Profesor Esaias Tegner de hatine tespît kirin.<sup>83</sup> Em dikarin van pereyên merwaniyan yên ku berî sedsalan hatine Gotlandê, angorî dever, cih, sala dîtînê û hejmara wan, li jêr waha bi rêz bikin:

Fardhem (Gerete, 1845)	3
Endre (Endre II, 1847)	2
Follingbo (Rosendal, 1855)	1
Burs (Enges, 1864)	1
Fole (Öster Ryftes, 1871)	12
Follingbo (Gerete, 1875)	1
Fole (Stora Sojdeby, 1910)	6
Etelhem (Hemängen, 1914)	1
Barlingo (Digeråkra, 1928)	1
	28

Ew 13 pereyên ku Tornberg di xebateke xwe ya sala 1857an de qala wan dike, li jor nehatine rêzkirin. Eger em wan jî li ser van 28 heban de zêde bikin, hejmara pereyên dewra merwaniyan li Swêdê hatine dîtîn ji çilî zêdetir dibin. Bêguman ev lîsteya, lîsteke gilover e, hejmara van peran dikarin zêde bin. Mîmkun e di nav pereyên ku Tornberg qala wan dike, pereyên ku ji der Gotlandê li cihên mayin yên Swêdê hatine dîtîn jî, hene. Tornberg di lêkolînên xwe de zêde behs nake ku ev pere li kêdera Swêdê hatine dîtîn. Ji van pereyên hinek tam in, çend heb jî şkestine an jî derizîne. Hans Hildebrand, di lêkolîneke xwe behsa pereyekî merwaniyan dike ku keştiye, bûye du perçeyan.<sup>84</sup> Yek ji van pereyên merwaniyan, li Cizîrê hatiye çêkirin, deriziye û bûye du perçan.<sup>85</sup>

Ev pereyan tenê beşekê wan pereyên ku li Gotlandê hatine dîtîn, pêk tînin. Çimkî lêkolînên arkeolojîk heta niha jî berdeham dikin. Bi kurtî Gotland wek "*defîna pereyên kurdî*" dikare bê hesibîn. Di sala 1910an de li Gotlandê defîna pereyên Îslamî ya here mezin tê dîtîn, qasî 2310 pereyên Îslamî ji nav defînê derdikevin. Ev peran li Stora Sojdeby li devera Fole li Gotlandê hatine dîtîn. Di nav defînê de 6 pereyên kurdî jî hene. Ev pereyên merwanî vi navê herdu mîrên kurdan yên pêşîn hatine çêkirin. Lêkolîner Bror Schnittger, di xebateke xwe de

hejmara wan 4 heb nîşan dide.<sup>86</sup> Lê belê di katalogên ku paşê hatine amade kirin, hejmara wan wek 6 heb hatiye nîşan kirin.<sup>87</sup> Ev pereyên zîv li Cizîrê û Mayafariqînê hatine çêkirin. Piraniya pereyên ku Gotlandê hatine dîtin bi navên Abu Ali al-Hasan ibn Merwan û Abu Mansur Said ibn Merwan, li bajarên Mayafariqînê, Cizîrê û Nisêbînê hatine çêkirin. Lêkolînên li Gotlandê heta niha her berdewam kirine. Di sala 1967an de pereyekî merwaniyan dîsa li cihekî bi navê Burgeyê tê dîtin. Ev defîna li Gotlandê defîna here mezin hatiye hesibîn, qasî 3 000 pere û gelek tiştên dewra vîkingan li vir hatine dîtin.<sup>88</sup> Hine pereyên ku li Gotlandê hatine dîtin, li qiraxê wan du qul hene. Ev yeka tê wê maneyê ku dema ev peranan hatine Gotlandê di jiyana rojane de wek hacetêke kirîn-firotinê nehatine bi kar anîn, demekê wek xeml û nîşana bedewiyê hatine bi kar anîn û paşê di bin erdê de veşartî mane. Lê belê çawa em dibînin piştî hilweşandina Mîrîtiya Merwaniyan, beşek pereyên merwaniyan ji aliyê hêzên mayin, wek mîsal ji aliyên mîrîtiyên tirkan de careke din hatine mor kirin û derbasî tedavûlê bûne.

Bi kurtî eger em bixwazin bizanibin ku heta niha tam çiqas pereyên kurdî ji deverên cihê yên Gotlandê hatine dîtin, divê xebateke fireh ya mayîn bê çêkirin. Ew pereyên heta niha hatine dîtin, ji gelek perçeyên kurdhakim çêbûne, wek Berda'a, Erdebil, Mayafariqîn, Nisêbîn û Cizîr. Ji nêveke pêşîn ya sedsala 9an heta nêveke pêşîn ya sedsala 10an van kontaktên kurdan û vîkingan, her berdewam kiriye. Ji sala 943an heta 1071an, ji sed salî zêdetir van pêwendiyên ajotiye. Cudabûna van cihan-mekanan û deman, rengîniya kontaktên kurdan û vîkingan nîşan dide. Ji aliyê din ev pereyan di warê ronîkirina pêwendiyên kulturî yên kurdan û swêdiyan de bi serê hêjayî lêkolîneke mayîn ya fireh e. Derbarê kontrolkirina rastiya wan zaniyariyên dîrokî yên ku di çavkaniyên nivîskî de hene, ev pereyên zîv gelek giring in û pir babetan de dikarin alîkariya lêkolîvanan dikin.

Di dewra vîkingan de ji çilî zêdetir pereyên kurdî hatine welatên bakurî, wek Swêd, Norvec, Danmarkayê. Qasî çil hebî hatine Gotlandê, piraniya wan pereyên merwaniyan e û li Mayafariqînê çêbûne, du heb ji aliyê mîrê kurd Ibrahim al-Daysam de li devere Aranê hatine çêkirin. Her çiqas hejmara wan zêde nîn be jî, çend pereyên merwaniyan li welatê mayin yên bakurê jî hatine dîtin. Di sala 1907an de du pereyên kurd yên merwaniyan li Norvecê<sup>89</sup> û yek jî li Danmarkayê hatiye dîtin.<sup>90</sup> Pereyê ku li Danmarkayê hatiye dîtin bi navê mîrê Merwaniyan yê duwemîn Abu Mansur Said bin Merwan hatiye çêkirin. Pêwendiyên Norvecê û Danmarkayê zêdetir bi rojavayê re hebûn, ji bo vê yekê jî angorî Swêdê kêr pereyên rohilatê li van welatan hatine dîtin. Çawa lêkolîner Ul-

la S. Linder-Welin dide diyar kirin, ev pereyên merwaniyan yên ku Norvecê û Danmarkayê hatine dîtin, di nav pereyên Îslamî de pereyên here teze nin (de-reng hatine çêkirin).<sup>91</sup> Di lêkolînên pereyan de, perenas gelek caran pereyên kurdî di bin kategoriya pereyên erebî, îslamî û kufî de cîwar dikin. Ev yeka ji bo lêkolîneran gelek caran dibe sedem û bayisê tevlihevî û çewtiyan.

Dema em çavkaniyan raçav dikin em dibînin ku berî avabûna Mîrîtiya Merwaniyan, pêwendiyên vîkingan û hamdanidan hebûne. Hamdanid navê mîrîtiyeke ereb (905-1004) bû ku li Suriyê û li Cizîrê hukim dikir. Hamdanîdan demekê devera Diyarbekirê jî xistibû bin hukimdariya xwe. Çend pereyên ku hamdanidan di van salan de li Nisêbînê û Mayafariqînê çêkirine, paşê hatine Swêdê. Hamdanîdan, bajarên Helep û Mayafariqîn ji xwe re demekê xistibûn paytext. Lêkolînera swêdî Ulla S. Linder-Welin derbarê van pereyên berî avakirina Mîrîtiya Merwaniyan li Kurdistanê çêbûne, agahdariyên fireh di xebareke xwe de pêşkêş dike.<sup>92</sup>

### **Rasthatina kurdan û vîkingan ya dawî li Malazgîrdê**

Di demên gelek cihê de vîking bi rêketine, çûne Konstantînopol, li wir mane. Konstantînopol di van salan de ji aliyê vîkingan de wek Miklagârd (bajarê mezin) dihate bi nav kirin. Vê mezinahî û muhteşembûna bajarê gelek vîking berbî xwe kişandine. Vîking li pey zêr, zîv, qumaş, baharat, pere û meşhurbûnê ketibûn. Hinek vîkingên ku çûne Konstantînoplê, çawa me li jor jî got li bal qeyserê Bizansê wek parêzkar xebitîne. Ji wan re vâring hatiye gotin. Dema salên şer de ew divê bi qeyserê Bizansê re tevayî biçûna şer. Ji der karkirinê, li Konstantînoplê, vîkingan di salên 860 û 1043an de du caran ber bi Konstantînoplê seferên vîkingî jî pêk anîne.

Di sala 1071an de, di navbera Bizansê û Selçûkiyan de şerekî mezin li dorberê Malazgîrdê (qeza Mûşê) çêbûye. Qeyserê Bizansî, Romanus IV Diogenes û vîkingên ku parêzkarên wî bûn jî tevî vî şerê li dijî selçûkiyan de beşdar bûne. Wisan jî bi hezaran kurd li bal selçûkiyan li dijî ordiyên Romanus IV Diogenes cih girtine. Di vî şerî de leşkerên skandînavî yên kirêkirî hatine kuştin û careke din piştî xwe serrast nekirine.<sup>93</sup> Angorî Alf Åberg û Mats G. Larsson, ew kevîrên dîrokî yên ku li Swêdê hatine dîtin û behsa "Grekland"<sup>94</sup> (Yunanîstan) dikin, mimkun e ji bo van kesên ku li Malazgîrdê mirine hatine çêkirin: "Ew li Yunanîstanê mir", "ew bi yunan ve mir".<sup>94</sup> Malazgîrd her çiqas di nav sînorên Bizansê de bû jî, bandûra hukimdariya merwaniyan li vê deverê xwe nîşan dida. Angorî dîroknasê Mîsirî, Ruvadarî qasî deh hezar kurd di vî şerî de beşdar bûne.<sup>95</sup> Îhtîmaleke gelek mezin e ku vîking û kurd piştî şerê Berda'ayê û rasthatina Diyar-

bekirê, cara sêwemîn li Malazgîrdê rastî hev hatine. T. J. Arne, di nivîseke xwe de wisan jî bala me dikşîne rasthatina tirkên û vîkingan ya pêşîn li Malazgîrdê.<sup>96</sup> Angorî Mats G. Larsson, piştî şerê Malazgîrdê hejmara vîkingên ku li Konstantînoplê kar kirine, her çûne kêmbûne û van leşkerên bakurî hêza xwe ya berê wunda kirine.<sup>97</sup> Ji aliyê din li dora nivê sedsala yanzdehan êdî dawîya *dewra vîkingan* hatiye û vîking li rohilatê mirov dikare bêje, êdî nemane. Deverên Kurdistanê vê carê dibin hedefê êrîşên mezin yê ordiyên selçûkiyan.<sup>98</sup>

Ji destpêka sedsala roan vir de hejmara pereyên Îslamî her diçin kêmbûn. Ev yeka tê wê maneyê ku pêwendiyên rohilatê û vîkingan hêdî hêdî qut dibin. Pereyên rohilatê êdî kêmbûne welatên bakur. Aktîfbûna eşîrên tirkên li Kafkasyê û keşfkirina rêya Behra Spî li başûrê, qiymetê dorberê Behra Hezarê kêmbûn. Vîking êdî hewl didan ku ji xwe re cî-meskenên nû peyda bikin. Her çiqas vîking di seferên talankirinê, lêxistin û kuştinê de beşdar bûne jî, lê belê ew wisan jî bi mîrxasî, camerî û bêtirsîya xwe ve hatine nas kirin. Divê mirov vî aliyê vîkingan jî bide ber çavan. Ev aliyê wan yê bi esil, romantîsekirina tema vîkingan xurttir kiriye. Çend mîsyonerên swêdî bi karakter û bi mercên jiyane kêmbûne vîking û kurd şibandine hev, wek mîsal Maria Anholm<sup>99</sup> û E. John Larsson<sup>100</sup>. Mîsyoner E. John Larsson di nivîseke xwe de, derbarê vê şibandina kurdan û vîkingan de tiştine balkêş dibêje: ”*Ev mîsalê hat dayin nîşan dide ku kurd xweyê exlaqekî bilind in. Mîrên kurdan bi rastî eşqîya ne û tirs-xofeke mezin di nav cînarên xwe de belav dikin. Lê belê ew dikarin di gelek rewşan de wek kesên centîlmen hereket bikin. Ew, gelek dişibin vîkingên bakurî ku ji bo şêlandin û talankirinê derketine seferên vîkingî, lê belê vîkingan di vî navberê de wek xelk cengawerî û mîrxasiya xwe jî nîşan dane*”.<sup>101</sup>

#### Jêrenot:


- <sup>1</sup> Sture Bolin, *Muhammed, Karl den store och Rurik*, Scandia - Tidskrift för historisk forskning, band XII, 1939, rûp.211.
- <sup>2</sup> Çend xebatên T. J. Arne yê ku behsa pêwendiyên vîkingan û rohilatê dikin: *Sveriges förbindelser med östern under vikingatiden*, Fornvännen, 1911. T. J. Arne, *De äldre förbindelserna mellan Sverige och Turkiet*, Hävd och Hembygd 2, 1927. T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943*. *Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, 1932. T. J. Arne, *La Suède et l'Orient*, 1914.
- <sup>3</sup> R. Nordenstreng, *Vikingafärderna*, Stockholm, 1926 (Vikingarna i österväg, rûp.143-189)
- <sup>4</sup> Holger Arbman, *Svear i Österviking*, Stockholm, 1955. (Di dawîya vî lêkolînê de bibliyografîke fireh li ser seferên vîkingan yê li rohilatê heye).
- <sup>5</sup> Mats G. Larsson, *Vikingar i österled*, Stockholm, 1997. (Ev xebata ji sê pirûkên nivîskar yê ku berê çapbûyî, pêk hatiye: *Ett ödesdigert vikingatåg*. *Ingvar den vittfarnes resa 1036-1041*, Stockholm, 1990. *Väringar. Norbor hos kejsaren i Miklagård*, Stockholm, 1991. *Rusernas rike. Nordborna i Rysslands födelse*, Stockholm, 1993).
- <sup>6</sup> Catharina Ingelman-Sundberg, *Boken om vikingarna*, Stockholm, 1998. (binêre beşa bi navê *Det främmande landet i öst*).
- <sup>7</sup> Ibn Miskawaih, *The eclipse of the Abbasid caliphate*, edited: R.F. Amedroz and D.S. Morgoliouth, vol.1-7, London, 1914-1921. H. Birkelands, *Nordens historie i Middelalderen etter ara-*

- biska kilder*, di: Det Norske Videnskabs-Akademis Skrifter II, Hirüp,-Filol. Klasse, no 2, 1954. rúp.57 (Ev nivîsa dirêj ji çend nivîsên dîroknaşên ereban ku li ser vîkingan bi zimanê norvecî der çûne, pêk hatiye).
- 8 Rohat Alakom, *Svenskar om kurder. En resa i tiden*, Stockholm, 1999. (Beşeke vê xebatê li ser babeta pêwendiyên kurdan û vîkingan e, li ber çapê ye).
  - 9 Alexander Kan, *Sverige och Ryssland*, Stockholm, 1996, rúp.150.
  - 10 V. Thomsen, *The relations between Russia and Scandinavia and the origin of the Russian state*, Oxford, 1877. W. Thomsen, *Ryska rikets grundläggning genom skandinaverna*, Stockholm, 1882. P. B. Golden, *Rus*, The Encyclopaedia of Islam, new edition, rúp. 618. T. J. Arne, *Det stora Svidjod. Essayer om gängna tidens svensk-ryska kulturförbindelser*, Stockholm, 1917. Mats G. Larsson, *Svidjod. Resor till Sveriges ursprung*, Stockholm, 1998. H. Paszkiewicz, *The Origin of Russia*, London, 1954.
  - 11 M.G. Larsson, *Rusernas rike. Nordborna och Rysslands födelse*, Stockholm, 1993, rúp. 14.
  - 12 Tomas Hågg, *Rhôs ante portas! Grekiska källor om rusernas angrepp på Konstantinopel 860*. Svenska Forskningsinstitutet i Istanbul. Meddelanden 4/1979.
  - 13 Erland Hjærne, *Roden. Upphovet och namnet. Området och Jarlen*, Lund, 1947 (Särtryck ur *Namn och bygd* 1947).
  - 14 *Nestorskrönikan*, wergervan: A. Norrback, Stockholm, 1919, rúp. 171. (Çapa nû: *Nestorskrönikan*, Stockholm, 1998, wergervan: Gabriella Oxenstierna).
  - 15 Alexandr Kan, *Sverige och Ryssland*, Stockholm, 1996, rúp.31. *Vikingatidens ABC*, Statens historiska museum, 1995, rúp.224.
  - 16 Helge Ljungberg, *Österländskt ljus över svenskt 900-tal*, Svenska Dagbladet 10/5.1979. (Ev nivîsa li ser pirtûka Stig Wikander ya bi navê *Araber, vikingar, varingar* hatiye nivîsin).
  - 17 *Vikingatidens ABC*, Statens historiska museum, 1995, rúp.297.
  - 18 Vilhem Thomsen, *Ryska rikets grundläggning genom skandinaverna*, Stockholm, rúp.98-99.
  - 19 T. J. Arne, *Det stora Svidjod. Essayer om gängna tidens svensk-ryska kulturförbindelser*, Stockholm, 1917. Mats G. Larsson, *Svidjod. Resor till Sveriges ursprung*, Stockholm, 1998.
  - 20 Stig Wikander, *Araber, vikingar, varingar*, Lund, 1978, rúp.12.
  - 21 T. J. Arne, "Austr i Karusm" och Särklandnamnet, Fornvännen, häfte: 5-6, 1947, rúp.295.
  - 22 *Ibid.*, rúp. 290-305.
  - 23 Mats G Larsson, *Ett ödesdigert vikingatåg. Ingvar den vittfarnes resa 1036-1041*, rúp.121-154.
  - 24 Mats G. Larsson, *Ett ödesdigert vikingatåg*, rúp.17.
  - 25 *Ibid.*, rúp. 17.
  - 26 Thomas S. Noonan, *When did Rus/Rus' merchants first visit Khazaria and Bagdad?* i *Archivum eurasiae medii aevi*, VII, 1987-1991.
  - 27 *Ibn Khordadbeh*, Fornordiskt Lexikon, 1983, rúp.173.
  - 28 *Ibn Xeldûn, Destpêka Dewleta Bad û ya Merwanîyan li Mûsilê*, wergera ji erebî: Emîn Narozi, Çira 8/1996.
  - 29 Şamilê Selîm Esker, *Kurdên Azerbeycanê, dîroka Laçînê û yên mayin*, Çira, 9/1997.
  - 30 V. Minorsky, *Kurds*, The Encyclopaedia of Islam, rúp. 450.
  - 31 Şamilê Selîm Esker, *Kurdên Azerbeycanê, dîroka Laçînê û yên mayin*, Çira, 9/1997.
  - 32 T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943. Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, 1932.
  - 33 *Ibn Miskawaih, The eclipse of the Abbasid caliphate*, edited: R.F. Amedroz and D.S. Morgoliouth, vol.1-7, London, 1914-1921, vol.II, rúp.62-67.
  - 34 D.M. Dunlop, *Bardha'a*, The Encyclopaedia of Islam, rúp.1040-1041.
  - 35 Şamilê Selîm Esker, *Kurdên Azerbeycanê, dîroka Laçînê û yên mayin*, Çira, 9/1997.
  - 36 V. Minorsky, *Studies in Caucasian History*, Cambridge, 1958. V. Minorsky, *A History of Sharvan and Darband in the 10th to 11th centuries*, Cambridge, 1958.
  - 37 Derbarê van navendên kevn de binêre: M. Canard, *Dwin*, rúp.678-681. W. Barthold, *Gandja*, rúp.975-976. D.M. Dunlop, *Bardha'a*, rúp.1040-1041. The Encyclopaedia of Islam.
  - 38 T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943. Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, 1932, rúp. 213.
  - 39 *Ibid.*, rúp. 216
  - 40 Karin Ådahl, *Orientalismen i svensk konst*, Stockholm, 1990, rúp.27.
  - 41 *Ibn Miskawaih, The eclipse of the Abbasid caliphate*, edited: R.F. Amedroz and D.S. Morgoliouth, vol.1-7, London, 1914-1921.

- 42 T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943. Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, 1932, rûp. 213. Holger Arbman, *Svear i Österviking*, Stockholm, 1955, rûp. 53-54. Olov Isaksson och Yves Cohat, *Vikingatid*, 1992, rûp.159.
- 43 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperti sunt - Catalogue of Coins from the 9th-11th Centuries found in Sweden*. I. GOTLAND. 4. Fardhem-Fröjel, 1982, rûp.205. (Ev katalogê pir-cild pereyên ziv yên ku di dewra vikingan de çêbûne, dide nasandin. Sernivîsa vê katalogê ya latîni û inglîzî tê vê manayê: *Katalogê pereyên salên 800-1000 yên ku li Swêdê hatine dîtin*. Di çar cildên pêşîn de yên ku di navbera salên 1975-1982an de çapbûne, tenê pereyên ku li Gotlandê hatine dîtin, tên nasandin. Di dawîya her cildêkî de sûretên hin pereyan jî hene).
- 44 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperti sunt - Catalogue of Coins from the 9th -11th Centuries found in Sweden*. I. GOTLAND. 2. Bål-Buttle, 1977, rûp.59, 62.
- 45 Bengt E. Hovén, *Islamiska mynt: Islam - Konst och kultur*, Stockholm, 1985. Statens historiska museum, rûp.76.
- 46 Mats G. Larsson, *Ett ödesdigert vikingatåg. Ingvar den vitfarnes resa 1036-1041*, Stockholm, 1990.
- 47 A. A. Bikov, *Dva novix dirxema Daysama ibn Ibraxima al-kurdi*, Epigrafika Vastoka XX, Moskova, 1971, rûp.74-76.
- 48 C. J. Tornberg, *Om de i svensk jord funna österländska mynt*, Stockholm, 1857, rûp.34.
- 49 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperti sunt - Catalogue of Coins from the 9th -11th Centuries found in Sweden*. I. GOTLAND. 2. Bål-Buttle, 1977, rûp.277.
- 50 T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943. Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, 1932, rûp. 217.
- 51 David M. Wilson, *The Vikings and their origins*, London, 1989, rûp.102.
- 52 Arşak Polatyan, VII-X. *Yüzyillarda Kürtler*, Ankara, 1991, rûp.68 (Arşak Polatyan di cihêkî vê xebata xwe de bi büyerên Şerê Berdayê ve bala xwendevanan dikşîne ser pêwendiyên kurdan û urisan yên pêşîn. Van büyeran wek beşeke pêşîn yên pêwendiyên vikingan û kurdan nahesibîne, rûp.68).
- 53 T. J. Arne, *Rus' erövring av Berda'a år 943 - Ibn Miskaweichs berättelse om ett vikingatåg*, Fornvännen, Stockholm, 1932, rûp. 213, 216.
- 54 Ibn Miskawaih, *The eclipse of the Abbasid caliphate*, edited: R.F. Amedroz and D.S. Morgoliouth, vol.1-7, London, 1914-1921. T. J. Arne, *Ibn Fadlans resa till Bulgarien*, Fornvännen 1941. H. Birkelands, *Nordens historie i Middelalderen etter arabiska kilder i Det Norske Videnskabs-Akademis Skrifter II*, Hirûp-,Filol. Klasse, no 2, 1954. Stig Wikander, *Araber, vikingar, varingar*, Lund, 1978.
- 55 Tomas Hägg, *Rhôs ante portas! Grekiska källor om rusernas angrepp på Konstantinopel 860*. Svenska Forskningsinstitutet i Istanbul. Meddelanden 4/1979.
- 56 Şefket Beysanoğlu, *Anıtları ve Kitabeleri ile Diyarbakır Tarihi*, cilt 1, Ankara, 1987, rûp.239.
- 57 Derbarê hersê kurên Merwan bin Kek ku di dewra Merwanîyan de wek sê emirên navdar dikarin bîn hesibîn, çend zaniyarên kurt li jêr tên pêşkêş kirin: Dema di sala 990/91an de avakare Merwanîyan Bad bin Dostik dimire, kurê Merwan bin Kek yê mezin Abu Ali al-Hasan ibn Merwan dibe hukimdar. Heta sala 997/98an li ser text dimîne. Piştî kuştina wî li Amîdê, vê carê birayê duwemîn Abu Mansur Said ibn Merwan dibe hukimdar. Ev mîrê duwemîn yê merwanîyan paşê bi paya "Mumabhid al-Dawlah" ve tê nas kirin. Hukimdariya wî heta sala 1011/12an dajo û paşê ji aliyê generalekî de bi jehrê tê kuştin. Paşê birayê sêwemîn Abu Nasr Ahmed bin Merwan tê ser text, hemû devera Diyarbekirê dixwe bin destê xwe û qasî 50î salî wek hukimdarê merwanîyan li ser text dimîne. Carinan di çavkaniyan de tenê bi navê *Nasruddevle* (Nasr al-Dawlah) tê nas kirin. Di dema wî de Mîritiya Merwanîyan gelek pêsta diçe. Di sala 1061an de dimire. Li Swêdê tenê pereyên bi navê herdu birayên pêşîn çêbûne, hatine dîtin. Carole Hillenbrand, *Marwanids*, The Encyclopaedia of Islam, rûp.626-627. H.F. Amedroz, *The Marwanid dynasty at Mayyafariqin in the tenth and eleventh centuries*, Journal of the Royal Anthropological Society, 1903, rûp.123-124.
- 58 Ibn'ül-Erzak, *Mervani Kürtleri Tarihi*, Istanbul, 1975. Tîrkiya wê: M.E. Bozarsalan, rûp.77.
- 59 Ibn'ül-Erzak, *Mervani Kürtleri Tarihi*, rûp.96.
- 60 H.R. Ellis Davitson, *The viking Road to Byzantium*, London, 1976, rûp.241-243.
- 61 Mats G. Larsson, *Varingar. Nordbor hos kejsaren i Miklagård*, rûp.30.
- 62 V. Minorsky, *Kurds*, The Encyclopaedia of Islam.
- 63 Mats G. Larsson, *Varingar. Nordbor hos kejsaren i Miklagård*, rûp.46.

- 64 Ibn'ül-Erzak, *Mervani Kürtleri Tarihi*, Istanbul, rûp.110, 119.
- 65 Ibid., rûp.119.
- 66 Roger Öhrman, *Vägen till Gotlands historia*, 1994, s.58-64.
- 67 Berbarê Gotlandê û pêwendiyên rohilatê bi Gotlandê re, binêre: Ingmar Jansson, *Gotland och omvärlden under vikingatiden - en översikt: Gutar och vikingar*, 1983. Statens historiska museet. Tore Gannaholm, *Gutarnas historia*, 1990. (Runiŝtvanên Gotlandê wek *gute* hatine bi nav kirin).
- 68 M. Stenberger, *Die Schatzfunde Gotlands der Wikinerzeit I-II*, Stockholm, 1947-1958.
- 69 M. Stenberger, *Det forntida Sverige*, Stockholm, 1964, s.736.
- 70 Bengt E Hovén, *Islamiska mynt: Islam - Konst och kultur*, Stockholm, 1985. Statens historiska museum, rûp.76.
- 71 Abr. Cronholm, *Wåringarna*, Lund, 1832, rûp.257.
- 72 Bror Schnittger, *Silverskatten från Stora Sojdeby*, Stockholm, 1915, rûp.79.
- 73 Ibn'ül-Erzak, *Mervani Kürtleri Tarihi*, Istanbul, 1975, rûp.82.
- 74 Ibid., rûp.157.
- 75 C. J. Tornberg, *Om de i svensk jord funna österländska mynt*, Stockholm, 1857, rûp.23.
- 76 Ibid., rûp.23.
- 77 Ulla S. Linder-Welin, *Arabiska mynt*, Kulturhistoriskt lexikon för nordisk medeltid, Malmö, 1956, rûp.188.
- 78 C. J. Tornberg, *Symbolae ad rem Numariam Muhammedanorum ex Museo Regio Holmiensi. Nova Acta Regiae Societatis Scientiarum Upsaliensis. Vol.XIII, 1846 (Merwanidici: rûp. 140-142).*
- 79 C. J. Tornberg, *Numi Cusci-Regii Nomophylacii Holmiensis quae emnes in terra Sueciae reperi- tos digessit et interpretatus est. Uppsaliae, 1848 (Numi Merwanidarum: rûp.269-274).*
- 80 C. J. Tornberg, *Om de i svensk jord funna österländska mynt*, Stockholm, 1857, rûp.17.
- 81 Ulla S. Linder-Welin, *Arabiska mynt*, Kulturhistoriskt Lexikon, Malmö, 1956, rûp.188.
- 82 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperi sunt - Catalogue of Coins from the 9th-11th Centuries found in Sweden. I. GOTLAND. 4. Fardhem-Fröjel, 1982, rûp.6, 79, 104, 179, 190.*
- 83 Bror Schnittger, *Silverskatten från Stora Sojdeby*, Stockholm, 1915, rûp.9.
- 84 Hans Hildebrand, *De öster- och västerländska mynten i Sveriges jord*, Historiska studier. Festskrift tillägnad Carl Gustaf Malmström 1897, rûp.9.
- 85 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperi sunt - Catalogue of Coins from the 9th-11th Centuries found in Sweden. I. GOTLAND. 4. Fardhem-Fröjel, rûp.282.*
- 86 Bror Schnittger, *Silverskatten från Stora Sojdeby*, Stockholm, 1915, rûp.9.
- 87 *Corpus Nummorum saeculorum IX-XI qui in Suecia reperi sunt - Catalogue of Coins from the 9th-11th Centuries found in Sweden. I. GOTLAND. 4. Fardhem-Fröjel, 1982, rûp.104.*
- 88 *Gotlands största silverskatt funnen vid Burge i Lummelunda*, Gotländsk Arkiv 1969.
- 89 Kolbjørn Skaere, *Coins and Coinage in Viking-Age Norway*, 1976, rûp.150.
- 90 J. Østrup, *Catalogue des Monnnes arabes et turques*, Copan Hague, 1938, rûp.113 (no 277).
- 91 Ulla S. Linder-Welin, *Arabiska mynt*, Kulturhistoriskt Lexikon, Malmö, 1956.
- 92 U.S. Linder Welin, *Sayf ad-dawlah's Reign in Syria and Diarbekr, in the Light of the Numismatic Evidence*. Kungliga Vitterhets Historia och Antikvitets Akademiens Handlingar, Antikvariska Serien 9, Stockholm, 1961, rûp.17-104.
- 93 Mats G. Larsson, *Våringar. Norbor hos kejsaren i Miklagård*, Stockholm, 1991, rûp.82.
- 94 Alf Åberg, *Svenskarna i Turkiet*, Jordan Runt, no 2, 1973. Mats G. Larsson, *Våringar. Norbor hos kejsaren i Miklagård*, Stockholm, 1991, rûp.82.
- 95 *Uluslararası Selahaddin-i Eyyubi Sempozyumu*, Diyarbakır Büyükşehir Belediyesi, Diyarbakır, 1997, rûp.236.
- 96 T. J. Arne, *De äldre förbindelserna mellan Sverige och Turkiet*, Hävd och Hembygd 2, 1927, rûp. 36.
- 97 Mats G. Larsson, *Våringar*, rûp.82.
- 98 Elizbieta Swiecicka, *Turkarnas erövring av Anatolien: Ur Anatoliens historia*, Skrifter utgivna av Sällskapet för asiatstudier 3, Uppsala, 1987.
- 99 Maria Anholm, *Det dödsdömda folkets saga*, Stockholm, 1906, rûp.20.
- 100 E. John Larsson, *Kurderna och deras land, di : I Orienten*, rûp.232. (Ev destnivîsa di arŝiva Svenska Missionsförbundetê de ye, di destpêka sedsala me de hatiye nivîsin).
- 101 Ibid., rûp.232.





Xwediyê *Medya Kitabeviyê* Selahattin Bulut û hevkarê wî.

**G**elek caran gazinên di derbarê nebûna kitêbxane û kitêbfiroşên kurdan de têne kirin. Lê Selahattin Bulutê kitêbhez bersiva van gazinan daye û li nava Stembolê, li Istiklal Cadeya Beyoğluyê dikaneke kitêbfiroşiyê vekiriyê ku tê de bi kurdî û di derheqa kurdan de her celeb kitêb hene.

Di seredana Stembolê de, seredana *Medya Kitabeviyê* wê hem mêjiyê we hem jî ruhê we dewlemndtir bike.

Em mizgîniyeke din jî didin xwendevanên welêt ku wê ji niha û demeke nêzik Nûdem û Weşanên Nûdemê jî li ba *Medya Kitabeviyê* peyda bibin. Lê hûn dikarin ji niha ve ji *Medya Kitabeviyê* pirsra Nûdem û kitêbên Nûdemê bikin. Em ê di hejmarên bê de ji bo bidestxistina kovara Nûdemê û weşanên wê, navnişanên hin kitêbfiroşên Diyarbekir, Îzmîr û Wanê jî bidin.

Medya Kitabevi  
Istiklal Cad. Elhamra pas. No: 258/6  
Beyoğlu-İstanbul - TURKEY

# BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

**G**ER HEWESA TE LI SER HELBEST, ÇÎROK, ROMAN, HEVPEYVÎN, LÊKOLÎN, HUNER, SÎNEMA Û HWD. HEBE, PÊŞNIYAZEKE ME HEYE; BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER TU DIXWAZÎ JI TEVGERA HUNER Û EDEBIYATÊ YA HER ÇAR PERÇEYÊN WELÊT HAYDAR BIBÎ Û EDEBIYATA DINYAYÊ YA KEVNAR Û NÛJEN BI ZIMANÊ KURDÎ BIXWÎNÎ, DÎSAN BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

NÛDEM DIXWAZE JI AVAKIRINA EDEBIYATA KURDÎ RE BIBE ALÎKAR, TU JÎ ALÎKARIYA WÊ BIKE, BIBE ABONE!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê/aboneya Nûdemê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek, Skandinavya 280 Sek, Ewrûpa 100 DM, Amerîka, Austaralya û Kanada 50 \$.

Nav û paşnav.....


Navnîşan.....

---

Vê kartê dagirin û kopya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiye ji we re bişînin.



# HAWAR DENGÊ ZANÎNÊ YE



Xwe ji zanînê bêpar mehê!e!